



K.T.

ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ

ŞAXA MEKAZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

**TESPÎTKIRIN Û TESNÎFKIRINA NIRXÊN CIVAKÎ**

**DI ÇÎROKÊN HERÊMA NISÊBÎNÊ DE**

Nurcihan AKTAŞ

19711009

Şêwirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn 2022

K.T.  
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ  
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ  
ŞAXA MEKAZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

**TESPÎTKIRIN Û TESNÎFKIRINA NIRXÊN CIVAKÎ  
DI ÇÎROKÊN HERÊMA NISÊBÎNÊ DE**

Nurcihan AKTAŞ  
19711009

Şewirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn 2022

**T. C.**

**MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ**

**TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**

**TEZ ONAYI**

Enstitümüz Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı 19711009 numaralı tezli yüksek lisans programı öğrencisi Nurcihan Aktaş’ın hazırladığı “Tespîtkirin û Tesnîfkirina Nirxên Civakî di Çîrokên Herêma Nisêbînê de” başlıklı Yüksek Lisans tezi ile ilgili Tez Savunma Sınavı, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 30/11/2022 Çarşamba günü saat 15:00’da yapılmış, tezin onayına oy oybirliğiyle karar verilmiştir.

Başkan

Doç. Dr. Necat KESKİN

Üye

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK (Danışman)

Üye

Doç. Dr. Canser KARDAŞ

**ONAY**

Bu tezin kabulü, Enstitü Yönetim Kurulu’nun \_\_/\_\_/202\_\_ tarih ve ..... sayılı kararı ile onaylanmıştır.

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

Enstitü Müdürü

## ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;

- Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,
- Tez çalışmada kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,
- Tez çalışmasının özgün olduğunu,
- Tez çalışmasının Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından kullanılan “bilimsel intihal tespit programı” ile tarandığını ve hiçbir şekilde “intihal içermediğini” beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucu kabullendiğimi bildiririm.

Nurcihan AKTAŞ

2022

## KURTE

Teza Lîsansa Bilind

### TESPÎTKIRIN Û TESNÎFKIRINA NIRXÊN CIVAKÎ DI ÇÎROKÊN HERÊMA NISÊBÎNÊ DE

Nurcihan AKTAŞ

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

158 Rûpel

Çîrok, ew serpêhatiyên devkî ne ku di nav civakê de welidîne û di xwe de çanda bav û kalan vehewandine. Hemû civakan li gorî jiyîn, bawerî û nirxên xwe çîrokên xwe afirandine û bi vî awayî jî ji nîşkekê xwe gihandine nîşkeke din. Ango çîrok li ser bawerî û nirxên civakê ava bûne. Lewma em dikarin bibêjin ku çîrok neynika civaka xwe ye; çimkî çîrok ji aliyekî ve ji bo guhdar kêfxweşî û zewq e û ji aliyê din ve jî di xwe de kodên civakê dihewîne û van kodan bi şîretwarî digihîne guhdarvanan. Helbet heman helwest bi qasî zarokan ji bo mezinan jî di çîrokan de vehewandî ne. Lewma di çîrokan de têgihîştina çand û nirxên civakî yên miletekî pêkan e. Armanca vê xebatê ew e ku di çîrokên kurdî yên gelêrî yên li herêma Nisêbînê de nirxên civakî bîn tespîtkirin. “Bi gelemperî nirxên civakî yên ku di xwe de hewandine çi ne û bi riya van çîrokan kîjan nirxan xwe gihandine nîşka li dû xwe?”, ew pirs in ku bersivên wan bingêha vê xebatê ne. Di xebatê de ji bo bersiva van pirsan li ser bîst çîrokên herêma Nisêbînê analîza naverokê hatiye kirin û di van çîrokan de nirxên civakî li gorî pîvana nirxan a Schwartz hatine tespîtkirin û senifandin. Di beşa destpêkê ya xebatê de li ser mijar, armanç, rêbaz, sînor û çavkanîyên tezê zanyarîyên bingehîn hatin dayîn. Di beşa yekem de li ser pêwendîya nirxan bi çîrok û folklorê re hate sekinandin û di beşa duyem de nirxên civakî ên her bîst çîrokên devera Nisêbînê hate pêşkêşkirin û tespît û tesnîfa van nirxan hate kirin. Di dawîya xebatê de encam û şîrove hatine nivîsîn û metnên tam ên deh çîrokên herêma Nisêbînê hatin dayîn ku ji hela me ve ji bo xebatê hatibûn berhevkirin; lê ji bo mafê telifê metnên tam ên wan her deh çîrokên herêma Nisêbînê yên jêgirtî nehatine dayîn.

**Bêjeyên Sereke:** Çîrok, Kurmancî, Nirxên civakî, Nisêbîn, Schwartz.

# ÖZET

Yüksek Lisans Tezi

## NUSAYBİN YÖRESİNE AİT MASALLARDA SOSYAL DEĞERLERİN TESPİT EDİLMESİ VE SINIFLANDIRILMASI

Nurcihan AKTAŞ

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

158 Sayfa

Masallar bir toplum içerisinde doğan ve ataların kültürlerini barındıran sözlü anlatılardır. Her toplum kendi yaşam biçimleri, inanç ve değerlerine göre masallarını oluşturmuşlar ve bu şekilde nesilden nesile aktarmışlardır. Yani masallar bir toplumun inanç ve toplumsal değerleri üzerine inşa edilmiştir. Bu yüzden masalların bir yönüyle toplumun aynası olduğu söylenebilir; çünkü masallar bir yandan dinleyicilere zevk verirken diğer yandan içinden barındırdığı toplumsal kodları nasihatvari yolla dinleyicilere ulaştırmaktadır. Elbette ki bu eğitsel yönü sadece çocuklar için değil, aynı zamanda yetişkinler için de geçerlidir. Dolayısıyla bir toplumun kültür ve toplumsal değerlerini masallarından anlamak mümkündür. Bu çalışmanın amacı Nusaybin yöresinde yer alan Kürtçe folklorik masallarında sosyal değerlerin tespit edilmesidir. “Genellikle barındırdığı sosyal değerler ne şekildedir ve bu masallar aracılığı ile hangi değerler bir sonraki nesle ulaşmıştır?”, soruların cevapları bu çalışmanın temelini oluşturmaktadır. Bu soruların cevapları için Nusaybin yöresine ait yirmi kurmanci masal analiz edilmiş ve bu masalarda Schwartz Değer Ölçeği kullanılarak sosyal değerler tespit edilip, sınıflanmıştır. Çalışmanın giriş bölümünde tezin konusu, amacı, yöntemi, sınırlılıkları ve kaynakları hakkında temel bilgiler verilmiştir. Birinci bölümde değerlerin hikâye ve halk bilimi ile ilişkisi üzerinde durulmuş, ikinci bölümde ise Nusaybin yöresine ait yirmi hikâyenin tamamına ait toplumsal değerler ortaya konulmuş ve bu değerlerin tespiti ve sınıflandırılması yapılmıştır. Çalışmanın sonunda sonuç ve yorumlar yapılmış olup, çalışmamız için derlediğimiz Nusaybin yöresine ait on masalın tam metinleri verilmiştir, ancak telif hakkından ötürü alıntı yaptığımız diğer on öykünün tam metinleri verilmemiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Masal, Nusaybin, Kürtçe, Sosyal değerler, Schwartz.

## ABSTRACT

Master's Thesis

### DETERMINATION AND CLASSIFICATION OF SOCIAL VALUES IN THE STORIES OF NUSAYBIN REGION

Nurcihan AKTAŞ

Mardin Artuklu University

Institute of Living Languages in Turkiye

Department of Kurdish Language and Culture

158 Pages

Tales are oral narratives that occur in a society and contain ancestral culture. each society has created their tales according to their lifestyle, beliefs and values and this way they passed it down from generation to generation. that is, tales are built on the belief and social values of a society. so it can be said that tales are the mirror of society; because while fairy tales delight the listeners on the one hand, they convey the social codes they contain to the listeners in a counseling way. Of course, this educational aspect applies not only to children, but also to adults. Therefore, it is possible to understand the cultural and social values of a society by looking at its tales. The aim of this study is to determine the social values in Kurdish folkloric tales located around Nusaybin. The answers to the questions "What are the social values it usually contains and which values have reached the next generation through these tales?", form the basis of this study. For the answers to these questions, twenty fictional tales belonging to the Nusaybin region were analyzed and social values were determined and classified using the Schwartz Value Scale in these tales. In the introduction part of the study, basic information about the subject, purpose, method, limitations and sources of the thesis is given. In the first part, the relationship of values with story and folklore was emphasized, in the second part, the social values of all twenty stories belonging to the Nusaybin region were revealed and these values were determined and classified. At the end of the study, conclusions and comments were made and the full texts of the ten tales belonging to the Nusaybin region that we compiled for our study were given, but the full texts of the other ten stories we quoted due to copyright are not given.

**Key Words:** Kurdish, Nusaybin, Tale, Social values, Schwartz.

## PÊŞGOTIN

Ji dema pêşî a mirovatîyê heta bi roja me mirov perçeyekî civaka xwe bûye û bi vê rola xwe hem têsîr li civaka xwe kiriye hem jî civakê têsîr lê kiriye. Bi vê taybetmendiyê berdewamiya civakan pêk hatiye. Ji bo berdewamiya civakê, ji bo jiyîneke baştir û herwiha ji bo refah û aramiya civakê bi demê re hin rêzik welidîne. Van rêgezên civakê weke nirxên civakan qeysa xwe girtine.

Civakek ji bo ku hebûna xwe biparêze dixwaze van nirxan zindî bihêle û wan bigihijîne nîşî li dû xwe. Dirustî, merhemet, qencî, edalet û hwd. ji wan nirxan in ku di nav civakê de çiqas bîn belavkirin, çiqas bigihjin nîşî nû, ji bo aramiya civakê ewqas baştir e. Bi vê helwestê civakan xwestine ku hêj di biçûkatîyê de bi riya hin tiştan zarokan fêrî van nirxên civakî bikin. Yek ji wan riyan çîrok in ku ne tenê ji bo zarokan lê ji bo mezinan jî rola ragihandina kodên civakî hilgirtine. Bi vê rola xwe çîrokên hiş û bawerî, jiyîn û rabirdûya civakê di xwe de vehewendine. Lewma ji van çîrokên gelêrî nirxên ku ji bo wê civakê pêwîst in dikarin bîn tespîtkirin û herwiha jiyîn û baweriyên wê civakê jî dikare bê fêmkirin.

Di vê xebata xwe de me jî hewl da ku li ser bîst çîrokên gelêrî yên li herêma Nisêbînê dahûrînê bikin û di wan çîrokên de li gorî pîvana nirxan a Schwartz nirxên civakî tespîtkirin. Bi vê yekê armanca me ew e ku pirsên wiha bîn bersivandin: “Li herêma Nisêbînê kîjan nirx hatine pejirandin, kîjan nirx hatiye xwestin ku bigihije nîşî nû û ji bo civaka Nisêbînê kîjan nirx pêwîst in? ”

Di esnayê xebata me ya qadê de deh çîrok ji hêla me ve hatin berhevkerin; deh çîrokên din jî ku beriya niha hatine berhevkerin li wan hatin zêdekerin û bi tevahî me li ser bîst çîrokên xebata xwe kir. Piştî berhevkerina çîrokên û dahûrîna wan, nirxên civakî yên di wan çîrokên de hatin tespîtkirin û şîrovekerin. Bi vê rêbazê nirxên ku li civaka Nisêbînê hatine pejirandin û nirxên pêwîst ên ku rola fêrkariyê jî hilgirtine diyar bûn.

Herçiqas xebata me weke hilberîneke şexsî xuya bike jî, di pêvajoya xebatê de çend kesan bi zanyarî, piştgiriya xwe ya manewî ev xebat xweş û geştir kirin. Ez malavayîya şewirmendê xwe Prof. Dr. Abdurrahman ADAK dikim ku bi zanyariya

xwe û bi bêhnfirehiya xwe ev xebata me geştir kir. Herwiha ez spasî û minetdariya xwe pêşkeşî juriyê tezê Doç. Dr. Necat KESKÎN dikim ku bi pêşniyaz û piştgiyariya xwe rê nîşanî me kir û derfet da ku em ji zanyariyên wî îstifade bikin. Ez ji jûriyê tezê Doç. Dr. Canser KARDAŞ re jî gelekî spas dikim ku wek pisporekî hêja fikrên xwe bi me re parve kir û rêhberiya me kir.

Bêguman ji bo ku em bikarin ji karê berhevkarîyê encam bidêrin, hewce hebû mezinên me deriyên xwe ji me re vekin. Di esnayê berhevkarîyê de me jî li deriyê gelek mezinên xwe da û wan jî her carê em destevala venegerandin. Ewilî spasiya xwe li bavê xwe Tekyeddin AKTAŞ dikim ku her û her hêz û piştgiyariya wî di dilê xwe de hîs dikim. Herwiha malavayiyê li Sebehat BATUN, Kader BEKTAŞ, Fasla ERDEM, Gülperi AKTAŞ, Fadile DOĞAN, Vehbiye ÇETİN û Hediye MUTLU dikim ku deriyê xwe ji me re vekirin û alîkariyeke mezin dane me. Herwiha ji hevalê xwe Ali ÇIVAK re spas dikim ku di qonaxên cuda yên teze de piştgirî û alîkariya wî giha min.

Nurcihan AKTAŞ

Mêrdîn

2022

## NAVEROK

<b>KURTE</b> .....	<b>iv</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>v</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>vi</b>
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>vii</b>
<b>LÎSTEYA TABLOYAN</b> .....	<b>xiii</b>
<b>KURTEBÊJE</b> .....	<b>xv</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
<i>Mijara Tezê</i> .....	1
<i>Armanc û Girîngiya Tezê</i> .....	2
<i>Çavkaniyên Sereke</i> .....	3
<i>Sînorên Tezê</i> .....	4
<i>Zehmetiyên Tezê</i> .....	5
<i>Rêbaz</i> .....	5
<i>Xebatên ku bi Mijarê re Têkildar</i> .....	5
<i>Bi Giştî Herêma Nisêbînê</i> .....	6
<b>1. BI GIŞTÎ FOLKLOR, ÇÎROK Û NIRX</b> .....	<b>8</b>
1.1. Folklor û Çîrok.....	8
1.1.1. Folklor.....	8
1.1.2. Çîrok .....	10
1.1.2.1. Cureyên çîrokan .....	12
1.1.2.2. Di kurdî de çîrok .....	14
1.2. Têgeha Nirxê.....	15
1.2.1. Senifandina nirxan .....	16
1.2.2. Nirxên civakî.....	18
1.2.3. Erka (fonksiyon) nirxan .....	19
1.2.4. Pêwendiya çîrok û nirxan.....	20

1.3. Pîvana Nirxan a Schwartz.....	22
<b>2. DI ÇÎROKAN DE NIRXÊN CIVAKÎ.....</b>	<b>26</b>
2.1. Çîroka Gavan .....	26
2.1.1. Kurteya çîroka gavan .....	26
2.1.2. Di çîroka gavan de dahûrîna nirxên civakî .....	30
2.2. Çîroka Hûtê heftserî.....	35
2.2.1. Kurteya çîroka hûtê heftserî.....	35
2.2.2. Di çîroka hûtê heftserî de hahûrîna nirxên civakî .....	37
2.3. Çîroka Mar û Du Bira .....	39
2.3.1. Kurteya çîroka mar û du bira .....	39
2.3.2. Di Çîroka mar û du bira de dahûrîna nirxên civakî.....	41
2.4. Çîroka Mîr û Du Diz.....	42
2.4.1. Kurteya çîroka mîr û du diz .....	42
2.4.2. Di çîroka mîr û du diz de dahûrîna nirxên civakî.....	45
2.5. Çîroka Mîr û Feqîr .....	48
2.5.1. Kurteya çîroka mîr û feqîr.....	48
2.5.2. Di çîroka mîr û feqîr de dahûrîna nirxên civakî.....	50
2.6. Çîroka Pîrê û Rovî .....	52
2.6.1. Kurteya çîroka pîrê û rovî .....	52
2.6.2. Di çîroka pîrê û rovî de dahûrîna nirxên civakî .....	55
2.7. Çîroka Seyrê û Eliyê Mamed.....	56
2.7.1. Kurteya çîroka seyrê û eliyê mamed.....	56
2.7.2. Di çîroka seyrê û eliyê mamed de dahûrîna nirxên civakî .....	60
2.8. Çîroka Stêrka Zêra .....	64
2.8.1. Kurteya çîroka stêrka zêra.....	64
2.8.2. Di çîroka stêrka zêra de dahûrîna nirxên civakî.....	65
2.9. Çîroka Şêr û Rovî.....	67
2.9.1. Kurteya çîroka şêr û rovî.....	67
2.9.2. Di çîroka şêr û rovî de dahûrîna nirxên civakî .....	69
2.10. Çîroka Wezîr.....	71
2.10.1 Kurteya çîroka wezîr.....	71
2.10.2. Di çîroka wezîr de dahûrîna nirxên civakî .....	73
2.11. Çîroka Çûk û Pîrê.....	75

2.11.1. Kurteya çîroka çûk û pîrê.....	75
2.11.2. Di çîroka çûk û pîrê de dahûrîna nîrxên civakî.....	76
2.12. Çîroka Mirîşk û Rovî .....	77
2.12.1. Kurteya çîroka mirîşk û rovî .....	77
2.12.2. Di çîroka mirîşk û rovî de dahûrîna nîrxên civakî .....	78
2.13.Çîroka Rovî û Şêr.....	80
2.13.1. Kurteya çîroka rovî û şêr.....	80
2.13.2. Di çîroka rovî û şêr de dahûrîna nîrxên civakî.....	82
2.14. Çîroka Şîqo .....	83
2.14.1. Kurteya çîroka şîqo .....	83
2.14.2. Di çîroka şîqo de dahûrîna nîrxên civakî .....	85
2.15. Çîroka Alik û Fatik .....	87
2.15.1. Kurteya çîroka alik û fatik .....	87
2.15.2. Di çîroka alik û fatik de dahûrîna nîrxên civakî.....	88
2.16. Çîroka Gur û Hec .....	91
2.16.1. Kurteya çîroka gur û hec .....	91
2.16.2. Di çîroka gur û hec de dahûrîna nîrxên civakî .....	93
2.17. Çîroka Jina Wezîr .....	95
2.17.1. Kurteya çîroka jina wezîr .....	95
2.17.2. Di çîroka jina wezîr de dahûrîna nîrxên civakî .....	95
2.18. Çîroka Mihemed .....	97
2.18.1. Kurteya çîroka mihemed.....	97
2.18.2. Di çîroka mihemed de dahûrîna nîrxên civakî .....	100
2.19. Çîroka Mirîşka Gavên.....	103
2.19.1. Kurteya çîroka mirîşka gavên .....	103
2.19.2. Di çîroka mirîşka gavên de dahûrîna nîrxên civakî .....	105
2.20. Çîroka Reşik.....	108
2.20.1. Kurteya çîroka reşik .....	108
2.20.2. Di çîroka reşik de dahûrîna nîrxên civakî .....	110
<b>ENCAM.....</b>	<b>113</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>124</b>
<b>PÊVEK (METNÊN TAM ÊN ÇÎROKAN) .....</b>	<b>131</b>

1. Çîroka Gavan .....	131
2. Çîroka Hûtê Heftserî .....	135
3. Çîroka Mar û Du Bira .....	138
4. Çîroka Mîr û Du Diz .....	139
5. Çîroka Mîr û Feqîr .....	142
6. Çîroka Pîrê û Rovî .....	144
7. Çîroka Seyrê û Eliyê Mamed .....	147
8. Çîroka Stêrka Zêra .....	152
9. Çîroka Şêr û Rovî.....	154
10. Çîroka Wezîr.....	156

## LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1.1: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Cureyên Nirxan û Nirxên Binbeş .....	24
Tablo 2.1: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Gavan de Senifandina Nirxan.....	30
Tablo 2.3: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Hûtê Heftserî de Senifandina Nirxan .....	37
Tablo 2.4: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Mar û Du Bira de Senifandina Nirxan .....	41
Tablo 2.5: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Mîr û Du Diza de Senifandina Nirxan .....	45
Tablo 2.6: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Mîr û Feqîr de Senifandina Nirxan	50
Tablo 2.7: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Pîrê û Rovî de Senifandina Nirxan	55
Tablo 2.8: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Seyrê û Eliyê Mamed de Senifandina Nirxan .....	60
Tablo 2.9: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Stêrka Zêra de Senifandina Nirxan .....	65
Tablo 2.10: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Şêr û Rovî de Senifandina Nirxan .....	69
Tablo 2.11: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Wezîr de Senifandina Nirxan .....	73
Tablo 2.12: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Çûk û Pîrê de Senifandina Nirxan .....	76
Tablo 2.13: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Mirîşk û Rovî de Senifandina Nirxan .....	78
Tablo 2.14: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Rovî û Şêr de Senifandina Nirxan .....	82
Tablo 2.15: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Şîqo de Senifandina Nirxan.....	85
Tablo 2.16: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Alik û Fatik de Senifandina Nirxan .....	88
Tablo 2.17: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Gur û Hec de Senifandina Nirxan .....	93
Tablo 2.18: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Jina Wezîr de Senifandina Nirxan .....	95
Tablo 2.19: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Mihemed de Senifandina Nirxan .....	100

Tablo 2.20: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Mirîşka Gavên de Senifandina Nirxan ..... 105

Tablo 2.21: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Reşik de Senifandina Nirxan .... 110



## KURTEBÊJE

AMD : Amedekar

BER : Berhevkar

Ç : Çap

ÇEV : Çeviri

HB : Heman behrem

HT : Heman tez

HWD : Her wekî din

R : Rûpel

S : Sayfa

WER : Werger

WEŞ : Weşanxane

HJ : Hejmar

## DESTPÊK

Berî heyama nivîsê hemû civakan li gorî baweriyên xwe, fikir û ramanên xwe bi riya vegotinan diyar dikirin. Ji van vegotinan efsane, çîrok, gotinên pêşyan, destan û hwd. diwêlidîn. Îro di roja me de ev cureyên vegotinê wekî edebiyata zarekî tê bi nav kirin. Bi riya van vegotinan her civak ne tenê fikrên xwe; lêbelê çand û kevneşopiya xwe û di heman deme de nixên xwe yê civakî jî digihînin nîşên nû. Çîrok jî yek ji wan vegotinên gelêrî ye ku barê ragihandina van tiştan hilgirtiye. Herçiqas çîrok bi aliyê xwe yê bi zewqdayîn û bexşiyê bala guhdaran bikêşîne jî, di naveroka xwe de gelek kodên civakî jî dihewîne. Bi riya van kodên civakî, guhdar kevneşopî, çand û nixên wê civakê û herwiha şîretên ku tê de wehewandî ne fêhm dikin. Çîrok bi vê taybetmendiya xwe nîşan dide ku rola fêrkariyê jî hilgirtiye.

### *Mijara Tezê*

Çîrok ew vegotinên devkî yê folklorîk in ku ji bo civakê weke xezîneyeke mezin in. Lewra di çîrokan de pêkan e ku şopên rabirdûya civakê bê dîtin. Çîrok çiqas vegotinên devkî bin jî bi berhevkirin û nivîsandinê gelek ji wan hatine tomakirin û bi vî awayî ji wendabûnê hatine xelaskirin. Di qada edebiyata gelêrî ya kurdî de jî gelek çîrokên berhevkirî û tomakirî hene û xebatên ku di vî warî de hatine kirin jî têra xwe hene.

Mijara teza me jî ew e ku di çîrokên gelêrî yê herêma Nîsêbînê de dîtina nixên civakî ye; herwiha di van çîrokan de kîjan nix peyda bûne ku civakê ew pejirandine û xwestine ku wan fêrî guhdaran bikin. Di çîrokan de şîretên ku ji hêla civakê ve tên qebûlkirin bi riya hin bûyeran an bi riya hin hevokan xwe nîşan didin. Rasterast ew şîret an ew nix ku ji aliyê civakê ve hatiye pejirandin nayê gotin; lê bi riya bûyerên di nav çîrokan de ev şîret an nix xwe digihînin guhdarvan. Herwiha ne tenê nixên ku di nava civakê de hatine pejirandin lê belê tevger û bûyerên ku civak wan napejirîne jî di nav çîrokan de tên dîtin. Mijara teza me bi giştî di vê çerçevoyê de ye. Em dixwazin bi riya wan bîst çîrokên berhevkirî, nixên ku ji aliye civakê ve hatine pejirandin bibînin.

### *Armanca û Girîngiya Tezê*

Di vê xebata me de armanca ew e ku di çîrokên kurmancî de yên li Nisêbînê têgihîştin, tespîtkirin û tesnîfkirina nirxên civakî ye. “Di çîrokên kurmancî yên li herêma Nisêbînê de kîjan nirxên civakî hene û di van çîrokan de nirxên herî zêde ku hatine bikaranîn kîjan in?” ew pirs in ku bersivên wan armanca vê xebata me diyar dikin. Ango armanca sereke ya vê xebatê ew e ku di çîrokên kurmancî yên li herêma Nisêbînê de tespîtkirina nirxên civakî ye. Herwiha çîrokên vê herêmê dixwazin kîjan nirxan bigihînin guhdarvanan, kîjan nirx ji wan re pêwîst in û hwd. ew pirs in ku bersivên wan jî armanca vê xebata me bûn.

Berhevkirina çîrokên li herêma Nisêbînê ku berya niha di tezên akademîk ên kurdî de nehatine bikaranîn armanca duyem a vê xebata me ye. Helbet ew çîrokên ku hatine berhevkirin ne yên tevahiya herêma Nisêbînê ne. Ji bo ku ji xebata me re bibe nimûne me ji herêma Nisêbînê de çîrok berhev kirin. Deh çîrokên din jî ên ku beriya niha hatine berhevkirin di xebata me de weke çavkaniyeke bingeîn cihê xwe girtiye. Bi tevahî li ser bîst çîrokan xebat hatiye kirin.

Di qada zanistî de, çî di ya biyanî de çî di ya kurmancî de xebatên ku li ser çîrokan hatine kirin têra xwe hene. Berhevkariya çîrokan, analîzkirina wan û hwd. ji van xebatan in. Xebatên ku li ser nirxan jî hatine kirin di tirkî de û di qada zanista biyaniyan de hene, lê di qada zanista kurmancî de xebatên kurmancî yên di derheqê nirxan de ku hatine kirin pir kêr in. Di gotara bi navê “*Bibliyografyaya Têzên Master û Doktorayê yên Bêşên Ziman û Edebiyata Kurdî û Ziman û Çanda Kurdî*”<sup>1</sup> de ji 2012an heta bi 2020an navên tezên master û doktora yên di qada kurdî hatine nivîsandin ku li zanîngehên tirkîyê hatine amedekirin. Li gorî vê gotarê em dibînin ku tenê xebatek heye ku bi mijara nirxên civakî re têkildar e; lê xebatên ku bi mijara di çîrokên gelêrî de dahûrîna nirxên civakî re eleqadar li gorî vê gotarê nînin. Lewma em dikarin bibêjin ku ev xebata me yekem xebat e ku di derheqê çîrok û nirxên civakî de ye.

Cure cure hêmanên folklorîk hene ku her civak ew afirandine. Destan, çîrok, gotinên pêşiyar û hwd. ew hêmanên folklorîk in ku ji hêla civakan ve hatine

---

<sup>1</sup> Z. Yıldırımçakar, S. Çakar, Ş. Güzel, “Bibliyografyaya Têzên Master û Doktorayê yên Bêşên Ziman û Edebiyata Kurdî û Ziman û Çanda Kurdî”, *Kurdiyat*, hj. 3, 2021.

afirandin û di naveroka xwe de kodên civakî vehewandine. Helbet di nav van hêmanên folklorîk de mimkûn e ku çand û nirxên wê civakê bê fêhmkirin. Lewma li ser van mijaran xebat jî hatine kirin. Bi van xebatan hem ev hêmanên folklorîk ji wendabûnê xilasbûne hem jî bûye neynik ku nirxên wê civakê bê dîtin. Me jî di vê xebata xwe de xwest ku bê dîtin ku di çîrokên gelêrî de bi gelemperî kîjan nirxên civakî vehewandî de. Herwiha bi teybetî me xwest ku di çîrokên herêma Nisêbînê de kîjan nirxên civakî hatine der, bê tespîtkirin.

### *Çavkaniyên Sereke*

Ev xebate me ji du beşan pêk tê. Beşa yekem beşa teorîk ku bi giştî me cih daye agahiyên teorîk. Di vê beşê de bi giştî mijara çîrok û nirxan hatiye dayîn; lê belê ji bo ku çîrok keresteyeke folklorîk e, bi giştî me behsa folklorê jî kiriye. Ji bo agahiyên di derheqê çîrokan de me ji hin kitêb û tezan îstîfade kir. Ji ber ku di vê qadê de xebatên kurdî hene, me ji xebatên kurdî jî îstîfade kir. Ji bo agahiyên teorîk ên di derheqê nirxan de, ji bo ku di qada kurdî de tenê xebateke kurdî heye, me ji wê xebatê sûd wergirt û di qada tirkî de jî ji hin kitêb û gotaran îstîfade kir. Di beşa duyem de kurteya çîrokan hatine nivîsandin û li gorî pîvana nirxan a Schwartz di wan çîrokan de nirxên ku hatine tespîtkirin bi tabloyan hatine nîşandan. Lîsteya nasnameya kesên ku me çîrok ji wan wergirtin di nav lîsteya çavkaniyan de me rêz kirin û metnên tam ên wan deh çîrokên ku me berhevkirine jî me di pêvekê de diyarkirin, lêbelê ji bo mafê telîfê, metnên tam ên wan deh çîrokên din me tevî nekirin. Jixwe kurteya wan û referansa wan nivîsandîne.

Pirtûka Necat Keskin a bi navê *Zêrka Zêra* û pirtûka Aslîxan Yildirim a bi navê *Herdemciwanê* ji bo xebata me du çavkaniyên sereke ne ku me deh çîrokên herêma Nisêbînê ji wan pirtûkan wergirtiye. Herwiha berhemên sereke ev in ku me ji wan îstîfade kiriye;

- *Herdemciwanê*, Aslîxan Yildirim, weş. Azad, Stenbol, 2013.
- *Zêrka Zêra/Cureyên Edebiyata Gelêrî ji Dêrdora Mêrdînê*, Necat Keskin, weş. Avesta, Stenbol, 2019.

- “Kıbrıs Türk Masallarında Değerler”, Nevin Akkaya, Folkloredebiyat Dergisi, sayı:90, 2017/2.
- “Masalın Toplumsal İşlevi: Bir Göstergibilimsel Sembolik Analiz” , Elif Kanca, Doktora Tezi, Hacettepe Üniversitesi,2009.
- “Peydabûna Nirxên Civakî û Vekolîna Wan di Hin Romanên Kurmancî yên Folklorik de”, Enes Akıncı, Teza Lisansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, 2019.
- “Bikaranîna Çîrokên Kurdî di Perwerdehiya Zarokan de” İbrahim Tarduş, Teza lîsansa bilind, Zanîngeha Mardin Artuklu'yê, Enstituya Zimanên Zindî, 2015.

#### *Sînorên Tezê*

Ji bo ku pêşiya berbelavbûna mijaran bê girtin, her xebata zanistî divê bê sînorkirin. Herwiha ji bo ku mijar berbelav nebe, ji bo vê xebatê me jî çerçevoyek xêz kir. Ji bo berhevkarîya çîrokan tenê me berê xwe da herêma Nisêbîne. Çîrokên ku hatine berhevkirin ji wan kesan hatine berhevkirin ku ji Nisêbînê ne û li Nisêbînê dijîn. Ji gundê Binerdka (Yerköy) du çîrok, ji gundê Cibiltînê (Yolindi) yek, ji gundê Kelehê (Kalecik) du, ji gundê Bawernê (Bahçebaşı) yek, ji gundê Sirînç (Düzce) yek, ji gundê Qesrikê (Kasrik) yek, ji navenda Nisêbînê du çîrok hatine berhevkirin ku tevahiya hejmara wan deh heb in. Helbet armanca me ne ew bû ku ji tavahiya Nisêbînê çîrok bînin berhevkirin. Ji bo ku ji mijara me ya sereke re bibe nimûne, bi qasî ku me xwe gihande vebêjêran me tenê deh çîrok berhev kirin û wekî din deh çîrokên din ên ku beriya niha hatine berhevkirin me tevlî wan kir. Bi tevahî di nav van bîst çîrokan de jî me nirxên civakî tespît kirin.

Ji bo esesgirtina nirxên civakî me di xebata xwe de pîvana nirxan a Schwartz bi kar anî û li gorî vê pîvanê di çîrokên xwe de nirx tespît kirin û senifandin. Li gorî pîvana nirxan a Schwartz nirxên ku hatine tespît kirin me bi tabloyan nîşan da.

Dibe ku li her herêmê devoka ku tê bikaranîn ji hev cuda bin. Li herêma Nisêbînê jî devokeke xweser heye. Di vê xebatê de çîrokên ku me berhevkirin û nivîsandin, me hewl da ku weke herêmî binvîsin. Ji bo ku ev çîrok xweserbûna xwe wenda nekînin, heta ji destê me hat, çawa hatibe gotin me jî bi wê rengî nivîsand.

### *Zehmetiyên Tezê*

Di qada kurmancî de nebûna xebatên vê mijarê zehmetiya yekem bû ku di pêvajoya xebata me de her û her hate pêşiya me. Ji bo vê yekê me jî bi gelemperî berê xwe da berhemên tirkî. Helbet xebatên bi vî rengî di qada biyanî de jî hebûn, lê ji bo ku îngilîziya me têrî nekir, mixabin me ji wan berheman îstîfade nekir.

Ji bo ji xebata me re bibe nimûne di qada akedemiya kurmancî de qet behrem nebûn ku em jî çerçevoya xebata xwe xêz bikin. Lewma dibe ku di çerçevoya xebata me de jî hin kêmasî hebin, lê heta ji destê me hat me xwest ku armanca vê xebatê pêk bînin.

Zehmetiya din a vê xebata me xwe gihandine çîrokan bû. Weke ku me li jor jî diyar kiriye, di berhevkarîya çîrokan de bi gelemperî navenda me gund bûn. Dîtina vebêjeran û çûyina gundan, beşek ji zehmetiya xebata me bûn.

### *Rêbaz*

Di vê xebatê de me rêbaza dahûrîna naverokî bikaranîn ku di pêvajoya xebata me de bû rêbaza bingeîn. Ji bo tespîtîkirina nirxên civakî hewce bû ku hemû çîrok bînin xwendin û yeko yeko bînin dahûrîn û li gorî pîvana nirxan a Schwartz bînin tespîtîkirin û senifandin.

### *Xebatên ku bi Mijarê re Têkildar*

Di qada akedemiyê de xebatên di derheqê çîrok û nirxan de helbet têra xwe hene; lê em bêhtir di akedemiya tirkan de rastî van xebatan tên. Li gorî gotara bi navê “*Bîbliyografyaya Têzên Master û Doktorayê yên Bêşên Ziman û Edebiyata Kurdî û Ziman û Çanda Kurdî*”<sup>2</sup> ku cih daye xebatên akedemiya kurdiya bakur, em rastî xebatekê tenê dibin ku di derheqê pêwendîya çîrok û nirxan de ye. Dibe ku di qada akedemiya biyanî de jî ev mijar têra xwe hebin; lê weke ku me di beşa zehmetiyên tezê de nivîsandî, ji bo ku îngilîziya me têrî nekir, em negihijtî wan çavkaniyan. Çend çavkaniyên sereke yên bi mijara me re têkildar ev in;

---

<sup>2</sup> Z. Yıldırımçakar, S. Çakar, Ş. Güzel, “*Bîbliyografyaya Têzên Master û Doktorayê yên Bêşên Ziman û Edebiyata Kurdî û Ziman û Çanda Kurdî*”, 2021.

- “*Peydabûna Nirxên Civakî û Vekolîna Wan di Hin Romanên Kurmancî yê Folklorik de*”, Enes Akıncı, Teza Lisansa Bilind, Zanîgeha Bîngolê, 2019
- “*Masalın Toplumsal İşlevi: Bir Göstergibilimsel Sembolik Analiz*” , Elif Kanca, Doktora Tezi, Hacettepe Üniversitesi,2009
- “*Keloğlan Masallarında Yer Alan Değerlerin İncelenmesi*”, Nevin Akaya, Akademik Sosyal Araştırmalar Dergisi, Yıl: 2, Sayı: 2/1, Haziran 2014, s. 312-324
- “*Hasan Latif Sarıyüce'nin Anadolu masallarının eğitsel değerler açısından incelenmesi*”, Tuğçe Alabay Yolcu, Yüksek Lisans Tezi, Erzincan Binali Yıldırım Üniversitesi, 2019
- “*Fakir Bayburt'un Masalarında Değer Eğitimi ve Masalların Türkçe Eğitimine Katkısı*”, Bekir Sittik Kılıç Oğuzhan Yılmaz, Uluslararası Türkçe Edebiyat Kültür Eğitim Dergisi, Sayı: 7/2 2018 s. 1104-1125

#### *Bi Giştî Herêma Nisêbînê*

Nisêbîn navçeyê bajârê Mêrdînê ye ku li ser sînore Sûriye, li deşteke cîranê Qamişlo hatiye avakirin. Nisêbîn li bakurê Mezopotamyayê, di hewza di navbera Çemê Dicle û Çemê Fîratê de ye ku li ber sînore Sûriye ye û li ser rîya hevrişimê ye.<sup>3</sup>

Gelê navçeyê bi piranî debara xwe bi çandiniya genim, nîsk, nok, ceh û pembû dike. Hebûna rîya hevrişm jî ji bo gelê navçeyê hatineke aborî tîne. Hemû kamyonên ku dê derbasî Başûrê Kurdistanê û Iraqê bibin di Nisêbînê re derbas dibin û ev yek jî bo gelê bajêr hatineke aborî ye. Navçeya Nisêbînê di dîrokê de bi sed salan serbixwe maye û ji aliyê mîrên kurdan ve hatiye parastin. Lewma Nisêbîn xwedî dîrokeke dûdirêj e ku ji gelek hêlan ve xwedî cihekî girîng e. Ephrem Isa Yousif di nivîsa xwe ya bi navê “Di Waqînameya Metropolit Elyasê Nisêbînî de Mîrekiya Merwanîyan” de ku Mustafa Aslan wergerandiye, jî bo Nisêbînê wiha dibêje;

“Di serê sedsala 11an de bajârê Nisêbînê digel malên xweyî qeşeng, mizgefta xwe, serşokên xwe û bexçeyên xweyî şênber, cihekî kêfxweşiyê bû.”<sup>4</sup>

<sup>3</sup> <https://tr.wikipedia.org/wiki/Nusaybin>, 8ê Berfanbara 2022an.

Nisêbîn şahidê dîrokeke kevnar e. Gelek şêx, siltan û serleşkerên navdar tê re derbas bûne û şopên xwe lê hiştine. Nimûneyek ji dîroka Nisêbînê ya kevnar Girnewas e. Di encama kolanên demdirêj de arkeologan li Girnewas, xwe gihandine bermayiyên dîroka berî zayînê bi heft hezar salan. Di roja me de jî gelek nexweş ji bo saxbûnê xwe davêjin ber dergeha Girnewas û paçên xwe yên rengo rengo li dara serê gir girê didin. Yê ku paçekî bi darê ve girê bide dikare paçekî jî jê veke û li destê xwe girê bide da ku xwe ji qeda û belayê biparêze. Gelek gerrokên navdar û alimên mezin bûne mêvanên Nisêbînê û di nivîsên xwe de pesnê bajêr û bereketa deşta Mêrdînê dane. Yek ji van aliman Ibn Cubeyr e ku di sala 1148 an de çûye serdana Nisêbînê û piştê di geştnameya xwe de ev gotinên jêrîn li ser Nisêbînê nivîsîne: “Bajar ji derve ve ciwan, ji hundir ve kevnar e, xwediyê dîmenekî bedew e. Hêja ye ku mirov bibêje paşî û pêşiya bajêr bi keskayîyeke zumrutî û gul û kulîlkan xemiliye. Bax û bostan û fêkî lê pir e, cihekî xweş e ji bo kêf û seyranê”.<sup>5</sup>

Li rojavayê Nisêbînê navenda Mêrdînê, li bakur-rojavayê wê navçeya Omerliyê, li bakurê wê navçeya Mîdyadê, li aliyê rojhilat parêzgeha Şirnexê û li başûrê wê jî bi Sûrî ve hatiye dorpeçkirin.<sup>6</sup> Bajarên ku nêzî hev in bi demê re danûsitandinên bi her awayî jî dikin; çî koçbûn, çî danûsitandinên aborî, çî yên çandî. Lewma herçiqasî xwedî çandê xweser jî be, tesîra hevîrdor a li ser bajarbûna wê û çanda wê pêkan e. Li Nisêbînê zimanê gel bi giştî kurdiya kurmancî ye, lê ji bo nêzîkbûna wê ya li bajarên Mîdyadê û Şirnexê, aliyek wê herêma torê ye û aliyê din jî herêma botan e. Lewma tesîra van herêman jî li ser devoka Nisêbîniyan peyda bûye.

---

<sup>4</sup> Ephrem Isa, “Di Waqînameya Metropolît Elyasê Nisêbînî De Mîrektîya Merwanîyan”, wer. Mustafa Aslan, *The Journal of Mesopotamian Studies*, h. 4/1, 2019, r. 176.

<sup>5</sup> <https://ku.wikipedia.org/wiki/Nis%C3%AAb%C3%AEn>, 8ê Berfanbara 2022an.

<sup>6</sup> Taner Kılıç, “Nusaybin’in Fiziki Coğrafya Özellikleri”, *D.Ü.Ziya Gökalp Eğitim Fakültesi Dergisi*, Sayı. 10, 2008, s. 107.

# 1. BI GIŞTÎ FOLKLOR, ÇÎROK Û NIRX

## 1.1. Folklor û Çîrok

### 1.1.1. Folklor

Ji bo têgeha folklorê gelek lêkolînêran xebatên xwe kirine û li ser tesnîfkirina wê fikrên xwe vegotine. Lewma ji bo têgeha folklorê pênaseyên curbicur hene, lê herwiha em dikarin bibînin ku xalên hevpar ên van pênaseyan jî pêkan in.

Wek ku Necat Keskin amaje pê dike, folklor herçiqasî di serê pêşî de bo binavkirina keresteyên gelêrî hatibe bikaranîn jî, bi demê re ji ber pesendkirin, bikaranîn û zêdebûna xebatên derbarê keresteyan ev têgeh kirin navê disiplînê bixwe.<sup>7</sup>

Ji bo pênasekirina têgaha folklorê ne tenê folklornîstên ji welatên cuda, lê herwiha folklorîstên ji heman welatî jî fikrên ji hev cuda îfade kirine. Di berga yekem a *Standard Dictionary of Folklore, Mythology and Legend* de hebûna bîst û yek pênaseyên kurt ên di derheqê folklorê de<sup>8</sup> vê yekê nîşan dide.

Folklor ji du peyvên zimanên skandinavî, “folk” (gel) û “lore” (zanîn), pêk tê û wateya wê ya ferhengî jî “zanîna gel” e. Ev ‘zanîna gel’ jî li ser tecrûbeyekê ava dibe ku di dirêjahiya sedan û hezaran salan de pêk hatiye.<sup>9</sup>

Bi kurdî bêjeya folklorê tê wateya zanista gelêrî an jî lêkolîna li ser gel. Di zaravayên kurdî de ji bo zanista folklorê bi kurmancî “zargotin” û “zanista gel”, bi soranî “xelknasî” û bi zazakî “zanistiya şarî” tê gotin.<sup>10</sup>

Li gorî Doğan Kaya jî folkler ew zanist e ku çanda gel berhev dike, lêdikole û digihîne sentezekê.<sup>11</sup> Di demên ku di wateya îroyin de zanistî pêş neketibû, yanî zanyariyên pozîtîf derneketibûn; mirovên pêşîn raman û baweriyên xwe, tesewirên

<sup>7</sup> Necat Keskin, *Folklor û Edebiyata Gelêrî*, weş. Avesta, Stembol, 2019, r.13.

<sup>8</sup> Alan Dundes, *What is Folklore?*, çev. Gülay Mirzaoglu, Milli Folklor, 2005, s.74.

<sup>9</sup> Keskin, *hb*, 2019, r. 23.

<sup>10</sup> K. Yıldırım, R. Perteve, M. Aslan, *Ji Destpekê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul, 2013, s. 11.

<sup>11</sup> Doğan Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Akçağ yayınları, Ankara, 2007, s. 327.

xwe yên der bareyê paşeroj û pêşeroja dinyayê de, li dû şertên çandî-bawerî yên wê demê bi rêya hin formên vegotinê dianîn ziman. Em îro ji wan formên vegotinê re, ku di encama afirîneriya hevpar a civakê de derketine; mîtos, efsane, destan, çîrok, çîrokên gelêrî, pêkenok, tiştanok, stran, gotinên pêşiyar, mersiye, lorîn û hwd. dibêjin. Folklor jî, ji wê zanyariyê re tê gotin ku; van hemî cureyan li gorî prensîbên zanyariyê tesnîf dike û li ser wan tehlîlan dike.<sup>12</sup>

Erman Artun jî folklorê wiha pênase dike: “Ji zayinê heta mirinê hemû hêmanên çanda maddî manewî yên di jiyana mirovan de, bi rengê zanistî berheve dike, li ser wan lêkolînan dike, wan dinirxîne û bi şiklekî sistematîk wan şîrove dike û bi vî şeklî serencama pêşketina çanda gel nîşan dide û di navbera çandên din de cudahî û hevpariyar dibîne.”<sup>13</sup>

Herwiha cara yekem antîkevan û lêkolînerê Brîtanî William John Thoms di sala 1846an de peyva “folk-lore” bi kar aniyê. Lê divê bê zanîn ku tiştek ji ber xwe ve dernakeve û naye binavkirin; berî wê pêvajoyek heye, xebat hene ku di dawî de digihîjin asteke “binavkirin”ê.<sup>14</sup>

Weke ku li jor hatiye nivîsandin, ji bo pênasekirina folklorê fikrên curbicur hene û herwiha em dizanin ku hêj gelek lêkolînerên din di vî warî de xebatên xwe kirine. Ji xeynî tesnîfkirina folklorê, folklor hem bi dîrokçeya xwe hem bi teoriyên xwe mijareke serbixwe ye ku têra xwe berfireh e.

Çawa ku di pênaseya folklorê de fikrên curbicur hene, di derbareyê naveroka folklorê de jî hin dîtinên cuda hene. Herwiha mirov nikare her gav sînoren folklorê bi awayekî zelal diyar bike. Li gorî Alan Dundes ku di vî warî de gelek xebat kirine, naveroka folklorê ji van mijaran pêk tê;<sup>15</sup>

---

<sup>12</sup> Izeddîn Mistefa Resûl, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Weşanxaneya Aras, ç.3, Hewlêr, 2010, r. 11. Jêgirtin: Hikmettin Attî, *Lêkolîneke Folklorî li Ser Destana Mem û Zînê*, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Mêrdîn, 2013, r.3.

<sup>13</sup> Erman Artun, *Türk Halkbilimi*, Kitabevi yayınları, İstanbul, 2010, s. 16.

<sup>14</sup> Keskin, *hb*, 2019, r. 25.

<sup>15</sup> Alan Dundes, “Folklor Nedir?” (Folklor Çi Ye?), wer. Gulay Mîrzaoğlu, Millî Folklor Dergisi (Kovara Folklorê Neteweyî), Zivistan-1997, r. 74. jêgirtin: K. Yıldırım, R. Pertev, M. Aslan, *Ji Destpekê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul, 2013, s. 31.

“Mît, Efsane, Çîrok, Gotinên pêşyan, Mamik, Çîvanok, Stran, Sêhr, Dia, Nifir, Dijûn, Heqaret, Silav, Xatirxwestin, Hunerên gelêrî, Cil û berg, Xwarin û vexwarin, Lîstik, Şanoya gelêrî, Bijîşkiya gelêrî, Leqeb Nivîsên mezelan, Bîr û bawerî. ”

Di naveroka folklorê de mijarên ku lê bîn zêdekirin, helbet dibe ku hebin. Û herwiha ev mijar bixwe jî bi serê xwe mijarên berfireh in; lê ji bo ku bingêha çerçevoya teza me bêhtir li ser çîrokan e, em ê jî bêhtir cih bidin vê binbeşê.

### 1.1.2. Çîrok

Çîrok yek ji hunera mirovatîyê ye ku di nav hezaran sal de hatiye vegotin û nifş bi nifş hatiye veguhastin. Di nav her civakê de û her wextî vebêjerên ku xeyalên xwe û yên civakê bi şeweyêkê bi civaka xwe re parve kirine derketine û ji zarokên xwe re ev xeyalên xwe û hestên civakê wek çîrokan gotine.<sup>16</sup>

Ji biçûkan heta bi mezinan peyva çîrokê li ser ziman e û peyva çîrokê bixwe jî ne xerîbê civakê ye. Herwiha çîrok ji wan mijarên folklorîk e ku gelek caran bûye mijara lêkolînên zanistî û hê jî xebatên ku li ser tîrîkirin berdewam in. Lewma jî dema ku pênaseya çîrokê bê pirsîn mirov dikare gelek pênaseyan ji gelek lêkolîneran destnîşan bike. Her çiqasî gorî lêkolîneran pênaseya çîrokê cuda bin jî, helbet xalên wan ên hevpar jî zêde ne. Ji van pênaseyên cuda çend mînak bi vî şiklî ne:

Di kurmancî de ji bo vî cureya vegotinê, navên wekî *çîrok*, *çîrvanok*, *çîrçîrok*, *kurteçîrok*, *xeberoşk*, *xemîşok*, *mesel*, *meselok*, *metelok*, *serborî*, *serpêhatî*, *serhatî*, *hikâye*, *hikyat* û hwd. tîrîkirin. Her wiha di kirmanckî/ dimilkî de estaneke an sanike, di soranî de çîrok an heqayet tîrîkirin. Ev yek ji aliyekî ve dikare wek dewlemendiya kurdî jî bê dîtin û ji aliyê din ve di çarçoveya têgehên de jihevdukbûna zaravayên kurdî jî dide xuyakirin.<sup>17</sup>

William R. Baskom çîrokê weha pênase dike;

“Çîrok, vegotinên pexşanî ne ku çêkirî tîrîkirin. Wek dîrok an jî dogmayê [ fikir an jî ramaneke ku bîrîqasî tê qebûlkirin] nayên qebûlkirin, dibe ku bûbin an jî

---

<sup>16</sup> Keskin, *hb*, 2019, r.204.

<sup>17</sup> Keskin, *hb*, 2019, r.204.

nebûbin û ne ewên ku bicidîyet bèn nîrxandin.(...) Çîrok, dibe ku di cih û demeke nediyar de hatibin honandin û di vê wateyê de, bê cih û bê dem in.”<sup>18</sup>

Ramazan Pertev di pirtûka xwe ya bi navê *Zarok û Çîrok*’ê de ji bo pênaseya çîrokê wiha dibêje; “Çîrok cureyek ji vegotinên gelêri ne ku tê de cih didin serborî û lehengên derasayî û mîjara wan xeyalî û bi devkî belavbûyî ne.”<sup>19</sup> Weke ku tê fêhmîkirin çîrok bi devkî belav bûne û vebêjerên wan ne diyar in. Ango piştî demekê ji aîdiyeteke şexsî derdikeve û dibe malê civakê.

Li gor Muhsine Helimoğlu Yavuz jî ev vegotinên xeyalî ku bi gelemperî aferînerê wan nediyar in, têra xwe bi zimanekî sade pêk tînin û xwerûbûna vegotinên devkî nîşanî me dide.<sup>20</sup> Li gorî P. Naili Boratav jî çîrok ew vegotinên kurt in ku bêyî hewldanake ku jê bèn bawerkirin bi pexşankî hatine gotin, ji baweriyên olî dûr, derasayî û bi temamî xeyalî ne.<sup>21</sup>

Ali Fuat Bilkan jî çîrokê wiha pênase dike; “Çîrok ew cureyê berhemên vegotinê ye ku bi rastiyê re bê eleqe ye, tevahî xeyalî ye, ew îddaya wê tune ku kes jê bawer bikin.”<sup>22</sup> Saim Sakaoglu di pirtûka xwe ya bi navê *Masal Araştırmaları* de diyar dike ku çîrok her çiqas berhemên xeyalî bin jî dikarin guhdaran bi xwe bidin bawerkirin.<sup>23</sup>

Di kurmançî de ji bo vî cureya vegotine, navên wekî çîrok, çîrvanok, çîrçîrok, kurteçîrok, xeberoşk, xemîşok, mesel, meselok, metelok, serborî, serpehatî, serhatî, hikaye, hikyat û hwd. tînin bikaranîn. Her wiha di kirmanckî/dimilkî de estaneke an sanike, di soranî de çîrok an heqayet tînin bikaranîn.<sup>24</sup>

---

<sup>18</sup> William R. Baskom, *The Forms of Folklore: Prose Narratives*, *The Journal of American Folklore*, C. 78, Hj. 307 (Jan. – Mar., 1965), pp. 3-20. <http://www.jstor.org/stable/538099> (22.03.2018).  
jêgirtin: Necat Keskin, *Folklor û Edebiyata Gelêri*, weş. Avesta, Stembol, 2019, r.206.

<sup>19</sup> Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok*, weş. Doz, İstanbul, 2009, r. 87.

<sup>20</sup> M. Helimoğlu Yavuz, *Masallar ve Eğitimsel İşlevleri Mesaj-İndeks*, Kültür Bakanlığı Yayınları, 2009, s.27.

<sup>21</sup> P. Naili Boratav, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, Gerçek Yayınları, İstanbul, 1992, s. 75.

<sup>22</sup> Ali Fuat Bilkan, *Masal Estetiği*, Timaş Yayınları, İstanbul, 2009, s. 15.

<sup>23</sup> Saim Sakaoglu, *Masal Araştırmaları*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2010, s. 2.

<sup>24</sup> Necat Keskin, *hb*, 2019, r.205.

Weke ku em dibînin her çiqasî lêkolîneran li gorî xwe pênaseyên xwe kiribin jî xalên hevpar zêde ne. Derasayî, xeyalî, devkî û gelêrî ji wan têgehên hevpar in ku pişporan ji bo pênaseya çîrokê diyar kirine.

Çîrok xwedî formeke taybet e. Di çîrokan de têgeha cî û demê nîne.<sup>25</sup> Dem heye an tune ye, yek heye yek tune ye, zamanên pir pir kevin e, carek ji caran e; cî, welatek û warekî bênav e, pişta çiyayê qaf e, ciyekî pir dûr e. Lehengên çîrokan li gorî cî û demê diyartir bin jî disa rasterast ne diyar in. Cîn, hût, perî, padîşah, mîr, wezîr, kurê biçûk, keça biçûk û ajelên ku liv û tevgerên mirovan dinimînin lehengên çîrokan in.<sup>26</sup>

Weke ku ji van pênaseyan jî diyar dibe ku çîrok mehsulên devkî ne û bi vî awayî gihiştine heta roja me. Di van çîrokan de nîrxên civakê jî vehewandî ne. Bi saya vê yekê berdewamiya çanda civakê jî pêkan dibe. Lewra her civak li gor çanda xwe, li gor nîrxên civaka xwe rengê xwe dide çîroka xwe.

Li gorî van pênaseyên çîrokê yên cuda bi kurtasî em dikarin bibêjin ku ew vegotinên devkî yên derasayî û xeyalî ne. Tehmekê dide guhdarvanan û her çiqasî bûyerên ne rasteqîn bin jî rengê civakê di xwe de dihevine. Herwiha van bûyerên derasayî bi şiklekî hîndekariyê vedibêje. Di dawiyê de guhdarvan dikare tişteki jê hîn bibe. Ango di xwe de peyamên nîrxên civakê dihevine.

### 1.1.2.1. Cureyên çîrokan

Çîrok bi gelemperî li ser lihevketina qenc û neqencan radiwestin, ji bo bîdestxistina nîrxên bingeşîn roleke sereke digirin. Ji bilî vê armanca çîrokê, zarok bi rêya çîrokan demeke xweş jî derbas dikin. Lêbelê armanc û taybetmendiyên çîrokan li gor lêkolîneran cuda cuda hatine dîtin.<sup>27</sup> Ji ber ku teybetmendiyên çîrokan li gor naveroka xwe ji hev cuda ne hin lêkolîneran jî li gor teybetmendiyên wan ew senifandine. Propp derheqê vê mijarê de wiha dibêje; “Ji ber ku çîrok cur bi cur in û

<sup>25</sup> Bilkan, *Masal Estetiği*, s. 60.

<sup>26</sup> İbrahim Tarduş, *Bikaranîna Çîrokên Kurdî di Perwerdehiya Zarokan de*, Teza lîsansa bilind, Zanîngeha Mardin Artuklu'yê, Enstituya Zimanên Zindî, 2015, r.4.

<sup>27</sup> R. Rojdar Yildiz, *Di Edebiyata Zarokan de Çîrok*, weş. Sîtav, Van, 2019, r. 58.

em nikarin hemûyan vekolin; divê ew bên dabeşkirin an bi gotineke din bên polînkirin. Polînkirineke rast ji gavên yekem ê şayesandina zanistî ye.’’<sup>28</sup>

Di cîhanê de senifandina çîrokan cara yekem ji aliyê lêkolînerê Fînî Anti Aarna di sala 1910an de hatiye kirin. Xebata li ser senifandina çîrokan a duyem jî ji aliyê Stith Thompson ve di sala 1928an de hatiye kirin.<sup>29</sup> Necat Keskin jî di pirtûka xwe ya bi navê Folklor û Edebiyata Gelêrî de cureyên çîrokan bi giştî bi vî awayî senifandiye û pênase kiriye,<sup>30</sup>

- Çîrokên ajalan: Wek ku ji sernav jî diyar dibe di van çîrokan de lehengê sereke ajal in. Fabl jî dikevin nav vécuryê de. Lehengê van çîrokan wek mirovan tevdiagerin, diaxivin, difikirin, radibin û rûdinin. Dikare bê gotin ku di van çîrokan de bi piranî dersdayîn û şîret hene. La Fontaine, Çîrokên Aisopos (ezop)ên herî navdar in. Di nav kurdan de jî di vî warî de gelek çîrok dikarin bîn dîtin. Rovi, hirç, şêr, mar, mirîşk, dîk hinek ajal in ku di van çîrokan de behtir tên dîtin.
- Çîrokên sêhrê: Di van çîrokan de motifê sereke ku derdikeve pêş sêhr e. Jin, mêr an jî kesên dinên sêhrdar, derasayiyên sêhrî wek leheng di van çîrokan de derdikevin pêş. Polînkirina Aarne û Thompson de ev tîp tune ye. Tevî yên olî û rasteqîn di nav tîpa çîrokên gelêrî yên eslî de hatiye bicihkirin.
- Çîrokên olî: Ev tîp jî di nav polînkirina Aarne- Thompson de di bin navê çîrokên gelêrî yên eslî de hatiye bicihkirin. Bêhtir mijarên olî di van vegotinan de cih digirin.
- Çîrokên rasteqîn: Ev cureyên çîrokan wek çîrokên gelêrî yên eslî jî tên binavkirin. Lehengên van çîrokan bêhtir mirovên wekî padîşah, wezîr, gundî, axa, gavan û hwd. in. Çîrokên Mîrza Mihemed, nav vê tîpê de bîn nixandî.
- Çîrokên dêwên bêaqil: Ev çîrok, wek ku ji nav jî tê derxistin, li ser heyînen derasayî hatine sazîkirin. Çîrokên kurdî ku di nav wan de heyînen wek hûtê heftserî derbas dibin dikarin di nav vê tîpê de bîn nixandî.
- Henek û anekdot [pêkenok]: Ev tîp dikare wek çîrokên pêkenokî jî bê binavkirin. Di van çîrokan de henek û tinaz li pêş in û armanc ew e ku guhdar an xwendevan bikene, dilxweş bibe û pend û şîretan jê werbigire. Herwiha ev cure çîrok gelek caran pê li qanûn û qayîdeyên civakî jî dikin û bi awayekî hostayî mekanizmaya sansûrê kêr dikin. Yanî tiştên ku ne mimkun be ku bi rêya tabîî bîn gotin bi saya rêbaza pêkenokî tên zimên. Mele Meşhûr, Xoce Nesredîn, Behlûl hinek karakterên pêkenok ên kurdî ne.
- Çîrokên formuleyî (zinciriyî): Di van çîrokan de tiştê sereke ku tê xuyakirin bihevgerîdana di nav rêzekê de ye. Rûdan bi hejmaran, bi gotinan, bi bûyeran bi hev ve girêdayîne û li ser rêzekê an jî fetlekê bûyer pêk tên, bi gotineke din ev çîrok bêhtir li serzincirê hatine sazîkirin. 3. Dav di bes di ol di ol bi piranî Li gorî Pertev Nail Boratav, lehengên van çîrokan bi piranî ajal in. Taybetmendiya ku wan ji çîrokên ajalan cuda dike ev e ku i van çîrokan de riste yanî sazîkirina wan cuda ye. Wekî din armanca van çîrokan ji dersdayîne bêhtir şadîkirina zarokan e. Ev şadîkirin bi rêya gotinên şaşmîtiî tê avakirin, risteya wan hinekî wan şaş dike û di heman demê de wan kêfxweş hendeke. Rudan b rûdanê derbas Risteya van çîrokan ji rûdanên gelekî piçûk, ne girîng pêk tê. Ev rûdan bi mantiqekî di nav hev de rêz dibin, û li gora vê rêzîkirinê çîrok dirêj dibe. Rûdan di dûv hev re tên, çalakî zû dimeşe û ji gavakê pê de ev rûdan bi heman rêzê, di çarçova

<sup>28</sup> Valadimir Propp, *Masalin Biçimbilimi*, wer. Mehmet Rifat, Sema Rifat, ç. 2, İş Bankası Kültür Yayınları, 2011, İstanbul, r. 8.

<sup>29</sup> Yıldız, *hb*, 2019, r. 58.

<sup>30</sup> Keskin, *hb*, 2019, s.218.

heman mantiqî de li xwe vedigerin û tèn serê çîrokê. Di nav çîrokên kurdî de wek mînak çîroka rovi û pîrê dikare bê dayîn.

### 1.1.2.2. Di kurdî de çîrok

Her wekî milletên din milletê Kurdan jî xwedî folkloreke ne. Helbet beriya heyama nivîskî di nav civakê de vegotin li pêş bû. Bi saya van vegotinan çand, bawerî û nirxên civakî xwe gihandine heta roja me. Çîrok jî yek ji wan hêmanên folkorê ye ku bi devkî derketiye holê. Lê ji bo ku ev hêmanên folklorê xwe ji wendabûnê xelas bikin, hewce ye ku bên nivîsin û xwe ji mirinê bifilitênin.

Di Kurdî de her çiqas bi derengî dest pê kiribe jî xebatên li ser berhevkarîya hêmanên folklorê di nav berhemana de cihê xwe girtine. Gava li çîrokên kurmancî yên nivîskî bê nêrin dikare bê gotin ku yekem car Mela Mûsayê Hekarî di sedsala XVII. de zêdetirî 50 çîrokên kurdî berhev kirine û bi navê “*Duru’l-Mecalîs*”ê nivîsîne.<sup>31</sup> Piştî Mela Mûsayê Hekarî, Mela Mehmûdê Bazîdî çîrokên kurmancî derbasî nivîsê kiriye lê qesta me ji vê gotînê ne ew e ku hemû hikayetên Mela Mehmûdê Bazîdî nivîsine çîrok in. Rastiya xwe de ev mijar mijareke bi nîqaş e. Gelo ev çîrok, çîrokên gelêrî (masal) an çîrokên modern (hikaye) in.<sup>32</sup> Ziya Avcî ku pirtûka *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî* ya Mela Mehmûdê Bazîdî transkribe kiriye û çap kiriye, di pêşgotina pirtûkê de behsa vê mijarê dike. Avcî di wê baweriyê de ye ku divê ev deq ne wekî çîrokan wekî hikayetan bên nirxandin.<sup>33</sup>

Ji bo berhevkirina çîrokan ne tenê Kurdan, herwiha lêkolînerên biyanî jî hatine Kurdistanê û mahsûlên Kurdî berhev kirine. Albert Socin û Eugen jî ji wan lêkolînerên biyanî ne ku piştî Mela Mehmûdê Bazîdî di sala 1890 î de çîrokên herêma Turabdîn û Botanê bi navê *Kurdische Sammlungen* li Petersburgê çap kirine.<sup>34</sup>

Piştî vê geşadanê di kovarên weke Rojî Kurd û Hawarê de jî çîrokên berhevkirî hatine çapkirin. Piştî qonaxa Hawarê jî çîrokên gelêrî di kovarên wek *Tîrêj*, *Hevî*,

---

<sup>31</sup> Ramazan Pertev, (Danasîn û Rewşa Giştî ya Xebatên li ser Folklor û Edebiyata Kurdî ya Gelêrî) *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, weş. Avesta, İstanbul, 2015, r. 17.

<sup>32</sup> Tarduş, *ht*, r.15.

<sup>33</sup> Mela Mehmûdê Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, amd. Ziya Avcî, weş. Lîs, Diyarbekir, 2010, r. 8

<sup>34</sup> [https://archive.org/details/bub\\_gb\\_KUg-AQAIAAJ/v2, 10/06/2015](https://archive.org/details/bub_gb_KUg-AQAIAAJ/v2, 10/06/2015), jêgirtin: Tarduş, *ht*, 2015, r.16.

*Xwençe, Rewşen û Nûbiharê* de ji xwe re cî girtine. Ji van kovaran *Xwençe* rasterast li ser folklorê kurdî ye. Di *Xwençeyê* ye 40 fabl, 262 çîrokên têkel û 68 çîrokên dirêj hatine weşandin. Îro bi zêdebûna weşangeriya kurdî û fêmkirina giringiya çîrokan û perwerdeya zarokan êdî gelek weşanxane pirtûkên çîrokan çap dikin.<sup>35</sup> Helbet xebatên folklorîk ji van ên ku hatine nivisîn zêdetir in, lê bi kurtasî çarçevoya geşadana çîroka Kurdî bi vî şiklê dikare bê xêzkirin.

## 1.2. Têgeha Nirxê

Gelek lêkolîneran pênaseya têgeha nirxê kirine û pênaseyên ku hatine kirin ji hev cuda ne. Helbet xalên wan ên hevpar jî hene; lê bi gelemperî li gor xwe şîrove kirine.

Têgeha nirxê di Latînî de ji peyva *valere* welidiye û bi wateya bihêzbûn û biqedrbûnê hatiye bi kar anîn.<sup>36</sup> Herwiha dikare bê gotin ku komeke civakî yan jî civakek ji bo ku hebûna xwe berdewam bike, ew regezên exlaqî û bawerî tên afirandin ku ji hêla endamên wê civakê ve hatine pejirandin.<sup>37</sup> Ango ji bo ku civakek hebûna xwe bidomîne, endamên wê civakê regezên exlaqî û baweriyên xwe diyar dikin û bi gelemperî wan regezan dipejirînin. Endamên civakê ger derveyî van regezan tevbigerin, ev tevgera wan di nav civakê de weke şermê yan jî gunehê tê binavkirin.

Li gor pênaseyeke din jî nirxê pergaleke girîng e ku wateyan li hêmanên sosyokulturiya civakekê bar dike.<sup>38</sup> Ji ber vê yekê jî weke prensîbên tevgeran tê dîtin ku endamên civakê bi pêwendiyê xurt bi hev ve girê dide.<sup>39</sup>

Ger bi kurtasî têgaha nirxê bê zelalkirin, dikare bê gotin ku ew rêgaz in ku ji hêla civakê ve hatine pejirandin û li ser tevgerên mirovan xwedî tesîr in. Di jîyanê û

<sup>35</sup> Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan, *hb*, r. 91.

<sup>36</sup> Takiyettin Mengüşoğlu, *Felsefeye Giriş*, Remzi kitapevi, Ankara, 1983, s. 204.

<sup>37</sup> S. Kızılcıllı-E. Yaşar, *Açıklamalı Sosyoloji Terimler Sözlüğü*, Atilla Kitapevi, Ankara, 1994, s. 99.

<sup>38</sup> Ertan Özsesenler, "Sosyolojik Bir Olgu Olarak Değer", *Değerler Eğitimi Dergisi*, 1(3):217-239, 2003.

<sup>39</sup> G. Theodorson-A. Theodorson, *A Modern Dictionary of Sociology*, Newyork, Barnes and Noble, 1979.

di her civakekê de nirxên girîng ên curbicur hene. Dilrehmî, dirûstbûn, xêrxwazî, rastgoyî û hwd. ji wan nirxên civakê ne ku ji hêla civakan ve hatine pejirandin.

Nirx ne tiştêkî şenber e ku ji derve bê dîtîn; lêbelê mimkin e ku mirov nirxan bi tevgerên mirovan fêhm bike. Lewra nirx li ser tevgerên mirovan tesîrdar in. Her mirovê ku endamê civakekê ye tevgerên wan jî li gor nirxên wê civakê reng vedide. Herwiha nirxên civakekê ji bo mirovan alîkariyê dike ku di bûyerekê de an jî di rewşekê de mirov çawa tevbigerin. Ango rêbera tevgerên endamên civakê ye.

Helbet qewînbûna nirxan a di civakê de pêvajoyeke dûdirêj e. Nirx ji nişke ve dernayên; bi demê re û bi pejirandine re mayînde dibin. Ev jî bi baweriyên civakê re eleqedar e. Ji ber ku nirxên civakê li gor baweriyên wan rengê xwe hildibijêrin. Lewma baweriyên wan çiqasî qewîn bin, nirxên wan jî bi wî awayî qewîn û xurt dibin.

Nirxên civakê di nav endamên civakê de pergal û ahengekê saz dike û ev jî dike ku aloziyên di nav civakê de kêm bike. Lewma civak dixwaze ku van nirxan bi awayekî bigihîne kesan an jî nifşên nû. Ji bo ragihandina van nirxan herçiqas rê û rêbaz hebîn jî, edebiyat jî yek ji wan rêbazan e. Bi rêya edebiyatê xwestine ku van nirxan bigihînin nifşên nû. Çîrok jî yek ji wan cureyên edebiyatê ye ku nirxên civakî tê de vehiwandî ne û bi helwesta ragihandinê ne.

### **1.2.1. Senifandina nirxan**

Di nav wan xebatan de yên ku li ser nirxan hatine kirin, tê dîtîn ku nirx hatine senifandin. Li gorî yek ji wan xebatan nirx bi vî awayî tên senifandin;

- Nirxên Estetîk
- Nirxên Teorîk
- Nirxên Politîk
- Nirxên Îqtîsadî
- Nirxên Civakî
- Nirxên Dînî
- Nirxên Exlaqî

Li gorî vê senifandinê daxwaza cîhaneke xweş û xweşik, hebûna her tiştê bi aheng û bi pîvan nirxên estetîkî pênase dike. Xelasiya ji nezanîbûne û zanîna her tiştî

nirxên teorîk, jiyaneke bi refah û serxwebûna aborî jî dikeve qada nirxên îqtîsadî. Têkoşîna ji bo azadî û wekhevîyê jî nirxên polîtîk in. Dostaniyeke jidil û piştevaniya ji bo mirovan nirxên civakî, tevgerên ji bo axîrete û hewldana bêgunehiyê nirxên dînî, xwedî wijdanbûn û dirûstbûn jî di qada nirxên exlaqî de ne.<sup>40</sup>

Ji van cureyên nirxan hemû jî kêr zêde di civakê de û di jiyana mirovan de peyda dibin. Her kes li gor xwe û baweriyên xwe têkiliyê bi van nirxan re girê dide. Helbet ev yek tesîre li tevger û kesayeta wan jî dike.

Refshauge cih daye nirxên bingeh. Li gorî Refshauge nirxên bingeh ev in: <sup>41</sup>

**Dirustî:** Bi awayekî hevgerî dirist û ewlendamûn.

**Tekûzî:** Tekoşîna ji bo serkeftina herî bilind ya takekesî ya di her qada jiyana civakî û takekesî û jiyana dibistanê de.

**Hurmet:** Ji bo xwe û kesên din rêzgirtin û qebûlkirina fikir û nêrînên cihê yê kesên din.

**Berpirsiyarî:** Ji bo tevgerên xwe yê civakî û şexsî, li hember xwe, li hember kesên din û hawîrdorê berpirsiyarîbûn.

**Tevlîbûn:** Ji bo kamiranîya civakî û aborî ya netewe û civakê, endambûna komeke çalak û hilberdar.

**Hevkarî:** Di gihîştina armancên hevpar de, xebata di nav hevkarîyê de.

**Girîngîpêdan:** Bi empatî û tevgerên merhemetî fikirîna kamiranîya xwe û ya kesên din.

**Bêalî:** Li hember bêedaletîyê, pêşdarazîyê û nejidilbûyîne derketin û sadiqbûna hêmanên edaleta civakî.

**Demokrasî:** Qebûlkirin û bilindkirina berpirsiyarî, maf û azadîya hemwelatîya Awistralyayê.

Xebatên derbarê nirx û perwerdehîya nirxan a welatekî bandorê li pergala wê ya perwerdehîyê jî dike. Di van salên dawî de li Tirkîyê û li gelek welatan li ser nirxan û perwerdehîya wan gelekî tê sekinîn. Wezareta Perwerdehîyê ya Tirkîyê di sala 2018an de bernameya xwe ya hîndekarîyê nû kir. Di vê bernameya nû ya hîndekarîyê de perwerdehîya nirxan jî cih girtiye û serenaveke taybet ji bo vê beşê hatiye veqetandin. Ji bo her merheleya polan ên dibistanan nirxên hevpar hatine dîyarîkirin. Navê van nirxên hevpar jî wek “nirxên bingeh” hatiye pênasîkirin. Nirxên

<sup>40</sup> Erol Güngör, *Değerler Psikolojisi Üzerinde Araştırmalar*, İstanbul: Ötüken Yayınları, 2000, s. 84.

<sup>41</sup> Ulusoy&Dilmaç, *Değerler Eğitimi*, Ankara, Pegem Akademi Yayınları, 2012 s. 28. jêgirtin: Enes Akıncı, *Peydabûna Nirxên Civakî û Vekolîna Wan di Hin Romanên Kurmancî yê Folklorik de*, Teza Lisansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, 2019, r.18.

bingeh ên di bernameya nû ya hîndekarîyê de derbas dibin ev in: “Edalet, dostanî, diristî, xwekontrol, sebir, hurmet, hezkirin, berpirsiyarî, wetenperwerî, xêrxwazî.”<sup>42</sup>

### 1.2.2. Nirxên civakî

Nirxên civakî tevahiya tevgerên bi fezîlet in ku di cavakê de pêwendiya mirovan xurt dike û jîiyînê bi aramtir dike. Her civak ji bo jiyaneke û civakeke baştir bi demê re nirxên xwe qewîntir dike. Her civak li gor xwe xwedî hin nirxan e. Herçiqas ev nirx li gor esasên nirxên gerdûnê jî bin, carcarna tê dîtin ku di navbera wan de kêma zêde cudahî tîne berbiçav. Herwiha di nav civakan de hin nirx hevpar bin jî girîngiya wan nirxan li gor civakan dikare bê guherîn. Ji bo nimûne, xêrxwazî yan jî merhemet dibe ku li hin civakan xwedî girîngiyeke zêde be, lê dibe ku di hin civakan de jî girîngiya wan nirxan kêmtir be.

Civak bi parastin û veguhezîna nirxan, gaveke saxlem diavêjin dahatûyê û rê li pêşîya her cure kaos û anomîyan digirin. Lewma nirx di jîyana civakî de roleke gelekî mezin û çalak dilîzin. Turna, di xebata xwe de ji bo nirxên civakî wiha dibêje; “Nirxên civakî jî eynî wek nirxên exlaqî erka muhafezekirina ahenga civakê pêk tînin.”<sup>43</sup>

Her çiqasî di literaturê de senifandineke hevpar a nirxên civakî nîn be jî hin lekolfîner li gor xwe ew senifanfîne. Göz nirxên civakî bi vî şiklî rêz dike; “Hezkirin, hurmet, xweşbînî, azadî, berpirsiyarî, edalet û wekhevî, biratî, alîkarî û piştevanî, diristî, zîrekî, mêvanperwerî, qencî, xêrxwazî, fedakarî, şefqet û merhemet, nefsbîçûkî û dîlnizmî, silavdayîn, xwedî derketina mîrasa çandî.”<sup>44</sup>

Di qada kurmancî de ji bo ku xebatên bi vî rengî pir kêma in, peydekirina senifandineke nirxên civakî zehmet e. Enes Akıncı di teza xwe de ya bi navê “Peydabûna Nirxên Civakî û Vekolîna Wan di Hin Romanên Kurmancî yê Folklorik de” di romanên kurmacî yê folklorik de nirxên civakî tespît kirine. Di

<sup>42</sup> MEB, [http://mufredat.meb.gov.tr/Dosyalar/2018130153652546-DKAB\\_\(4-8.%20S%C4%B1n%C4%B1f\)\\_DOP\\_%202018.pdf](http://mufredat.meb.gov.tr/Dosyalar/2018130153652546-DKAB_(4-8.%20S%C4%B1n%C4%B1f)_DOP_%202018.pdf), 08 Tebax 2019. jêgirtin: Akıncı, *ht*, 2019, r.18.

<sup>43</sup> Murat Turna, *Türk Romanında Değerler Çözülmesi*, İz Yayıncılık, İstanbul, 2015, s. 47. jêgirtin: Akıncı, *ht*, 2019, r.17.

<sup>44</sup> Kemal Göz, “Toplumsal Değerler Bağlamında Yaşama Hürriyeti”, *Pamukkale Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, İstanbul, 2014, s. 89.

wan romanane de nirxên civakî yê ku tespît kirine ev in; aşîfî, bawerî, comerdî, diristî, edalet, efûkirin, fedakarî, hevaltî, hurmet, merhemet, mêrxasî, nefsbîçûkî, paqijî, qencî, sebir, sozdayîn, wekhevî, wetenperwerî, xêrxwazî, xweşbînî û zîrekî.<sup>45</sup>

### 1.2.3. Erka (fonksiyon) nirxan

Bi giştî nirx bandorê li jîyana me ya civakî dikin. Di jîyana me ya civakî de her nirxek xwedîyê erkekê ye û wê erkê bi cih tîne. Heke em civakê wek avahîyekê tesewir bikin, ferdên wê, hêmanên bingeh in û nirx jî çîmentoya wê ye. Nirx ferdên civakê digihîne hev û sûtê li berdewamîya wê civakê dike. Bi van rolên xwe yê girîng, nirx di civakê de xwedî erkeke mezin in.<sup>46</sup>

Erkên nirxan bi giştî ew e ku di pêkhatina bûyerên beşerî de diyarker e. Di qada polîtîk, dînî, exlaqî yan jî di qada aborî, civakî û hwd. de bûyerên beşerî bi nirxan piştrast dibe.<sup>47</sup>

Di jîyana me ya civakî de, him ji bo me bixwe him jî ji bo civakê gelek erkên nirxan yê cihê hene. Ertan Özensel rola nirxan wiha îfade dike; “Nirx, pîvanên herî girîng in ku wateyê didin hêmanên civakê yê sosyal û çandî.”<sup>48</sup> Bi van pîvanên girîng, ango bi nirxên civakî rê û rêgazên civakê peyda dibin. Herwiha ev rewş dibe sedama hin rêgazan ku pêwendîya di navbera mirovan de xwedî tesîreke xurt e.

Gelek kesan di derheqê erka nirxan de fikrên xwe vegotine. Yek ji wan Orhan Gökçe ye ku erkên nirxan bi vî şiklî rêz dike;<sup>49</sup>

- Nirxeke civak-çandî di bingehê de standarta oryantasyona hîlbijêr e. Ango di vê konteksê de nirx, kirîterên giştî yê tevgerên bihişmend û biarmanc in; kirîterên bijartinê yê ji bo armanca şênber a tevgerê ne. Lewma, nirx peywira daxwazên ferdekî yê wek tevgerên civakî tîn qebûl dikin, bi cih tîne.
- Nirx ji aliyê çandê ve tîn çêkirin û di heman demê de bandorê li ser çandê jî dikin. Lewma nirx bingeha çandê pêk tînin.

<sup>45</sup> Akıncı, *ht*, 2019, r.6.

<sup>46</sup> Akıncı, *ht*, 2019, r.18.

<sup>47</sup> Mustafa Aydın, (2011), “Değerler, İşlevleri ve Ahlak”, *Eğitime Bakış Dergisi*, Yıl: 7 Sayı: 19. s.41.

<sup>48</sup> Ertan Özensel, “Sosyolojik Bir Olgu Olarak Değer”, *Değerler Eğitimi Dergisi*, 1(3), 2003, İstanbul, s. 220. jêgirtin: Akıncı, *ht*, 2019, r.18.

<sup>49</sup> Orhan Gökçe, “Türk Gençliğinin Sosyal ve Ahlaki Değerleri”, *Selçuk Üniversitesi Ata Dergisi*, Konya, 1994, S.6, s. 133. jêgirtin: Akıncı, *ht*, 2019, r.18.

- Nirx bi mirovan tèn zanîn û naskirin. Ango di pêvajoya sosyalîzasyonê de nirx ji aliyê kesan ve tèn hînkirin. Bi kurtasî, li binyada şexsîyeta ferdî entegre dibin. Di encama vê de nirx wek perçeyek ji şexsîyeta ferdî tê dîtin. Nirx xwedîyê asteke gotinî ne. Ango nirx him aliyê wê yê zihnî him jî yê hisî-hestiyarî îfade dikin.

Bi van rêzikan tê fêhmkirin ku nirx ji civakekê re rêberek e ku ji bo civakê tişta herî baş pêşniyar dike û bi vê erka xwe dixwaze pêşiya aloziyan bigire. Bi vê erka xwe nirx bingeheke xurt ava dike ku di nav civakê de tê esesgirtin.

Rokeach bi me dide zanîn ku sê fonksiyonên nirxan hene. Ji van a ewil fonksiyona nirxan a sererastkirin û eyarkirinê ye. Rokeach ya diduyan wek fonksiyona nirxan a parastina egoyê bi nav dike. A sisêyan û ya dawî jî fonksiyona nirxan a xwe pêkanînê ye. Rokeach li ser fonksiyonên nirxan disekine. Li gorî wî nirx;<sup>50</sup>

- Ferdan sewq dike ku di mijarên civakî de pozîsyonekê bistînin.
- Bandorê ji aliyê tercîhên ferdan yên polîtîk an jî îdeolojîyên olî de dike.
- Rêbertîya pêşkeşîya ferdî ya bi xwe dike.
- Nirxandin û darizandina ferdî ya xwe û ya kesên din de, pesindayîna xwe û ya kesên din an jî dîtina qisûran de roleke kirîtkî dilîzin.
- Ji ber cihê wê yê navendî, di pêvajoya muqayeseyê de wek pîvanê tê bikaranîn.
- Di bandorkirin û qanêkirina kesên din de tê bikaranîn.

Diyar e ku nirx bi van erkên xwe di jiyana civakî de xwedî roleke girîng e, li ser tercîhên mirovan tesîrdar e ku di heman demê de di nav civakê de weke pîvaneke başiyê tê dîtin. Herwiha erkên nirxan xwedî hêzekê ne ku di nav civakê de jiyaneke xweşî bi aşîti ava bike.

#### **1.2.4. Pêwendîya çîrok û nirxan**

Her mirov di nav civakekê de tê ser dinê û dest bi jîyanê dike. Di vê civakê de bi jîyana hevpar re, mirov fêrî rêzik û qaîdeyên civakî dibe. Fêrî çanda wê civakê, nirxên wê civakê û urf û edetên wê civakê dibe. Ji rabûn û rûniştinê bigire, heta şeklê silavdayînê jî li gorî civaka ku lê hatî dinê şikil distîne. Mirov li kîjan civakê were dinê, li gorî rêzîkên wê yên civakî adapte dibe. Ewil mirov li civakekê tê ser dinê, paşê fêrî rêzîkên wê civakê dibe, paşê van rêzikan nîşanî zaroyên xwe dide, zaroyên

---

<sup>50</sup> Akıncı, *ht*, 2019, r.18.

wî/wê jî nîşanî zaroyên xwe... Ev çerx her û her bi vî awayî dom dike. Bi vî awayî neslên nû fêrî çandê, nîrxên civakî û urf û edetên civakê dibin.<sup>51</sup>

Civak wan nîrxên ku pejirandine dixwazin ku bi awayekî bigihînin nîşên nû. Ji bo vê yekê jî gelek rêbaz ceribandine. Yek ji wan rêbazan edebiyat e û herwiha di cureyên edebiyatê de tê dîtin ku nîrxên civakê di edebiyata wê civakê de jî vehewandine. Çîrok yek ji wan vegotinên devkî ne ku weke cureyê edebiyatê tê hesibandin û di xwe de nîrxên civakê vehewandine.

Çîrok ji aliyê naverokê ve cureyek e ku nêzî jiyana mirovan e û ji jiyana civakê parçeyekê dihewîne. Ji ber vê nêzbûna xwe ya mirovan, çîrok qeysa xwe li civakê digirin; ji nîşekê xwe digihînin nîşeke din. Herwiha çîrok neynika serdema xwe ne ku çand û nîrxên wê civakê hildigirin û digihînin nîşên nû.

Bi riya çîrokan perwerdehiya nîrxan pêk tê. Çîrok bi qasî teybetmendiya wan a dayîna kêfxweşiyê, erka wan a fêrkariyê jî heye. Zarok tiştê ku serlehengên çîrokê dijî, weke ku ew dijî xeyal dike. Serlehengên çîrokê ew karakterên xwedî sekn in ku li hemberî zordariyê jixwebawer û bi wêrekî tevdigerin. Tevgerên serlehangên ên li hemberî bûyeran, di hişê zarokan de têgînên başî-xerabî ava dike.<sup>52</sup>

Civak tiştê ku dixwaze ragihîne bi piranî bi rêya çîrokê û carcaran jî bi şîretî dike. Lewma pêkan e ku di çîrokan de mirov çand û nîrxên wê civakê fêhm bike. Bi vê teybetmendiya xwe çîrok rola fêrkariyê jî hildigire.

Gelek nîrxên manewî, gerdûnî, netewî û ferdî di nav wan berhemên edebî de cihê xwe girtine. Yek ji wan riya ragihandina nîrxan a ji bo zarokan çîrok in ku di nav van berhemên edebî de em dikarin ji wan sûd wergirin. Bi riya nîrxên ku di nav van çîrokan de wehewandî, tevgerên ku dixwazin zarok hilgirin dikare bê perandin.<sup>53</sup>

Di çîrokan de ji bo civakê û ji bo jiyîna mirovan nîrxên pêwist hene. Di serî de civaka ku em lê û herwiha hem nîrxên netewî hem ên manewî hem jî nîrxên gerdûnî

---

<sup>51</sup> Akıncı, *ht*, 2019, r.26.

<sup>52</sup> N. Gamze ILICAK, Nuran BAŞOĞLU, "Ahmet Ümit'in Masal Kitaplarında Yer Alan Değerlerin İncelenmesi", *Karaelmas Journal of Educational Sciences*, sayı.6, Zonguldak, 2018, s.92.

<sup>53</sup> Tuğçe Alabay Yolcu, *Hasan Lâtif Sarıyücel'in Anadolu Masallarının Eğitsel Değerler Açısından Değerlendirilmesi*, Erzincan Binali Yıldırım Üniversitesi, Erzincan, 2019, Yüksek Lisans Tezi, s.2.

di nav wan de ne. Dema ku malîmezî ji biçûkan re çîrokan dibêjin, bêyî ku heya wan jê hebe çand, zîman, dîn û kevneşopiyên pêşiyên xwe radigihînin biçûkan. Ji ber vê yekê çîrokên ku di xwe de peyamên çandî û perwerdeyî vehewandine, ji hêla fêrkariya nirxan hewce ye.<sup>54</sup>

Çîrok xwedî şewazeke bi heyecan û bi zewq e ku guhdar bi guhdarkirina çîrokê dibe xwedî persfektîfeke nû. Ji ber ku bi herikbariya çîrokê re guhdar dikare li hemberî serlehengan empatiyê girê bide û têbigihije rewşa wan. Ev teybetmendiyên çîrokê rê li ber ragihandina nirxên civakî vedike ku xwe bigihîne guhdaran. Ev jî teybetmendiyeke girîng e ku ew nirxên civakî yên di çîrokan de vehewandî tesîrê li ser tevgerên mirovan jî bike.

Zaroka ku di çîrokan de rastî mehetên civakî yên curbicur dibe û heya wan jê çê dibe, mafê mirovan û pêwistiya wekheviya di navbera mirovan de, edelata civakî û dostaniyê seh dike, li hemberî civakê û mirovan ber bi hesasbûne ve diçe û ji bo hilgirtina berpirsyan daxwaza wan xurt dibe.<sup>55</sup>

Motîfên çandî yên civakê di çîrokan de cihê xwe digirin ku ev jî ji bo perwerdehiya nirxan pêwist in. Kevneşopî û çanda civakê di çîrokan de vehewandî ne û gelek caran jî bi xisûsî ji bo perwerdehiya nirxan hatine bi kar anîn.

Bi kurtasî dikare bê gotin ku ji dêvla gotinên rût û zûwa, şîretên bê heyecan, di çîrokan de bi riya zewqê û kêfxweşiyê fêrkariya nirxên civakî tê kirin û bi vî awayî derseke bi tesîr xwe digihîne nifşên nû.

### **1.3. Pîvana Nirxan a Schwartz**

Bingeha nîqaşên felsefî yên derbarê nirxa îroyîn, di salên 1890î de hatiye danîn. Têgîna nirxê ji aliyê lêkolîner û ramanwerên wekî Nietzsche, Scheler, Dupreel, Le Senne û Polin ve jî hatiye bikaranîn û di felsefeya wan de cihekî girîng

---

<sup>54</sup> Yolcu, *Hasan Lâtîf Sarıyücel'in Anadolu Masallarının Eğitimsel Değerler Açısından Değerlendirilmesi*, 2019, s.2.

<sup>55</sup> Nevin Akkaya, "Keloğlan Masallarında Yeralan Değerlerin İncelenmesi", *Akademik Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Sayı. 2/1, 2014, s.323.

girtiye. Li gorî Nietzsche yê ku nirxan diafirîne û saz dike mirov e. N. Hartmann jî diyar dike ku nirx bi serê xwe hene lê mirovan ew keşif kirine.<sup>56</sup>

Gelek senifandinên nirxan hene. Ji nav wan senifandinan senifandina herî zêde ku tê qebûlkirin ji hêla Spranger (1928) ve hatiye çêkirin. Ev senifandin ji hêla Allport, Vernon û Lindzey (1951) bûye pîvana nirxan. Spranger di encamên lêkolînên xwe de nirx di şeş koman de berhev kiriye. Ev komên nirxên estetîk, teorîk (Zanistî), aborî, siyasî, civakî û dînî ne. Rokeach jî di pirtûka xwe ya bi navê “The Nature of Human Values” de nirx di du koman de veqatandiye û bi tevahî 36 nirx nirx diyar kiriye.<sup>57</sup> Di nav tirkan de jî Cahit Kavcar ji bo perwerdehiya nirxa senifandina nirxan kiriye û di hin xebatên zanistî yên li Tirkiyê de jî ev senifandin hatiye bikaranîn.

Shalom H. Schwartz jî yek ji wan lêkolîneran e ku senifandina nirxan kiriye û li ser vê bingehe pîvana nirxan çê kiriye. Herwiha Schwartz psîkolog û lêkolînerê civakî ye ku di qada psîkolojiya civakî de li zanîngeha Colombîayê master û li zanîngeha Michiganê doktoraya xwe kiriye. Lêkolînerê navçandî ye û aferînerê Teoriya Nirxên Mirovan ên bingehî e. Ji bo pêkanîna pîvana nirxan di çarçoveya teoriya fêrbûna civakî de keda wî heye. Di sala 1973an de bûye profesor û di sala 1979an de li zanîngeha Hebrêwê (Îsrail), di beşa psîkolojiyê de karê xwe kiriye. Piştî teqawîtbûna xwe jî karê xwe berdewam kiriye û aniha serokê komeleya navnetewî ya psîkolojiya navçandî ye.<sup>58</sup>

Di nav van xebat û lêkolînan de, xebata bi navê Schwartz Value Servey (SVS)/ Pîvana Nirxan a Schwartz ku ji hêla S. H. Schwartz ve hatiye pêşxistin, xebata herî berfireh û navnetewî tê qebûlkirin. Ji bo vê sedemê ev pîvan pîvana herî maqûl tê hesibandin.<sup>59</sup>

Schwartz, “Pîvana Arasteyên Nirxan” a ku di çarçoveya “Teoriya Nirxan” de amede kiriye, ewilî li ser nimûneyan bi kar aniye ku ev nimûne ji bîst welatan pêk

---

<sup>56</sup> Akkaya, “Kıbrıs Türk Masallarında Değerler”, 2017, s. 232.

<sup>57</sup> Erol Güngör, *Değerler Psikolojisi Üzerine Araştırmalar*, Ötüken Yayınları, İstanbul, 1998, s.25.

<sup>58</sup> [https://en.wikipedia.org/wiki/Shalom\\_H.\\_Schwartz](https://en.wikipedia.org/wiki/Shalom_H._Schwartz), 8ê Berfanbara 2022an.

<sup>59</sup> Rıza Altun, “Fen Lisesi ve İmam Hatip Lisesi Öğrencilerinin Değer Yönelimleri (Samsun Örneği)”, *Gaziosmanpaşa Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, Sayı 2, 2015, s. 200.

tên. Piştire xebata xwe berfirehtir kiriye û li ser çilûçar welatan, piştire jî li ser ji heftêyî bêhtir welatan xebata xwe berdewam kiriye. Bi tevahî li ser 60.000 kesî bi zamanê wan ê zikmakî ev pîvan bi kar aniye û xebatên xwe kiriye. Di nav van xebatan de pîrserêzên ku hatine kirin, li gorî zimanê zikmakî yê wî welatî hatine wergerandin û bi wî awayî hatine bikaranîn. Di encama xebatên xwe de ji çandên cihêreng deh komên nirxên bingehîn û 56 nirxên binbeş ên van koman diyar kirine.<sup>60</sup>

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz ev deh komên nirxan û nirxên binbeş ên van koman bi vî şiklî ne;<sup>61</sup>

**Tablo 1.1. Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Cureyên Nirxan û Nirxên Binbeş**

CUREYÊN NIRXAN	RAVEKIRIN	NIRXÊN BINBEŞ
<b>HÊZ</b>	Prestîj û statûya civakî, hêza kontrolkirin û berçavkirina ya li ser mirovan	Xwedî hêza civakî, dewlemendî, parastina statûya civakî, pejirandina ji hêla mirovan, xwedî otorîtebûn
<b>SERKETIN</b>	Rê û rêbaza serkeftinê ya wan kesên ku standartên civakî li ber xwe datînin	Serkeftûbûn, şarezabûn, bûyîna kesekî ku gotina wî/wê nayê şikandin, zîrekbûn
<b>HEZPERESTÎ</b>	Zewq û xelatkirina şexsî a hestan	Zewq, stendina tehma jiyane, zayendî
<b>ŞIYARKIRIN/HIŞYARKIRIN</b>	Kelocanî, serfiraziya li hemberî jiyane û gera li nûbûnê	Wêrekî, jiyîna jiyaneke guhêrok, xwedî jiyîneke bi kelocan
<b>XWETÊGIHÎN</b>	Fikrên xweser û terciha çalakiyê, kifş û lêkolîn	Aferînerî, meraqkirin, serbestbûn, neqandina helwestên xwe, xweserbûn, rêzdariya li hemberî xwe
<b>GERDÛNÎBÛN</b>	Bîrewerî, qedirzanî û xweşbinî, daxwaza qenciya mirovan û ya xwezayê	Berfirehbûna li hemberî fikrên nû, fezîletdarbûn, edaleta civakî, wekhevî, daxwaza cîhaneke bi aşitî, cîhaneke bi

<sup>60</sup> Semih Bilge, Durdane Küçükaycan, “Maliye Bölümü Öğrencilerinin Yaşam Değeri Yönelimlerini Oluşturan Faktörlerin Belirlenmesi Üzerine Bir Araştırma”, *Sosyal ve Beşeri Bilimler Dergisi*, Sayı.5, 2013, s.421.

<sup>61</sup> Nurettin Küçük, “Schwartz’ın Değer Yönelimleri Ölçeği ile Türkiye’deki Öğrenciler Üzerine Yapılmış Olan Bazı Araştırma Bulgularının Değerlendirilmesi”, *Akademik Bakış dergisi*, 2016, S. 57, s. 282.

		xweşî, yekbûniya bi xwezayê re, parastina xwezayê, ahenga navxweyî
<b>XÊRXWAZÎ</b>	Xêrxwaziya li hemberî wan kesên ku bi wan re hevbandoriyeke şexsî heye, parastin û pêşxistin	Alîkarxwazî, dirustbûn, efûkerî, dilsozî/wefa, xwedî berpirsiyarîbûn, hevaltiyeke qewîn, hezkirina kemilî, jiyanêke bi manewî, jiyanêke bi wate
<b>RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)</b>	Qebûlkirina hin adet û fikrên çanda kevneşopî yan jî dînî, rêzgirtin û pêvgirêdanî	Nefsbiçûkî, dîndarî, qebûlkirina wan tiştên ku jiyanê pêşkeş kirine, rêzdariya li hemberî kevneşopiyan, xwevekişîna ji kar û barên dinyevî
<b>RAJÊRÎBÛN (RÎAYET)</b>	Sînorkirina wan îhtîmal û meylên ku ji bo bînpêkirina norm û hêviyên civakî, acizkirin an jî zirara li hemberî kesên din.	Kubarî, îtaatkarî, qedirdayîna li hemberî dê û bavên û pîr û kalan, bixwekarî/ xwekontrolkirin
<b>EWLEKARÎ</b>	Ewlehî û aramiya xwe ya şexsî, ya civakê û ya têkiliyan	Ewlehiya netewî, daxwaza berdewamiya pergela civakî, paqijî, ewlehiya malbatê, li hemberî qencyê qencî, hesta sedeqatê, sexlambûn/Sihhetbûn, mehremiyet

Di nav xebata me de, ew bîst çîrokên ku bingeha xebata me ava dikin, li gorî vê senifandina Schwartz hatine nirxandin û nirxên civakî li gorî vê pîvanê hatine tespîtkirin.

## 2. DI ÇÎROKAN DE NIRXÊN CIVAKÎ

### 2.1. Çîroka Gavan

#### 2.1.1. Kurteya çîroka gavan

Hebû nebû, go li gundekî gavanê gund hebû. Ev gavanê gund ji bo go pîraka wî rehmet kiribû bi tena serê xwe di xaniyekî kerpîçî de bû. Her serê şeveqê berya malayê sibehê diçû ber dewarê gund, gûh dida dewêr û rojekê jî dereng nedima. Rojek ji rojan çaxê go li ber dewêr bû beqekî kesk dibîne, ji wa beqên go dibêjin beqê Seyîda. Axirê diraje wê beqê go bêne malê û carê ji xwe re sebra xwe pê bêne.

.....

Ka gavan çî bike, ev yek ji gavan re dibe meraq, ji bo go her êvar wexta divegere malê dibîne go her tiştê mala wî tekuz e. Rojekê xeberê dide cîrana, bi qestî dibêje ez nexweş im û naçim ber dewêr. Wê rojê xwe di kevana nivîna de diveşêre. Beq jî dibêje qey gavan çûye ber dewêr, ew jî potikê xwe yê beqê didaxe. Gavan dibîne gu beq dibe jineke spehî, çiqas dilahî dibe jî dengê xwe dernaxê û dibêje ka gelo ev jin ê çî bike. Jin dirabe her deverî paqij dike, sobê pê dixê, diçe xwarinê jî çê dike. Gavan îda fêhm dike go kî mala wî paqij dike. Gavên di dilê xwe de dibêje go ev jin çî jineke paqij e. Piştî go ew beqa go bûye jin kar û barê xwe diqedêne careke dî potikê xwe yê beqitiye li xwe dike û dibe beq. Gavan bi va tiştê ecebmayî dibe; lê dengê xwe dernaxê. Roja dî dîsa dikeve kevana nivîna de xwe diveşêre û li beqê dimeyzêne, ka ê çî bike çî neke. Beq qaşo piştî go gavan diçe dîsa potikê xwe dadixe û dibe jineke spehî. Kar û barê xwe diqedêne û diçe go careke dî potikê beqê li xwe bike. Hema ha di vê kêliyê de gavan bilêz ji cihê derdikeve û wê jinikê zemt dike. Pê re diştexile û dibêje ez ê te li xwe mehr bikim. Dirabe diçe dibakê malayê gund û jinikê li xwe mehr dike. Roj bi roj her du bi hev re kêf û eşq in, gavan jî hurmetê dide jina xwe. Jina gavên jî têra xwe jîr û jêhatî ye; karê mala xwe ew qas paqij dike go cîranên derdorê hemû behsa wê û paqijiya wê dikin. Rojekê xulamê axayê gund di ber mala gavên re derbas dibe. Dibîne go jina gavan çî paqijiyê dike, çiqas jêhatî ye. Xulamê axê divegere qesra axê, ji axê re dibêje;

- Ne bi te ne bi jina te yî sist û tiral. Ma jineke gavên heye ji ev qas jinê gund jêhatîtir e. Ma tu jî dibêje jina min jin e, go jina gavên jina te bane ha wê çaxê axatiya te timam bû.

.....

Dotira rojê axê xulamê xwe dişyêne mala gavên û dibakê gavan go werê qesra wî. Gavan jî dikevê tirsekê de. Ji jina xwe re dibêje;

- Vî axayî bakiriye min lê ne jî xêra min re ye hermetê, bixwedê yan ê min bikuje yan ê tiştinan ji min bike, ma te ne go yê erd û zêwiyan bexşî min bike. Wey tî li mala min be...

.....

Axê di nav civata xwe de jê re dibêje go ev hemû kesên civatê şahid in go yan ez ê te bikujim û jina te li xwe mehr bikim an tê sê şertên min bi cih bêne. Ji axê wê ye go ev her sê şert ne pêkan in û ê jina gavên ji xwe re mehr bike. Bi tirs û bi mitalê gavên ji axê re dibêje ka gelo ew şertên wî çî ne. Axê dibêje;

- Şerta min a pêşî ew e go ti werşiyek tireh ( Tirî ) bêne go ev qas kesên cimaata min jê bixwin. Piştî go te ev yek pêk anî êdî ez ê şertê dî bêjim.

Gavan bi wî halê perîşan divegere malê û hal û hewadîsê ji jina xwe re dibêje. Jina wî dibêje;

- Meraqa neke, ti karê vî şertî pêk bêne. Ka vêca ez ji te re bibêjim êdî tê çî bike.

Gavan bi va gotinê jina xwe her çiqas ne bawer be jî û tirsî kuştina xwe de jî be, dîsa jî li jina xwe guhdar dike. Jina wî dibêje;

- Meyzêne, here wî cihê go te ez ji wir anîme û bibêje; “Wa Perîxanê xweha te Perîşanê ez şiyandime, bidime werşiyek tireh.” Piştî te ev gotin kir tê werşiyek tireh bibîne û rahijiye bibe qesra axê.

Ev gotinê jina wî her çiqasî bi serê wî nekevin jî ji neçarî dirabe diçe û gotina jina xwe dike. Dema go diçe wî cihê ku beq jê anîbû dibêje;

- Wa Perîxanê xweha te Perîşanê ez şiyandime, bide min werşiyek tireh. Çawa go wilo dibêje berî kesekî yan kesekê bibîne werşiyek tireh tê li ber nigê wî. Ecebmayî dimêne lê dirajiyê û dikeve rêya qesra axê.

.....

Dibêje vêca şertê dî bi cîh bêne û dibêje;

- Tê here ji min re sê hêka bêne go ji her sê heka sê dehşikê kera biwelidin. Bi vê xwestekê tirs bêhtir dikevê dilê gavan, ji bo go nizane ka çawa pêk bêne vî şertê ku axê daye ber. Bi tirs divegere malê û ji jina xwe re hal û hewadîse dibêje. Jina wî dîsa heman tiştî jê re dibêje. Ew jî dîsa ji neçarî diçe wî cihê go beq jê anî bû. Dibêje;
- Wa Perîxanê xweha te Perîşanê ez şiyandime, bide min sê hêka go dehşikê jê biwelidin.

.....

Çavê axê bel dibin û dîsa hêrs dibe lê ji bo go li derdora wî civata wî heye nikare tiştêkî jî bêje. Gavan bixwe jî hem ecêbmayî ye hem jî kêfxweş e, kêliyêk berî kêliyêkê dixwaze herê vê xeberê ji jina xwe re bêje; lê tê bîra wî go hêj şertêkî dî heye go divê pêk bêne. Dibêje axê;

- Axayê gundê min, va ye min her du şertên jî pêk anîn, vêca bêje min ka şertê te yî dawî çî ye?

Axê bawer nedikir go ne tenê gavên lê ti kes nikare va şerta pêk bêne, lewma li şertê sêya nefikirîbû. Hema ji nişke ve tê bîra wî û dibêje;

- Rast e te ev her du şert pêk anîn, lê heke ti vê şertê sêya jî pêk bêne va ye civata min şahid e go soza min soz e. Lê divê ti pêk bêne. Şertê min jî ew e go divê tu pitikekî di pêçekê de bêne go wek mezinan diştexile. Heke ti vî şertî pêk neyêne ti kuştî yî û jina te jî li min mehr e.

Ka gelo gavên çawa vî şertî pêk bêne; lê vê carê ew qasî ne bi tirs e, ew bawer e go dîsa jina wî jê re bibe alîkar.

.....

Piştî vê gotinê gavan dirabe diçe wî cihî û dibêje;

- Wa Perîxanê xweha te Perîşanê ez şiyandime, bide min pitikekî di pêçekê de go biştexile.

Çawa go gavên vê gotinê dibêje dîsa berî go kesekî yan kesekê bibîne pitikek bi pêçek derdikevê holê. Gavên dirajiyê pitikê û diceribêne ka birastî diştexile yan na. Gavên dibêje;

- Wa pitika xweşik ka ji min re bibêje tu kur î yan keç î?

Pitik tilehka xwe ji devê xwe derdixê û wek mezinan dibêje;

- Ez kur im, kurekî xweşik im.

Piştî vê gotinê gavan hem acebmayî hem bi kêfxweşî diçe bi rêya qesra axê de. Wexta digihê qesra axê dibîne ku axê dîsa bi civata re rûniştiye û kêyfa xwe dikin. Gavan diçe odeya wa û wî pitikî şanî axê dike. Axê jî û civata wî jî bi kelecana li hêviya gavên dimênin go ka gelo ê ev pitik biştexile yan na. Gavên dibêje;

- Ho axayê gund û cimaata wî, bi çi şiklî vî axayî ez xistim tengayiyê û hûn jî bûn şahidê vê zordariyê. Ka vêca li vî pitikî meyzênin go ew ê çawa min xilas bike. De bêje pitikê xweşik.

Piştî vê gotinê pitik wek mezinan diştexile û hemû kesê wir bi dilahî lê dimeyzênin. Axê fêhm dike go êdî nikare tiştêkî bike. Heke li derdora wî ev civata wî nebana dîsa ev gavan sax nedihîşt lê êdî şahidê wî hebûn û gavan azad kir. Gavan jî tevî wî pitikî bi kêfxweşî diçe malê û tiştê go qewimîne ji jina xwe re dibêje. Ji bo ku ew pitik li rastê nemêne wî ji xwe re dikin kur û jê re dê û bavitiyê dikin. Jina wî jî dibêje;

- Ev qas tişt hatin serê me, lê me sebir kir. Ma ne beleseveb nabêjin xwediyê sebrê melikê Misrê.

Gavan jî bi vê yekê baş zanê. Axirê bi hev re bi kêf û eşq dibin heta hetayê. Çîroka min jî ji we re xweş ka bidin min qetîtik şebeş.

### 2.1.2. Di çîroka gavan de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.1: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Gavan de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
<b>HÊZ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Ma ne axa ye, mezin e.</li> <li>Axayê gundê min, va ye min her du şertên te jî pêk anîn.</li> </ul>	<b>2</b>
<b>SERKETIN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Wê rojê xwe di kevana nivîna de diveşêre. Beq jî dibêje qey gavan çûye ber dewêr, ew jî potikê xwe yê beqê didaxe.</li> <li>Jina gavên jî têra xwe jîr û jêhatî ye.</li> <li>Ma jineke gavên heye ji ev qas jinê gund jêhatîtir e.</li> </ul>	<b>3</b>
<b>HEZPERESTÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Di rê de dilê wî dibije tireh, çiqas dixwaze go nefsa xwe bigire jî hew îdare dike.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>ŞIYARKIRIN/ HIŞYARKIRIN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Hema ha di vê kêliyê de gavan bilêz ji cihê xwe derdikeve û wê jinikê zemt dike.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>XWETÊGIHÎN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Ka gavan çî bike, ev yek ji gavan re dibe meraq, ji bo go her êvar wexta divegere malê dibîne go her tiştê mala wî tekuz e.</li> <li>Piştî van gotinan axa hem hêrs dibe hem jî jina gavan jî meraq dike; ka kî ye çî kesek e.</li> <li>Dibêje ka gelo ev jin ê çî bike.</li> </ul>	<b>3</b>
<b>GERDÛNÎBÛN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Vê şertê sêya jî pêk bîne va ye civata min şahid e go soza min soz e.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>XÊRXWAZÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Roj bi roj her du bi hev re kêf û eşq in, gavan jî hurmetê dide jina xwe.</li> <li>Meraqa neke, ti karê vî şertî pêk bîne. Ka vêca ez ji te re bibêjim êdî tê çî bike.</li> <li>Jina wî dîsa jê re dibêje here cem xweha min Perîxanê, ew ê ji te re bibe alîkar.</li> <li>Ji bo ku ew pitik li rastê nemêne wî ji xwe re dikin kur û jê re dê û bavitiyê dikin.</li> <li>Axirê bi hev re bi kêf û eşq dibin heta hetayê.</li> <li>Ew bawer e go dîsa jina wî jê re bibe alîkar.</li> </ul>	<b>6</b>

<b>RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Her serê şeveqê berya malayê sibehê diçû ber dewarê gund, gûh dida dewêr û rojekê jî dereng nedima.</li> <li>• Ji wa beqê go dibêjin beqê Seyîda.</li> <li>• Pê re diştexile û dibêje ez ê te li xwe mehr bikim.</li> <li>• Dirabe diçe dibakê malayê gund û jinikê li xwe mehr dike.</li> <li>• Yan ez ê te bikujim û jina te li xwe mehr bikim an tê sê şertên min bi cih bêne.</li> <li>• Û ê jina gavên ji xwe re mehr bike.</li> <li>• Ev qas tişt hatin serê me, lê me sebir kir. Ma ne beleseveb nabêjin xwediyê sebrê melikê Misrê.</li> </ul>	<p style="text-align: center;"><b>7</b></p>
<b>RAJÊRÎBÛN (RÎAYET)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Çavê axê bel dibin û dîsa hêrs dibe lê ji bo go li derdora wî civata wî heye nikare tiştêkî jî bêje.</li> </ul>	<p style="text-align: center;"><b>1</b></p>
<b>EWLEKARÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Piştî go beq aniyê malê sê çar roja şûn de her cara go divegere malê dibîne go mala wî hatiye paqijkirin.</li> <li>• Jin dirabe her deverî paqij dike, sobê pê dixê, diçe xwarinê jî çê dike. Gavan îda fêhm dike go kî mala wî paqij dike.</li> <li>• Gavên di dilê xwe de dibêje go ev jin çî jineke paqij e.</li> <li>• Karê mala xwe ew qas paqij dike go cîranên derdorê hemû behsa wê û paqijîya wê dikin.</li> <li>• Rojekê xulamê axayê gund di ber mala gavên re derbas dibe. Dibîne go jina gavan çî paqijîyê dike, çiqas jêhatî ye.</li> </ul>	<p style="text-align: center;"><b>5</b></p>

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka Gavan de her deh cureyên nirxan hatine tespîtkirin. Di tevahiya çîrokê de di seh cihan de ev nirx hatine dîtin ku dudu jî wan di nirxa hêzê de xwe dide nîşandan. Xwedî hêza civakî, dewlemendî, parastina statûya civakî, pejirandina jî hêla mirovan û xwedî otorîtebûn li gorî Schwartz ew nirxên binbeş ên nirxa ‘hêz’ê ne.

“... Ma ne axa ye mezin e.”

“...Axayê gundê min, va ye min her du şertên te jî pêk anîn.”

Di van her du hevokan de bi karakterê ‘axa’ em têdigihijin ku ev karakter xwedî hêzeke civakî ye. Li gorî Schwartz ev nirx nirxa hêzê ye.

Serkeftûbûn, şarezabûn, bûyîna kesekî ku gotina wî/wê nayê şikandin, zîrebûn li gorî pîvana nirxan a Schwartz nirxên binbeş ên nirxa ‘serketin’ê ne. Di çîroka Gavan de li gorî Schwartz nirxa serketinê bi sê cihan xwe dide nîşandan;

“...Wê rojê xwe di kevana nivîna de diveşêre. Beq jî dibêje qey gavan çûye ber dewêr, ew jî potikê xwe yê beqê didaxe.”

“...Jina gavên jî têra xwe jîr û jêhatî ye.”

“...Ma jineke gavên heye ji ev qas jinê gund jêhatîtir e.”

Di nav van her sê hevokan de di hevoka ewil de nirxa serketinê rasterast nehatiye dayîn, lê di wateya hevokê de tê fêhmkirin ku nirxa zîrekîyê hatiye dayîn. Di her du hevokên din de jî zîrekî rasterast hatiye dayîn. Nirxa zîrekîyê nirxeke binbeş a nirxa ‘serketin’ê ye.

Di çîroka gavan de li gor pîvana nirxan a Schwartz nirxa hezperestiyê bi nirxeke binbeş hatiye dayîn;

“... Di rê de dilê wî dibije tireh, çiqas dixwaze go nefsa xwe bigire jî hew îdare dike.”

Di vê hevokê de nirxa hezperestiyê rasterast nehatiye dayîn, lê ji wateya hevokê nirxa zewqê a binbeşa nirxa ‘hezperestî’yê tê fêhmkirin.

Wêrekî, jiyîna jiyaneke guhêrok, xwedî jiyîneke bi kelocan nirxên binbeş ên nirxa hişyarkirinê ne. Nirxa hişyarkirinê bi nirxa binbeş a wêrekîyê di cihekî de hatiye dayîn;

“... Hema ha di vê kêliyê de gavan bilêz ji cihê xwe derdikeve û wê jinikê zemt dike.”

Nirxa wêrekîyê di vê hevokê de rasterast nehatiyê dayîn, lê ji wateya hevokê û ji wateya çîrokê nirxa wêrekîyê têderxistin.

Aferînerî, meraqkirin, serbestbûn, neqandina helwestên xwe, xweserbûn, rêzdariya li hemberî xwe nirxên binbeş ên nirxa xwetêgihînê ne. Di çîroka gavan de di sê cihan em rastî vê nirxê dibin;

“...Ka gavan çi bike, ev yek ji gavan re dibe meraq, ji bo go her êvar wexta divegere malê dibîne go her tiştê mala wî tekuz e.”

“...Piştî van gotinan axa hem hêrs dibe hem jî jina gavan jî meraq dike; ka kî ye çi kesek e.

“...Dibêje ka gelo ev jin ê çî bike.”

Di her du mînakên ewil de meraqkirin rasterast hatiye dayîn, lê di ya sêyan de tenê wateya meraqkirinê heye û ev yek li gorî Schwartz nirxa ‘xwetêgihîn’ê ye.

Gerdûnîbûn yek ji wan nirxa ye ku Schwartz di pîvana xwe ya nirxan de cih daye. Di çîroka gavan de jî li cihekî em rastî vê nirxê dibin;

“... Vê şertê sêya jî pêk bîne va ye civata min şahid e go soza min soz e.”

Fezîletdarbûn nirxeke binbeş a gerdûnîbûnê ye û di vê hevokê de dema ku dibêje “soza min soz e” em têdigihjin ku ev tevgereke bi fezîlet e.

Li gorî Schwartz alîkarxwazî, dirustbûn, efûkerî, dilsozî/wefa, xwedî berpirsiyarîbûn, hevaltiyeke qewîn, hezkirina kemilî, jiyaneke bi manewî û jiyaneke bi wate nirxên binbeş ên nirxa xêrxwaziyê ne. Di çîroka gavan de em li şeş cihan rastî vê nirxê dibin. Li du cihan alîkarxwazî rasterast hatiye dayîn û li cihekî jî rasterast nehatiye dayîn, lê ji wateya hevokê nirxa xêrxwaziyê tê fêhmkirin;

“...Jina wî dîsa jê re dibêje here cem xweha min Perîxanê, ew ê ji te re bibe alîkar.”

“...Ew bawer e go dîsa jina wî jê re bibe alîkar.”

“... Ji bo ku ew pitik li rastê nemêne wî ji xwe re dikin kur û jê re dê û bavitiyê dikin.”

Li cihekî jî alîkarxwazî rasterast nehatiye dayîn, lê ji wateya hevokê ev nirx jî xwe dide der;

“...Meraqa neke, ti karê vî şertî pêk bîne. Ka vêca ez ji te re bibêjim êdî tê çî bike.”

Li gorî Schwartz hezkirina kemilî binbeşeke nirxa xêrxwaziyê ye, lewma em jî dikarin bibêjin ku jiyîna bi kêf û eşq a du kesan hezkirineke kemilî ye û di çîroka gavan li du cihan em rastî vê nirxê dibin;

“...Axirê bi hev re bi kêf û eşq dibin heta hetayê.”

“...Roj bi roj her du bi hev re kêf û eşq in, gavan jî hurmetê dide jina xwe.”

Nefsbiçûkî, dîndarî, qebûlkirina wan tiştên ku jiyaneke pêşkeş kirine, rêzdariya li hemberî kevneşopîyan û xwevekişîna ji kar û barên dinyevî ew nirxên binbeş ên nirxa rêz û rêçîka (Kevneşopî) ne. Di çîroka gavan de nirxa herî zêde ku hatiye

tespîtkirin jî ev e. Li heft cihan em rastî vê nirxê dibin; ji nav van heft cihan di şeş cihan de nirxa binbeş a dîndariyê hatiye bikaranîn. Mehrkirin, malayê sibehê, Seyîd (Di nav kurdan de ji wan kesan re tê gotin ku ji nifşa peyxember in.) têgehên olî ne ku bikaranîna wan li gorî Schwartz nirxeke civakê ye.

“...Her serê şeveqê berya malayê sibehê diçû ber dewarê gund, gûh dida dewêr û rojekê jî dereng nedima.”

“...Ji wa beqê go dibêjin beqê Seyîda.”

“...Pê re diştexile û dibêje ez ê te li xwe mehr bikim.”

“...Dirabe diçe dibakê malayê gund û jinikê li xwe mehr dike.”

“...Yan ez ê te bikujim û jina te li xwe mehr bikim an tê sê şertên min bi cih bêne.”

“...Û ê jina gavên ji xwe re mehr bike.”

Li gorî Schwartz qebûlkirina wan tiştên ku jiyanê pêşkeş kirine nirxa binbeş a nirxa rêç û rêçikan e. Li cihekî em rastî vê nirxê dibin ku bi wateya tehamulkirin û sebirkirina li hemberî hin bûyeran hatiye bikaranîn;

“...Ev qas tişt hatin serê me, lê me sebir kir. Ma ne beleseveb nabêjin xwediyê sebrê melikê Misrê.”

Kubarî, îtaatkarî, qedirdayîna li hemberî dê û bavan û pîr û kalan, bixwekarî/xwekontrolkirin nirxên binbeş ên rîayetê ne. Di çîroka gavan de li cihekî em rastî vê nirxê dibin ku ew jî bi nirxa xwekontrolkirinê xwe daye der;

“...Çavê axê bel dibin û dîsa hêrs dibe lê ji bo go li derdora wî civata wî heye nikare tişteki jî bêje.”

Nirxa dawî ku di çîroka gavan de hatiye tespîtkirin nirxa ewlekariyê ye. Li gorî Schwart paqijî nirxa ewlekariyê ye û di nav civakan de ev nirxek e. Di çîroka gavan de li pênc cihan em rastî vê nirxê dibin;

“...Piştî go beq aniyê malê sê çar roja şûn de her cara go divegere malê dibîne go mala wî hatiye paqijkirin.”

“...Jin dirabe her deverî paqij dike, sobê pê dixê, diçe xwarinê jî çê dike. Gavan îda fêhm dike go kî mala wî paqij dike.”

“...Gavên di dilê xwe de dibêje go ev jin çî jineke paqij e.”

“...Karê mala xwe ew qas paqij dike go cîranên derdorê hemû behsa wê û paqijiya wê dikin.”

“..Rojekê xulamê axayê gund di ber mala gavên re derbas dibe. Dibîne go jina gavan çî paqijiyê dike, çiqas jêhatî ye.”

## **2.2. Çîroka Hûtê heftserî**

### **2.2.1. Kurteya çîroka hûtê heftserî**

Go hebû nebû, go sê çar keçik li hev kom bûbûn û ji xwe re meharkan (Morîk) dilîstin. Piştî kêliyê qey yek ji wan keçika hîle kiribû. Vêca digotin hev ka kê hîle kiriye. Yekê got bi serê birayê xwe sûnd dixwim go min hîle nekiriye, keçika dî jî got bi serê birayê min, min jî hîle nekiriye û hema keçika dî jî eynî tişt got. Feqîrê keçika sonê nizanîbû go li ser çî sûnd bixwe, ji bo go nizanîbû birayên wê hene. Hema wê jî got;

- Bi serê qemçika diya min min hîle nekiriye.

Axirê keçik diçe malê, li kêleka diya xwe dirûne û dest bi girî dike. Diya wê tê balê, destê xwe ser serê wê re dibe û bi dilahî jê dipirse;

- Ti çima digirî keçka min, ma qey çî qewimiye?

Keça wê bi zîkezîk dibêje;

- Birayê hemû hevalê min hene, ma qey birayên min nînin?

Diya wê dibêje;

- Ma çawa birayê te nînin keça min. Welleh du birayê te hene û li filan deverê ne.

Piştî go diya wê behsa birayê wê dike, keçik dixwaze go biçe cem birayê xwe. Diya wê jî cihê birayê wê jê re dibêje û diya wê dibêje go ez ê ji te re kerekî bi heriyê çêkim, bi wî kerî here bigihe birayê xwe; lê heke ti ji kerê xwe re bêje “Şoş” ê kerê te bifelişê û tê nivê rê bimêne. Keçik jî dibêje tamam û dikevê rê; lê li nivê rê bi gotina diya xwe nakê û dibêje kerê xwe “Şoş”. Çawa go dibêje “şoş” kerê wê difelişê. Dirabe careke dî divegerê malê û dibêje diya xwe ka kerekî min dî çêke. Diya wê

dibêje ma min negot nebêje “Şoş”; lê dîsa jî pê de naxiyêde, dilê keça xwe nahêle û kerekî dî jê re çê dike.

.....

Birayê wê bi hatina wê kêfxweş dibin. Bi hev re xwarinê dixwin, têra xwe diştexilin û diçin ser cihê xwe go razin. Roja dî dîsa birayê wê diçin nêçîrê, berî go herin dibêjin xwîşka xwe;

- Meyzêne xwehkam, ha ev dara hajîrê dara kitikê (Pisîk) ye, heke ti ji vê darê bixwe kitik ê bê di agirê te de bimîze û carek dî ti nikare agir peyda bike.

Lewma ti ji vê darê nexwe.

Keçik jî dibêje tamam û birayê wê diçin çiyê nêçîrê. Piştî go birayê wê diçin, keçik hejîra bi darê ve meraq dike û diçe hejîra kitikê dixwê. Keçik henekê xwe bi kitikê dike û dibêje kitikê;

- Wa kitikê ma ne min hejîra te xwar.

Kitik jî dibêje;

- Erê min dît te xwar lê min jî di agirê te de mîz kir.

Piştî vê gotinê keçik diçe agirê go pê xistiye dimeyzêne, bira jî agirê wê temiriye. Keçik dike û nake agirê xwe careke dî nikare pêxe.

.....

Keçikê dengê xwe dernexist lê gote jinekê ku ez hatime agir. Jinik jî dibêje;

- Heft parengê me hene; lê hût ew jimartine. Ji xwe re rahije yekî bilêz here mala xwe, berî go hût şiyar bibe.

Jinik piştî go gotina xwe bi dawî dike, kulmek derzî, kulmek şûjin û qalibek sabûnê jî dide keçikê. Dibêje keçikê dinyayê hût şiyar bibe û bide dû te, hema ti jî va tiştê bavêje nigê wî.

Keçik diraje wa tiştê û bi bayê bezê ber bi malê ve diçe. Lê hût şiyar dibe û bêhna goştê însana dike. Hût dirabe dibîne go keçikek bi bayê bezê baz dide, hema ew jî dide dû keçikê. Çawa go nêzî keçikê dibe, keçik kulmek derzî diavêje nigê wî.

.....

Vê carê jî hût dişemite û dikeve erdê. Heta go hût dirabe ser xwe û careke dî dide pey keçikê, keçik digihe mala xwe; lê êdî hût zehf diqeherê û tê devê deriyê mala keçikê. Keçik deriyê xwe dixiliqêne; lê hût dibêje yan tê derî vekê yan jî tê tiliya xwe derxê go ez ji tiliya te xwîna te bimijim. Keçik ji neçarî tiliya xwe derdixê. Her şeveq piştî go birayê keçikê ji mal derdikevin, hût tê tiliya keçikê dimije go xwîn tê de nahêle. Roj bi roj keçik li xwe dişkêne, mehdê wê zer dibe. Birayê wê vî halê wê dibînin.

.....

Ji ber go birayê keçikê xwe veşartine vê yekê dibînin, çawa go çav li hûtê heftserî dikan, her du bira dibin yek, dirajin şûrê xwe û serê hût dibirin. Şeş seriyên hût dibirin. Hût dibêje go vî seriyê dî jî bibirin, ji ber go heke ev serî jî jê bibe ê seriyê nû şîn bidin. Birayê keçikê bi vê yekê zanîbûn, lewma ew seriyê dawî jê nekirin lê hût kuştin û kirin tirbê de.

Û axirê çîroka min çû bi avê de, dê û bavê min çûn hacê de.

### 2.2.2. Di çîroka hûtê heftserî de hahûrîna nirxên civakî

**Tablo 2.3: Li Gorî Pivana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Hûtê Heftserî de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
XWETÊGIHÎN	<ul style="list-style-type: none"> <li>Piştî go diya wê behsa birayê wê dike, keçik dixwaze go biçe cem birayê xwe.</li> <li>Go birayê wê diçin, keçik hejîra bi darê ve meraq dike û diçe hejîra kitikê dixwê.</li> </ul>	2
XÊRXWAZÎ	<ul style="list-style-type: none"> <li>Diya wê tê balê, destê xwe ser serê wê re dibe.</li> <li>Diya wê dibêje ma min negot nebêje ‘Şoş’; lê dîsa jî pê de naxiyîde, dilê keça xwe nahêle û kerekî dî jê re çê dike.</li> <li>Jinik çawa go çav li keçikê dike, dibêje dengê xwe dernexe, heke ti dengê xwe derxê ê hût şiyar bibe û bikevê dû te û yê te bikuje.</li> <li>Heft parengê me hene; lê hût ew jimartine. Ji xwe re rahije yekî bilêz here mala xwe, berî go hût şiyar bibe.</li> <li>Jinik piştî go gotina xwe bi dawî dike, kulmek derzî, kulmek şûjin û qalîbek sabûnê jî dide keçikê. Dibêje keçikê dinyayê</li> </ul>	5

	hût şiyar bibe û bide dû te, hema ti jî va tiştê bavêje nigê wî.	
<b>RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Yekê got bi serê birayê xwe sûnd dixwim go min hîle nekiriye, keçika dî jî got bi serê birayê min, min jî hîle nekiriye û hema keçika dî jî eynî tişt got.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>EWLEKARÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Ew jî dirabe xwe diçikêne û hema dest bi paqijiyê dike, xwarina birayê xwe çê dike.</li> <li>• Dimeyzênin go mal paqij û germ e, xwarina wa jî hazir e.</li> <li>• Çawa go çav li hûtê heftserî dikan, her du bira dibin yek, dirajin şûrê xwe û serê hût dibirin.</li> </ul>	<b>3</b>

Li gorî Schwartz di çîroka hûtê heftserî de çar nirx hatine tespîtkirin. Bi tevahî li yanzdeh cihan ev nirx tînin dîtin ku du ji wan nirxa xwetêgihînê ye. Aferînerî, meraqkirin, serbestbûn, neqandina helwestên xwe, xweserbûn û rêzdariya li hemberî xwe ew nirxên binbeş ên nirxa xwetêgihînê ne. Di çîroka hûtê heftserî de li cihekî em rastî ‘neqandina helwestên xwe’ û li cihekî jî rastî ‘meraqqkirin’ê dibin;

“...Piştî go diya wê behsa birayê wê dike, keçik dixwaze go biçê cem birayê xwe.”  
(Neqandina helwestên xwe)

“...Go birayê wê diçin, keçik hejîra bi darê ve meraq dike û diçe hejîra kitikê dixwê.” (Meraqqkirin)

Di çîroka hûtê heftserî de nirxa herî zêde ku hatiye tespîtkirin nirxa xêrxwaziyê ye. Alîkarxwazî, dirustbûn, efûkerî, dilsozî/wefa, xwedî berpirsiyarîbûn, hevaltîyeke qewîn, hezkirina kemilî, jiyaneke bi manewî û jiyaneke bi wate ew nirxên binbeş ên nirxa xêrxwaziyê ne. Li pênc cihan em rastî vê nirxê dibin ku ji wan sê cihan alîkarxwazî tê fêmkirin û li her du cihên din jî efûkerî û hezkirina kemilî tê tespîtkirin;

“...Jinik çawa go çav li keçikê dike, dibêje dengê xwe dernexe, heke ti dengê xwe derxê ê hût şiyar bibe û bikevê dû te û yê te bikuje.” (Alîkarxwazî)

“...Jinik piştî go gotina xwe bi dawî dike, kulmek derzî, kulmek şûjin û qalibek sabûnê jî dide keçikê. Dibêje keçikê dinyayê hût şiyar bibe û bide dû te, hema ti jî va tiştê bavêje nigê wî.” (Alîkarxwazî)

“...Heft parengê me hene; lê hût ew jimartine. Ji xwe re rahije yekî bilêz here mala xwe, berî go hût şiyar bibe.” (Alîkarxwazî)

“...Diya wê tê balê, destê xwe ser serê wê re dibe.” (Hezkirina kemilî)

“...Diya wê dibêje ma min negot nebêje “Şoş”; lê dîsa jî pê de naxiyîde, dilê keça xwe nahêle û kerekî dî jê re çê dike.” (Efûkerî)

Li gorî Schwartz rêz û rêçik (kevneşopî) cureya nirxeke civakê ye û dîndarî jî nirxeke binbeş a kevneşopê ye. Di çîroka hûtê heftserî de li cihekî em rastî nirxa dîndariyê dibin ku bi têgeha “sûndxwarin” ê xwe daye der;

“...Yekê got bi serê birayê xwe sûnd dixwim go min hîle nekiriye, keçika dî jî got bi serê birayê min, min jî hîle nekiriye û hema keçika dî jî eynî tişt got.”

Ewlehiya netewî, daxwaza berdwamiya pergela civakî, paqijî, ewlehiya malbatê, li hemberî qencyê qencî, hesta sedeqatê, sexlambûn/Sihhetbûn û mehremiyet nirxên binbeş ên nirxa ewlekariyê ne. Di çîroka hûtê heftserî de li sê cihan ewlekarî hatiye tespîtkirin ku ji wan li du cihan nirxa paqijiyê û li cihekî nirxa ewlehiya malbatê hatiye dîtin;

“...Ew jî dirabe xwe diçikêne û hema dest bi paqijiyê dike, xwarina birayê xwe çê dike.” (Paqijî)

“...Dimeyzênin go mal paqij û germ e, xwarina wa jî hazir e.” (Paqijî)

“...Çawa go çav li hûtê heftserî dikin, her du bira dibin yek, dirajin şûrê xwe û serê hût dibirin.” (Ewlehiya malbatê)

## **2.3. Çîroka Mar û Du Bira**

### **2.3.1. Kurtiya çîroka mar û du bira**

Go hebu nebû go du bira hebûn, go dê û bavê wa her du jî mirîbûn û ev her du bira gundekî ji wa gunda, di xaniyekî kerpîçî de bûn. Erdekî wa yî biçûk hebû û ji xwe re genim diçandin. Guh didan vî erdê xwe û ji şeveqa heta êvara tê de dişuxilîn, da go gezek nanê xwe jê derxin. Ha wilo xwe xwedî dikirin.

Bi feqîrî bi rezilî xwe xwedî dikirin. Rojekê ji roja birayê biçûk diçe nav erda go erdê xwe bikolê. Wexta diçe nav erd çêlikekî mara dibîne, ew jî hema dirajiye û

dibêje hema ez ê xwedî bikim. Diraje wî çêlikê mar û têne malê; lê ji birayê xwe re nabêje go çêlikê mar aniye. Heke bêje birayê xwe, zane go birayê wî destûra wî nade

.....

Her roj bi hev re diştexilin û birayê biçûk wî derdixe derve wî digêrêne û car di wî têne malê beyî go birayê wî zanibe. Ez ji te re bêjim, hingî hevaltiye mar û wî birayê biçûk xurt dibe berî hev naçin ti devera, ew qasî hij hev du dikin. Birayê biçûk ji mar re her car dibêje;

- Tu çêlik bûyî û heta niha ti li ba min î. Ti birayê min û ez birayê te me.

Mar jî her car lê divegerand;

- Ez û ti heta hetayê destbirayê hev in.

Axirê wilo bi hev re rojê xwe derbas dikirin. Rojek ji rojan mar ji qurçika xwe derdikeve û birayê mezin wî dibîne, Wexta ku dibîne dirajê kevirê go wî bikuje. Hê wilo birayê biçûk tê û destê wî digire. Birayê mezin dibêje ma te hişê xwe xwariye bisekine ez bikujim an na ew ê me bikuje. Birayê biçûk dibêje;

- Çêlik bû û heta niha min ew xwedî kiriye. Ew hevalê min e û weke bira ye ji min re, ez nahêlim tu wî bikuje.

Birayê wî dibêje;

- Çawa heta niha te ew xwedî kiriye û te heya min pê nexistiye, ma ev e biratiya te?

Û ji heme radije kevir û li mar dixê. Kevir li dûvê mar dikevê û dûvê wî jê dibe. Mar jî bi wê janê diçe bi birayê mezin vedide û jehriya xwe diavêje laşê wî. Birayê mezin li wir dimire.

.....

Rojekê diçe ba marê xwe û jê re dibêje;

- Maro maro, me ji hev re got biraoo, tu bûyî bêdûvo ez mame bêbirao..Lê were em dîsa bibin destbirakê hev wek berê.

Mar jî lê divegerêne;

- Bira biraoo, me ji hev re gotibû destbiraoo, lê ez heta hetayê bêdûvo tu heta hetayê bêbiraoo. Tu ya rast bivê kengî em werin cem hev em ê birînê hev bênin bîra hev. Ji bo wilo tu li riya xwe ez li riya xwe.

Mar jî wilo got û di riya xwe de çû, careke dî hew pêjna wî hat. Û çîroka min jî kurt û kurmancî li vir xilas.

### 2.3.2. Di Çîroka mar û du bira de dahûrîna nirxên civakî

**Tablo 2.4: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Mar û Du Bira de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
XÊRXWAZÎ	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Tu ya rast bivê kengî em werin cem hev em ê birînê hev bênin bîra hev. Ji bo wilo tu li riya xwe ez li riya xwe.</li> <li>• Guh didan vî erdê xwe û ji şeveqa heta êvara tê de dişuxilîn, da ku gezek nanê xwe jê derxin.</li> <li>• Ji bo go dê û bavê wa nebû ev her dû bira meyla xwe dabûn hev û gelekî hij hev du dikirin.</li> <li>• Ez ji te re bêjim, hingî hevaltiye mar û wî birayê biçûk xurt dibe berî hev naçin ti devera, ew qasî hij hev du dikin.</li> <li>• Tu çêlik bûyî û heta niha ti li ba min î. Ti birayê min û ez birayê te me.</li> <li>• Ez û ti heta hetayê destbirayê hev in.</li> <li>• Ew hevalê min e û weke bira ye ji min re, ez nahêlim tu wî bikuje.</li> <li>• Lê were em dîsa bibin destbirakê hev wek berê.</li> <li>• Bira biraoo, me ji hev re gotibû destbiraoo.</li> </ul>	9
RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Bi mehan hezna birayê xwe dikşene; lê bêriya marê xwe jî dike.</li> </ul>	1

Di çîroka mar û du bira de li gorî Schwartz du cureyên nirxan tê dîtin; xêrxwazî û rêz û rêçik (Kevneşopî). Nirxa herî zêde ku hatiye tespîtkirin nirxa xêrxwaziyê ye ku li neh cihan hatiye dîtin. Alîkarxwazî, dirustbûn, efûkerî, dilsozî/wefa, xwedî berpirsiyarîbûn, hevaltiyeke qewîn, hezkirina kemilî, jiyaneke bi

manewî û jiyaneke bi wate nîrxên binbeş ên xêrxwaziyê ne. Di çîroka mar û du bira de li cihekî nîrxê dirustbûnê, li cihekî nîrxê xwedî berpirsyarîbûnê û li heft cihan jî nîrxê hevaltiya qewîn hatiye tespîtkirin. Nimûneya nîrxê “dirustbûn”ê;

“...Tu ya rast bivê kengî em werin cem hev em ê birînê hev bênin bîra hev. Ji bo wilo tu li riya xwe ez li riya xwe.”

Nimûneya nîrxê “xwedî berpirsyarîbûn”ê;

“...Guh didan vî erdê xwe û ji şeveqa heta êvara tê de dişuxilîn, da ku gezek nanê xwe jê derxin.”

Nimûneyên nîrxê “hevaltiya qewîn”;

“...Ji bo go dê û bavê wa nebû ev her dû bira meyla xwe dabûn hev û gelekî hij hev du dikirin.

“...Ez ji te re bêjim, hingî hevaltiya mar û wî birayê biçûk xurt dibe berî hev naçin ti devera, ew qasî hij hev du dikin.”

“...Tu çêlîk bûyî û heta niha ti li ba min î. Ti birayê min û ez birayê te me.”

“...Ez û ti heta hetayê destbirayê hev in.”

“...Ew hevalê min e û weke bira ye ji min re, ez nahêlim tu wî bikuje.”

“...Lê were em dîsa bibin destbirakê hev wek berê.”

“...Bira biraoo, me ji hev re gotibû destbiraoo.”

Kişandina hezna mirinê kevneşopeke dînî ya civakê ye û li gorî Schwartz jî dîndarî nîrxê binbeş a rêz û rêçikan (kevneşopî) e. Di çîroka mar û du bira de li cihekî ev nîrxê hatiye tespîtkirin;

“...Bi mehan hezna birayê xwe dikşêne; lê bêriya marê xwe jî dike.”

## **2.4. Çîroka Mîr û Du Diz**

### **2.4.1. Kurtiya çîroka mîr û du diz**

Hebû nebû go mîrek hebû, ma çî mîr bû; mîrekî bi deh zilamê qerese bû. Hingî ev mîr qeç, dilbirehm û destvekirî bû, çî feqîr û beleganzê bajêr hebana dihatin

qesra wî xwe têr dikirin. Kî hatiba ber deriyê mîr, qewêtiya mîr bû go ti kesî destvekirî neşyênin. Lewma kêfa xelkê jî ji mir re dihat û hurmet jê re digirtin. Lê wezîrê Mîr ji vê yekê diqehêrî, dihesidî.

.....

Piştî go xwe têr dikin ji qesra Mîr derdikevin û diçin ji xwe re diziyê dikin. Lê heya mîr jê nîne go ev her du xort diz in û diziya bajêr dikin. Jixwe mîr nizanîbû go ka ev her du xort kî ne û çî kar û barî dikin jî. Ji mîr wê ye go ev xort du xortên bê kes in û feqîr in. Me go ev her du xort diz in, lê ne bi eceba go herin tiştê zêde bidizin. Carna mirişkek, carna hin genim, carna şekalek diziya wa jî bi va tiştê bû. Rojekê ji roja dîsa ev her du xort tèn civata mîr; dixwin, divexwin, xwe têr dikin.

.....

Lewma feêlek tê bîra wî. Wezîrê mîr mêrekî xwedî erd û xanî bû û têra xwe malê wî jî hebû, lê çî feydê qesîs û çavbirçî bû. Ev çavbirçîbûna wî yekcar wî timakar dikir. Vêca wilo wezîr dirabe diçe odeya xezîneya mîr. Berî go kes bibîne dirajê gelek zêra û ji xwe re dihilêne. Roja dî diçe ba mîr û dibêje mîr;

- Mîrê min ev çiqas e go te ne hesebê xwe kiriye û ne jî te li xezîneya xwe pirsîye. Carê tu diçû te li xezîneya xwe dimêyzan çî kê mî çî ne kê mî e.

Mîr Jî dibêje;

- Erê welle te rast go, ev çiqas e go min lê nemêyzandiye. Ka îro em herin meyzênin.

Mîr diçe go xezîneya xwe meyzêne, ma çî bibîne..dibîne go ji zêrên wî kê mî bûne. Mîr zehf diqehêrê.

Dibêje wezîrê xwe;

- Va ye li ber çava ye go ketine diziya xezîneya min, divê ti wa kesa bibîne û wa bişenihênê.

Wezîr jî dibêje mîrê xwe ser çava û diçe. Piştî kêlîkekê wezîr divegerê ba mîrê xwe û dibêje mîr;

- Mîrê min ez zanim bê kê ketiye xezîneya te.

Mîr jixwe ji wezîrê xwe bawer e, çî dibêje jê yeqîn dike. Ew jî dibêjo naxwe kerem bike.

Wezîr dibêje;

- Wê rojê min bi guhê xwe bihîst go ew her du xort diçin diziya xelkê. Min di derheqê wa çû ji millet pirsî. Heçî wa nas dikir digotin ew diz in. Ma ka mîrê min te deriyê xwe ji va xorta re vekir lê ma tu zanê ka kî ne çî kes in?

Mîr hinekî difikire û wek go heq dide wezîrê xwe. Dibêje;

- Tu rast dibêje, ez nizanim ka kî ne çî kes in. Hebê nebe ew in dizê malê. Here bake wa û bila werin vir ; lê ti ti tiştî ji wa re nebêje.

Wezîr bi gotina mîr dike û diçe go wa her du xorta bêne. Wezîr diçe li wa her du xorta digere, dibîne û bi qepika wa digire, diêne ba mîr.

....

Her du xort ditirsin û bi ecêbmayî dibin. Yek ji wa xorta dibêje mîr;

- Mîrê min me digo qey tu kesekî zane yî, me tiştêkî wilo nekiriye û tu berî go baş zanibe ka mesele çî ye tu dixwaze me ciza bike.

Her du xort bi lavlavekê dixwazin bêjin mîr go wa tiştêkî wilo nekiriye. Vê carê xortê dî dibêje mîr;

- Mîrê min rast e em diziya bajêr dikin car carna, ew jî ne zêr in, hema tiştê bê qîymet in; lê kehniya go me jê vexwariye em kevirekî jî naavêjinê. Me nanê te xwariye, em ê çawa bêbextiyê li te bikin. Bê ji te re kî navê me bi diziyê daye, diz bixwe ew e.

Piştî gotina wî xortî Mîr hinekî dudilî dibe. Dibêje ma ne min ne tiştêkî dîtiye û ne jî bihîstiyê, ji xeynî gotina wezîrê xwe. Belkî jî wezîrê min derewa dike û ev xort bi heq bin. Di dile xwe de dibêje go ka ez va xorta bixime zindanê, heta go tiştêkî fêhm bikim.

.....

Axirê mîr dibakê wezîrê xwe û wezîr bixwe jî bêbextiya xwe qebûl dike. Mîr ji bo vê xayîntiyê, wezîrê xwe ji wezîrtiyê jî dûr dixwe û wî dixwe zindana xwe de jî. Her du

xorta jî azad dike. Mîr fêhm dike go ev her du xort xayîntiyê nakin. Bi şertê go diziya ti kesî dî nekin wezîr wa her du xorta têne qesra xwe û karekî jî dide wa. Ha halê xayîn û timakaran ev hal e û halê dirusta jî ev hal e. Çîroka mîn çû bi avê de, dê û bavê min çûne bi hacê de.

#### 2.4.2. Di çîroka mîr û du diz de dahûrîna nirxên civakî

**Tablo 2.5: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Mîr û Du Diza de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
<b>HÊZ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Hebû nebû go mîrek hebû, ma çi mîr bû; mîrekî bi deh zilamê qerase bû.</li> <li>• Lewma kêfa xelkê jî ji mir re dihat û hurmet jê re digirtin.</li> <li>• Wezîrê mîr mîrekî xwedî erd û xanî bû û têra xwe malê wî jî hebû.</li> </ul>	<b>3</b>
<b>SERKETIN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Go ev her du xort jî hingî jîr û henokoyî bûn, kêfa mîr ji wa re tê.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>HEZPERESTÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Gelek cara tên qesra mîr û mîr re dixwin vedixwin; henek meneka dikan û têra xwe kêfê dikan.</li> <li>• Rojekê ji roja dîsa ev her du xort tên civata mîr; dixwin, divexwin, xwe têr dikan.</li> </ul>	<b>2</b>
<b>GERDÛNÎBÛN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Xatir ji mîr dixwazin û diçin.</li> <li>• Mîr ji bo vê xayîntiyê, wezîrê xwe ji wezîrtiyê jî dûr dixwe û wî dixwe zindana xwe de jî. Her du xorta jî azad dike.</li> </ul>	<b>2</b>
<b>XÊRXWAZÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Hingî ev mîr qeç, dilbirehm û destvekirî bû, çi feqîr û beleganzê bajêr hebana dihatin qesra wî xwe têr dikirin.</li> <li>• Kî hatiba ber deriyê mîr, qewêtiya mîr bû go ti kesî destvekirî neşyênin.</li> <li>• Ma ka mîrê min te deriyê xwe ji va xorta re vekir lê ma tu zanê ka kî ne çi kes in?</li> <li>• Lê kehniya go me jê vexwariye em kevirekî jî naavêjinê.</li> <li>• Me nanê te xwariye, em ê çawa bêbextiyê li te bikin.</li> <li>• Bi şertê go diziya ti kesî dî nekin wezîr wa her du</li> </ul>	<b>7</b>

	<p>xorta têne qesra xwe û karekî jî dide wa.</p> <ul style="list-style-type: none"> <li>• Ha halê xayîn û timakaran ev hal e û halê dirusta jî ev hal e.</li> </ul>	
<b>RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Ew jî însan in û em ji wa ne çêtir in.</li> </ul>	<b>1</b>

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka mîr û du diz de şeş cureyên nirxan hatine tespîtkirin. Nirxa herî zêde ku hatiye dîtin xêrxwazî ye. Alîkarxwazî, dirustbûn, efûkerî, dilsozî/wefa ew nirxên binbeş ên xêrxwaziyê ne ku di çîrokê de li heft cihan hatine tespîtkirin. Nimûneyên nirxa “alîkarxwazî” yê;

“...Hingî ev mîr qeç, dilbirehm û destvekirî bû, çi feqîr û beleganzê bajêr hebana dihatin qesra wî xwe têr dikirin.”

“...Kî hatiba ber deriyê mîr, qewêtiya mîr bû go ti kesî destvekirî neşyênin.”

“...Ma ka mîrê min te deriyê xwe ji va xorta re vekir lê ma tu zanê ka kî ne çi kes in?”

Nimûneya nirxa ‘dirustbûn’ê;

“...Ha halê xayîn û timakaran ev hal e û halê dirusta jî ev hal e.”

Nimûneya nirxa “efûkerî” yê;

“...Bi şertê go diziya ti kesî dî nekin wezîr wa her du xorta têne qesra xwe û karekî jî dide wa.”

Nimûneyên nirxa “dilsozî/wefa” yê;

“...Lê kehniya go me jê vexwariye em keviyekî jî naavêjinê.”

“...Me nanê te xwariye, em ê çawa bêbextiyê li te bikin.”

Xwedî hêza civakî, dewlemendî û pejiwandina ji hêla mirovan ew nirxên binbeş ên hêzê ne ku di çîroka mîr û du diz de li sê cihan hatine tespîtkirin.

Nimûneya nirxa “dewlemendî” yê;

“...Wezîrê mîr mêrekî xwedî erd û xanî bû û têra xwe malê wî jî hebû.”

Nimûneya nirxa “xwedî hêza civakî” yê;

“...Hebû nebû go mîrek hebû, ma çi mîr bû; mîrekî bi deh zîlamê qerese bû.”

Nimûneya nirxa “pejirandina ji hêla mirovan”;

“...Lewma kêfa xelkê jî ji mir re dihat û hurmet jê re digirtin.”

Li gorî Schwartz zîrebûn nirxeke binbeş a serketinê ye. Di çîroka mîr û du diz de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Go ev her du xort jî hingî jîr û henokoyî bûn, kêfa mîr ji wa re tê.”

Zewq, stendina tehma jiyanê, zayendî nirxên binbeş ên hezperestiyê ne. Di çîroka mîr û du diz de nirxa zewq û stendina tehma jiyanê li du cihan hatiye tespîtkirin;

“...Gelek cara tîn qesra mîr û mîr re dixwin vedixwin; henek meneka dikin û têra xwe kêfê dikin.”

“...Rojekê ji roja dîsa ev her du xort tîn civata mîr; dixwin, divexwin, xwe têr dikin.”

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz berfirehbûna li hemberî fikrên nû, fezîletdarbûn, edaleta civakî, wekhevî, daxwaza cîhaneke bi aşitî, cîhaneke bi xweşî, yekbûniya bi xwezayê re, parastina xwezayê û ahenga navxweyî nirxên binbeş ên gerdûnîbûnê ne. Di çîroka mîr û du diz de li cihekî nirxa fezîletdarbûnê û li cihekî nirxa wekheviyê hatiye tespîtkirin;

“...Xatir ji mîr dixwazin û diçin.” (Fezîletdarbûn)

“...Mîr ji bo vê xayîntiyê, wezîrê xwe ji wezîrtiyê jî dûr dixwe û wî dixwe zindana xwe de jî. Her du xorta jî azad dike.” (Wekhevî)

Li gorî Schwartz nefsbîçûkî nirxeke binbeş a kevneşopê ye û di çîroka mîr û du diz de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Ew jî însan in û em ji wa ne çêtir in.”

## 2.5. Çîroka Mîr û Feqîr

### 2.5.1. Kurteya çîroka mîr û feqîr

Go hebû nebû, go feqîrek hebû. Go ev feqîr hengî feqîr bû nan nebû go bixwe. Ji ber vê feqîriya xwe şepirze û belangaz bû. Rojekê êdî hew îdare dike û qîrar dide go herê cem mîrê dewlemend. Wexta go diçe cem mîrê dewlemend mîr jê dipirse;

- Feqîr wa feqîr, ti çi dixwaze ti li çi digere?

Feqîr dibêje;

- Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.

Piştî vê gotinê feqîr tiştêkî dî nabêje. Dilê Mîr jî bi halê wî dişewitê û dibêje xulamê xwe ji feqîr re xwerin û avê bênin.

.....

Her car jî mîr jê dipirse;

- Feqîr wa feqîr, ti çi dixwaze ti li çi digere?

Feqîrê reben her carê eynî tiştî dibêje;

- Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.

Her carê go feqîr vê gotinê dike mîr polikekî zêr jî dide feqîr. Her cara go feqîr tê û mîr wilo pê re eleqadar dibe wezîre mîr jî êdî ji feqîr diqêherê. Wezîr di dilê xwe de dibêje, ev çend sal in go li ber destê mîr im û ez ew qas tiştê jê re dikim hê rojekê polikekî zêr nedaye min.

.....

Rojekê wezîr dibakê feqîr û jê re dibêje were li mala min xwarinê bixwe. Feqîrê behla ji qencya dilê xwe û ji dilsafitiya xwe dibêje qey wezîr zilamekî baş e û lewma diçe mala wî xwarinê. Axirê wezîr dibêje kebaniya xwe go hemû xwarina bi sîr çêke. Kebaniya wî jî xwarina go çê dike têr sîr dike. Piştî xwarinê wezîr dibêje feqîr;

- Birayê feqîr, xwarin bi sîr bû û ti zanê kesên derdorê çawa ji sîrê adiz in, lewma wexta go tu çûyî cem mîrê min şîreta min li te go ti destmalekê li ber devê xwe bipêçe, yan na mîr ê gelekî adiz bibe.

Feqîrê reben jî bi gotina wî dike û diçe cem mîr. Piştî go feqîr ji cem mîr derdikevê, wezîr diçe cem mîr û ji mîr dipirse;

- Mîrê min ma ti zanê ka çima ev feqîr devê xwe girtiye?

Ma mîr ji kû zanê. Mîr dibêje ma ez çi zanim. Wezîr dibêje;

- Mîrê min te ev qas qencî li wî feqîrî kir lê ew bi xwe piştê te re behsa te nebaşî dike. Destmal daniye ber devê xwe ji bo go digot bêhn û pûxara devê mîr neyê min. Ha ji bo wilo destmal daniye ber devê xwe.

Piştî vê gotinê mîr gelekî adiz dibe, dibêje naxwe ev feqîrê go min xwedî dikir nankor e. Li ser qaxezekê tişteki dinivîse û li hêviya wî feqîrî dimêne heta roja dî. Roja dî dîsa li ber nîvrokî feqîr tê qesra mîr. Dîsa xwarina xwe dixwe û mîr jê dipirse;

- Feqîrê belengaz li vê dinyayê çi qenc e?

Feqîr dîsa eynî tiştî dibêje;

- Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.

Mîr di dilê xwe dibêje, ev feqîrê ne weke xwe, çi ji qencyê fêhm dike go behsa qencyê dike; lê behsa tişteki dî jê re nakê.

.....

Wezîr ji feqîr dibêje ka ma mîr çi got çi negot. Feqîr jî hal û ehwalê dibêje. Wezîr dike go biteqê ji qehra. Ji wezîr wê ye go bi wê mektubê mîr ê erd û zêwiya bexşî feqîr bike. Lewma dibêje feqîr, ka wê qaxezê bide min, ez ê di bêdela te de karê mîr hal bikim. Feqîr çiqas dibêje na jî wezîr bela xwe jê navekê û kaxezê je distêne. Wezîr dirabe diçe cem wî kesê go mîr gotiye qaxezê bibe.

.....

Wezîr wê kêliye li wir dimire. Ji ber go di wê qaxezê de mîr emr daye go kesê vê qaxezê bêne werê kuştin. Axire wezîr bi derba xençerê dimire. Roja dî feqîr dîsa diçe

mala mîr, Wexta go mîr wî dibîne ecebmayî dibe. Mîr dibêje feqîr ka ma ti neçûyî cem wî zilamê go min gotiye te here balê. Feqîr jî dibêje;

- Mîrê min ez ji vir derketim go herim emirê te pêk bînim, lê wezîrê te nehişt go herim û got emirê mîrê xwe ez ê pêk bînim. Min jî go bila be.

Mîr jî dibêje;

- Wezîrê min got xebero te gotiye ji ber bêhn û pûxara mîr ez li ber devê xwe asê dikim, lewma min jî emirê kuştina te dabû lê va ye wezîr xwe bi xwe çûye mirina xwe.

Feqîrê behla hal û ehwalê ji mîr re dibêje û dibêje;

- Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.

Û çîroka min jî li vir xilas dibe.

### 2.5.2. Di çîroka mîr û feqîr de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.6: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Mîr û Feqîr de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
HÊZ	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Rojekê êdî hew îdare dike û qîrar dide go herê cem mîrê dewlemend.</li> <li>• Wexta go diçe cem mîrê dewlemend mîr jê dipirse.</li> </ul>	2
XÊRXWAZÎ	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.</li> <li>• Dilê Mîr jî bi halê wî dişewitê û dibêje xulamê xwe ji feqîr re xwerin û avê bînin.</li> <li>• Piştî go feqîr xwarina xwe dixwe mîr polikekî zêr jî dide wî û wî dişyêne malê.</li> <li>• Her roj êdî feqîr diçe mala mîr û mîr jî wî têr dike û polikekî zêr dide wî.</li> <li>• Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.</li> <li>• Her carê go feqîr vê gotinê dike mîr polikekî zêr jî dide feqîr.</li> <li>• Her cara go feqîr tê û mîr wilo pê re eleqadar dibe.</li> </ul>	10

	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Mîrê min te ev qas qencî li wî feqîrî kir lê ew bi xwe piştê te re behsa te nebaşî dike.</li> <li>• Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.</li> <li>• Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.</li> </ul>	
RAJÊRÎBÛN (RÎAYET)	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Wezîr di dilê xwe de dibêje, ev çend sal in go li ber destê mîr im û ez ew qas tiştê jê re dikim.</li> <li>• Birayê feqîr, xwarin bi sîr bû û ti zanê kesên derdorê çawa ji sîrê adiz in, lewma wexta go tu çûyî cem mîrê min şîreta min li te go ti destmalekê li ber devê xwe bipêçe.</li> <li>• Feqîr jî dibêje serçavê min Mîrê min.</li> <li>• Mîrê min ez jî vir derketim go herim emirê te pêk bînim</li> </ul>	4

Li gorî Schwartz di çîroka mîr û feqîr de sê cureyên nirxan hatine tespîtkirin; hêz, xêrxwazî û rajêrbûn. Di nav van cureyên nirxan de nirxa herî zêde ku hatiye dîtîn nirxa xêrxwaziyê ye. Li deh cihan ev nirxa xêrxwaziyê hatiye tespîtkirin û li her deh cihan de jî nirxa alîkarxwaziyê a binbeşa nirxa xêrxwaziyê hatiye dîtîn. Di çîrokê de hevokeke ku behsa qencyê dike, li sê cihan bi heman hevokê hatiye nivîsin. Ev jî dide nîşandan ku nirxa alîkarxwaziyê hatiye kirpandin. Nimûneyên nirxa alîkarxwaziyê;

“...Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.”

“...Dilê Mîr jî bi halê wî dişewitê û dibêje xulamê xwe ji feqîr re xwerin û avê bînin.”

“...Piştî go feqîr xwarina xwe dixwe mîr polikekî zêr jî dide wî û wî dişyêne malê.”

“...Her roj êdî feqîr diçe mala mîr û mîr jî wî têr dike û polikekî zêr dide wî.”

“...Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.”

“...Her carê go feqîr vê gotinê dike mîr polikekî zêr jî dide feqîr.”

“...Her cara go feqîr tê û mîr wilo pê re eleqadar dibe.”

“...Mîrê min te ev qas qencî li wî feqîrî kir lê ew bi xwe piştê te re behsa te nebaşî dike.”

“...Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike”

Li gorî Schwartz dewlemendî hêz e û ev jî nirxeke civakî ye. Di çîroka mîr û feqîr de li du cihan nirxa dewlemendiyê hatiye tespîtkirin;

“...Rojekê êdî hew îdare dike û qîrar dide go herê cem mîrê dewlemend.”

“...Wexta go diçe cem mîrê dewlemend mîr jê dipirse.”

Kubarî, îtaatkarî, qedirdayîna li hemberî dê û bavan û pîr û kalan, bixwekarîn/xwekontrolkirin nirxên binbeş ên rajêrbûnê ne. Di çîroka mîr û feqîr de li cihekî nirxa kubarî û li sê cihan jî nirxa îtaatkariyê hatiye tespîtkirin. Nimûneya nirxa “kubarî”yê;

“...Birayê feqîr, xwarin bi sîr bû û ti zanê kesên derdorê çawa ji sîrê adiz in, lewma wexta go tu çûyî cem mîrê min şîreta min li te go ti destmalekê li ber devê xwe bipêçe.”

Nimûneyên nirxa “îtaatkarî”yê;

“...Wezîr di dilê xwe de dibêje, ev çend sal in go li ber destê mîr im û ez ew qas tiştê jê re dikim.”

“...Feqîr jî dibêje serçavê min Mîrê min.”

“...Mîrê min ez ji vir derketim go herim emirê te pêk bînim”

## **2.6. Çîroka Pîrê û Rovî**

### **2.6.1. Kurteya çîroka pîrê û rovî**

Go hebû nebû, go pîrek hebû. Go mîrê vê pîrê çûbû ber rehma Xwedê û zarokê wê jî zewicî bûn, bûbûn xwedî malê xwe. Vê pîrê jî ji xwe mastê xwe çê dikir û carna jî mastê zêde dibir û dibêdela wê de ji xwe re genim dianî

.....

Rojekê ji roja Xwedê dîsa mastê xwe xistibû tenûrê û diçe go mastê xwe ji tenûrê derxê. Çawa go çavê wê li mastê wê dikevê dibîne go mastê wê jê kêmbûye û tevdebelayî bûye

.....

Carek du cara sê cara çar cara.. îda dibîne go gelek cara mastê wê jê hatiye xwarin.  
Pîrê jî her carê dibêje;

- Na gidî na, wilo nabê; meseleyek di vê de heye.

Pîrê jî radije qurmekî dara û piştî go mastê xwe dixê tenûrê, nobetê lê digire.

.....

Rovî çawa go ji tenûrê derdikevê, Pîrê qurmê dar li dûvê wî dixê û dibêje;

- Hey roviyê pîs î heram, qey tu fihêt nakê mastê min didize?

Rovî bê dûv dimêne û ji tirsê baz dide û diçe ba hevalê xwe. Hevalê wî çawa go çav  
lê dîkin pê dîkenin û henekê xwe pê dîkin. Hemû jê re dibêjin;

- Qûto qûto rovî qûto, di bin de xwekuto..

Rovî ji bo go hevalê wî henekê xwe pê dîkin zehf diqehere lê nizane çî ji wa bike.  
Ew ji radibe diçe ba Pîrê. Dibêje Pîrê;

- Pîrê pîrê ez qurbanê ka dûvê min pê ve bike, ez diçim ba hevala heval henekê  
xwe bi min dîkin.

Pîrê jî jê re dibêje;

- Te ew qas mastê min berî min xwar, ma wilo hesanî ye ez dûvê te bi te ve  
bikim, here ji min re şîrê min bêne, ez ê jî te efû bikim û dûvê te bi te ve  
bikim.

Rovî ma çî bike, radibe diçe ba bizinê û dibêje bizinê;

- Bizinê bizinê ez heyranê.. ka bidime hinek şîr, ez ê bidim Pîrê, Pîrê yê dûvê  
min pê ve bike. Ez diçim nav hevala heval henekê xwe bi min dîkin.

.....

Rovî ma çî bike, dirabe diçe ba darê, dibêje darê;

- Darê darê ez qurbanê, ka bide min çîlo, ez ê bidim bizinê, bizinê bide min  
şîr, ez ê şîr bidim Pîrê, Pîrê yê bide min dûvê min. Ez diçim nav hevala heval  
henekê xwe bi min dîkin.

Darê jê re dibêje;

- Roviyo roviyo, roviyê dûvquto.. here ji min re bêne dasê, ez ê jî bidime te çilo.

Ma roviyê reben çî bike. Hema ji xwe re dibêje, ma min çî bêaqilî kiribû, ketim dizîya Pîrê. Radibê diçe ba hedat, dibêje hedat,

- Hedato ez qurbano bide min dasekê, ez ê bidim darê, dar ê bide min çilo, ez ê çilo bidim bizinê, bizin ê bide min şîr, ez ê şîr bidim Pîrê, Pîrê yê bide min dûvê min. Ez diçim nav hevala heval henekê xwe bi min dikin.

.....

- Birako ez qurbano bide min avê, ez ê avê bidime hedat, hedat ê bide min dasê, ez ê dasê bidim darê, dar ê bide min çilo, ez ê çilo bidim bizinê, bizin ê bide min şîr, ez ê şîr bidim Pîrê, Pîrê yê bide min dûvê min. Ez diçim nav hevala heval henekê xwe bi min dikin.

Zilam jî jê re dibêje;

- Naxwe here bêne solekê, ez ê bi wê solê pêl banê enzelê bikim da go avê bidim te.

Roviye reben yekcar şepirze dibe û di dilê xwe dibêje, ma min çî bêaqilî kiribû, ketim dizîya Pîrê. Lê çî bike diçe ba solfiroş. Xwedêkirî solfiroş vê carê tiştêkî jê naxwaze, dilê solfiroj pê dişewite û sola dideye. Rovî radibe diçe solê dide wî zilamê li ber enzelê. Zilam avê dideye, rovî diçe avê dide hedat.

.....

Wexta tê ba hevalê xwe hevalê wî bi dûvê wî ecebmayî dibin. Yek ji wî alî dibe ka te dûvê xwe çawa çê kir, yê dî ji aliyekî ve dibêje Roviyo qurbano ka te çilo dûvê xwe çê kiribe ji me re jî çê bike.

.....

Rovî jî ji forsa dûvê xwe diçe û tê û ji bo go ji wa qeherîbû bi qestî dibêje hevalê xwe;

- Ez zanim bê ka çawa yê dûvê we xweşik bibe. Herin bikevine wî çemê hanê û heta sibehî tê de bin. Wexta go bû şeveq dûvê we ê weke yê min xweşik bibe.

Hevalê wî jî ji girgirê hev berî go zanibin ka rovî rast dibêje yan na, diçin dikevin çem de. Ma ne zivistan e û çem ji êvara heta sibeha qeşa digire. Wexta dibê şeveq dûvê hevalê wî hemûya qeşa digire, ji serma nikarin bimeşin heta rojekê. Û çîroka me jî li vir xilas.

### 2.6.2. Di çîroka pîrê û rovî de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.7: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Pîrê û Rovî de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
GERDÛNÎBÛN	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Pîrê diraje şîrê xwe û dûvê rovî pê ve dike. Ma ne soza xwe dabû.</li> </ul>	1
XÊRXWAZÎ	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Here ji min re şîrê min bêne, ez ê jî te efû bikim û dûvê te bi te ve bikim.</li> <li>• Xwedêkirî solfiroş vê carê tiştêkî jê naxwaze, dilê solfiroj pê dişewite û sola dideye.</li> <li>• Pîrê jî dibêje bila xêra min be û bi meherk (Morîk) û tiştik û miştika dûvê rovî dixemilêne.</li> </ul>	3

Di çîroka pîrê û rovî de li gorî pîvana nirxan a Schwartz du cureyên nirxan hatine tespîtîkirin. Nirxa herî zêde ku hatiye dîtin xêrxwazî ye û alîkarxwazî û efûkerî nirxên binbeş ên nirxa xêrxwaziyê ne. Li sê cihan ev nirx hatiye tespîtîkirin ku li cihekî nirxa efûkerî û li du cihan jî nirxa alîkarxwazî ye. Nimûneyên nirxa “alîkarxwazî” yê;

“...Xwedêkirî solfiroş vê carê tiştêkî jê naxwaze, dilê solfiroj pê dişewite û sola dideye.”

“...Pîrê jî dibêje bila xêra min be û bi meherk (Morîk) û tiştik û miştika dûvê rovî dixemilêne.”

Nimûneya nirxa “efûkerî” yê;

“...Here ji min re şîrê min bêne, ez ê jî te efû bikim û dûvê te bi te ve bikim.”

Sozdayîn û bicihanîna sozan fezîletdarbûn e û li gorî Schwartz fezîletdarbûn nirxeke binbeş a gerdûnîbûnê ye. Di çîroka pîrê û rovî de li cihekî em rastî vê nirxê dibin;

“...Pîrê diraje şîrê xwe û dûvê rovî pê ve dike. Ma ne soza xwe dabû.”

## **2.7. Çîroka Seyrê û Eliyê Mamed**

### **2.7.1. Kurteya çîroka seyrê û eliyê mamed**

Go hebû nebû go keçeke bi navê Seyranê hebû lê li gund her kesî jê re digo Seyrê. Seyrê xwedî du biraya bû; birayekî wê yê bi navê Qo Qasim birayê wê yê heq bû û birayê wê bi navê Hiso jî birayê wê yê ne heq bû, yanî birayê wê yê jinbavê bû. Ne diya Seyrê hebû ne bavê wê, ne jinbava wê û ne jî xwehên wê hebûn. Ew û her du birayên xwe û keçikeke cariya wê hebûn. Ji ber go bavê Seyrê zilamekî dewlemend, mezin û bi nav û deng bû piştî go bavê wê miriye jî birayên wê ketine şûna bavê xwe.

.....

Axirê pismamekî Seyrê hebû go Seyrê ne wî nas dikir û ne jî ew dîtibû. Ev pismamê wê yî go navê wî Eliyê Mamed bû xortekî 20 salî, xweşik, lihevhatî û camêrek ji camêran bû. Min go Seyrê ew nas nedikir, erê Seyrê ew nas nedikir û bi çavê seriya jî ew neditîbû. Ji bo go wa çaxa Eliyê Mamed hê di pêçekê de bû dê û bavê wî bi êşa zirav ketibûn û rehmet kiribûn. Lewma birayê Seyrê Qo Qasim wî têne ba xwe û wî xwedî dike.

.....

Rojekê ji rojan Seyrê û keçika li ber destê wê li ber şibakê ji xwe re dirûnin û ji xwe re li hewşê dimeyzênin. Seyrê dibîne go xortek tê hewşê û kîsekî dideyne û diçe. Seyrê ji keça li ber destê xwe dipirse bê ka ew kî ye. Keçik dibêje go ew pismamê wê ye û filan bêvan. Seyrê dikevê meraqa pismamê xwe de û eqlê wê li pismamê wê

dimêne. Diçe û tê hema dibêje ev çi xortê qeşeng, xweşik û lihevhatî. heta niha çima kesî behsa wî ji min re nekir? Seyrê teliya talî xwe nagire û ji cariya xwe re dibêje;

- Te bi Xwedêkî ka bangî pismamê min bike, ez ê çend gotinan jê re bikim.

Cariya wê bi ya wê dike û diçe bangî pismamê wê dike. Pismamê wê bi fêhtokî diçe cem Seyrê. Seyrê çawa ku wî dibîne dilê wê dixûmxûmê, hema wilo kelocanek xwe lê digire. Axirê pismamê wê tê û li kêlaka wê dirûne. Hal û hewalê hev dipirsin û Seyrê hema jê re dibêje;

- Tu pismamê min î û ji her kesî çêtir î ji min re, kêliya go min tu dîtiye ve dilê min ketiya te û were min bixwaze, heke dilê te hebê tu ji min re ez ji te re.

Eliyê Mamed xortekî ji xwefedî bû, nizanîbû çi bêje; lê ji aliyekî ve jî dotmama wî xweşik û esîl bû, wek go dil jî ketiya de. Serê xwe rakir û ji dotmama xwe re got;

- Tu dotmama min î û ji min re ji her kesî çêtir î; lê ez ne xwedî tiştêkî me, tiştêkî min nîne ma ka birayê te yê çawa te bidin min. Birayê te yê li qerşî vî tiştî bin, a baş em vî tiştî ji bîr bikin.

Seyrê keça delalî bû, her tiştê wê hetabû serî, ma yê çawa ji va gotinê Eliyê Mamed qayîl bibe!

.....

Axirê çîroka min dirêj e. Seyrê û Eliyê Mamed digihin hev û ji gund derdikevin. Piştî go ji gund derdikevin Eliyê Mamed ji Seyrê dipirse, dibêje ka vêca em ê bi kû ve herin. Seyrê dibêje;

- Li Mîdyadê min navê kesekî bihîstiye, birayê min Qo Qasim jî wî nas dike, axa ye û ew va meseleyê wilo ji safî dike, xelkê li hev têne. Em herin xwe li wî bigirin, heta go hêrsa birayên me sivik bibe.

Eliyê Mamed jî ji bo ku kesî nas nake ji neçarî bi ya Seyrê dike û berê xwe didene Mîdyadê. Ta bi mala axê diçin, dibêjin axayekî bi navê Hesen e û bi nav û deng e. Diçin mala axê û hal hewalê xwe jê re dibêjin. Xwe dispêrin axê heta go birayên Seyrê wa efû bike; lê piştî go axê Seyrê dibîne dil dikevê Seyrê. Qaşo sê jinê axê hene; lê çawa go çav li Seyrê dikevê har û dîn dibe, dibêje divê Seyrê bibe jina min a çaran. Ji ber vê yekê axê ewilî wan dixapêne û xwe li ber çavê wa şêrin dike, dibêje

ser sera ser çavan heta hûn bixwazin hûn mêvanê min in. Helbet Seyrê û Eliyê Mamed jî ji axê bawer dikin û li wir dimênin.

.....

Seyrê bi hewar û girî nizane çî bike. Dibîne go birastî jî pismamê wê li ber mirine ye, ew jî xwe ji nav destê axê xelas dike û direve diçe. Jixwe ma ne me got Eliyê Mamed, ew xortê bîst salî nestêleh piştî reva Seyrê diçe ber rehma Xwedê. De vêca werîn li birîna Seyrê meyzênin.

Seyrê diçe û hey diçe, ber bi çola ve û li ser zimanê wê tenê hewara wê ye;

- Lo pismamo, lo pismamo. kêlikê em bi hev şa nebûn pismamo..Lo qurbano lo ciwano, ev bejn û bal çawa dikevê bin erdê..

Seyrê bi vê gotinê diçe û hey diçe, bi roj û şev. Çiya û çola derbas dike. Roj bi roj cilên lê kevn dibin, çavê wê ji girî xera dibin, eyn wek pîrê heftê salî lê tê. De vêca bêjim guhdarvanino, heke ez ne şaş bim roj û meh derbas dibin û Seyrê li çiyayekî di şikeftê de xwe dihilêne. Cara go birçî jî dibe giyayê li çiyê dide hev û ji xwe re dixwe; lê ez ji te re bêjim, tu dibe qey ev keça xweşik û nazik çûye û ji bêdala wê jineke dî jihevketî hatiye, êşa wê ew qasî wê daye erdê.

.....

Meh derbas bûn, sal derbas bûn..Seyrê hê jî li wî çiyayî di halê xwe de bû û hezna pismamê xwe dikişand. Axîna wê li wî çiyayî belav dibû. Rojekê dîsa dilorand;

- Pismamo lo pismamo, rojekê em bi hev şa nebûn pismamo, heta ez sax im te ji bîr nakim pismamo..

Seyrê digot û pê re digirî. Wê kêliya go Seyrê digot û digirî feqehê di wê riyê re derbas dibe û dengê Seyrê dibihîze. Te dî carê feqeh hebûn, ji gundekî diçûn gundekî, ji barekî diçûn bajarekî, lê bi paya. Vêca bêjim, feqe pêşî fêhm nakê ka ev dengê çî ye, dengê kê ye; lê li derdora xwe dimeyzêne û dibîne go jineke bi cilê kevnok e û digirî. Dirabe diçe ba Seyrê û jê dipirse ka ev çî derdê wê heye.

.....

Derwîş dikevê rê.. Roj û meha di rê dimêne û taliya talî digihe gundê Seyrê. Ji gundiya mala Seyrê dipirse, gundî rê şanî dikin. Feqe diçe mala Seyrê û dibîne go zilamek li nav bexçe ye û li ber dara dikolê. Ev zilam birayê Seyrê yê jinbavê Hiso ye. Axir silavê dideye û jê re dibêje go ew birayê Seyrê digere. Zilam jî bi qestî nabêje go ew birayê Seyrê ye, xwe bêrî dike û weke go Seyrê nas nakê tevdigerê. Feqe dirabe derdikeve û leqayî gundiyeke dibe. Ji gundî re hal û hewalê dibêje.

.....

Qo Qasim jî dirabe divegere gund. Qo Qasim mêrekî dirist bû, lewma gundiya lihev digihêne hev, da go ji wa re her tiştî bêje û dû re dibêje;

- Mesele ev e camêrno. Du ciwan xwe li axeyekî digirin go wan xilas bike, ew çi dike, radibe xayîntiye li wa dike û di ser hala de ciwanekî qetil dike. Ka însaniyeta vî zilamî? Ez ê rabim herim xwîna pismamê xwe li erdê nehêlim. Ji nav we kesê go bixwaze bi min re werê bila werê, kesê go nexwaze jî ez ji wa bê gazin im.

Qo Qasim zilamekî bi dilrehm bû, her car alîkariya gundiya kiribû û bi edalet bû. Lewma ji xeynî du sê zilama hemûya xwe bi Qo Qasim re kar kir. Qo Qasim û gundî xwe bi çek kirin û dane ser riya Mîdyadê. Me go Qo Qasim zilamekî bi dilrehm bû, ji xeynî vê jî şehreza û baqil bû. Wexta go gihane Mîdyadê ji gundiya re dibêje;

- Camêrno em hatin lê heke em bi vî şiklî bangî vî axayî bikin, ew ê fêhm bike go ji bo heyfê em hatine û ew ê jî bi çek werê. Hûn bi min re hatine lê naxwazim tiliya we hilpekê. Lewma em ê xeberê jê re bişyênin go ez hatime malavayiyê lê bikim, ji bo go namûsa me paqij kiriye. Ez bawer im bi vê xeberê ew ê bixapê.

Qo Qasim piştî vê gotinê zilamekî dişyêne ba axê û kara xwe dikin. Zilamê go şiyandine ba axê vedigere û dibêje axê gotiye ser sera ser çava bila kerem bikin werin filan deverê. Qo Qasim û gundî radibin diçin. Dibînin go axê jî hatiye wir. Qo Qasim pêşî di kîsikekî biçûk de xelatekê dide axê û dibêje;

- Ez vê xelatê didim te go tu qebûl bike, ev xeleta min a ji bo malavayiya min e go te namûsa min li erdê nehişt.

Axê kêfxweş dibe û forsa wî lê zêde dibe. Hê wilo Qo Qasim bi qerpika wî digire û lê dide, wî dide erdê. Têra xwe gotinan jê re dike û xençerê nivê dilê wî dixê. Axê li wir dimire û Qo Qasim û gundiye xwe bilêz ji wir derdikevin. Piştî ku heyfa xwe hilanî, Qo Qasim êdî dibêje gundiya;

- Hûn bi min re hatin, zanim ev rêyeke nevegerê bû lê dîsa we camêriya xwe kir; lê êdî ez ê herim bi xweha xwe Seyrê ve. Hûn vegerin gund û mala we hemûçka ava.

.....

Dibîne go jineke jihevketî, bi cilê kevnok ji xwe re dengêkî lawaz distire. Wexta go Qo Qasim hineke dî ber bi deng ve diçe, fêhm dike go ev xweha wî Seyrê ye. Hingî rûyê wê guheriye wî ew nas nekiribû. Qo Qasim dibake Seyrê. Seyrê çawa dengê wî dike dengê wî nas dike û ew jî ber bi birayê xwe ve diçe. Her du jî digirîn û hev hembêz dikin. Piştî kelîkekê didin rê go vegerin gundê xwe û çîroka min li vir xilas û canê we jî sax.

### 2.7.2. Di çîroka seyrê û eliyê mamed de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.8: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Seyrê û Eliyê Mamed de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
HÊZ	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Ji ber go bavê Seyrê zilamekî dewlemend, mezin û bi nav û deng bû piştî go bavê wê miriye jî birayên wê ketine şûna bavê xwe.</li> <li>• Lewma hê jî birayên wê û ew wek mezinên gund dihatin hesabandin.</li> </ul>	2
SERKETIN	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Axa ye û ew va meseleyê wilo ji safî dike, xelkê li hev têne.</li> <li>• Me go Qo Qasim zilamekî bi dilrehm bû, ji xeynî vê jî şehreza û baqil bû.</li> </ul>	2
ŞIYARKIRIN/ HIŞYARKIRIN	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Seyrê çawa ku wî dibîne dilê wê dixûmxûmê, hema wilo kelocanek xwe lê digire.</li> <li>• Piştî vê gotinê Seyrê dibêje naxwe min birevêne û em herin ji xwe re gundekî dî.</li> </ul>	3

	<ul style="list-style-type: none"> <li>Hê wilo Qo Qasim bi qerpika wî digire û lê dide, wî dide erdê.</li> </ul>	
<b>XWETÊGIHÎN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Seyrê dikevê meraqa pismamê xwe de û eqlê wê li pismamê wê dimêne.</li> <li>Hema ew jî dibêje naxwe bila soza min be îşev xwe kar bike ez ê werim te birevênim.</li> <li>Seyrê û Eliyê Mamed digihin hev û ji gund derdikevin.</li> <li>Ew jî xwe ji nav destê axê xelas dike û direve diçe.</li> <li>Seyrê bi vê gotinê diçe û hey diçe, bi roj û şev. Çiya û çola derbas dike.</li> <li>Gundî êdî divegerin gund û Qo Qasim jî dikevê rê ber bi çiyaya ve. Ez dibêim qey roj û meh derbas dibe.</li> </ul>	<b>6</b>
<b>GERDÛNÎBÛN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Ji nav we kesê go bixwaze bi min re werê bila werê, kesê go nexwaze jî ez ji wa bê gazin im.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>XÊRXWAZÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Xwe dispêrin axê heta go birayên Seyrê wa efû bike.</li> <li>Her û her dibêje gundiyan xwezî min zanîba ka li kû ne, welleh billeh min ew nedikuştin, min ê ew efû kiriba.</li> <li>Dilê feqe bi Seyrê dişewitê, dixwaze alîkariyê bike û dibêje bila be, heke ez nemirim ez ê ricaya te bigihênim birayê te.</li> <li>Ka were ez te bibim ba lê, hema belkî bi vê xeberê kêfxweş be.</li> <li>Qo Qasim mêrekî dirust bû, lewma gundiya lihev digihêne hev, da go ji wa re her tiştî bêje.</li> <li>Her du jî digirîn û hev hembêz dikin.</li> </ul>	<b>6</b>
<b>RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Axê û Eliyê Mamed dikin go limêja êvarî bikin.</li> <li>Ew xortê bîst salî nestêleh piştî reva Seyrê diçe ber rehma Xwedê.</li> </ul>	<b>2</b>
<b>EWLEKARÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Elî dibîne go nêta axê xerab e, di wî halê ber mirinê de dibêje Seyrê tu bireve here.</li> <li>Malavayiya xwe li derwiş dike go ev qenci lê kiriye û dixwaze go wî feqeyî biezimêne heta çend roja.</li> </ul>	<b>2</b>

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka Seyrê û Eliyê mamed de heşt cureyên nirxan hatine tespîtkirin; hêz, serketin, şiyarkirin, xwetêgihîn, gerdûnîbûn, xêrxwazî, ewlekarî, rêz û rêçik. Ji nav van cureyên nirxan nirxên herî zêde ku hatine dîtîn xêrxwazî û xwetêgihîn e.

Nirxên binbeş ên xêrxwaziyê ku di çîroka Seyrê û Eliyê Mamed de hatine tespîtkirin jî ev in; alîkarxwazî, efûkerî, dirustbûn, hezkirina kemilî;

“...Xwe dispêrin axê heta go birayên Seyrê wa efû bike.” (Efûkerî)

“...Her û her dibêje gundiyan xwezî min zanîba ka li kû ne, welleh billeh min ew nedikuştin, min ê ew efû kiriba.” (Efûkerî)

“...Dilê feqe bi Seyrê dişewitê, dixwaze alîkariyê bike û dibêje bila be, heke ez nemirim ez ê ricaya te bigihênim birayê te.” (Alîkarxwazî)

“...Ka were ez te bibim ba lê, hema belkî bi vê xeberê kêfxweş be.” (Alîkarxwazî)

“...Qo Qasim mêrekî dirust bû, lewma gundiya lihev digihêne hev, da go ji wa re her tiştî bêje.” (Dirustbûn)

“...Her du jî digirîn û hev hembêz dikin.” (Hezkirina kemilî)

Aferînerî, meraqkirin, serbestbûn, neqandina helwestên xwe, xweserbûn, rêzdariya li hemberî xwe ew nirxên binbeş ên nirxa xwetêgihînê ne. Di çîroka Seyrê û Eliyê Mamed de nirxên binbeş ên xwetêgihînê ku hatine tespîtkirin ev in;

“...Seyrê dikevê meraqa pismamê xwe de û eqlê wê li pismamê wê dimêne.” (Meraqkirin)

“...Hema ew jî dibêje naxwe bila soza min be îşev xwe kar bike ez ê werim te birevênim.” (Neqandina helwestên xwe)

“...Seyrê û Eliyê Mamed digihin hev û ji gund derdikevin.” (Xweserbûn)

“...Ew jî xwe ji nav destê axê xelas dike û direve diçe.” (Xweserbûn)

“...Seyrê bi vê gotinê diçe û hey diçe, bi roj û şev. Çiya û çola derbas dike.” (Xweserbûn)

“...Gundî êdî divegerin gund û Qo Qasim jî dikevê rê ber bi çiyaya ve. Ez dibêm qey roj û meh derbas dibe.” (Xweserbûn)

Xwedî hêza civakî, dewlemendî, parastina statûya civakî, pejirandina ji hêla mirovan, xwedî otorîtebûn nirxên binbeş ên nirxa hêzê ne. Di çîroka Seyrê û Eliyê Mamed de li du cihan ev nirx tê tespîtîkirin ku yek jê dewlemendî ya din jî pejirandina ji hêla mirovan e;

“...Ji ber go bavê Seyrê zilamekî dewlemend, mezin û bi nav û deng bû piştî go bavê wê miriye jî birayên wê ketine şûna bavê xwe.” (Dewlemendî)

“...Lewma hê jî birayên wê û ew wek mezinên gund dihatin hesabandin.” (Pejirandina ji hêla mirovan)

Serkeftîbûn, şarezabûn, bûyîna kesekî ku gotina wî/wê nayê şikandin, zîrekbûn nirxên binbeş ên nirxa serketinê ne. Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka Seyrê û Eliyê Mamed de li du cihan nirxa serketinê hatiye tespîtîkirin;

“...Axa ye û ew va meseleyê wilo ji safî dike, xelkê li hev têne.” (bûyîna kesekî ku gotina wî/wê nayê şikandin)

“...Me go Qo Qasim zilamekî bi dilrehm bû, ji xeynî vê jî şehreza û baqil bû.” (Şarezabûn)

Wêrekî, jiyîna jiyaneke guhêrok, xwedî jiyîneke bi kelocan nirxên binbeş ên nirxa şiyarkirinê ne. Di çîroka Seyrê de li sê cihan ev nirx tê tespîtîkirin;

“...Seyrê çawa ku wî dibîne dilê wê dixûmxûmê, hema wilo kelocanek xwe lê digire.” (Xwedî jiyaneke bi kelocan)

“...Piştî vê gotinê Seyrê dibêje naxwe min birevêne û em herin ji xwe re gundekî dî.” (Jiyîna jiyaneke guhêrok)

“...Hê wilo Qo Qasim bi qerpika wî digire û lê dide, wî dide erdê.” (Wêrekî)

Berfirehbûna li hemberî fikrên nû nirxeke binbeş a gerdûnîbûnê ye. Di çîroka Seyrê de li cihekî ev nirx tê tespîtîkirin;

“...Ji nav we kesê go bixwaze bi min re werê bila werê, kesê go nexwaze jî ez ji wa bê gazin im.”

Dîndarî nirxeke binbeş a rêz û rêçikan e. Di çîroka Seyrê de li du cihan ev nirx hatiye tespîtîkirin û tê dîtin ku li her du cihan jî têgehên dînî hatiye bikaranîn;

“...Axê û Eliyê Mamed dîkin go limêja êvarî bikin.”

“...Ew xortê bîst salî nestêleh piştî reva Seyrê diçe ber rehma Xwedê.”

Ewlehiya malbatê, li hemberî qencyê qencî du nîrxên binbeş ên nîrxê ewlekariyê ne. Di çîroka Seyrê de li du cihan em rastî vê nîrxê dibin;

“...Elî dibîne go nêta axê xerab e, di wî halê ber mirinê de dibêje Seyrê tu bireve here.” (Ewlehiya malbatê)

“...Malavayiya xwe li derwîş dîke go ev qenci lê kiriye û dixwaze go wî feqeyî biezimêne heta çend roja.” (Li hemberî qencyê qencî)

## **2.8. Çîroka Stêrka Zêra**

### **2.8.1. Kurtiya çîroka stêrka zêra**

Go hebû nebû, keçikeke bi navê Stêrka Zêra hebû û xweha heft biraya bû. Go rojekê keçikê gûnd hemû çûne qirşîka. Stêrka Zêra jî bi wa re çûye; lê ew ji hemû hevalên xwe jêhatîtir û zîrektir e.

.....

Hevalê wê qirşîkê xwe didin hev û ber bi qedandine ve bi qestî dibakin Stêrka Zêra. Dibînin go li ti devera pêjna wê nayê. Jixwe ew jî wilo dixwestin go Stêrka Zêra dengê wa nekê. Hevalê wê jî xayîntiyê lê dîkin wê li wir dihêlin û divegerin malê. Piştî go wext dibe dereng, diya Stêrikê mitala dîke û diçe ji hevalê wê pirs dîke. Hevalê wê jî derewa dîkin, dibêjin go me bakiriye Stêrikê lê ji ber go pêjna wê nehat em vegerane malê. Diya wê jî divegerê malê û li hêviya wê dimêne.

Stêrikê jî dema ji xew dirabe dibîne go bûye şevtarî û ti kes jî li derdorê nemaye. Hema ji tirsê dibakê diya xwe;

- Yadê, wa yedêê ez im Stêrka Zêra me, xweha heft bira me.

Hûtek jî dengê wê dîke û xwe dixê şûna diya wê û dibêje;

- Ez va me kaça min, were vir.

Stêrikê wexta go vî dengî dibihîze dizane go ev ne dengê diya wê ye. Lewma lê vedigerêne;

- Dengê diya min zirav û dirêj e, ti ne diya min î.

Hût piştî go vê gotinê dibihîze ew jî dengê xwe zirav û direj dike û carek dî bi vî dengî dixwaze go Stêrikê bixapêne. Hêdî hêdî ber bi Stêrikê ve diçe û hema bi derbekê re dirajiyê û li milê xwe dike. Hût wê dibe li şikeftê dideyne û latekî jî dideyne ber devê şikeftê da go Stêrikê bi ti deverî de neçe.

.....

Piştî çend rojan carekê şivan guliska di stirehê beran de dibîne, çawa ku dibîne fêhm dike go ev gulîska keçika gûndê wa Stêrika Zêranê ye. Ji ber go dixwaze baş fêhm bike şivan diçe ber bi aliyê şikafta. Wexta nêzî şikefta dibe Stêrka Zêra jî dengê xirpişa şivên dike û dibêje;

- Ez im Stêrka Zêra me, xweha heft bira me, îsal heft sal e di girtîgeha hûta de me.

.....

Nêzî berbangê hût derdikevê û birayê biçûk bi mêranî xwe diavêje nav serê wî, kevirekî mezin li serê wî dixê û serê wî dipelixêne. Lê hût namire. Birayê dî dibînin go hût nemiriye, ew jî tîn bi kevira serê wî dixin. Piştî dibînin go gundî jî hatine alîkariya wa û gundî jî bi kevira li hût dixin. Hût diferfite û dimire. Piştî go hût dimire, her heft bira werisê xwe diavêjin şikefta Stêrikê; latê li ber devê şikeftê dadixin xwarê û xweha xwe ji wir xilas dikin. Her heft bira û xweha xwe bi kêfxweşî divegerin mala bavê xwe. Çîroka min li vir xilas, canê gûhdarvanan sax.

### 2.8.2. Di çîroka stêrka zêra de dahûrîna nirxên civakî

**Tablo 2.9: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Stêrka Zêra de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
SERKETIN	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Stêrka Zêra jî bi wa re çûye; lê ew ji hemû hevalên xwe jêhatîtir û zîrektir e.</li> <li>• Stêrka Zêra ji ber go ji hevalê xwe jêhatîtir û jîrtir e, hevalê wê jî jê dihesidin.</li> </ul>	3

	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Bi vê yêkê hêvî dike go şivanê vî beranî gulîska wê nas bike û pêjna wê bike, ê ne Stêrikê jîr e.</li> </ul>	
<b>ŞIYARKIRIN/ HIŞYARKIRIN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Nêzî berbangê hût derdikevê û birayê biçûk bi mêranî xwe diavêje nav serê wî, kevirekî mezin li serê wî dixê.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>XÊRXWAZÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Bi vî dengî şivên baş fêhm dike go ev dengê Stêrika Zêranê ye; bilêz dixwaze alîkariya wê bike, divegere gûnd û hal hewadîse ji birayê wê re dibêje.</li> <li>• Piştê dibînin go gundî jî hatine alîkariya wa û gundî jî bi kevira li hût dixin.</li> </ul>	<b>2</b>
<b>EWLEKARÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Birayê wê hemû dibin yek û haziriya xelaskira xweha xwe dîkin.</li> <li>• Latê li ber devê şikeftê dadixin xwarê û xweha xwe ji wir xilas dîkin.</li> </ul>	<b>2</b>

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka Stêrka Zêra de çar cureyên nirxan hatine tespîtîkirin; serketin, şiyarkirin/hişyarkirin, xêrxwazî û ewlekarî. Li sê cihan serketin, li du cihan xêrxwazî, li cihekî şiyarkirin û li du cihên din ewlekarî hatiye dîtin.

Zîrebûn û şarezabûn nirxên binbeş ên serketinê ne. Di çîrokê de li sê cihan rasterast em rastî vê nirxê dibin;

“...Stêrka Zêra jî bi wa re çûye; lê ew ji hemû hevalên xwe jêhatîtir û zîrektir e.”

“...Stêrka Zêra ji ber go ji hevalê xwe jêhatîtir û jîrtir e, hevalê wê jî jê dihesidin.”

“...Bi vê yêkê hêvî dike go şivanê vî beranî gulîska wê nas bike û pêjna wê bike, ê ne Stêrikê jîr e.”

Alîkarxwazî nirxeke binbeş a nirxa xêrxwaziyê ye û di çîroka Stêrka Zêra de li du cihan ev nirx hatiye tespîtîkirin;

“...Bi vî dengî şivên baş fêhm dike go ev dengê Stêrika Zêranê ye; bilêz dixwaze alîkariya wê bike, divegere gûnd û hal hewadîse ji birayê wê re dibêje.”

“...Piştê dibînin go gundî jî hatine alîkariya wa û gundî jî bi kevira li hût dixin.”

Ewlehiya malbatê nirxeke binbeş a nirxa ewlekariyê ye. Di çîrokê de li du cihan ev nirx hatiye tespîtkirin ku ji wateya hevokê ev nirx tê fêhmkirin.

“...Birayê wê hemû dibin yek û haziriya xelaskira xweha xwe dikin.”

“...Latê li ber devê şikeftê dadixin xwarê û xweha xwe ji wir xilas dikin.”

Wêrekî nirxeke binbeş a şiyarkirin/hişyarkirinê ye. Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîrok Stêrka Zêra de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Nêzî berbangê hût derdikevê û birayê biçûk bi mêranî xwe diavêje nav serê wî ,kevirekî mezin li serê wî dixê.”

## **2.9. Çîroka Şêr û Rovî**

### **2.9.1. Kurtiya çîroka şêr û rovî**

Rojekê ji roja şêr ji xwe re digêrê û ji nişkê ve li roviyekî hejar, belengaz û birçî rast tê. Çawa go rovî çav li şêr dike zehf ditirse, xwe bi ser hev de diqermiçêne, dûvê xwe dixê ber xwe û serê xwe ditewêne. Şêr li halê wî dimeyzêne û jê re dibêje;

- Roviye belengaz ti li çi digere çepalê heram.

Rovî bi halekî xilmaşî dibêje;

- Ez gelekî birçî û betilî me; lê ez nizanim çi bikim?

Şêr şêr e û bi fors e; lê dîsa jî dilê wî pê dişewitê û dibêje;

- Rebeno, belengazo bi min re were ez ê ji xwe re û ji te re neçîrê bikim, bide pey min. Çepelo!

Roviye reben ji neçarî dide pey şêr û bi rêya xwe de diçin. Di rê de li pezkoviyeke rast tên. Şêr wî pezkoviyeke şanî dike û bi dengekî nizm û xapînok dibêje;

- Rovî... Rovî... Ti dibîne ew neçîra me ye, ka bi lez û bez were çavên min bifirkêne ji bo go sor bibin.

.....

Birastî jî çavê şêr sor dibin. Piştî vê gotina rovî, şêr bi lepê xwe ê mezin bi hişmekê diçe li qirika pezkovî dixê. Pezkoviyê reben cihde dikevê erdê û dimire. Şêr bi coşekê, bi heybetekê dibakê rovî;

- Roviye belengaz! Were vî goştê xweş bixwe û dengê xwe jî neke.

Ma roviye birçî çî dixwaze! Xwarina wî hatiye ber lê ma hê jî çî bixwaze. Bi kêyfeke nêzî goşt dibe û bi hev du re goştê pezkoviyê dixwin. Heta ku ûrê wa digihê erdê li ser xwarinê narabin.

.....

Rojekê ji halê xwe qayil dibe û êdî dibêje bes ez bi şêr re diçim nêçîrê. Taliya talî dibêje şêr;

- Şêrê min, mîre min ez dixwazim ji te veqetim. Te qencî bi min kir lê êdî dixwazim ez bi kêrî xwe werim û bi xwe bi xwe ez nêçîra xwe bikim. Mala te ava, ez ê car cara ji xwe re bigerim.

Ma şêr bibêje çî, heke rovî bi xwe qayil be û jêhatî be bila here, zora wî naçê. Lewma şêr dibêje;

- Heke tu bêje ez ê bi kêr werim, ti karê here, ma bêjim çî.

Bi vê gotinê rovî kêfxweş dibe, êdî weke xulama bi şêr re nagerê û jixwe ji xwe jî qayil e. Ew ê bi xwe bi xwe nêçîra xwe bi dilê xwe bike. Bereketa Xwedê ye bavo. Rojekê ji roja rovî ji xwe re digere û di rê de rastî roviyekî zehf hejar û birçî tê û nişke ve bi quretî dibêje;

- Rovî, Rovî waaa roviye belengaz! Kuro bi min re were neçîrê û bibîne ka ez çawa nêçîrvan im!

Feqîrê roviye hêjar lê ecêbmayî dimêne, lê dibêje hema ez herim belkî zikê xwe tije bikim û dide dû roviye qelew go weke golikekî ye.

.....

Roviye lawaz ji birçîbûna hema bi gotina wî dike û diçe çavê roviye qelew difirkêne. Roviye qelew jê dipirsê;

- Çavên min sor bûn?

Roviyê dî;

- Hinekî sor bûn.

Dîsa roviyê qelew careke dî dibêje;

- Zû, baş bifirkêne ji bo go qenc sor bibin.

Roviyê reben diqeherê. Jixwe hal tê de nemaye, hema bi hêrs dibêje;

- Min qenc firmand û her du çavên te baş sor bûne, de ka tê çî bike bike.

Piştî vê gotinê roviyê qelew bi çavsorî diçe go her du karika bikuje. Çawa go nêzî karika dibe du kûçikên har go bi şivên re ber pez in bi xezep tîn xwe diavêjin ser roviyê qelew û wî ji halekî dixin halekî dî.

.....

Roviyê reben ku her tişt bi çavê xwe dîtî lê divegerêne;

- Tu rovî yî û tu xwe dîke şêr. Şêr şêr e û rovî rovî ye, divê yek weke xwe be, hey ehmeqê bêaqil û qurre!

## 2.9.2. Di çîroka şêr û rovî de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.10: Li Gorî Pîvana Nîrxan a Schwartz Di Çîroka Şêr û Rovî de Senifandina Nîrxan**

CUREYÊN NîRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
HÊZ	<ul style="list-style-type: none"><li>• Roviye reben ji birçibûna hal tê de nemaye, lê ma çî bike, şêr şêr e û hurmeta şêr digire</li></ul>	1
HEZPERESTÎ	<ul style="list-style-type: none"><li>• Ma roviye birçî çî dixwaze! Xwarina wî hatiye ber lê ma hê jî çî bixwaze.</li><li>• Bi kêyfeke nêzî goşt dibe û bi hev du re goştê pezkoviyê dixwin.</li></ul>	2
ŞIYARKIRIN/ HIŞYARKIRIN	<ul style="list-style-type: none"><li>• Piştî vê gotina rovî, şêr bi lepê xwe ê mezin bi hişmekê diçe li qirika pezkovî dixwe.</li></ul>	1
GERDÛNÎBÛN	<ul style="list-style-type: none"><li>• Ma şêr bibêje çî, heke rovî bi xwe qayîl be û jêhatî be bila here, zora wî naçê.</li></ul>	1

<b>XÊRXWAZÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Şêr şêr e û bi fors e; lê dîsa jî dilê wî pê dişewitê û dibêje; 'Rebeno, belengazo bi min re were ez ê ji xwe re û ji te re nêçîrê bikim, bide pey min. Çepelo!'</li> <li>• Te qencî bi min kir lê êdî dixwazim ez bi kêrî xwe werim û bi xwe bi xwe ez nêçîra xwe bikim.</li> </ul>	<b>2</b>
<b>RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Bereketa Xwedê ye bavo.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>RAJÊRÎBÛN (RÎAYET)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Roviye reben bi şaş û peş dirabe her du çavê şêr difirkêne.</li> <li>• Rovi lê ecebmayî dimêne lê bi ya wî dike û bi xurtir carke dî difirkêne.</li> <li>• Rovi êdî diqehere lê ji tirs nîkarê dengê xwe derxê û hinekî dî sebrê dikşene</li> </ul>	<b>3</b>

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka şêr û rovi de heft cureyên nirxan hatine tespîtkirin; hêz, hesperestî, şiyarkirin, gerdûnîbûn, xêrxwazî, rêz û rêçik, rajêrîbûn. Nirxa herî zêde ku hatiye dîtin nirxa rajêrîbûnê ye ku li sê cihan hatiye tespîtkirin. Kubarî, îtaatkarî, qedirdayîna li hemberî dê û bavan û pîr û kalan, bixwekarî/ xwekontrolkirin nirxên binbeş ên nirxa rajêrîbûnê ne. Di çîrokê de li her sê cihan jî îtaatkarî hatiye tespîtkirin;

“...Roviye reben bi şaş û peş dirabe her du çavê şêr difirkêne.”

“...Rovi lê ecebmayî dimêne lê bi ya wî dike û bi xurtir carke dî difirkêne.”

“...Rovi êdî diqehere lê ji tirs nîkarê dengê xwe derxê û hinekî dî sebrê dikşene.”

Xwedî otorîtebûn nirxeke binbeş a nirxa hêzê ye. Di çîrokê de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin ku ji wateya hevokê tê fêhmkirin;

“...Roviye reben ji birçîbûna hal tê de nemaye, lê ma çi bike, şêr şêr e û hurmeta şêr digire.”

Zewq, stendina tehma jiyanê du nirxên binbeş ên nirxa hezperestiyê ne. Di çîrokê de li du cihan wateya zewqê hatiye dîtin;

“...Ma roviye birçî çi dixwaze! Xwarina wî hatiye ber lê ma hê jî çi bixwaze.”

“...Bi kêyfeke nêzî goşt dibe û bi hev du re goştê pezkoviyê dixwin.”

Wêrekî nirxa binbeş a nirxa şiyarkirin/hişyarkirinê ye. Di çîrokê de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin ku rasterast nehatibe dîtin jî ji wateya hevokê ev tevger hatiye fêhmkirin;

“...Piştî vê gotina rovî, şêr bi lepê xwe ê mezin bi hişmekê diçe li qirika pezkovî dixê.”

Fezîletdarbûn nirxa binbeş a gerdûnîbûnê ye. Di çîrokê de li cihekî ev nirx tê tespîtkirin ku ji wateya hevokê tê fêhmkirin;

“...Ma şêr bibêje çi, heke rovî bi xwe qayîl be û jêhatî be bila here, zora wî naçê.”

Alîkarxwazî nirxa binbeş a xêrxwaziyê ye. Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka Şêr û Rovî de li du cihan ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Şêr şêr e û bi fors e; lê dîsa jî dilê wî pê dişewitê û dibêje; Rebeno, belengazo bi min re were ez ê ji xwe re û ji te re nêçîrê bikim, bide pey min. Çepelo!”

“...Te qencî bi min kir lê êdî dixwazim ez bi kêrî xwe werim û bi xwe bi xwe ez nêçîra xwe bikim.”

Hin têgehên dînî di wê civakê de nirxa dîndariyê nîşan didin. Li dorî Schwartz jî dîndarî nirxeke binbeş a rêz û rêçikan (Kevneşopî) e. Di çîroka şêr û rovî de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Bereketa Xwedê ye bavo..”

## **2.10. Çîroka Wezîr**

### **2.10.1 Kurteya çîroka wezîr**

Hebû nebû go wezîrek hebû. Go ev wezîr têra xwe zengîn û destfîreh bû, mal û milkê wî ne xema wî bû. Û kurekî wezîr hebû; lê kurê wezîr nexweş bû. Çiqas dibirin cem doxtora jî ti çareya nexweşiya wî nebû. Hema dert û kula wezîr ew bû go kurê wî baş bibe. Her carê wezîr digot; “Ya rebbî hema go kurê min rihet bibe, bila hemû mal û milkê min di ber de herê.”

.....

Dibêje, xwezî canê min di ber canê kurê min de çûba, hema go kurê min rihet bûba. Diçe kû û naçê kû ti derman li nexweşiya kurê wî nayê go kurê wî baş bibe. Çend meh wilo derbas dibin, go rojekê keçeke esmer û bêvil xizêmkirî tê ber şibakeya kurê wezîr û ji kurê wezîr re dibêje;

- Tu kurê wezîr î ez keça qereçî me, tu ji min re ez ji te re.

Kurê wezîr tişteki ji vê gotinê fêhm nakê lê ew qasî bêhal e go hema guhê xwe nadiyê.

.....

Rojekê ew jî pê re diştexile û hema wilo dibin heval. Her şeveq ew keç tê û bi kurê wezîr re sihetê dikan. Xulamê wezîr jî dibîne go êdî kurê nexweş xwarina xwe dixwe û roj bi roj li xwe dixwe, mehdê wî xweştir dibe; lê tişteki ferq dike, her cara go xwarina wî dideyne li ber deriyê wî dengê wî tê go bi kesekê re diştexile.

.....

Vêca wezîr dibakê kurê xwe ka ev çi mesele ye go fêhm bike. Kurê wî tê û bavê wî jê dipirse. Kur jî dibêje;

- Yabo êdî ez dixwazim bi wê keça go tê ber şibekaya min re bizewicim û jixwe emrê min jî hatiye.

Helbet wezîr li hêviya wê rojê bû go kurê xwe bizewicîne. Bi vê xebera kurê xwe kêfxweş dibe û jê re dibêje;

- Wey hezar carî li ser xêrê..lê ka bêja kî ye çi kes e ew a go tu dixwaze pê re bizewice?

Kurê wezîr behsa keça qereçî dike û hal û ehwalê ji bavê xwe re dibêje.

.....

Axir diçin keçika qereçî ji kurê xwe re dixwazin. Tofanek fîstan û kirasa jê re didûrin û têra wê jî zêra pê ve dikan. Bi ezîmeteke geş û xweş û bi xwarin daweta xwe jî dikan û keçika qereçî dikan xanima malê. Mehekê du meha bi kêf û eşq bi hev re ne û kurê wezîr jî hê baştir dibe. Piştî du meha dimêyzenin ku car caran beyî go

heya kesî pê bixe bûka wezîr ji mal diçe û dereng tê malê. Her cara go jê dipirsin ka tu diçe kû, ew bi derewa dibêje go diçime mala bavê xwe.

.....

Xulam bi dizîka bûka wezîr dişopêne, dimeyzêne ku bûkê rahiştiye kêsekî û mal bi mal digere ji xwe re parsektiyê dike. Xulamê wezîr divegere malê û tiştê go dîtîye ji wezîr û kurê wî re dibêje. Her du jî ecebmayî dibin. Wezîr diqehere û dibêje vê bûkê em hetikandin, divê em wê berdînin û bişyênin mala bavê wê. Kurê wezîr nizane çi bike, lê ew jî dibîne go êdî nabe. Ew jî bi ya bavê xwe dike. Bavê wî jî dibêje;

- Kurê min keçîka qereçî nabe xanima malê.

Û çîroka min jî li vir xilas dibe.

### 2.10.2. Di çîroka wezîr de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.11: Li Gorî Pîvana Nîrxan a Schwartz Di Çîroka Wezîr de Senifandina Nîrxan**

CUREYÊN NîRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
<b>HÊZ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Go ev wezîr têra xwe zengîn û destfîreh bû, mal û milkê wî ne xema wî bû.</li> <li>• Tu kurê wezîr î ez keçîka qereçî me, tu ji min re ez ji te re..</li> <li>• Tofanek fîstan û kirasa jê re didûrin û têra wê jî zêra pê ve dîkin.</li> <li>• Bi ezîmeteke geş û xweş û bi xwarin daweta xwe jî dîkin û keçîka qereçî dîkin xanima malê.</li> </ul>	<b>4</b>
<b>XWETÊGIHÎN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Lê jê re jî dibe meraq ka gelo kurê wî bi kê re diştexile yan hema ji xwe me re diştexile.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Axir diçin keçîka qereçî ji kurê xwe re dixwazin.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>RAJÊRÎBÛN (RÎAYET)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Taliya talî wezîr qaneh dibe û dixwaze go bi dilê kurê xwe bike.</li> <li>• Heta çiqasî jî kes pê de naxiyêde û naxwazin go dilê wê bimêne.</li> </ul>	<b>2</b>

<b>EWLEKARÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Hema dert û kula wezîr ew bû go kurê wî baş bibe.</li> <li>• Her carê wezîr digot; ‘ Ya rebbî hema go kurê min rihet bibe, bila hemû mal û milkê min di ber de herê.’</li> <li>• Dibêje, xwezî canê min di ber canê kurê min de çûba, hema go kurê min rihet bûba.</li> </ul>	<b>3</b>
-----------------	--	----------

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka wezîr de pênc cureyên nirxan hatine tespîtkirin; hêz, xwetêgihîn, rêz û rêçik, rajêrbûn, ewlekarî. Di nav van de nirxa herî zêde ku hatiye dîtin nirxa hêzê ye. Li çar cihan ev nirx hatiye tespîtkirin ku du nirxên binbeş wehewandîne. Yek ji wan xwedî hêza civakî, yê din jî dewlemendî ye;

“...Go ev wezîr têra xwe zengîn û destfîreh bû, mal û milkê wî ne xema wî bû.” (Dewlemendî)

“...Tu kurê wezîr î ez keça qereçî me, tu ji min re ez ji te re.” (Dewlemendî)

“...Tofanek fîstan û kirasa jê re didûrin û têra wê jî zêra pê ve dîkin” (Xwedî hêza civakî)

“...Bi ezîmeteke geş û xweş û bi xwarin daweta xwe jî dîkin û keçika qereçî dîkin xanima malê.” (Dewlemendî)

Meraqkirin nirxa binbeş a xwetêgihînê ye û di çîroka wezîr de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Lê jê re jî dibe meraq ka gelo kurê wî bi kê re diştexile yan hema ji xwe me re diştexile.”

Xwestina keçikan rêz û rêçikeke civakê ye û bicihanîna wê tê wateya rêzdariya li hemberî kevneşopiyan. Rêzdariya li hemberî kevneşopiyan jî nirxeke binbeş a rêz û rêçikan e. Di çîroka wezîr de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Axir diçin keçika qereçî ji kurê xwe re dixwazin.”

Kubarî, îtaatkarî du nirxên binbeş ên rajêrbûnê ne. Di çîroka wezîr de li du cihan ev nirx hatine tespîtkirin ku ji wateya hevokê tê fêhmkirin;

“...Taliya talî wezîr qaneh dibe û dixwaze go bi dilê kurê xwe bike.” (Îtaatkarî)

“...Heta çiqasî jî kes pê de naxiyîde û naxwazin go dilê wê bimêne.” (Kubarî)

Ewlehiya malbatê nirxa binbeş a ewlekariyê ye û di çîroka wezîr de li sê cihan ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Hema dert û kula wezîr ew bû go kurê wî baş bibe.”

“...Her carê wezîr digot; ‘ Ya rebbî hema go kurê min rihet bibe, bila hemû mal û milkê min di ber de herê.’”

“...Dibêje, xwezî canê min di ber canê kurê min de çûba, hema go kurê min rihet bûba.”

## 2.11. Çîroka çûk û pîrê

### 2.11.1. Kurteya çîroka çûk û pîrê<sup>62</sup>

Hebû pîrekek. Go pîrekê çû tenûrka xwe dara, tenûra pîrekê pê neket, go berf bû, baran bû, go çûk hat ser pişta tenûrê, go çima tenûra te pênakevê, go ez ji kû zanim, go ha ji te re vî sitirikî ji lingê min derxe û bixe tenûrê dê pêkevê.

Pîrê jî rabû sitirî ji lingê çûk derxist û xist tenûrê, tenûrka wê pêket. Go nanê xwe çêkir, go çûk hat giriya go ya tê heft nan û qursik'kê bidê min ya tê sitirikê min bidê mi. Go heyra ma ez ê ji kû sitiriyê te bênim, mi xist tenûrê, ma ne te da min. Çûk go illeh na, kir û nekir çûk ji ya xwe nehat xwar, go rabû heft nan û qursikek dan çûk.

.....

Go çû deverkê gava dawet'kê çêdikin, dawet e. Go dît dawetê, go xwarina wa nîne, go kêzik û kurmik dixwarin, go wa xwediyê dawetê, go hê, go va heft meh û berxikê mi ez ê bidim we û daweta xwe pê bikin. Go tamam, go heft meh û berxikek dan wa, go daweta xwe kirin, go çûk dîsa giriya go ya winê heft meh û berxikê min bidin mi û ya winê bûkê bidin mi, go heyra çawa dibê, yek ji çûk yek ji wa, go werhasil bûk danê.

.....

Çirî virî

go min stirîk da bi heft nan û qursikekê

û heft nan û qursikek dan bi heft meh û berxikekê

û heft meh û berxikek jî dan bi bûk'kê

û mi bûk jî da bi bilûr'kê

û kes nîne kevir'kî li serê mi xê û serê mi hûr hûr kê

---

<sup>62</sup> Necat Keskin, *Zêrka Zêra/Cureyên Edebiyata Gelêrî ji Dêrdora Mêrdînê*, weş. Avesta, Stenbol, 2019, r. 133.

go keviyek ji wa da we hat li serê wî ket serê wî hûr hûr bû  
 û çîroka min çû nav deviya  
 û dê û bavê te çûn nav horiya.

### 2.11.2. Di çîroka çûk û pîrê de dahûrîna nirxên civakî

**Tablo 2.12: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Çûk û Pîrê de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
<b>XÊRXWAZÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Go ha ji te re vî sitirikî ji lingê min derxe û bixe tenûrê dê pêkevê.</li> <li>Go çûk çû giha şivan'kî, gava şivan şîr tene dixwê, nanê wî nîn e. Go wa şivano, go hê, go şîr ji kîsî te û nan ji kîsî min.</li> <li>Go dît dawetê, go xwarina wa nîne, go kêzik û kurmik dixwarin, go wa xwediye dawetê, go hê, go va heft meh û berxikê mi ez ê bidim we û daweta xwe pê bikin.</li> </ul>	<b>3</b>
<b>RAJÊRÎBÛN (RÎAYET)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Çûk go illeh na, kir û nekir çûk ji ya xwe nehat xwar, go rabû heft nan û qursikek dan çûk.</li> <li>Şivan kir û nekir çûk ji ya xwe nehat xwar, rabû heft meh û berxikek da çûk.</li> <li>Go çûk dîsa giriya go ya winê heft meh û berxikê min bidin mi û ya winê bûkê bidin mi, go heyra çawa dibê, yek ji çûk yek ji wa, go werhasil bûk danê.</li> </ul>	<b>3</b>

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka çûk û pîrê de du cureyên nirxan hatine tespîtkirin; xêrxwazî, rajêrîbûn. Di nav nirxên binbeş a xêrxwaziyê de sê mînakên nirxa alîkarxwaziyê hatine tespîtkirin;

“...Go ha ji te re vî sitirikî ji lingê min derxe û bixe tenûrê dê pêkevê.”

“...Go çûk çû giha şivan'kî, gava şivan şîr tene dixwê, nanê wî nîn e. Go wa şivano, go hê, go şîr ji kîsî te û nan ji kîsî min.”

“...Go dît dawetê, go xwarina wa nîne, go kêzik û kurmik dixwarin, go wa xwediye dawetê, go hê, go va heft meh û berxikê mi ez ê bidim we û daweta xwe pê bikin.”

Di nav van mînanan de nirxa alîkarxwaziyê helbet rasterast nehatiye dayîn, lê ji tevgerê tê fêmkirin ku helwesta alîkarxwaziyê hatiye der.

Îtaatkarî nirxeke binbeş a rajêrbûnê ye. Di çîroka çûk û pîrê de li sê cihan nirxa îtaatkarî hatiye tespîtkirin;

“...Çûk go illeh na, kir û nekir çûk ji ya xwe nehat xwar, go rabû heft nan û qursikek dan çûk.”

“...Şivan kir û nekir çûk ji ya xwe nehat xwar, rabû heft meh û berxikek da çûk.”

“...Go çûk dîsa giriya go ya winê heft meh û berxikê min bidin mi û ya winê bûkê bidin mi, go heyra çawa dibê, yek ji çûk yek ji wa, go werhasil bûk danê.”

Di nav van her sê mînanan de tê xuyakirin ku îtaatkarî rasterast nehatiye gotin, lê ji tevgerên serlehengên çîrokê tê dît ku îtaatek li hemberî serlehengê çîrokê hatiye kirin. Li gorî Schwartz ev rewş rîayet e û rîayet jî nirxek e.

## 2.12. Çîroka Mirîşk û Rovî

### 2.12.1. Kurteya çîroka mirîşk û rovî<sup>63</sup>

Hebû nebû, malke mitirba hebû. Kurka xwe danîn, û lê konê xwe barkirin û çûn û kurka xwe li wir jî bîr kirin. Kurka wa di der'kê da ma feqîrê. Piştî wextê wê qediya çêlikê xwe derxistin, li nav dara ziyaretê bû. Go dît go rovîk hat, go mirîşkê mirîşkê wele ezê çiç'ke te bixwim.

Mirîşkê go;

- Rovî rovî go çiç'kê min gunehin, biçûkin, û ji xwe li ber devê te jî nakevin. Go here çil rojî bimîne û were hê nû wê çiç'kê min mezin bibin û tê bixwê. Rovî go tamam û rabû çû.

.....

Rovî çû çil rojî ma û rojekê mirîşkê dît gava rovî ji wir ve tê. Çiç'kê mirîşkê hemika go pir pir çûn serê dara.

Rovî go:

- Mirîşkê, mirîşkê ma ne qewlê me hebû, me tişteke ji hev dû re gotibû.

Mirîşkê go:

- Erê min gotibû, çiç'k ji te tirsyan û firîn serê dara. Were em strana ji xwe re bigirin û dîlanê bigirin, heta hingê ew jî ê werin û li me vehewin û tê jî wa bixwê.

Rabû rovî hat û dest bi strana xwe kir û ew û mîrîşk reqisîn. Rovî go;

<sup>63</sup> Keskin, *hb*, 2019, r. 144.

Mirîşka perî belek

Çiç'ka dixwim gelek gelek Zarokno werin ferca dîlanê

Go bû dora mirîşkê û mirîşkê jî go;

Îmam Heyderê çawirî

.....

Rovî go:

- Mirîşkê, mirîşkê ti behsa tajî û toleka bikê ezê herim.

Mirîşkê go:

- Ma ne ti jî dibê ezê çiç'ka bixwim û ez dey nakim, tiji deyneke, em strana ji xwe re dibêjin.

.....

Rovî meyzand ku çiçik nehatin, go;

- Mirîşkê çiç'kê te nehatin.

Mirîşkê go:

- Em kêlik'ke dî bireqsîn ê werin, û dîsa strana xwe got û ba kir tajî û tole, go;

Îmam Heydere Çawirî

Tajî û tole virde werî

Da bixwin vî rovîkê xinzirî

Rovî go:

- Mirîşkê mirîşkê ev di cara ti wilo dibêjê, ezê herim ha.

Mirîşkê go:

- Na tiştek nabê, em ji xwe re direqisin.

Hê wilo diştexilîn tajî û tole bi derb'kê ve derketin hatin bi qepir-ka rovî girtin ew xwarin. Mirîşk û çiç'kê xwe jî xelas bûn.

Çîroka min çû nav deviya

Dê bavê çûn nav horiya.

## 2.12.2. Di çîroka mirîşk û rovî de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.13: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Mirîşk û Rovî de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
HÊZ	<ul style="list-style-type: none"><li>• Go dît go rovîk hat, go mirîşkê mirîşkê wele ezê çiç'ke te bixwim.</li><li>• Mirîşk jî çû cem tajî û tole û go hal û mesela mi bi rovî re eve.</li><li>• Gava mi bakir we win jî werin û rovî bixwin. Tajî û tole jî gotin tamam.</li></ul>	

	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Îmam Heyderê çawirî Tajî û tole virde werî Da bixwin vi rovîkê xinziri</li> <li>• Mirîşka peri belek Çiç'ka dixwim gelek gelek</li> <li>• Hê wilo diştexilîn tajî û tole bi derb'kê ve derketin hatin bi qepir-ka rovî girtin ew xwarin.</li> </ul>	<b>6</b>
<b>SERKETIN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Rovî rovî go çiç'kê min gunehin, biçûkin, û ji xwe li ber devê te jî nakevin. Go here çil rojî bimîne û were hê nû wê çiç'kê min mezin bibin û tê bixwê.</li> <li>• Mirîşk jî çû cem tajî û tole û go hal û mesela mi bi rovî re ev e. Go çil rojî dî ê werê û çiç'kê mi bixwê. Gava mi bakir we win jî werin û rovî bixwin.</li> <li>• Hê wilo diştexilîn tajî û tole bi derb'kê ve derketin hatin bi qepir-ka rovî girtin ew xwarin. Mirîşk û çiç'kê xwe jî xelas bûn.</li> </ul>	<b>3</b>
<b>XÊRXWAZÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Gava mi bakir we win jî werin û rovî bixwin. Tajî û tole jî gotin tamam.</li> </ul>	<b>1</b>

Di çîroka mirîşk û rovî de nirxa herî zêde ku hatiye tespîtkirin hêz e. Xwedî otorîtebûn nirxa binbeş a hêzê yê û di çîrokê de du serleheng bi tevgerên xwe otorîterbûnê nîşan didin. Rovî otorîterbûna xwe li ser mirîşkê datîne û tê fêhmkirin ku tajî û tole jî li ser rovî xwedî otorîte ne. Di çîrokê de li şeş cihan ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Go dît go rovîk hat, go mirîşkê mirîşkê wele ezê çiç'ke te bixwim.”

“...Mirîşk jî çû cem tajî û tole û go hal û mesela mi bi rovî re eve.”

“...Gava mi bakir we win jî werin û rovî bixwin. Tajî û tole jî gotin tamam.”

“...Îmam Heyderê çawirî

Tajî û tole virde werî

Da bixwin vi rovîkê xinziri”

“...Mirîşka peri belek

Çiç'ka dixwim gelek gelek”

“...Hê wilo diştexilîn tajî û tole bi derb'kê ve derketin hatin bi qepir-ka rovî girtin ew xwarin.”

Serkeftîbûn û zîrebûn du nirxên binbeş ên nirxa serketinê ne. Di vê çîrokê de li sê cihan em rastî vê nirxê dibin ku rasterast nehatiye dayîn, lê ji wateya hevokê û çîrokê tê fêhmkirin ku li du cihan zîrebûn û li cihekî jî serkeftîbûn hatiye bikaranîn. Serlehangî çîrokê bi zîrebûna xwe, xwe ji rovî xilas dike. Li jêr du hevokên ewilî zîrebûnê, hevoka dawî jî serkeftinê nîşan dide;

“...Rovî rovî go çîç'kê min gunehin, biçûkin, û ji xwe li ber devê te jî nakevin. Go here çil rojî bimîne û were hê nû wê çîç'kê min mezin bibin û tê bixwê.” (Zîrebûn)

“...Mirişk jî çû cem tajî û tole û go hal û mesela mi bi rovî re ev e. Go çil rojî dî ê werê û çîç'kê mi bixwê. Gava mi bakir we win jî werin û rovî bixwin.” (Zîrebûn)

“...Hê wilo diştexilîn tajî û tole bi derb'kê ve derketin hatin bi qepir-ka rovî girtin ew xwarin. Mirişk û çîç'kê xwe jî xelas bûn.” (Serkeftin)

Di çîrokê de serleheng ji tajî û tole alîkariyê dixwaze û ew jî tîr alîkariyê. Lewma tê dîtin ku li cihekî nirxa xêrxwaziyê hatiye bikaranîn;

“...Gava mi bakir we win jî werin û rovî bixwin. Tajî û tole jî gotin tamam.” (Alîkarxwazî)

## 2.13.Çîroka Rovî û Şêr

### 2.13.1. Kurtiya çîroka rovî û şêr<sup>64</sup>

Go hebû nebû rovîk hebû. Go çû çû kete çalê. Şêrek di wire çû li çalê meyzand gava rovî, go;

- Wa birakê rovî ti di wir de çi d'kê di çalê de.  
Rovî go;

- Ez bez dixwim.  
Go şêr jî xwe avêtîyê û kete çalê de ew jî. Go bû roja dî hirçek hat serê çalê meyzand rovîk û şêrek di çalê de ne, go;

- Ha birakê rovî ti di wir de çi d'kê?  
.....

Wext derbas bû, birçî bûn, tişteke nîne bixwin go em çi bikin, rovî go;

- Em meyzênin bê navê kê ji me ne xweş e em wê bixwin.  
Ê dî jî gotin tamam. Gur dest pê kir, go;

---

<sup>64</sup> Keskin, *hb*, 2019, r. 138.

- Ez gur im,  
Diran bivir im,  
  
Roja mijî hazir im.

Şêr go;

- Ez şêr im,  
Şêrê Xwedê me.

Kîroşkê go;

- Kîroşk im,  
Pişt qeveloşk im.

Hirçê go;

- Ez hirç im,  
Qûn bi pirç im.

Rovî go;

- Ez rovî me  
Serçeqa duv spî me

Axakî şengî erebî me.

.....

Çend roj tê re derbas bûn, dîsa birçî bûn, vê carê gotin go ma "bivir çi ye? emê gur bixwin, rabûn gur xwarin. Rovî dîsa hestuyê xwe dixê bin kaboka xwe de. Heta go dîsa birçî bûn, vê carê jî hirça qun bi pirç xwarin. Rovî dîsa hestu xistin bin kaboka xwe de. Man rovî û şêr.

Roja dî rovî dîsa birçî bû, hestukê bin lingê xwe dixwarin, dibû kirt kirta wî, şêr go;

- Ha birakê rovî, ti çi dixwê?  
Rovî go;

- Mi çav'kî xwe xwar.

.....

Şer jî destê xwe xwar. Roja dî dîsa bû kir kira wî, şêr go:

- Ha birakê rovî vêca çi bû, te çi xwar, rovî go;

- Mi lingê xwe xwar.

Şer jî lingê xwe xwar û bi gindor. Rabû rovî ket ser kelaşê şêr de, şêr jî xwar.

Sê çar ro tê ve çûn, birçî bû, go;

- Ya rebî, xwedo ti mi derxê ser devê çalê, 'elbek nisk sed'qe bê ez bidim teyrik tûrika, bidim çûka.

Go bablîsokek rabû, li binê çalê da, rovî derxist ser devê çalê. Rovî rabû qûna xwe weşand, go; ma ezê nîska ji kû bênim, nêta xwe xera kir ku nîska nedê. Go dîsa bablîsekek rabû û go gurm û rovî ket çalê de. Rovî go;

- Ya rebî, xwedo ez li 'elbê digeriyam, te'z xistim çalê.

Go dîsa ceriband, dîsa bablîsokek hat li binê çalê da û dîsa rovî derxist serê çalê. Go rabû Rovî çû meşiya, dî yek hat li kerê xwe siwar e, barê wî barkirî ye, nîsk in. Go çû xwe li pêşiya kerê mirand, go xwediyê nîska go;

- Bêxwedîkê pîs, çime miriya? û çû bi riya xwe de.  
Go rovî jî piştî go ê siwar çû di aliyê dî re zîvirî dîsa çû pêşiya wî û dîsa xwe li pêşiya kerê xwe mirand. Go zilam go;
- Bexwedîko ev jî miriye!  
.....  
Go “şoş kero”, kerê xwe li wê dê sekinand û çû ‘eyarê wa yê dî jê kê. Heta zilam çû go “eyarê” roviyê dî jê kê û bènê, go rovî çû bazda ser piştta kerê, nîskê wî li wa da bela wela kirin û go;
- Ya rebî, xwedo va mi têra teyrik û tûrikê te da wa.  
Û çîroka mi xelas çû nav deviya,  
  
Dê û bavê te çûn nav horiya.

### 2.13.2. Di çîroka rovî û şêr de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.14: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Rovî û Şêr de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
<b>HÊZ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Ez rovî me Serçeqa duv spî me Axakî şengî erebî me.</li> <li>• Em meyzênin bê navê kê ji me ne xweş e em wê bixwin.</li> </ul>	<b>2</b>
<b>SERKETIN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Şêr jî lingê xwe xwar û bi gindor. Rabû rovî ket ser kelaşê şêr de, şêr jî xwar.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Ya rebî, xwedo ti mi derxê ser devê çalê, ‘elbek nîsk sed’qe bê ez bidim teyrik tûrika, bidim çûka.</li> <li>• Ya rebî, xwedo ez li ‘elbê digeriyam, te’z xistim çalê.</li> <li>• Ya rebî, xwedo va mi têra teyrik û tûrikê te da wa.</li> <li>• Ez şêr im, Şêrê Xwedê me.</li> </ul>	<b>4</b>

Di çîroka rovî û şêr sê cureyên nirxan hatine tespîtîkirin; hêz, serketin, rêz û rêçik. Li gorî pîvana nirxan a Schwartz xwedî hêza civakî nîrxêke binbeş a hêzê ye. Di çîrokê de bi tegaha “axakî şengî erebî” tê fêhmîkirin ku qesta hêzeke civakî heye. Li cihekî em rastî vê nîrxê dibin;

“...Ez rovî me

Serçeqa duv spî me

Axakî şengî erebî me.” (Hêza civakî)

Herwiha xwedî otorîterbûn jî nirxeke binbeş a hêzê ye û li cihekî em rastî vê nirxê jî dibin;

“...Em meyzênin bê navê kê ji me ne xweş e em wê bixwin.” (Xwedî otorîtebûn)

Di çîrokan de herçiqasî şêr bi karakterê xwe xwedî hêzekê jî be, di vê çîrokê de rovî bi zîrebûna xwe dide zora şêr. Zîrekî nirxa binbeş a serketinê ye û dikare bê gotin ku nirxa zîrebûnê li cihekî tê fêhmkirin;

“... Şêr jî lingê xwe xwar û bi gindor. Rabû rovî ket ser kelaşê şêr de, şêr jî xwar.” (Zîrebûn)

Dîndarî nirxa binbeş a rêz û rêçika ye. Di çîroka rovî û şêr de nirxa herî zêde ku hatiye tespîtîkirin jî dîndarî ye. Bi hin têgehên dînî tê fêhmkirin ku ev nirx hatiye bikaranîn. Li çar cihan ev nirx hatiye tespîtîkirin;

“...Ya rebî, xwedo ti mi derxê ser devê çalê, ‘elbek nisk sed’qe bê ez bidim teyrik tûrika, bidim çûka.”

“...Ya rebî, xwedo ez li ‘elbê digeriya, te’z xistim çalê.”

“...Ya rebî, xwedo va mi têra teyrik û tûrikê te da wa.”

“...Ez şêr im, Şêrê Xwedê me.”

## 2.14. Çîroka Şiqo

### 2.14.1. Kurteya çîroka şiqo<sup>65</sup>

Hebû nebû zilamek, jinek ji xwe re anî, zarok jê re çênebûn, yeke din jî anî. Dîsa çênebûn rojekê çû sûkê, yekî dû sêv dayê go here malê bide jina xwe ê ji te re zarok çêbibin. Ji pîrekê xwe re her yekî yek anî. Go yekê jê sêva xwe xwar, go yek jê destê wê ê di hevîr de bû. Destê wê di hevîr de bû, go rexek xwar û rexê dî danî wir. Rexê dî danî wir, go ya dî hewiya wê hat ew rexê dî jî xwar.

---

<sup>65</sup> Keskin, *hb*, 2019, r. 114.

Vêca go ê wê ya go yek û qetek xwar, di zarokê wê, di kurê wê çêbûn. Go ê wê ya di çêbû yek, wilo b' şixikî çêbû. Rabû go bavê wan kete ber mirinê.

Go; “Yabo tê vayê mirî, ti pereyê te, tiştekî te li xelkê nînin, é xelqê te nînin?”

Go; “Heyra welleh bîst qirûşk'kî mi li hûtê heftserî heye yanî weka go ti bê yekî ne qenc lê heye, lê bela xwe jê vekin”.

Go; “Na, em bela xwe jê navekin”. Dibê her du birayê wî, şixwe Şiqo bêxêr e ew ne ji hesaba ye. Ev her du kê dî yê birayê hev, go, emê çin emê çilo perê bavê xwe li xelkê hêlin.”

.....

Go; “Ezê di beranê xwe berdim hev, heke we karîbû win j' hev vekin şixwe winê çin perê xwe ênin. Heke win nikaribin...” Go kir û nekirin dora beranê re çûn û hatin, nikaribûn wa j'hev du vekin.

Go; “Wele bi serê mi nakeve. Win herin jî win wa nayênin, lê hema herin”. Dibê çûn gihan gavanekî. Gihan gavanekî, gavan go; “winê çi kin xortno” filan? Go; “hal û meselê me jî ev e”.

Go; “Heyra şertekî mi jî heye ka e' jî ezê ji we ra bêjim. Heke win pêk bênin”.

Go; “Çi ye?”

Go; “Di conegayê mi hene ezê wan berdime hev, heke win wa j' hevdu vekin winê ênin, heke na”.

.....

Dibê herduka xwe pê va zeliqandin kir û nekirin nikarîbûn. Çûn. Çûne cem hûtê heftserî filan jê ra gotin, pê hisand. Vêca çirok in derû ne dibê tiliha xwe qelaştîye hut û her du wilo kirine wir, asê kirine, êsîr kirine. Rokik, di ro, sê ro tê ra diçin nayên. Birayê wa ew ê Şiqo jî mêr e. Birayê wî nehatina. Dibê rabû, go “welleh ezê l' dû birayê xwe çim”. Gote diya xwe go, “de ka qalibekî mi çêka, qalibekî hêka”. Xwarineke xweş jê ra çêkir û rahişte kopalê xwe û ser rê ket.

Ser rê ket, dibê hate cem ê şivan. “Şivan qewet be ji te re”, dibê, “erê”. Tê çikê şiqo? Go; “Wele hal û mesela perê mi, bavê mi bîst ro kê wî li yekî bûn û di birayê mi çûne û nehatin û ezê jî dûv wa çim”.

Dibê; “Were Şiqo şirtekî mi heye. Di beranê mi wê l'evxin, ezê wan berdim hev, heke te ji hevdû vekirin wele tê birayê xwe jî ênê û perê xwe jî. Heke na, boş e”.

.....

Diçê cem pîrê. Pîrê dibê; “Tê çikê kurê min?” Dibê; “Wele hal û mesele mi ev e”. Ê dibê;

“Kurê min wele şerta mi heye. Heke ti karibê di muwa ji rûvê mi hilkê, wele tê birayê xwe jî ênê û tê çêlikê wa jî. Tê birayê xwe jî ênê û perê xwe jî”.

Ê dibê ka mêyzêne. Dibê dirabê baqekî li destê dipêçe, dibê (pir); “haaa kuro, kuro, tê ênê, tê ên”. Werhasil, derbas dibê. Derbas dibe, diçe cem hûtê heftserî. Dibê ka li ku derê ye, filan bêvan, go wele li filan deverê ye. Dibê, “herin bakinê bila werê”. Diçê di bakê de, dibê wer. Şûrê wî jî heye me'lûm e, ne yî bê şûr e jî Şiqo. Dibê “kanî birayê min” filan bêvan, “kanî perê ma?” Dibê; “Şiqo ti jî diştexile, ti jî di riya birayê xwe deyî? Ezê te jî riya birayê te de şiyênim”. Dibê, “de tamam, ka em meyzînin”.

Rabû şer dikin. Şer dikin, Şiqo dibê ez mêvan im, dibê pêşî dibêje wî, dibê; “ti derba xwe bavêje mi. Mêvan û zêdekar çênabin”.

.....

T'avêjîyê wî dikûjê. Wî dikujê û birayê wî, heka hepsê da ne, heka d' devereke asê de ne, birayê xwe derdixê. Malûmê î serbest e ser xiznê li malê wî digere. Malê wî digere, xiznê wî. Dirabê dirajê xizna wî, zêrin, kîsek zêr ji dêla perê xwe ve yanî, tènê. Û herdu birayê xwe jî tènê.

Tên qederekî, li wa dibê şev. Li wa dibê şev, li devereke dibê emê razin. Dibê mexelê pez jî li wa nêzîka wa heye. -ê deva ye, ê pez e- Î razaye Şîqo, dibê ew her dukê dîn-birayên wî zêrê wî vala dîkin, ê wî kîsê wî vala dîkin û wa mişkulê deveha, wa tiştê têxinê de, û dirajîne zêra û diçin. Baz didin, diçin.

Diçine mal, dibêjine diyê xwe wa. Dibê; “kanî birayê we, ma ne Şîqo pey we hatibû?”

Dibê; “Şîqo î li ku ye? me ji ku me î Şîqo dîtiye?” Dibê; “Ev in, me çûn ew kust, ew hûtê heftserî me kuşt û me ev pere (zêr) ji dela perê xwe anîn û ev e, me tiştêkî di nedîye”.

Wele Şîqo direbê, ser xwe dimeyzînê, birayê wî î ne l' cem in, kîsê wî zêra birine. Dibê ser rê dikevê. Ser rê dikevê, vêca ew jî diçine mal û hingî diya wa qedrê wa digirê. Dibê ma evqa pere ji me ra anîne û perê bavê xwe standîne û filan û bêvan. Vêca diçê, li dûv wa dicê, ma ne hêzê wî dîtine. Hêzê wî dîtine, diçin. Dibê; “kanî, ew birayê mi kanîn?” filan bêvan wa sepîrîze dikê. Dibê “mi zêr standîne” û êdî meselê wa temama dibêjê. A ev bû çîroka Şîqo.

#### 2.14.2. Di çîroka şîqo de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.15: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Şîqo de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
HÊZ	<ul style="list-style-type: none"> <li>Vêca ew jî diçine mal û hingî diya wa qedrê wa digirê. Dibê ma evqa pere ji me ra anîne û perê bavê xwe standîne û filan û bêvan.</li> </ul>	1
SERKETIN	<ul style="list-style-type: none"> <li>Vêca Şîqo dizîvirê û şûrê xwe dihejênê, di dora wî re diçê û tê û t'avêjî de. T'avêjîyê wî dikûjê.</li> </ul>	1
HEZPERESTÎ	<ul style="list-style-type: none"> <li>Gote diya xwe go, “de ka qalibekî mi çêka, qalibekî hêka”.</li> <li>Xwarineke xweş jê ra çêkir û rahişte kopalê xwe û ser rê ket.</li> </ul>	2
ŞIYARKIRIN/ HIŞYARKIRIN	<ul style="list-style-type: none"> <li>Birayê wa ew ê Şîqo jî mêr e.</li> </ul>	1
XWETÊGIHÎN	<ul style="list-style-type: none"> <li>Malûmê î serbest e ser xiznê li malê wî digere.</li> </ul>	1
XÊRXWAZÎ	<ul style="list-style-type: none"> <li>Rojekê çû sûkê, yekî dû sêv dayê go here malê bide jina xwe ê ji te re zarok çêbibin.</li> <li>Wî dikujê û birayê wî, heka hepsê da ne, heka d' devereke asê de ne, birayê xwe derdixê.</li> </ul>	2

<b>EWLEKARÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Dibê rabû, go “welleh ezê l' dû birayê xwe çim”.</li> </ul>	<b>1</b>
-----------------	--	----------

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka şiqo de heft cureyên nirxan hatine tespîtkirin; hêz, serketin, hezperestî, şiyarkirin, xwetêgihîn, xêrxwazî û ewlekarî. Hezperestî û xêrxwazî her yek ji wan li du cihan, ewên din jî her yek ji wan li cihekî hatine tespîtkirin. Nirxa binbeş a xêrxwaziyê alîkarxwazî ye û li du cihan ev nirx hatiye dîtin;

“...Rojekê çû sûkê, yekî dû sêv dayê go here malê bide jina xwe ê ji te re zarok çêbibin.”

“...Wî dikujê û birayê wî, heka hepsê da ne, heka d' deverekê asê de ne, birayê xwe derdixê.”

Nirxa binbeş a hezperestiyê zewq e ku di çîroka şiqo de li du cihan hatiye tespîtkirin;

“...Gote diya xwe go, "de ka qalibekî mi çêka, qalibekî hêka”.

“...Xwarineke xweş jê ra çêkir û rahişte kopalê xwe û ser rê ket.”

Nirxa binbeş a hêze dewlemendî ye û li cihekî hatiye tespîtkirin;

“...Vêca ew jî diçine mal û hingî diya wa qedrê wa digirê. Dibê ma evqa pere ji me ra anîne û perê bavê xwe standîne û filan û bêvan.”

Wêrekî nirxa binbeş a şiyarkirin/ hişyarkirinê ye ku di çîroka şiqo de li cihekî hatiye tespîtkirin.

“...Birayê wa ew ê Şiqo jî mêr e.”

Nirxa binbeş a xwetêgihînê serbestbûn e ku di çîroka şiqo de li cihekî hatiye dîtin;

“...Malûmê î serbest e ser xiznê li malê wî digirê.”

Ewlehiya malbatê li gorî pîvana nirxan a Schwartz nirxa binbeş a ewlekariyê ye û di çîroka şiqo de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Dibê rabû, go "welleh ezê l' dû birayê xwe çim". ”

## 2.15. Çîroka Alik û Fatik

### 2.15.1. Kurteya çîroka alik û fatik<sup>66</sup>

Dibê, pîreka yekî miribû, keçikek û lawikekî wî hebû. Navê wan Alik û Fatik bû. Bavê wan ji nû ve dizewice, dikevin bin destê jinbavê. Jinbav hez ji zarokan nake, ji wan dienitîne. Jinbav ji bo bi hawayekî tiştêkî bi zarokan bike dikeve nav liv û lebatê. Di xwe difikire bê ka bi çi riyê ji zarokan xelas bibe, şeytaniyek tê hişê wê.

.....

Jinik dere cem melê û tê, ji mêrê xwe re dibêje, melê gotiye bila her zarokekî xwe li aliyekî serseda erd serjê bike wê erdê we şîn bê. Mêrik mecbûr dimîne zarokên xwe dibe nava erd ku li ser erd wan serjê bike. Çûkek tê ji zarokan re dibêje, “Wê bavê we serê we jêke, ji xwe re birevin. Fatik tu rahêje kumê birayê xwe û bireve, Alik jî bila bi dû te keve, bê çima tu kumê min nadî min? Û bi wî hawayî bazdîn, xwe xelas bikin.” Dema firsenda wan dikeve ji qazî ve keçik radihêje kumê birayê xwe û direvîne. Birayê wê jî ji bavê xwe re dibêje, bîner yabo xweha min kumê min nade min û bi dû xweha xwe dikeve. Didin ser piştê hev û xwe ji bavê xwe bi dûr dixin, derin. Nema li bavê xwe vedigerin, geh heta ji wan tê bazdidin, geh dimeşin; axirê xwe xelas dikin.

.....

Çend roj wilo derbas bûne, dûre terîka mişk winda kirine. Dema pîrê hatiye ber qula kewarê bûye kupekupa dilê wan û mecbûr mane tilikên xwe pêş pîrê kirine. Pîrê dinêre ku qelew bûne. Dere distek av li êgir dike û tê dibêje, lawo hûn niha lewitîne de ka derkevin ku ez serê we bişom. zarokan ji kewarê derdixe, wan dibe ber dista ava kelandî ku wan têxê. Her du xwe bi tiştêkî nahisînin, li dora pîrê derin û tînen, dibêjin, em ê pêşiyê serê te bişon dûre tê me bişo. Heta pîrê dibêje na, filan bêvan zarok xwe lê dikin yek, wê dixin dista ava kelandî û bazdidin. xwe bi wî hawayî ji pîrê xelas dikin.

.....

Dere wê ji birayê xwe re dixwaze û wan dizewicînin. Fatik, Alik û jina wî hez ji hev dikin, kêfa xwe ji hev re tînin. Bi demê re jina Alik dinêre ku, mêrê wê gelekî hez ji xweha xwe dike. Bi hev re gelek zehmetî û rojên zor derbas kirine, dilê wî bi ser xweha wî ve ye. Qîma jinikê bi vê nayê, jinik ji dişax xwe dicemise, jê diqehire. Carê Fatik dere çolê dixebite, heta tê malê ji hal û balê xwe de dikeve. Rojekê jinbira Fatikê dere ji nav çem çêlikekî mara digire û dixê şerbikê avê. Dema Fatik tê, dere pêşiyê dibêje, ez zanim tu gelekî tî bûyî, min ji te re av anî. Keçik gelekî betiliye, ji tînan ketiye, hema radihêje şerbik û devê xwe dixê, dibe qurtequrta wê. Dema avê vedixwe çêlikê maran jî dere nava wê. Roj bi roj çêlik mezin dibe û zikê Fatikê jî pê re mezin dibe. Jinik ji mêrê xwe re dibêje, “Va xweha te biheml e, zikê wê roj bi roj mezin dibe. Em hetikîn.” Di nav xelkê de jî dibe şitexalî, dibêjin Fatik bihemil bûye. Birayê keçikê di nav xelkê de kêr dikeve. Jina wî jê re dibêje, “Ji bo ev eyb ji ser te here divê tu xweha xwe bikujî.” Lawik ji xweha xwe re dibêje, heydê em ji xwe re bigerin û wê dibe serê çiyayekî ku wê bikuje. Keçik dibetile, birayê wê serê wê datîne ser kapoka xwe, keçik wilo di xew re dere. Destê birayê wê lê nagere wê bikuje, hêdîka kaboka xwe ji bin serê xweha xwe dikişîne, wê li navsera wan çiyayan di xew de tenê dihêle û vedigere malê.

.....

Elq tînen keçikê û mar dibê çelq û xwe davê nava avê. Keçik diqutife. Ji aliyekî ve jî bêhna wê derdikeve, dinêre ku zikê pêve nema. Avê li dest û rûyê xwe dike, hebekî rûdinê, bêhna xwe vedike. Keçik dinêre siwerek ji wê de tê, hildikişe ser darê. Siwar tê

<sup>66</sup> Aslîxan Yildirim, *Herdemciwanê*, weş. Azad, Stenbol, 2013, r.69.

bin darê, hespê xwe dibe ber çem ku avbide, hesp daqul tê û ji ser avê vedikişe, daqul tê û vedikişe. Tu nabêjî şewqa keçikê di avê re xuya dike. Lawik dibêje ev çi hewalê hespê min e, li avê dinêre û hema berê xwe ber bi jora darê ve dizivirîne. Dinêre ku keçikê sipehî û li ser darê ye. Bang dike, dibêje were dakeve, biner bê tu çi kes î, tu li wir çi dikî. Keçik ji darê dadikeve, meseleya xwe ji serî heta binî ji layê paşê re dibêje. Layê paşê bi heft dilan dil dikeve keçikê. Keçikê qanix dike û wê dibe malê; dawetekê li dar dixê û wê li xwe mehr dike. Mala paşê dewlemend e, halê keçikê xweş e. Di wê navê re ka bê çend sal derbas dibin, li aliyê ku mala birayê wê lê ye xela çêdibe. Li gundê mala birayê wê dibihîzin ku li bajarê filan derê li mala filan paşayî genim heye û li xelkê bela dikin. Jina ‘Alik jê re dibêje, tu jî rabe here wî bajarî ji mala wî paşayî ji me re hinek genim werîne.

.....

Li hev rûdinên, keçik dibêje ez ê meseleyekê ji we re bêjim. Dest pê dike, çi bi serê wê hatibe hemûyî ji wan re dibêje, lê nabêje ew ez im. Dibêje wilo wilo bi serê keçikê de hatiye. Di dawiyê de dibêje ew ez im û tu birayê min î. Lawik kenûgirî dibe, nema zane ne divê kêfa wî bê, ne biqehire. Keçik û birayê xwe xwe çem hev dikin, hevdu maçî dikin. Lawik dike ku jina xwe bikuje, xweha wî nahêle. xweh dibêje, - Min xwest ez yeke ku şîrê însanan nexwaribe ji birayê xwe re bînim ji bo wek jinbava me li me neke. Lê xuya ye xayîntî û bêwijdanî di xwîna însan de heye. xweh ji bo ku birayê xwe dîtîye dilê wê xweş bûye. Jinbira xwe efû dike. Têra wan genim jî dide wan û wan dişîne malê.

## 2.15.2. Di çîroka alik û fatik de dahûrîna nirxên civakî

**Tablo 2.16: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Alik û Fatik de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
HÊZ	<ul style="list-style-type: none"> <li>Mala paşê dewlemend e, halê keçikê xweş e.</li> </ul>	1
SERKETIN	<ul style="list-style-type: none"> <li>Zarokan ji xwe re mişkek girtine û carê terîka mişk didin destê pîrê. Pîrê dibêje, hûn hîn qelew nebûne û dîsa wan xwedî dike.</li> <li>Li dora pîrê derin û tîn, dibêjin, em ê pêşiyê serê te bişon dûre tê me bişo.</li> <li>Heta pîrê dibêje na, filan bêvan zarok xwe lê dikin yek, wê dixin dista ava kelandî û bazdidin. xwe bi wî hawayî ji pîrê xelas dikin.</li> </ul>	3
XWETÊGIHÎN	<ul style="list-style-type: none"> <li>Didin ser piştê hev û xwe ji bavê xwe bi dûr dixin, derin.</li> <li>Geh heta ji wan tê bazdidin, geh dimeşin; axirê xwe xelas dikin.</li> </ul>	2
XÊRXWAZÎ	<ul style="list-style-type: none"> <li>Çûkek tê ji zarokan re dibêje, “Wê bavê we serê we jêke, ji xwe re birevin.</li> <li>Fatik tu rahêje kumê birayê xwe û bireve, Alik jî bila bi dû te keve, bê çima tu kumê min nadî min?</li> </ul>	

	<p>Û bi wî hawayî bazdin, xwe xelas bikin.</p> <ul style="list-style-type: none"> <li>• Li wir ji xwe re disebibin, dişixulin, nanê xwe derdixin.</li> <li>• Lawik mezin bûye, xweha wî dixwaze wî bizewicîne.</li> <li>• Dere wê ji birayê xwe re dixwaze û wan dizewicînin.</li> <li>• Fatik, Alik û jina wî hez ji hev dikan, kêfa xwe ji hev re tînin.</li> <li>• Bi hev re gelek zehmetî û rojên zor derbas kirine, dilê wî bi ser xweha wî ve ye.</li> <li>• Layê paşê bi heft dilan dil dikeve keçikê.</li> <li>• Li gundê mala birayê wê dibihîzin ku li bajarê filan derê li mala filan paşayî genim heye û li xelkê bela dikan.</li> <li>• Ji wan re dibêjin, niha hûn gelekî betilîne werin rûnên, bêhna xwe vekin, gepek nan bixwin.</li> <li>• Keçik û birayê xwe xwe çem hev dikan, hevdu maçî dikan.</li> <li>• Lawik dike ku jina xwe bikuje, xweha wî nahêle. Jinbira xwe efû dike. Têra wan genim jî dide wan û wan dişîne malê.</li> </ul>	12
<b>RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Keçikê qanix dike û wê dibe malê; dawetekê li dar dixê û wê li xwe mehr dike.</li> </ul>	1
<b>EWLEKARÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Keçik dibêje, “Ez ê yeke ku bi şîrê xezalan xwedî bûye ji birayê xwe re bînim. Jinbava me ev qas xayîn derket, belkî yeke ku şîrê însanan nexwaribe wilo bêmîrwet dernekeve.”</li> </ul>	1

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka alik û fatik de şeş cureyên nirxan hatine tespîtîkirin; hêz, serketin, xwetêgihîn, xêrxwazî, rêz û rêçik, ewlekarî. Di nav van de nirxa herî zêde ku hatiye dîtin xêrxwazî ye û li duwazdeh cihan hatiye tespîtîkirin. Nirxên binbeş ên xêrxwaziyê tevî nimuneyên xwe li jêr hatine nivîsîn;

“...Çûkek tê ji zarokan re dibêje, “Wê bavê we serê we jêke, ji xwe re birevin.” (Alîkarxwazî)

“...Fatik tu rahêje kumê birayê xwe û bireve, Alik jî bila bi dû te keve, bê çima tu kumê min nadî min? Û bi wî hawayî bazdin, xwe xelas bikin.” (Alîkarxwazî)

“...Li wir ji xwe re disebibin, dişixulin, nanê xwe derdixin.” (Xwedî berpirsiyarîbûn)

“...Lawik mezin bûye, xweha wî dixwaze wî bizewicîne.” (Xwedî berpirsiyarîbûn)

“...Dere wê ji birayê xwe re dixwaze û wan dizewicînin.” (Xwedî berpirsiyarîbûn)

“...Fatik, Alik û jina wî hez ji hev dikin, kêfa xwe ji hev re tînin.” (Hezkirina kemilî)

“...Bi hev re gelek zehmetî û rojên zor derbas kirine, dilê wî bi ser xweha wî ve ye.” (Hezkirina kemilî)

“...Layê paşê bi heft dilan dil dikeve keçikê.” (Hezkirina kemilî)

“...Li gundê mala birayê wê dibihîzin ku li bajarê filan derê li mala filan paşayî genim heye û li xelkê bela dikin.” (Alîkarxwazî)

“...Ji wan re dibêjin, niha hûn gelekî betilîne werin rûnên, bêhna xwe vekin, gepek nan bixwin.” (Alîkarxwazî)

“...Keçik û birayê xwe xwe çem hev dikin, hevdu maçî dikin.” (Hezkirina kemilî)

“...Lawik dike ku jina xwe bikuje, xweha wî nahêle. Jinbira xwe efû dike. Têra wan genim jî dide wan û wan dişîne malê.” (Efûkerî)

Dewlemendî nirxeke binbeş a hêzê ye û di çîroka alik û fatik de li cihekî ev nirx hatiye tespîtîkirin;

“... Mala paşê dewlemend e, halê keçikê xweş e.” (Dewlemendî)

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz zîrebûn nirxeke binbeş a serketinê ye û di çîroka alik û fatik de li sê cihan ev nirx hatiye tespîtîkirin. Li her sê cihan zîrebûn rasterat nehatibe gotin jî ji tevgerê û ji wateya hevokê tê fêhmîkirin ku ev nirx hatiye bikaranîn;

“...Zarokan ji xwe re mişkek girtine û carê terîka mişk didin destê pîrê. Pîrê dibêje, hûn hîn qelew nebûne û dîsa wan xwedî dike.”

“...Li dora pîrê derin û tîn, dibêjin, em ê pêşiyê serê te bişon dûre tê me bişo.”

“...Heta pîrê dibêje na, filan bêvan zarok xwe lê dîkin yek, wê dixin dista ava kelandî û bazdidin. xwe bi wî hawayî ji pîrê xelas dîkin.”

Neqandina helwestên xwe û xweserbûn du nirxên binbeş ên nirxa xwetêgihînê ne. Di çîrokê de li du cihan ev nirx hatiye tespîtkirin ku ji wateya hevokê tîn fêhmkin;

“...Didin ser piştê hev û xwe ji bavê xwe bi dîr dixin, derin.” (Neqandina helwestên xwe)

“...Geh heta ji wan tîn bazdidin, geh dimeşin; axirê xwe xelas dîkin.” (Xweserbûn)

Mehrkin tîgeheke dînî ya îslamê ku di nav civakên misilmanan de tîn dîtin. Li gorî Schwartz dîndarî nirxeke binbeş a rêz û rêçikan. Di çîroka alik û fatik de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...keçikê qanix dîke û wê dibe malê; dawetekê li dar dixê û wê li xwe mehr dîke.” (Dîndarî)

Ewlehiya malbatê nirxeke binbeş a ewlekariyê ye. Di çîroka alik û fatik de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin ku ji wateya hevokê tîn fêhmkin;

“...Keçik dibêje, Ez ê yeke ku bi şîrê xezalan xwedî bûye ji birayê xwe re bînim. Jinbava me ev qas xayîn derket, belkî yeke ku şîrê însanan nexwaribe wilo bêmîrwet dernekeve.” (Ewlehiya malbatê)

## 2.16. Çîroka Gur û Hec

### 2.16.1. Kurtiya çîroka gur û hec<sup>67</sup>

Hebû tune bû, rehme li dê û bavê min û we bû. Hebû gurek. Gur rojekê got, ez ê herim hecê, ez ê dev ji malê heram û diziyê berdîm. Çû ji hevalê xwe re got;

- Ez ê herim hecê.

Hevalê wî pê kenîyan gotin;

- Ma tu herî hecê tu nema karî derkevî nêçîrê û heywanan bikujî, tîn çî bixwî? Û ku tu herî ka em ê ji te re bêjin çî, em ê navê te bikin çî?

Gur got;

---

<sup>67</sup> Aslîxan Yildirim, *hb*, 2013, r.233.

- Îşê we pê tune. Ji min re bêjin Hecî Mihemed û hew.

Xatir xwest û ket ser riya hecê. Çû çû çû pêrgî mîhekê bû, nêrî ku mîh ji kerî maye. Mîheke pir xweşik e. Tenê ji xwe re diçêre. Dilê gur gelekî bijiyayê di dilê xwe de got, gelo ez vê mîhê bixwim, ez nexwim.

.....

Ket ser riya xwe, piştî çend qonaxan nêrî ku qantirek di mêrgekê de diçêre û bi her çar lingan ve girêdayî ye. Ser û qûna qantirê bûye yek, hingî qelew e. Dilê gur li ser êşiya, ber pê de çû got,

- Merheba hevalê qantir.

Kantirê got,

- Ehlen hevalê gur ser çavan. Tu ji ku têyî hevalê gur?

Gur dibêje,

- Ez dikim herim hecê û ez gelekî birçî bûme. Hek ji min bê ez ê te bikujim û ez ê te bixwim. Qantirê nêrî ku hebekî aqilê gur kême, dibêje;

- Ser çavan hevalê gur. Her tê min bixwî, xweşik bixwe. Nalbendekî min î gelekî qenc hebû nalê min gelekî qewîn û xweşik danî, hema wî nalê min derxî, bila hesin nere zikê te.

Kêfa gur hat got;

- Bila ka lingê xwe hilgêve ez ê nalê te derxim.

.....

Dûre ji xwe re got, wê bêbava qantirê çî kir ji min. Yanê gur wê biçûya hecê. Hebekî bi paş de vegeriya got, bi xwedê ez birçî me ma ez çilo bikim, a baş ez li mîhê vegerim. Rabû li mîhê vegeriya. Mih dinêre ku gur her bi her xwe tîne ber pê de, got,

- Destbirakê gur ma te xêr e, wek ku îro nêta te xerab e, tu dev ji min naqerî.

Diran jî di devê gur de nemane. Gur got;

- Ya mîha delal, bi xwedê ez gelekî birçî me, goştê te jî pir xweş e. Ku ji min bê ez ê te bixwim. Mihê got,

- Bila, lê tiştêkî tenê ez ê ji te bixwazim. Şivanekî me hebû hingî bilûrvan bû. Min gelekî bêriya wî kiriye. Hema tu jî sê caran berê xwe bide bayê kur û neqla bilûrê bike û were min bixwe. Ma ez çilo bikim.

Gur rabû neqla bilûrê sê caran zûriya. Hema kûçik û lê vehewiyane, bi dû gur ketine. Gur bazdaye, bi zorê xwe ji nav lepê wan xelas kiriye. Dîsa bi riya xwe de meşiya. Pêrgî mîhînekê bûye. Hingî meşiyaye û betiliye û birçî ye ber çavê wî tarî dibe, nema ber xwe dibîne. Dere bal mehîne jê re dibêje,

.....

Mihîne nêrî ku nêta gur xera bû, jê re got;

- Temam, lê pêşiyê were ser piştê min ez te hebekî bigerînim. Ez ê bazdim, ez li ku sekinîm min li wir bixwe, ma çênabe?

Gur dibêje;

- Ma çima çênabe.

Li ser piştê wê siwar bû û mîhîne bazda. Bazda gihîşt gundekî. Gundî extiyar û mezin û zarok hemû derketin gotin, ma vî tiştê wîlo kê dîtiye? Gurek li ser piştê mîhînekê ye û di nav gund de dimeşe. Li derdora wan bûn kom û bi keviran bi wan ketin, bi zorê xwe ji nav lepê wan xelas kirin û bazdan. Her yek bi derekê de çûn. Gur çû bal şkeftekê dora xiramekî, ket wê şkeftê. Ji birçîna hal tê de nemaye, yanê mêrik wê biçûya hecê.

Çima tu nabêjî yekî gundî navê wî Mihemed e; bivirekî seqakirî pê re ye û kirî here êzingan. Haya wî ji gur tune. Gur jî ji xwe re diştexile, dibêje;

- Lawo Hecî Mihemed, birçiyoy, dizoy, malheramxuro, ma kalikê te hecîî ma bavê te hecîîî ma apê te hecîîîî. Binê bê te çi kir serê xwe. Ma tu li ku û hec li ku. Lawo ma qey kes tunê ku bivirekî li serê te bixê û stûyê te jêke. Deng dere Mihemed, ew jî dibêje, wey tu çi dibêjî û bivir li serê gur dixê, serê wî perçe dike.

## 2.16.2. Di çîroka gur û hec de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.17: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Gur û Hec de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
SERKETIN	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Her tê min bixwî, xweşik bixwe. Nalbendekî min î gelekî qenc hebû nalê min gelekî qewîn û xweşik danî, hema wî nalê min derxî, bila hesin nere zikê te.</li> <li>• Hema tu jî sê caran berê xwe bide bayê kur û neqla bilûrê bike û were min bixwe.</li> <li>• Temam, lê pêşiyê were ser piştê min ez te hebekî bigerînim. Ez ê bazdim, ez li ku sekinîm min li wir bixwe, ma çênabe?</li> </ul>	3
HEZPERESTÎ	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Ya mîha delal, bi xwedê ez gelekî birçî me, goştê te jî pir xweş e.</li> </ul>	1
RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Gur rojekê got, ez ê herim hecê, ez ê dev ji malê heram û diziyê berdim.</li> <li>• Xatir xwest û ket ser rîya hecê.</li> <li>• Nalet li şeytên anî, jî xwe re got, ma ne ez ê herim hecê.</li> <li>• Ez dikim herim hecê û ez gelekî birçî bûme.</li> <li>• Yanê gur wê biçûya hecê.</li> <li>• Birçîna hal tê de nemaye, yanê mêrik wê biçûya hecê.</li> <li>• Lawo Hecî Mihemed, birçiyoy, dizoy, malheramxuro, ma kalikê te hecîî ma bavê te hecîîî ma apê te hecîîîî.</li> </ul>	7
RAJÊRÎBÛN (RÎAYET)	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Dilê gur gelekî bijiyayê di dilê xwe de got, gelo ez vê mihê bixwim, ez nexwim.</li> <li>• Got, ma gelo ez cardin li mîha xwe vegerim. Di xwe fikirî got, çênabe û meşîya.</li> </ul>	2

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka gur û hec de çar cureyên nirxan hatine tespît kirin; serketin, hezperestî, rêz û rêçik, rajêrîbûn. Nîrxên herî zêde ku

hatiye tespîtîkirin jî rêz û rêçik e. Hec û hecî ew têgehên dînî yên Îslamê ne û li gorî Schwartz dîndarî nirxa binbeş a rêz û rêçika ye. Di çîroka gur û hec de li heft cihan em rastî vê nirxê dibin.

“...Gur rojekê got, ez ê herim hecê, ez ê dev ji malê heram û diziyê berdim.”

“...Xatir xwest û ket ser riya hecê.”

“...Nalet li şeytên anî, ji xwe re got, ma ne ez ê herim hecê.”

“...Ez dikim herim hecê û ez gelekî birçî bûme.”

“...Yanê gur wê biçûya hecê.”

“...Birçîna hal tê de nemaye, yanê mêrik wê biçûya hecê.”

“...Lawo Hecî Mihemed, birçiyê, dizo, malheramxuro, ma kalikê te hecîî ma bavê te hecîîî ma apê te hecîîîî.”

Di çîroka gur û hec de nirxa binbeş a hezperestiyê ku hatiye tespîtîkirin zewq e. Ji wateya hevokê ev nirx tê derxistin;

“...Ya mîha delal, bi xwedê ez gelekî birçî me, goştê te jî pir xweş e.” (Zewq)

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka gur û hec de nirxa binbeş a serketinê ku hatiye tespîtîkirin şarezabûn e. Di çîrokê de ji tevgerên baqilane yên serlehengan serkeftina serlehengan pêk tê. Di çîrokê de ev şarezabûna wan tê fêhmîkirin. Bo nimûne;

“...Her tê min bixwî, xweşik bixwe. Nalbandekî min î gelekî qenc hebû nalê min gelekî qewîn û xweşik danî, hema wî nalê min derxî, bila hesin nere zikê te.”

“...Hema tu jî sê caran berê xwe bide bayê kur û neqla bilûrê bike û were min bixwe.”

“...Temam, lê pêşiyê were ser piştê min ez te hebekî bigerînim. Ez ê bazdim, ez li ku sekinîm min li wir bixwe, ma çênabe?”

Bixwekarî/ xwekontrolîkirin nirxa binbeş a rajêrîbûnê ye û di çîroka gur û hec de li du cihan ev nirx hatiye tespîtîkirin;

“...Dilê gur gelekî bijiyayê di dilê xwe de got, gelo ez vê mihê bixwim, ez nexwim.”

“...Got, ma gelo ez cardin li mîha xwe vegerim. Di xwe fikirî got, çênabe û meşiya.”

## 2.17. Çîroka Jina Wezîr

### 2.17.1. Kurteya çîroka jina wezîr<sup>68</sup>

Dibê, wezîrekî mîrê Cizîra Botan hebû. Mîr dil ketibû jina Wezîr. Demekê Mîr wezîrê xwe şand xûkîtiyê. Her wezîr diçû xûkîtiyê şeş mehan nedihat. Heta xerc ji xelkê dida hev demek dirêj derbas dibû. Piştî wezîr diçe mîr dibêje, “wezîr ne li mal e, ez ê herim mala wan.” Ro li nivro ye, dinya germ e; mîr rabû çû mala wezîr. Pîreka wezîr jî li mal e. Pîreka wezîr dinêre ku mîr hat mala wê, ma ecêbmayî. Pîreka wezîr nikare li himberî mîr biaxive, bêje “ez tenê me neyê mala me.” Bixar baz da, çû doşeka ku wezîr di nav de radiza anî ji mîr re danî. Mîr derbas bû, li ser doşekê rûnişt. Jinikê dît ku lebta mîr ne baş e, nêta wî xerab e. Jina wezîr radibe çend hêkan ji mîr re dikelîne û her yekê bi hawayekî rengîn dike û datîne ber mîr. Mîr hêkan dixwe pê de jina wezîr dipirse û dibêje; - Ya mîrê min, te ji van hêkan çi fêm kir, kîjan şikil hêk ji ya din cudatir bû? Mîr dibêje; - Hemû wek hev bûn. Îcar jina wezîr dibêje; - Ya mîrê min, pîrek hemû jî yek in. Tu Mîrê Botanê yî, tu gelekî mezin î û tu hatiye mala wezîr tu li dor namûsa wezîr digerî. Ev bi te nakeve. Mîr gelekî li ber xwe ket, bimira jê re xweştir bû. Rabû û berê xwe da malê çû mal. Kesek pê nizane lê mîr bi xwe zane û gelekî li ber xwe dikeve.

.....

Wek ku tu cerek av bi wezîr dakî, di cih de dimîne. Ji xwe re dibêje, wey! Heye neye mîr hatiye mala me. Kesekî din ku bizmarê zêrî bi kar bîne tune, ma ji wî pê ve wê kî be.

.....

Ka bê mehek çû bê du meh çûn, wezîr qet berê xwe nade jina xwe, pê re naştexile. Jinik di xwe fikirî got, “heye neye ji doşekê tiştêk gihaye zîlamê min. Kesek nizane vê meselê, ji min û mîr pê ve kes tune bû. Çi bûbe ji doşekê bûye.” Rojekê dîsa civata mîr geriyaye. Roja civînê ye, gelek kes li wir in, mîr û wezîr jî di civînê de ne. Keçikek wezîr a 6, 7 salî heye. Diya wê gulekê dide destê keçika xwe û dibêje; - Lawo here vê gulê bibe têxe destê mîr û tê bibêjî, “ya mîrê me, dewsa şêrekî çûye nav baxçeyê me, xwediyê baxçe nema xwe dide ser baxçe, berê xwe nema didê. Îcar ka tu çi dibêjî?”. Keçikê rahişt gulê û çû nav civatê. Wezîr jî li qîza xwe dinêre, dibîne ku qîza wî çû gul da destê mîr û got; - Ya mîrê min diya min got silavan li mîrê min bike. Dewsa şêrekî hatiye nav baxçeyê me, xwediyê baxçe nema xwe dide ser baxçe xwe ji baxçe vegirtiye. Ka tu çi dibêjî? Mîr jî dibêje; - Lawo silavan li diya xwe bike. Bêje ew dewsa çûye nav baxçe ne hingiftiye darekê, ne hingiftiye pelekî; çilo ketiye nav baxçe wilo derbas bûye derketiye. Ne hingiftiye şaxekî. Îcar bila xwediyê baxçe guh bide baxçeyê xwe bila baxçeyê wî hişk nebe. Wezîr fêm kir bê mesele çi ye. Dilê wî hênik bû û dema hat malê bi jina xwe re bi kêf û eşq axivî. Roj bi roj li hev vegeyan û bidilxweşî heyata xwe derbas kirin.

### 2.17.2. Di çîroka jina wezîr de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.18: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Jina Wezîr de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
----------------	--------------------------------------	--------

<sup>68</sup> Aslîxan Yildirim, *hb*, 2013, r.42.

<b>HÊZ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Tu Mîrê Botanê yî, tu gelekî mezin î.</li> <li>• Kesekî din ku bizmarê zêrî bi kar bîne tune, ma ji wî pê ve wê kî be.</li> </ul>	<b>2</b>
<b>XÊRXWAZÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Dilê wî hênîk bû û dema hat malê bi jina xwe re bi kêf û eşq axivî.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>RAJÊRÎBÛN (RÎAYET)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Pîreka wezîr nikare li himberî mîr biaxive, bêje ‘ez tenê me neyê mala me.’</li> </ul>	<b>1</b>
<b>EWLEKARÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Tu Mîrê Botanê yî, tu gelekî mezin î û tu hatiya mala wezîr tu li dor namûsa wezîr digêrî. Ev bi te nakeve.</li> </ul>	<b>1</b>

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka jina wezîr de çar cureyên nirxan hatine tespîtîkirin; hêz, xêrxwazî, rajêrîbûn û ewlekarî. Di çîrokê de mînakên hêzê li du cihan, ewên din jî her yek ji wan li cihekî hatine tespîtîkirin. Ji bo nirxa hêzê nimune;

“... Tu Mîrê Botanê yî, tu gelekî mezin î.” (Xwedî hêza civakî)

“...Kesekî din ku bizmarê zêrî bi kar bîne tune, ma ji wî pê ve wê kî be.” (Xwedî hêza civakî)

Hezkirina kemilî nirxeke binbeş a xêrxwaziyê ye. Di çîroka jina wezîr de li cihekî ev nirx hatiye tespîtîkirin ku rasterast nehatibe dayîn jî, ji wateya hevokê tê fêhmîkirin;

“...Dilê wî hênîk bû û dema hat malê bi jina xwe re bi kêf û eşq axivî.” (Hezkirina kemilî)

Li gorî Schwartz îtaatkarî nirxeke binbeş a rajêrîbûnê ye û di çîroka jina wezîr de li cihekî ev nirx hatiye tespîtîkirin;

“...Pîreka wezîr nikare li himberî mîr biaxive, bêje ‘ez tenê me neyê mala me.’” (Îtaatkarî)

Mehremiyet yek ji wan nirxên binbeş a ewlekariyê ye ku di çîroka jina wezîr de li cihekî em lê rast hatine. Herçiqasî ev nirx rasterast nehatibe dayîn jî, ji wateya hevokê ev nirx tê derxistin;

“...Tu Mîrê Botanê yî, tu gelekî mezin î û tu hatiyî mala wezîr tu li dor namûsa wezîr digerî. Ev bi te nakeve.” (Mehremiyet)

## 2.18. Çîroka Mihemed

### 2.18.1. Kurteya çîroka mihemed<sup>69</sup>

Hebû tune bû. Wextekî xortek bi navê Mihemed hebû. Mihemed biçûkê çar birayan bû. Rojekê ji rojan her çar birayan xwe kar kir ku herin seyde. Her çaran, tûr û firaxên xwe li milên xwe kirin, dan dû hev û çûn. Çûn û çûn, li vir ketin, li wir ketin ji gundê xwe bi dûr ketin. Gelekî tî bûn. Çavên xwe li avê gerandin. Tu av li der û dora wan tune bû. Dev ji seyda xwe berdan û ji avê pêve nema li tu tiştî geriyên. Carekê nêrîn ku wa ye çalek. xwe li çalê daqûl kirin, nêrîn ku çaleke gelekî kûr e. Werîs bi dewlê ve girêdan û berdan çalê lê dewl negihîşt avê, xwe bi dû de dahiştinê heta bi newqê lê dîsa negihîştin avê. Li hev nêrîn û gotin;

- Ma ka em çî bikin?

Ji tîna ketine, divê bi hawakî xwe bigihînin avê. Birayê wan î mezin got;

- Min dahêjin çalê.

Werîs li newqa wî girêdan û ew daxistin çalê. Piştî ew hinekî berdan bi çalê de, ji hilm û tarîbûna çalê tirsîya û got;

- Zû min derxin!

.....

Dor hat Mihemed. Mihemed got;

- Ku ez ji we re çî bêjim, ez bikim hawar jî hûn min hilnekişînin heta hûn min berdin binê çalê.

Mihemed werîs li newqa xwe girêda û xwe berda çalê. Hêdî hêdî gihîşt ser kevirêkî. Dewl tije av kir û hilda ji birayên xwe re. Wî jî xwe daqûl kir ku bi destên xwe avê vexwe. Qurtek li avê xist, dît ku li dawîya çalê şewqek xuya dike. Qenc xeyala xwe dayê û dît ku wa ye keçikek li wê ye ku tu fedî dikî lê binerî. Mihemed di cî de dil li ser avêt. xwe berda cem û li hev rûniştin. Keçik jî di dilê xwe de dibêje, heta niha kesekî ceger nekir ku xwe berde binê çalê, çî xortekî bedew e! Bi hev re peyivîn, dilê xwe ji hev re vekirin. Dîtin ku birayên Mihemed bangî dîkinê. Werîs jê re avêtin ji bo wî bikişînin jor. Mihemed ji keçikê re got;

- Ka pêşiyê tu hilkişe, bi dû te de ez ê hilkişim.

Keçik gelekî bi aqil bû, ji Mihemed re got;

- Pêşiyê tu hilkişe. Dûre tu dikarî werîs ji min re bavêjî û min hilkişîni.

Kir û nekir, Mihemed bi ya wê nekir. Pêşiyê ew hilkişand. Nû keçik ji çalê derket birayên Mihemed lê nêrîn ku li çî binerîn, hema şewq û biraq ji keçikê dere. Werîs davêjin ji Mihemed re ji bo wî jî derxin. Mihemed xwe bi werîs girêdide û wî dikişînin jor. Wê gavê birayê mezin şûrê xwe davêje werîs, werîs dibire û Mihemed dikeve binê çalê. Keçik bi dû de dike hawar, di devê çalê re bang dike, dibêje;

---

<sup>69</sup> Aslîxan Yildirim, *hb*, 2013, r.151.

- Mihemed, ma min ji te re negot pêşiyê tu hilkişe, min zanibû dinya bêbext e, gava birayên te çav li min kevin wê te di çalê de bihêlin. De guhê xwe baş bide min, bila dengê min qenc bê te. Ber êvarî li qorzîka çalê wê du beran xuya bikin, yek ji wan spî ye yek jî reş e. Wê li hev xin, li hev xin; di vê pevçûnê de geh wê yê reş bibe spî geh wê yê spî bibe reş. xeyala (bala) xwe baş bidê, dawiya pevçûnê divê tu li ser yê spî bikevî. Ku tu li ser yê spî bimînî tê derkevî ser rûyê erdê, lê ku tu li ser yê reş bimînî tê heft tebeqeyan bi binê erdê de herî.

.....

Mihemed xwe diavêt ser yê spî didît ku yê spî dibû reş, xwe diavêt ser yê din, vê carê ew dibû reş, dawiya pevçûnê Mihemed dît ku wa ye li ser yê reş maye û heft tebeqeyan bi binê erdê de çû. Ji ser hişê xwe ket. Carekê çavê xwe vekir nêrî va ye li ciyekî bêav, bêdar, ziwa, hemû ax û kevir e. Heta hinekî hişê wî hat serê wî, rabû ser xwe, meşiya meşiya gihîşt nêzikî gundekî. Çû mala pêşî, li derî xist. Pîrikê derî jê re vekir. Got;

- Xêr e lawo?
- Ma tu mêvanan nahewînî pîrê?
- Çawa lawo, mêvan mêvanê xwedê ne, kerem bike, derbas bibe.  
Mihemed derbasî hundir bû, bêhna xwe vekir, dûre peşkek av ji pîrê xwest. Pîrê ma heyirî got;
- Hûûû lawo ma ne ava me tune ye, ava me xelas bûye.
- Çima pîrê ava te tune ye?
- Nepirse lawo, tu dibînî der û dora me ji bêaviyê hişk î hola bûye. Marekî xwe xistiye devê kaniya me û heftiyê em keçikekê didinê hetanî peşkek ava vexwarinê dide me. Tu keç li gundê me neman. Sibê jî dora qîza mala Paşê ye. Ew keçik tenê maye di gundê me de. Gund hemû heziniye, wê gundê me biqele.

.....

Av ji xwîna mar hemû sor dibe. Gundî man şaş, li bin guhê hev ketin û bangî hev kirin, ji hev re gotin, “Mar kuştin kaniya me vebûûû!” Keçikê destê xwe di nav xwîna mar dakir û li nav piştê Mihemed xist. Paşê jî li malê heziniye û ji xwe re dibêje malik li min xera bû, mar keçika min niha xwariye, gundê min jî xera bû çû, qîz tê de neman. Hîn wilo, dît ku gundî bi ser de qoriyan. Her yekî ji aliyê xwe ve de digot, “Paşeyê min yekî mar kuşt û keçika te xelas kir.” Gelekî kêfa Paşê hat. Keçika wî hat malê û hev himbêz kirin. Ji gundiyan pirsî, got;

- Ma ev ê mêrxas kî ye, ka bînin cem min. Gundiyan got;
- Yekî xerîb bû wele, em nas nakin. Keçikê got;
- Yabo em ê nas bikin, nîşana min lê ye. Wexta mar kuşt, min destê xwe di xwîna mar dakir û li piştê wî xist. Paşê got;
- Ka bila kes di hundiran de nemîne, bila hemû bên vê derê. Her kes ji mala xwe derketin hatin mala Paşê. Keçikê nêrî lawik di nav wan de nedît.

Paşê pirsî;

- Mala we lê nenêriye maye? Gundiyan got;
- Paşeyê min, me li gund hemûyî nêrî, mala pîrekê tenê li serê gund heye em neçûn wir tenê.
- Paşê got;
- Herin wê derê jî.

Rabûn çûn mala pîrê, dîtî ku wa ye xortek li wir rûniştiye. Ew birin cem Paşê. Keçîk lê dinêre ku va ye nîşana wê li piştî lawîk e. Paşê ji Mihemed re got;

- Lawo te keçîka min ji mirinê û te gund jî ji bêaviyê xelas kir. Ez jî te re çî bikim? Bixwaze jî min şîrê şêr di eyarê şêr de ez jî te re bînim.
- Min tiştêk jî te navê, lê ku tu karibî min bi ser rûyê erdê bixî û bes.
- Xwezî te keçîka min bidaya mar û te ev jî min nexwesta. Bes min soz da te ez mecbûr im daxwaza te bînim çî. Lê de binere lawo, tê heft çiyayan derbas bikî, tê bigihîjî çiyayekî mezin. Li wî çiyayî Teyrê Sîmir heye, hêlîna wî li serê tehtekê ye. Her sal çêlikên xwe digihîne ber firê lê marek tê wan dixwe. Heke tu çêlikên wê jî mar xelas bikî, ew dikare te bigihîne ser rûyê erdê.

Rabûn têra wî nan û xwarin pê re kar kirin û Mihemed da ser rê.

.....

Hema bi carekê re şûrê xwe derdixê, li mar dixê û wî parçe parçe dike. Teyrê Sîmir tê ku va ye yek şûr di dest de li bal çêlikên wê ye. Dil wê de kirî mêrik çêlikên wê bibe. Xwe dahîjt ser serê Mihemed ku wî bikuje, bû şîqêşîqa çêlikan. Ji diya xwe re gotin;

- Wî zilamî em jî mar xelas kirin.  
Û parçeyên mar pêş wê kirin. Nêrî ku bi rastî çêlikên wê jî mirinê xelas kirine. Teyrê Sîmir jî Mihemed re got;
- Ka tu çî jî min dixwazî, ez dinyayê jî te re xera bikim yan ava bikim?
- Min tiştêk jî te navê, min tenê divê tu min bi ser rûyê erdê bixî û hew. Teyr ma heyirî. Got;
- Xwezî mar dîsa çêlikên min bixwara û te ev tişt jî min nexwesta. Lê çû min soz da te. De here jî min re heft tenûr nan û heft rehnê beranan bîne û were.

Mihemed çû gundê Paşê, heft tenûr nan û heft rehnê berana anîn û hat. Teyr, Mihemed li stûye xwe kir û bi hewa ket.

.....

Mihemed di ber re nan û goştê wê didayê. Carekê nêrî va ye goşt xelas bûye. Hindik jî maye bigihîjin ser rûyê erdê. Mihemed rabû rehnêkî xwe jê kir û da teyr. Teyr nêrî tama vî goştî ne wek ê berê ye, fêr kir ku Mihemed rehnê xwe dayê. Ew rehn xist bin zimanê xwe. Teyr dîsa pirsî;

- Dinya jî te ve çilo xuya ye?
- Vê carê bû bi qasî teştêkê.
- De baş e, xwe qenc bigire, hindik ma, em ê dakevin ser rûyê erdê.  
Hêdî hêdî xwe berdînan û nêzikî gundê Mihemed danîn. Teyr got;
- Mihemed, ew goştê dawiyê te da min ê çî bû?
- Min jî rehnê xwe jêkiribû.

Teyr goştê bin zimanê xwe derxist û li ciyê berê xist, alast alast û got, de here. Teyrê Sîmir vegeya cem çêlikên xwe. Mihemed hat ber deriyê mala xwe, dît ku va ye dawetek li dar e, gundî hemû direqîsin. Ji gundiyan pirsî, got;

- Ev çî ye, xêr e, daweta kê ye? Jê re gotin;
- Birayê te yî mezin dike bizewice.

Çû ber şîbakeya bûkê, nêrî ku wa ye fîncana jehrê di destê bûkê de ye û dike ku vexwe. Rabû bang kirê û fîncan jî destê wê girt û xwe avêtin paxila hev, Mihemed got;

Bistikekê li vir bisekine ez ê niha bêm. Çû her sê birayên xwe kuşt û meseleya xwe ji gundiyan xwe re got û keçik li xwe mehr kir. Û her du jî gihîştin meqsed û miradê xwe.

## 2.18.2. Di çîroka mihemed de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.19: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Mihemed de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
HÊZ	<ul style="list-style-type: none"> <li>Mihemed çû gundê Paşê, heft tenûr nan û heft rehnê berana anîn û hat.</li> </ul>	1
SERKETIN	<ul style="list-style-type: none"> <li>Ka pêşiyê tu hilkişê, bi dû te de ez ê hilkişim. Keçik gelekî bi aqil bû.</li> <li>Mar gava serê xwe dirêj dike ku keçikê dabelîfne, Mihemed bêyî ku bihêle kes wî nas bike ji nişka ve şûrê xwe li nivê devê wî dixê, mar dibe du filqe.</li> <li>Yabo em ê nas bikin, nişana min lê ye. Wexta mar kuşt, min destê xwe di xwîna mar dakir û li piştê wî xist.</li> </ul>	3
ŞIYARKIRIN/ HIŞYARKIRIN	<ul style="list-style-type: none"> <li>Rojekê ji rojan her çar birayan xwe kar kir ku herin seydê. Her çaran, tûr û firaxên xwe li milên xwe kirin, dan dû hev û çûn.</li> <li>Ku ez ji we re çî bêjim, ez bikim hawar jî hûn min hilnekişînin heta hûn min berdî binê çalê.</li> <li>Keçik jî di dilê xwe de dibêje, heta niha kesekî ceger nekir ku xwe berde binê çalê, çî xortekî bedew e!</li> <li>Radihêje şûrê xwe û diçe devê kaniyê.</li> <li>Ma ev ê mêrxas kî ye, ka bînin cem min.</li> <li>Hema bi carekê re şûrê xwe derdixê, li mar dixê û wî parçe parçe dike.</li> </ul>	6
GERDÛNÎBÛN	<ul style="list-style-type: none"> <li>Xwezî te keçika min bidaya mar û te ev ji min nexwesta. Bes min soz da te ez mecbûr im daxwaza te bînim cî.</li> <li>Xwezî mar dîsa çêlikên min bixwara û te ev tişt ji min nexwesta. Lê çû min soz da te.</li> </ul>	2
XÊRXWAZÎ	<ul style="list-style-type: none"> <li>Bi hev re peyivîn, dilê xwe ji hev re vekirin..</li> <li>Mihemed jî kara xwe kiriye, wê biçe keçikê xelas bike.</li> <li>Paşeyê min yekî mar kuşt û keçika te xelas kir.</li> </ul>	7

	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Rabûn têra wî nan û xwarin pê re kar kirin û Mihemed da ser rê.</li> <li>• Wî zilamî em ji mar xelas kirin.</li> <li>• Teyr goştê bin zimanê xwe derxist û li ciyê berê xist, alast alast û got, de here.</li> <li>• Rabû bang kirê û fincan ji destê wê girt û xwe avêtin paxila hev.</li> </ul>	
<b>RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Çawa lawo, mêvan mêvanê xwedê ne, kerem bike, derbas bibe.</li> <li>• Meseleya xwe ji gundiye xwe re got û keçik li xwe mehr kir.</li> </ul>	<b>2</b>
<b>EWLEKARÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Lawo te keçika min ji mirinê û te gund jî ji bêaviyê xelas kir. Ez ji te re çî bikim? Bixwaze jî min şîrê şêr di eyarê şêr de ez ji te re bînim.</li> <li>• Ka tu çî ji min dixwazî, ez dinyayê ji te re xera bikim yan ava bikim?</li> <li>• Heke tu çêlikên wê ji mar xelas bikî, ew dikare te bigihîne ser rûyê erdê.</li> </ul>	<b>3</b>

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka Mihemed de heft cureyên nirxan hatine tespîtkirin; hêz, serketin, şiyarkirin, xêrxwazî, gerdûnîbûn, rêz û rêçik, ewlekarî. Di nav van de nirxên herî zêde ku hatine dîtin xêrxwazî ye. Hezkirina kemilî, alîkarxwazî nirxên binbeş ên xêrxwaziyê ne û di çîroka Mihemed de li heft cihan ev nirx hatine tespîtkirin;

“...Bi hev re peyivîn, dilê xwe ji hev re vekirin..” (Hezkirina kemilî)

“...Mihemed jî kara xwe kiriye, wê biçe keçikê xelas bike.” (Alîkarxwazî)

“...Paşeyê min yekî mar kuşt û keçika te xelas kir.” (Alîkarxwazî)

“...Rabûn têra wî nan û xwarin pê re kar kirin û Mihemed da ser rê.” (Alîkarxwazî)

“...Wî zilamî em ji mar xelas kirin.” (Alîkarxwazî)

“...Teyr goştê bin zimanê xwe derxist û li ciyê berê xist, alast û got, de here.” (Alîkarxwazî)

“...Rabû bang kirê û fincan ji destê wê girt û xwe avêtin paxila hev.” (Hezkirina kemilî)

Wêrekî, jiyîna jiyanekê guhêrok ew nirxên binbeş ên şiyarkirin/hişyarkirinê ne. Di çîroka Mihemed de li şeş cihan ev nirx hatine tespîtkirin;

“...Rojekê ji rojan her çar birayan xwe kar kir ku herin seydê. Her çaran, tûr û firaxên xwe li milên xwe kirin, dan dû hev û çûn.” (Jiyîna jiyanekê guhêrok)

“...Ku ez ji we re çî bêjim, ez bikim hawar jî hûn min hilnekişînin heta hûn min berdî binê çalê.” (Wêrekî)

“...Keçik jî di dilê xwe de dibêje, heta niha kesekî ceger nekir ku xwe berde binê çalê, çî xortekî bedew e!” (Wêrekî)

“...Radihêje şûrê xwe û diçe devê kaniyê.” (Wêrekî)

“...Ma ev ê mêrxas kî ye, ka bînin cem min.” (Wêrekî)

“...Hema bi carekê re şûrê xwe derdixe, li mar dixê û wî parçe parçe dike.” (Wêrekî)

Dewlemendî nirxa binbeş a hêzê ye û hin têgeh dewlemendiyê nîşan didin. Di çîroka Mihemed de li cihekî em rastî têgehên bi vî rengî dibin ku nirxa dewlemendiyê vehewandiye;

“...Mihemed çû gundê Paşê, heft tenûr nan û heft rehnê berana anîn û hat.” (Dewlemendî)

Serkeftîbûn, şarezabûn, bûyîna kesekî ku gotina wî/wê nayê şikandin, zîrekbûn nirxên binbeş ên serketinê ne. Di çîroka Mihemed de li sê cihan serkeftîbûn, şarezabûn û zîrekbûn hatiye tespîtkirin;

“...Ka pêşiyê tu hilkişe, bi dû te de ez ê hilkişim. Keçik gelekî bi aqil bû.” (Zîrekbûn)

“...Mar gava serê xwe dirêj dike ku keçikê dabelîne, Mihemed bêyî ku bihêle kes wî nas bike ji nişka ve şûrê xwe li nivê devê wî dixê, mar dibe du filqe.” (Serkeftîbûn)

“...Yabo em ê nas bikin, nîşana min lê ye. Wexta mar kuşt, min destê xwe di xwîna mar dakir û li piştê wî xist.” (Şarezabûn)

Bicihanîna sozan di nav civakê de tevgereke bi fezîlet e. Li gorî pîvana nirxan a Schwartz jî fezîletdarbûn nirxeke binbeş a gerdûnîbûnê ye. Di çîroka Mihemed de li du cihan ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Xwezî te keçika min bidaya mar û te ev ji min nexwesta. Bes min soz da te ez mecbûr im daxwaza te bînim cî.” (Fezîletdarbûn)

“...Xwezî mar dîsa çêlikên min bixwara û te ev tişt ji min nexwesta. Lê çû min soz da te.” (Fezîletdarbûn)

“Mehrkirin, mêvanê xwedê” ew têgehên dînî yên îslamê ne. Li gorî pîvana nirxan a Schwartz dîndarî nirxeke binbeş a rêz û rêçikan e. Di çîroka Mihemed de li du cihan ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Çawa lawo, mêvan mêvanê xwedê ne, kerem bike, derbas bibe.” (Dîndarî)

“...Meseleya xwe ji gundiye xwe re got û keçik li xwe mehr kir.” (Dîndarî)

Li gorî Schwartz li hemberî qencyê qencî nirxeke binbeş a ewlekariyê ye. Di çîroka Mihemed de li sê cihan ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Lawo te keçika min ji mirinê û te gund jî ji bêaviyê xelas kir. Ez ji te re çi bikim? Bixwaze ji min şîrê şêr di eyarê şêr de ez ji te re bînim.” (Li hemberî qencyê qencî)

“...Ka tu çi ji min dixwazî, ez dinyayê ji te re xera bikim yan ava bikim?” (Li hemberî qencyê qencî)

“...Heke tu çêlikên wê ji mar xelas bikî, ew dikare te bigihîne ser rûyê erdê.”

## 2.19. Çîroka Mirîşka Gavên

### 2.19.1. Kurteya çîroka mirîşka gavên<sup>70</sup>

Layê gavan wek her roj garan bir û çû çolê. Dî ku va ye li ser tehtekê hêkek dipeke wî aliyî û wî aliyî ji xwe re dilîze. Rahîşt wê hêkê ji xwe re pê list, êvarê jî bi xwe re anî malê. xweha wî hêk dît got;

- Ev çi ye?
- Li çolê li ser tehtekê ji xwe re dilîst, min jî rahîştê ji xwe re anî, te divê bila ji te re be.

---

<sup>70</sup> Aslîxan Yildirim, *hb*, 2013, r.237.

Her du zarokan têra xwe pê lîstin; bû evar, razan. Diya wan sibehê rabû, dora xwe da hev, karê xwe kir û derket nav gund. Êvarê tê malê ku va ye hêka wan bûye mirîşk. Dinêrin va ye mirîşk zane biştexile. Kêfa xwe ji hev re tînin û mirîşk dibe yek ji kufletê malê. Li gund melê suxte datanîn. Mirîşka mala gavên got;

- Wa yadê, min divê tu min jî bibî ber melê deynî, ez ê bixwînim.

- Lawo tu mirîşk î, tê çilo bixwîni, wê xelk nebêjin çi?

Kir û nekir mirîşk ji ya xwe daneket. Rabûn ew birin cem melê û gotin;

- Mele!

- Çi ye!

- Tê mirîşka me jî bielimîni Quranê.

- Ez ê çilo mirîşkê bielimînim Quranê, we aqilê xwe berdaye?

Mirîşkê dest bi şitexaliyê kir û li dora melê çû û hat. Mele ma şaş. Kir û nekir dev ji melê neqeriya. Dawiyê mele qanix kir. Mirîşkê li cem melê dest bi xwendinê kir. Her roj wek hemû kesî çû û hat dersa xwe.

.....

Layê paşê dil ketiyê, aqil li ser berda, çavê wî ma li ser keçikê. Wê jî di birkê de sobanî kir xwe qenc şûşt, eyarê xwe dîsa li xwe kir, çû beqdûnis çini û veqeriya da melê, hîn hevalên wê bi rê de ne. Mele ma ecêbmayî. Tu nabêji layê paşê dide dû mirîşkê, dibîne ku mirîşk ket mala melê. Heta suxte li malên xwe bela dibin, dere ji melê dipirse dibêje;

- Ew çi mirîşk e tê mala te?

Mele ji layê paşê tirsîya, got;

- Mirîşka mala gavên e. Suxta min e. Tê Quranê dixwîne.

.....

Layê paşê tê malê, ban diya xwe dike dibêje;

- Yadê yadê ka were.

- Çi ye?

- Ji bavê min re bêje, bila here mala gavên ji min re mirîşka wan bixwaze.

- Tê çi bikî ji mirîşka gavên? Hewşa te tije mirîşk in.

.....

Mala paşê xwe kar kirin û çûn xwestina mirîşkê. Piştî bîstikekê rûniştin gotin, em hatine mirîşka we ji layê xwe re bixwazin. Mala gavên got;

- Hûn ê çi bikin ji mirîşkê?

- Layê me wilo dixwaze ma em çi bikin.

Qelenê wê bi piranî didin û mirîşkê ji layê xwe re tînin. Mirîşk birin odeya lawik. Lawik ma li ber, pê re diştexile, dibêje;

- Ez zanim tû keçikek gelekî xweşik î, min tu dîtî, min dît te eyarê xwe ji xwe kir, roja tu ketî birkê ez dil ketim te, ka eyarê xwe ji xwe bike.

Dike û nake mirîşk tiştêkî li xwe heq nake; dibe qîdqiya wê û hew. Jina paşê her sibeh radibe ku va ye der dor tije zelq bûye. Dibe pitpita wê, malê paqij dike û di ber re dibêje;

- Xelk derin qîzê axa tînin, qîzê mîran tînin, layê min xwelî li serê min kiriye çûye mirîşka ku her roj zelqa dike aniye.

Rojekê daweta cîranê wan çêdibe, xesû karê xwe dike ku here dawetê. Çekên xwe ji xwe dike, wê serê xwe bişo, mirîşkê hat bi ser çekên wê de zelq kir. xesûyê rahişt heskê, avêtê û got;

- Kiş bêxwediyê, mirîşkê me hindik bûn me çû ya gavên jî li xwe zêde kir.

.....

Berî dawet biferike, mirîşk bi xar hat malê, eyarê xwe kişand xwe, bi dû de xesû hat malê. Wexta layê wê hat cem bû pitpita wê bi ser layê wê de;

- Xwelîsero, kezepşewitiyo, min îro yek li dawetê dît, di dinyayê de keseke wilo xweşik tune ye, encex ew layiqî te bû, ma mirîşka gavên.

.....

Xesû xwe hîn bêhtir diqehirîne, radihêje şûnik davêjê û dibêje;

- Kişî te serê min xwarê, xelk daweta çêdikin ji keçkan re, em li te hesilîn.

Piştî xesûya wê dere dawetê ew jî eyarê xwe ji xwe dike, xwe dike şikleki din, dere dawetê û li teniştaya xesûya xwe rûdinê. xesûya wê dinêre fêr nake ku ya doh e, dibêje;

- Lawo doh yek li cem min rûniştibû, gelekî sipehî bû, lê tu ji wê jî xweşiktir î, ev tu ji ku yî? Xwelîserê layê min yeke wek te nanî ji xwe re, çû mirîşka gavên anî.
- Ez ji welatê şûnika me.
- Pepû lawo ma welatê şûnika heye?
- Erê.

Heta teqnikî ji xwe re diştexilin. Di vê navê re layê paşê nav mirîşkan saxtî dike, dinêre mirîşka wî ne xuya ye. Dere hundir digere dîsa nabîne. Dinêre va ye eyarê mirîşka wî di qorzîkê de ye. Hema radihêje eyar û davêje êgir dişewitîne. Keçik çilo tê li eyar digere, hema layê paşê xwe davêje newqa wê û nema berdide. Bi dengekî bilind banî diya xwe dike;

- Yadê! Yadê! Ka were.

Dê dibêje;

- Yadê û jehr, xwedê rûyê te reş bike, çî tu ban min dikî ez nayê, mirîşka te bi ser min de zelqan dike.
- Yadê! Tu were! zû were!

Diya wî rabû çû hundir, ku çî bibîne! Dît ku va ye ew keçika xweşik di nav lepên layê wê de ye, cemidî wek ku tu cerek av bi ser daki, ma di ciyê xwe de, devê wê ket hev. Layê wê got;

- Yadê mirîşka min ev bû, ev e bûka te û ji serî ve çîroka xwe ji diya xwe re got. Ji nû ve dawetek li dar xistin ku heft rûnên û behs bikin.

## 2.19.2. Di çîroka mirîşka gavên de dahûrîna nirxên civakî

**Tablo 2.20: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Mirîşka Gavên de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
----------------	--------------------------------------	--------

<b>HÊZ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Xelk derin qîzê axa tînin, qîzê mîran tînin, layê min xwelî li serê min kiriye çûye mirîşka ku her roj zelqa dike aniye.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>HEZPERESTÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Ji nû ve dawetek li dar xistin ku heft rûnên û behs bikin.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>RÊZ Û RÊÇIK (KEVNOŞOPÎ)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Wa yadê, min divê tu min jî bibî ber melê deynî, ez ê bixwînim.</li> <li>Tê mirîşka me jî bielimîni Quranê.</li> <li>Mirîşka mala gavên e. Suxta min e. Tê Quranê dixwîne.</li> <li>Ma wê çilo bikin, wê herin ji mala gavên mirîşkê bixwazin.</li> <li>Binerin, wê mala paşê bên min ji we bixwazin, hûn qelenê min gelekî bixwazin ha.</li> <li>Mala paşê xwe kar kirin û çûn xwestina mirîşkê.</li> <li>Piştî bîstikekê rûniştin gotin, em hatine mirîşka we ji layê xwe re bixwazin.</li> <li>Qelenê wê bi piranî didin û mirîşkê ji layê xwe re tînin.</li> </ul>	<b>8</b>
<b>RAJÊRÎBÛN (RÎAYET)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Kir û nekir mirîşk ji ya xwe daneket. Rabûn ew birin cem melê.</li> <li>Lawik yekî tenê ye, naxwazin dilê wî bihêlin ma wê çilo bikin, wê herin ji mala gavên mirîşkê bixwazin.</li> </ul>	<b>2</b>
<b>EWLEKARÎ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>Diya wan sibehê rabû, dora xwe da hev, karê xwe kir û derket nav gund.</li> <li>Wê jî di birkê de sobanî kir xwe qenc şûşt.</li> <li>Xesûyê serê xwe şûşt, çekên xwe li xwe kir û çû dawetê.</li> </ul>	<b>3</b>

Xwendina Quranê têgeheke dînî ya Îslamê ye. Herwiha xwestina bûkan an xwestina qelenê rêz û rêçikên civakê ne. Li gorî pîvana nirxan a Schwartz bikaranîna van têgehên nirxên dîndarî û rêzdariya li hemberî kevneşopan nîşan dide. Ev nirx ji nirxên binbeş ên rêz û rêçikan e;

“...Wa yadê, min divê tu min jî bibî ber melê deynî, ez ê bixwînim.” (Bi peyva “bixwînim” qesta xwendina Quranê dike. Lewma nirxa dîndarî hatiye bikaranîn.)

“...Tê mirîşka me jî bielimînî Quranê.” (Dîndarî)

“...Mirîşka mala gavên e. Suxta min e. Tê Quranê dixwîne.” (Dîndarî)

“...Ma wê çilo bikin, wê herin ji mala gavên mirîşkê bixwazin.” (Rêzdariya li hemberî kevneşopiyan)

“...Binerin, wê mala paşê bên min ji we bixwazin, hûn qelenê min gelekî bixwazin ha.” (Rêzdariya li hemberî kevneşopiyan)

“...Mala paşê xwe kar kirin û çûn xwestina mirîşkê.” (Rêzdariya li hemberî kevneşopiyan)

“...Piştî bîstikekê rûniştin gotin, em hatine mirîşka we ji layê xwe re bixwazin.” (Rêzdariya li hemberî kevneşopiyan)

“...Qelenê wê bi piranî didin û mirîşkê ji layê xwe re tînin.” (Rêzdariya li hemberî kevneşopiyan)

Bi gotina “qîza axê, qîza mîra” tê fêhmkirin ku axa û mîr xwedî hêzeke civakî ne. Xwedî hêza civakî nirxa binbeş a hêzê ye û di çîroka mirîşka gavên de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Xelk derin qîzê axa tînin, qîzê mîran tînin, layê min xwelî li serê min kiriye çûye mirîşka ku her roj zelqa dike aniye.” (Xwedî hêza civakî)

Dawet di nav civakê de kêfxweşî, şahî û zewq e. Li gorî Schwartz zewq nirxeke binbeş a hezperestiyê ye. Di çîroka mirîşka gavên de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Ji nû ve dawetek li dar xistin ku heft rûnên û behs bikin.” (Zewq)

Qebûlkirina xwestekan îtaatê nîşan dide. Li gorî pîvana nirxan a Schwartz îtaatkarî nirxeke binbeş a rajêrîbûnê ye. Di çîroka mirîşka gavên de li du cihan tê fêhmkirin ku îtaatkarî hatiye bikaranîn;

“...Kir û nekir mirîşk ji ya xwe daneket. Rabûn ew birin cem melê.” (Îtaatkarî)

“...Lawik yekî tenê ye, naxwazin dilê wî bihêlin ma wê çilo bikin, wê herin ji mala gavên mirîşkê bixwazin.” (Îtaatkarî)

Li gorî Schwartz paqijî nirxeke binbeş a ewlekariyê ye. Di çîroka mirîşka gavên de li sê cihan nirxa paqijiyê hatiye tespîtkirin ku ji wateya hevokê tê fêhmkirin;

“...Diya wan sibehê rabû, dora xwe da hev, karê xwe kir û derket nav gund.”  
(Paqijî)

“...Wê jî di birkê de sobanî kir xwe qenc şûst.” (Paqijî)

“...Xesûyê serê xwe şûst, çekên xwe li xwe kir û çû dawetê.” (Paqijî)

## 2.20. Çîroka Reşik

### 2.20.1. Kurteya çîroka reşik<sup>71</sup>

Hebû tune bû. Rehme li dê û bavê min û we bû. Got, hebû sê bira. Navê wan Ehmed û Mihemed û Reşo bû. Reşo hingî mekruh bû jê re digotin Reşik. Bavê wan miriye, ew û pîra diya xwe mane. Halê wan ne xweş bûye, feqîr bûne. Erdê wan jî tune, bûne feqîrê gund. Her sê bira li hev rûniştine gotine wilo nabe. Em ê herin ji xwe re îşekî, xulamtiyekê; bi vî halî naqede. Ji xwe re pirsîne, ka em herin ku, em çawa bikin? Navê axayekî bihîstine ku xulaman dişixulîne, kar dide wan. Bira li hev rûniştine, gotine ka ma bila kî ji me here. Birayê mezin gotiye, ez ê mezin im ez ê pêşiyê herim. Birayê mezin çûye wî gundî, li bal mala axê bûye mêvan. Dibêje;

- Axayê min ez hatime bal te îşekî. Axe dibêje;
- Ser çavan, ez jî li xulamekî digeriyam, lê em ê şertê xwe ji hev re bêjin. Ew jî dibêje;
- Ser çavan, bes hema ku tu min li bal xwe bişixulîne. De ka şertê xwe bêje axayê min. Axê gotiye;
- Li hewşê odak xulaman heye tê li wir bi cî bibî, tê li cem me bimînî. Tê ji me re herî cot. Tajiyêke min heye, tê bi xwe re bibî cot, tajiya min li ku mexel bibe tê li wir cot bikî. Wê qîza min ji te re firavîna te bîne. Bes tu ji ya xwe vegeerî, tu bixeyidî ez ê tehtîk çerm ji piştî te rakim. Ku ez bixeyidim tê ji piştî min tehtîk çerm rakî. Tu qebûl bikî sibê dest bi karê xwe bike.

Dibe sibeh, lawik tajî dide pêşiya xwe û dere çolê. Tajî dere li ser tehtekî mexel dibe. Difîkire bê wê çilo vî tehtî cot bike, tu rê jê nare. Nîvro keçika axê nanê wî jê re dibe. Sifrê li ber datîne û dibêje, bavê min gotiye bila mastê sehnîkê kême neke, bila nan neşîkîne, serê kevçî şil neke û têr bixwe fedî neke. Li ber sifrê dimîne rûniştî, dinêre çî bike wê xerab bikeve. Xwarinê di cih de dide destê keçîkê û dimîne birçî. Heta êvarê tajî ji ser tehtî ranabe. Ji bo wilo tu karî jî nikare bike û êvarê bi halekî ne xweş dide rê tê mala axê. Axe jê dipirse dibêje;

- Ma te cotê xwe xweşik kir, ma te têr xwar?  
Xulam li axê dinêre xwe diqehêrîne, dibêje;

<sup>71</sup> Aslîxan Yildirim, *hb*, 2013, r.194.

- Te got tajiya min li ku mexel hat tê li wir cot bikî, tajî çû li ser tehtekî mexel hat, ma ez ê çilo teht bajom. Te firavîn bi qîza xwe re şand, tu dibêjî mastê sehnîkê kême neke, nan neşikêne, serê kevçî şil neke û têr bixwe fedî neke. Ma ez ê çilo xwarinê bixwim.

Xulam, bi zirt diaxive û dibêje şertê te giran in. Axe dibêje;

- Tu xwe ji min diqehirînî? Tu dixeyidî? Naxwe divê ez tehtîk çerm ji piştê te rakim. Bangî zilamên xwe dike, tehtîk çerm ji piştê wî radikin, tavên axoyekî û li wir dimire.

.....

Reşîk gelekî bi aqil û jîr û jêhatî ye. Şertê wî qebûl dike, dibêje ser çavan axayê min. Lê fême dike ku bi vî hawayî birayê wî yê din hatine kuştin. Di dilê xwe de xeberan ji axê re dide û dibêje, ez ê heq ji te derkevim. Reşîk bi eynî hawayî derdikeve cot. Dîsa tajî dere ser teht mexel dibe. Ewîl kevîrekî li serê tajî dixwe wê dîkuje. Dûre keçîk nivro tê xwarinê jê re tîne û dîsa dibêje, bavê min gotiye bila mastê sehnîkê kême neke, bila nan neşikêne, serê kevçî şil neke û têr bixwe fedî neke. Reşîk li ber sifirê rûdinê têr dixwe, tiştêkî di firaxan de nahêle. Dawiyê bela xwe li keçîkê jî dixwe û dibêje de here, wê dişîne bi ser bavê wê de. Axe li benda xulam e ku bê û tehtiyek çerm ji piştê wî rake. Dinêre ku keçîka wî bi halekî perîşan tê malê. Xiyala xwe dide firaxan, firax jî hemû vala ne. Ji keçîka xwe re dibêje;

- Ev çi halê te ye, çi bû ji te? Keçîk dibêje, hal û hewalê Reşîk ji vê ye...

.....

Axe dibêje ku gayê wî jî şerjê kiriye û halet jî qut qutî kiriye; dike ku biteqe.

.....

Axe sor dibe, şîn dibe, newêre deng derxe, dibêje;

- Na ez naxeyidim.

Axe di xwe de difikire, dibê ka ez çawa xwe ji vî xelas bikim. Dere ji pîra diya xwe re dibêje;

- Yadê here xwe têxe nav wan kokelan, wan kevîran û bang bike, bêje qewlê şivan û gavanan xelas bûye. Ji bo em ji Reşîk xelas bibin.

Deng dere Reşîk. Dema diya axê bang dike dibêje, “Qewlê şivan û gavanan xelas bûye!” Reşîk dere kevîrekî li serê pîrê dixwe û wê dîkuje. Dûre tê dibêje;

- Axayê min, dengê tebayekî dihat digot, qewlê şivan û gavanan xelas bûye, min nedixwest ez ji te veqetim min kevîrek li serî xist min kuşt.

Axe fême dike ku diya wî kuştîye, dere laşê diya xwe tîne, vedişêre. Di hundirê xwe de dipiçpiçe, awiran ji Reşîk vedide.

.....

Rojekê lawîkê wan ê biçûk dixwaze here qedemgehê, axe dibêje Reşîk;

- Lawo here vî lawîkê bibe qedemgehê.

Reşîk dema lawîk dibe ser destavê, şûjînan tê radike, asaqaan tê dike, nahêle destava xwe bike. Axe bang dike dibêje;

- Çima lawîk digirî? Ew dibêje;

- Ez dikim û nakim destava xwe nake û digirî. Axe dibêje;

- Serê wî li dîwêr xe. Ew jî serê lawîk li dîwêr dixwe û lawîk di cih de tamam dibe. Axe dinêre ku Reşîk lawîkê wan jî kuşt, nema zane wê çawa bike. Reşîk her çi dike ku axe tev dileqe jê re dibêje, ma tu poşman î. Heke tu qebûl nakî ka tehtiyek çerm.

.....

Axe ji jina xwe re dibêje;

- Em ê îşev bi dizî karê xwe bikin, hin tişt miştên xwe di hev xin û berê sibehê em ê ji xwe re ji vir birevin.

Livînên xwe dixin hev, çend firaxên ferz ji xwe re kar dikin û ber sibehê bi dizî bi rê dikevin. Digihên ber gundekî kûçikên gund tên wan. Dibe ewt ewta kûçikan û êrîşî ser wan dikin hema dikin ku dev li wan bikin. Jina axê dibêje;

- Niha Reşik li vir bûya wê çî bi serê we kiribûya! Dema ev deng dere Reşik, Reşik serê xwe ji nav livînan derdixê û dibêje;
- Va ye ez li vir im!

Axe û jina xwe dimînin şaş. Dinêrin ku xelasî ji destê wî tune ye. Di cih de vedigerin gundê xwe û hemû tiştên xwe didin Reşik. Axe dibêje;

- Hemû mal û mewdanê min ji te re û bila tu axayê vî gundî bî, ma tu îcar bela xwe ji me venakî... Îcar Reşik bû xwediyê hemû tiştên axê û bû axayê wî gundî.

## 2.20.2. Di çîroka reşik de dahûrîna nîrxên civakî

**Tablo 2.21: Li Gorî Pîvana Nirxan a Schwartz Di Çîroka Reşik de Senifandina Nirxan**

CUREYÊN NIRXAN	MÎNAKÊN KU DI ÇÎROKÊ DE DERBAS DIBIN	HEJMAR
<b>HÊZ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Navê axayekî bihîstine ku xulaman dişixulîne, kar dide wan.</li> <li>• Axayê min ez hatime bal te îşekî.</li> <li>• Hemû mal û mewdanê min ji te re û bila tu axayê vî gundî bî.</li> <li>• Îcar Reşik bû xwediyê hemû tiştên axê û bû axayê wî gundî.</li> </ul>	<b>4</b>
<b>SERKETIN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Reşik gelekî bi aqil û jîr û jêhatî ye.</li> <li>• Reşik berî ku bê malê halet û gîsin jî dişikêne, dike êzing. Gayê cot şerjê dike û hemûyan li kerê dike tê bal axê.</li> </ul>	<b>2</b>
<b>XWETÊGIHÎN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Her sê bira li hev rûniştine gotine wilo nabe. Em ê herin ji xwe re îşekî, xulamtiyekê; bi vî halî naqede.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>GERDÛNÎBÛN</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• De ne ku bêje ez xeyidîm, ez ji sozê xwe vegeyriyam.</li> </ul>	<b>1</b>
<b>RAJÊRÎBÛN (RÎAYET)</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Ser çavan, bes hema ku tu min li bal xwe bişixulîne.</li> <li>• Şertê wî qebûl dike, dibêje ser çavan axayê min.</li> </ul>	<b>2</b>

<p><b>EWLEKARÎ</b></p>	<ul style="list-style-type: none"> <li>• Birayê mezin gotiye, ez ê mezin im ez ê pêşiyê herim.</li> <li>• Birayê me li me venegeriya, wilo çênabe, divê em ji xwe re bisebibin, ka em çi bikin?</li> <li>• Mihemed ji Reşik re dibêje, ez ê mezin im ka ez ê herim. Belkî ez tiştina bi ser hev de bînim.</li> <li>• Ew jî radibe karê xwe dike û dide dû şopa her du birayên xwe.</li> </ul>	<p style="text-align: center;"><b>4</b></p>
------------------------	---	---

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di çîroka Reşik de şeş cureyên nirxan hatine tespîtkirin; hêz, serketin, xwetêgihîn, gerdûnîbûn, rajêrbûn û ewlekarî. Nirxên herî zêde ku hatine tespîtkirin ewlekarî û hêz in. Xwedî hêza civakî nirxa binbeş a hêzê ye û di çîroka reşik de bi peyva “axê” a di wateya hevokê de tê fêhmkirin ku ev nirx hatiye bikaranîn;

“...Navê axayekî bihîstine ku xulaman dişixulîne, kar dide wan.” (Xwedî hêza civakî)

“...Axayê min ez hatime bal te îşekî.” (Xwedî hêza civakî)

“...Hemû mal û mewdanê min ji te re û bila tu axayê wî gundî bî.” (Xwedî hêza civakî)

“...Îcar Reşik bû xwediyê hemû tiştên axê û bû axayê wî gundî.” (Xwedî hêza civakî)

Di çîroka reşik de ji hin tevgerên serlehangana tê fêmkirin ku xwesteka ewlehiya malbatê hatiye berbiçav. Jixwe li gorî pîvana nirxan a Schwartz jî ewlehiya malbatê nirxa binbeş a ewlekariyê ye. Di çîrokê de li çar cihan ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...Birayê mezin gotiye, ez ê mezin im ez ê pêşiyê herim.” (Ewlehiya malbatê)

“...Birayê me li me venegeriya, wilo çênabe, divê em ji xwe re bisebibin, ka em çi bikin?” (Ewlehiya malbatê)

“...Mihemed ji Reşik re dibêje, ez ê mezin im ka ez ê herim. Belkî ez tiştina bi ser hev de bînim.” (Ewlehiya malbatê)

“...Ew jî radibe karê xwe dike û dide dû şopa her du birayên xwe.” (Ewlehiya malbatê)

Di çîroka reşik de du nirxên binbeş a serketinê hatine tespîtkirin; zîrebûn û şarezabûn. Nirxa zîrebûnê rasterast hatiye dayîn lê şarezabûn ji wateya hevokê ya di nav çîrokê de tê fêhmkirin;

“...Reşik gelekî bi aqil û jîr û jêhatî ye.” (Zîrebûn)

“...Reşik berî ku bê malê halet û gîsin jî dişikêne, dike êzing. Gayê cot şerjê dike û hemûyan li kerê dike tê bal axê.”(Şarezabûn)

Bicihanîna sozan di nav civakê de weke fezîletekê tê xuyakirin û li gorî Schwartz jî ev nirxeke binbeş a gerdûnîbûnê ye. Di çîroka reşik de li cihekî ev nirx hatiye tespîtkirin;

“...De ne ku bêje ez xeyidîm, ez ji sozê xwe vegeyriyam.”

Di çîroka reşik de nirxa binbeş a xwetêgihînê ku hatiye tespîtkirin neqandina helwestên xwe ye. Ji wateya hevokê tê fêhmkirin ku ev nirx hatiye bikaranîn;

“...Her sê bira li hev rûniştine gotine wilo nabe. Em ê herin ji xwe re îşkê, xulamtiyekê; bi vî halî naqede.” (Neqandina helwestên xwe)

Di çîroka reşik de nirxa binbeş a rajêrbûnê ku hatiye bikaranîn nirxa îtaatkariyê ye. Ji wateya hevokê tê fêhmkirin ku li du cihan ev nirx hatiye bikaranîn;

“...Ser çavan, bes hema ku tu min li bal xwe bişixulîne.” (Îtaatkîrî)

“...Şertê wî qebûl dike, dibêje ser çavan axayê min.”. (Îtaatkîrî)

## ENCAM

Bi jiyana dêmanî re ji bo mirovan qonaxeke nû destpêkiriye û piştî vê serdemê êdî jiyaneke hevpar ava bûye. Ev jiyana hevpar û bi hev re bûye sedem ku bi xwe re rêgazên civakî bîne. Bi saya van rêgazên civakî pergelek nû ava bûye ku jiyana hevpar hesan bike. Piştî ku her qewm li devereke din belav bûn û bûne niştecihên wê deverê, ew qewm li gorî civaka xwe rêgazên xweser ava kirine. Bi demê re ev civak bûne xwedî ziman, xwedî dîrok, xwedî çand û edebiyat û hwd.

Berî heyama nivîsê jî her civak li gor baweriyên xwe, fikir û ramanên xwe bi riya vegotinan diyar dikirin. Ji van vegotinan efsane, çîrok, gotinên pêşiyar, destan û hwd. diwelidîn. Îro di roja me de ev cureyên vegotinê wekî edebiyata devkî tê bi nav kirin. Bi riya van vegotinan her civak ne tenê fikrên xwe; lêbelê çand û kevneşopîya xwe û nirxên xwe yê civakî digihandin nîşên nû. Çîrok jî yek ji wan vegotinên gelêrî ye ku barê ragihandina hin tiştan hilgirtiye.

Armanca xebata me jî ew bû ku di çîrokên gelêrî yê li herêma Nisêbînê de tespîtîkirin û tesnîfkirina nirxên civakî bû. Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di bîst çîrokan de dahûrîna nirxên civakî hat kirin ku ew çîrok jî herêma Nisêbînê hatibûn berhevîkirin. Di vê beşê de em ê behsa wan nirxên civakî û encamên wan bikin ku me di çîrokên xwe de ew tespît kirine.

Ji bo ku çîrok hemanke folklorê ye, di heman demê de teybetmendiyên civakê jî di xwe de vehewandiye. Lewma çîrok ji hêla vehewandina nirxên civakî ve dewlemend e. Herwiha ev xebata me jî vê yekê nîşan dide. Li gor encama xebata me di nav van çîrokan de **bi tevahî 264** mînakên nirxên civakî hatine dayîn;

1. Di çîroka Gavan de = 30
2. Di çîroka Hûtê Heftserî de = 11
3. Di çîroka Mar û Du Bira de = 10
4. Di çîroka Mîr û Du Diza de = 16
5. Di çîroka Mîr û Feqîr de = 16

6. Di çîroka Pîrê û Rovî de = 4
7. Di çîroka Seyrê û Eliyê Mamed de = 24
8. Di çîroka Stêrka Zêra de = 8
9. Di çîroka Şêr û Rovî de = 11
10. Di çîroka Wezîr de = 11
11. Di çîroka Çûk û Pîrê de = 6
12. Di çîroka Mirîşk û Rovî de = 10
13. Di çîroka Rovî û Şêr de = 7
14. Di çîroka Şiqo de = 9
15. Di çîroka Alik û Fatik de = 20
16. Di çîroka Gur û Hec de = 13
17. Di çîroka Jina Wezîr de = 5
18. Di çîroka Mihemed de = 24
19. Di çîroka Mirîşka Gavên de = 15
20. Di çîroka Reşik de = 14

Li gor vê tahlîlê, herî zêde di çîroka Gavan de mînakên nirxên civakî hatine dayîn û herî kêr jî di çîroka Pîrê û Rovî de mînakên nirxên civakî hatine dayîn. Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di nav van bîst çîrokên me de çîrokên ku mînakên nirxa *Hêzê* tê de derbas bûne;

1. Çîroka Gavan (2)
2. Mîr û Du Diz (3)
3. Mîr û Feqîr (2)
4. Seyrê û Eliyê Mamed (2)

5. Şêr û Rovî (1)
6. Wezîr (4)
7. Mirîşka Gavên (1)
8. Mirîşk û Rovî (6)
9. Rovî û Şêr (2)
10. Şiqo (1)
11. Alik û Fatik (1)
12. Jina Wezîr (2)
13. Mihemed (1)
14. Reşik (4)

Nirxa **hêzê** di 14 çîrokên me de û bi tevahî **32** caran hatiye tespîtkirin.

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di nav van bîst çîrokên me de çîrokên ku mînakên nirxa **Serketinê** tê de derbas bûne;

1. Çîroka Gavan (3)
2. Mîr û Du Diz (1)
3. Seyrê û Eliyê Mamed (2)
4. Stêrka Zêra (3)
5. Mirîşk û Rovî (1)
6. Şiqo (1)
7. Alik û Fatik (3)
8. Gur û Hec (3)
9. Mihemed (3)

10. Reşik (2)

Nirxa **serketinê** di 10 çîrokên me de û bi tevahî **22** caran hatiye tespîtkirin.

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di nav van bîst çîrokên me de çîrokên ku mînakên nirxa **Hezperestiyê** tê de derbas bûne;

1. Çîroka Gavan (1)
2. Mîr û Du Diz (2)
3. Şêr û Rovî (2)
4. Şiqo (2)
5. Gur û Hec (1)
6. Mirîşka Gavên (1)

Nirxa **hezperestiyê** di 6 çîrokên me de û bi tevahî **9** caran hatiye tespîtkirin.

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di nav van bîst çîrokên me de çîrokên ku mînakên nirxa **Şiyarkirin/hîşyarkirinê** tê de derbas bûne;

1. Çîroka Gavan (1)
2. Seyrê û Eliyê Mamed (3)
3. Stêrka Zêra (1)
4. Şêr û Rovî (1)
5. Şiqo (1)
6. Mihemed (6)

Nirxa **şiyarkirin/hîşyarkirinê** di 6 çîrokên me de û bi tevahî **13** caran hatiye tespîtkirin.

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di nav van bîst çîrokên me de çîrokên ku mînakên nirxa **Xwetêgihînê** tê de derbas bûne;

1. Çîroka Gavan (3)

2. Hûtê Heftserî (2)
3. Seyrê û Eliyê Mamed (6)
4. Wezîr (1)
5. Şiqo (1)
6. Alik û Fatik (2)
7. Reşik (1)

Nirxa **xwetêgihînê** di 7 çîrokên me de û bi tevahî **16** caran hatiye tespîtkirin.

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di nav van bîst çîrokên me de çîrokên ku mînakên nirxa **Gerdûnîbûnê** tê de derbas bûne;

1. Çîroka Gavan (2)
2. Mîr û Du Diz (2)
3. Pîrê û Rovî (1)
4. Seyrê û Eliyê Mamed (1)
5. Şêr û Rovî (1)
6. Mihemed (2)
7. Reşik (1)

Nirxa **gerdûnîbûnê** di 7 çîrokên me de û bi tevahî **10** caran hatiye tespîtkirin.

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di nav van bîst çîrokên me de çîrokên ku mînakên nirxa **Xêrxwaziyê** tê de derbas bûne;

1. Çîroka Gavan (5)
2. Hûtê heftserî (5)
3. Mar û Du Bira (9)
4. Mîr û Du Diz (7)

5. Mîr û Feqîr (10)
6. Pîrê û Rovî (3)
7. Seyrê û Eliyê Mamed (6)
8. Stêrka Zêra (2)
9. Şêr û Rovî (2)
10. Çûk û Pîrê (3)
11. Mirîşk û Rovî (1)
12. Şiqo (2)
13. Alik û Fatik (12)
14. Jina Wezîr (1)
15. Mihemed (7)

Nirxa **xêrxwaziyê** di 15 çîrokên me de û bi tevahî **75** caran hatiye tespîtkirin.

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di nav van bîst çîrokên me de çîrokên ku mînakên nirxa **Rêz û Rêçik (Kevneşopî)** tê de derbas bûne;

1. Çîroka Gavan (7)
2. Mîr û Du Diz (1)
3. Seyrê û Eliyê Mamed (2)
4. Şêr û Rovî (1)
5. Wezîr (1)
6. Rovî û Şêr (4)
7. Alik û Fatik (1)
8. Gur û Hec (7)

9. Mirîşka Gavên (8)

Nirxa **rêz û rêçikê** di 9 çîrokên me de û bi tevahî **32** caran hatiye tespîtkirin.

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di nav van bîst çîrokên me de çîrokên ku mînakên nirxa **Rajêribûnê (Rîayet)** tê de derbas bûne;

1. Çîroka Gavan (1)
2. Mîr û feqîr (4)
3. Şêr û Rovî (3)
4. Wezîr (2)
5. Çûk û Pîrê (3)
6. Gur û Hec (2)
7. Jina Wezîr (1)
8. Mirîşka Gavên (2)

Nirxa **rajêribûnê** di 8 çîrokên me de û bi tevahî **18** caran hatiye tespîtkirin.

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di nav van bîst çîrokên me de çîrokên ku mînakên nirxa **Ewlekariyê** tê de derbas bûne;

1. Çîroka Gavan (5)
2. Hûtê Heftserî (3)
3. Seyrê û Eliyê Mamed (2)
4. Stêrka Zêra (2)
5. Wezîr (3)
6. Şiqo (1)
7. Alik û Fatik (1)
8. Jina Wezîr (1)

9. Mihemed (3)

10. Mirîşka Gavên (3)

11. Reşik (4)

Nirxa **ewlekariyê** di 11 çîrokên me de û bi tevahî **28** caran hatiye tespîtkirin.

Li gorî pîvana nirxan a Schwartz di nav van bîst çîrokên herêma Nisêbînê de hemû cureyên nirxan hatine dîtin ku Schwartz di senifandina xwe ya nirxan de ew diyar kirine. Herçiqasî hemû cureyên nirxan hatibin tespîtkirin jî hemû nirxên binbeş ên van cureyên nirxan nehatine dîtin. Bo nimûne em dikarin bibêjin ku di çîrokan de hêz hatiye dîtin û nirxên binbeş ên hêzê bi tevahî hatine tespîtkirin, lê nirxên binbeş ên hezperestiyê hemû nehatine dîtin. Zewq, stendina tehma jiyanê, zayendî nirxên binbeş ên hezperestiyê ne lê di çîrokên me de tenê zewq û stendina tehma jiyanê hatine tespîtkirin. Nirxên binbeş ên ku nehatine tespîtkirin ev in;

- Zayendî
- Aferînerî, rêzdariya li hemberî xwe
- Daxwaza cîhaneke bi aşîfî, cîhaneke bi xweşî, yekbûniya bi xwezayê re, parastina xwezayê, ahenga navxweyî
- Qedirdayîna li hemberî dê û bavan û pîr û kalan
- Ewlehiya netewî, daxwaza berdewamiya pergela civakî, hesta sedeqatê, sexlambûn/Sihhetbûn

Nirxa herî zêde ku di nav çîrokan de hatine bikaranîn ewilî nirxa xêrxwaziyê ye ku di nav panzdeh çîrokan de 75 caran hatiye tespîtkirin. Dû re nirxa hêzê ye ku di çardeh çîrokan de 32 caran hatiye tespîtkirin. Piştî nirxa hêzê nirxa herî zêde ku hatiye dîtin, nirxa rêz û rêçik (Kevneşopî) e. Nirxa rêz û rêçik jî di neh çîrokan de 32 caran hatiye tespîtkirin. Ev her sê nirxên ku herî zêde hatine tespîtkirin, di derheqê çîrokên herêma Nisêbînê de çi nîşanî me dide dikarin bi çend rêzikan zelal bikin;

- Alîkarxwazî, dirustbûn, efûkerî, dilsozî/wefa, xwedî berpirsiyarîbûn, hevaltîyeke qewîn, hezkirina kemilî ew nirxên binbeş ên xêrxwaziyê ne ku

herî zêde di nav çîrokan de hatine tespîtkirin. Ev nirxên ku hatine dîtin ji bo jiyîneke bi aram a civakê xwedî roleke xurt e. Dikare bê gotin ku ev nirx ji bo civaka Nisêbînê jî xwedî girîngiyekê ye û ev civak xwestiye ku wan bi riya çîrokan bigihînin guhdarvanan.

- Xwedî hêza civakî, dewlemendî, parastina statûya civakî, pejirandina ji hêla mirovan, xwedî otorîtebûn ew nirxên binbeş ên hêzê ne ku di çîrokên me de bi piranî hatine tespîtkirin. Di nav van çîrokên me de serlehengên ku dewlemend û xwedî hêz in, di çîrokên resen de bi piranî mîr, axa, wezîr in. Di çîrokên ajalan de jî şêr û rovî xwedî van wesfa ne. Ev yek nîşan dide ku ev karakterên mîna mîr û axa di nav herêma Nisêbînê de xwedî statuyeke bûne.
- Xwedî hêza civakî, dewlemendî, parastina statûya civakî, pejirandina ji hêla mirovan, xwedî otorîtebûn di heman demê de teybetmendiyên karakterên mîtolojîk in ku di destan û efsaneyên kurdan de xwe dane der.
- Nefsbiçûkî, dîndarî, qebûlkirina wan tiştên ku jiyane pêşkeş kirine, rêzdariya li hemberî kevneşopiyên nirxên binbeş ên rêz û rêçikan e û herwiha di çîrokên me de piştî nirxa xêrxwaziyê û hêzê nirxa herî zêde ye ku hatiye tespîtkirin. Bi vê encamê em dikarin di derheqê baweriya dînî ya herêma Nisêbînê de bibin xwedî agahî û têbigihjin ku kîjan kevneşopî ji bo vê civakê pêwîst in.

Bi van daneyên ku me di bîst çîrokên kurmancî yê li herêma Nisêbînê de bi dest xistine em têdigihjin ku çîrokên vê herêma ji hêla vehewandina nirxên civakî ve dewlemend e. Ji bilî hin nirxên binbeş, hemû nirxên din kêr zêde geh rasterast geh ne rasterast hatine dayîn. Dibe ku ew nirxên binbeş ên ku nehatine dayîn (Zayendî, aferînerî, cihaneke bi xweşî hwd.) di hin çîrokên din ên li herêma Nisêbînê de hebin, lê mixabîn di nav van bîst çîrokên me de nînin ku me ji bo nimûneya xebata xwe berhev kiribûn.

Di nav van bîst çîrokan de nirxa herî zêde ku mînakên wê hatine dayîn ewil qxêrxwazî ye. Em ji vê yekê têdigihjin ku li herêma Nisêbînê girîngiya van nirxan di nav civakê de diyar e. Herwiha di gelek çîrokên kurdî yê gelêrî de rasthatina van

nirxan mimkûn e. Di van çîrokan de em dibînin ku bi qewimîna hin bûyeran balê dikşînin ser van nirxan. Ev jî bi me dide fêhmkirin ku di van çîrokan de helwesta ragihandina van nirxan di çîrokan de vehewandiye.

Di nav çîrokên gelêrî de gelek caran helwest ew e ku guhdarvan dersekê ji wê bûyerê wergire. Bûyerên di nav çîrokan de jî gelemperî bi tevgerên li çepirasta nirxên çivakî tê dayîn. Bo nimûne em dikarin bibêjin ku di çîrokê de heger helwest ragihandina nirxa dirustiyê be, vê yekê bi bûyereke dide ku tevgera xiyaneê yan jî derewê tê de hebe. Di nav van bîst çîrokên me de em rastî wan daxuyaniyan bûn ku bi helwesta musîbetan fêrkirina guhdarvan berbiçav e. Herwiha ev dide nîşandan ku di nav van bîst çîrokan de ji bo guhdarvanan ragihandineke şîretwarî vehewandiye.

Di nav van bîst çîrokên kurmancî yên li herêma Nisêbînê de, em dibînin ku cureyên çîrokan jî cur bi cur in. Şeş çîrokên ajalan, du çîrokên sêhrê, heft çîrokên rasteqîn, sê çîrokên dêwên bêaqil, du çîrokên zinciriyê di nav çîrokên me de hene, lê di nav van çîrokan de em rastî çîrokên olî û henek û anektodî nebûne. Di nav çîrokên ajalan de ajalên bi zîrek û şahreza serkeftî dibin û bi vê şahrezabûna xwe bi kêrî xwe tên. Şêr, rovî, mirîşk ji wan karakteran in ku bi riya wan, nirxên zîrekî û şahrezabûnê radigihînin. Di nav çîrokên rasteqîn de jî bi giştî serlehangên wêrek û dirûst li hemberî xerabiyên bi serkeftî dibin û çîrok bi kêfxweşiya wan bi encam dibe. Bi riya van serlehangên nirxên weke wêrekî, dirûstbûn, ewlehiya malbatê û hwd. tên ragihandin. Di çîrokên dêwên bêaqil de jî bi giştî karakterên weke hût bi neqenciya xwe zirarê didin lê ji ber van neqenciyan xwe jî têk diçin, ji bo lu li hemberî wan karakterên dirûst, zîrek û wêrek hene. Bi riya van karakteran guhdarvan rastî hin nirxên civakî dibin.

Di nav miletan de nirxên civakî bingeha jiyaneke bêaloz ava dike. Nirx ew rêgez in ku civakan li ser piya dihêle. Parastina van nirxan û ragihandina wan a ji bo nifşên nû ji bo her civakan girîng e ku li hemberî her cure xetereyan ji bo hilweşandina civakan bibe asteng. Civakeka ku nirx û çanda wan li ber wendabûnê be, mimkûn e ku li hemberî her cure xetereyan civakî qels be. Lewma em dikrin bibêjin ku ragihandine nirxan a ji bo civaka pêşarojê, rê li ber alozî û xetereyan digire. Herwiha ev çîrokên gelêrî ku di wan de nirxên civakî vehewandî ne, ji bo

ragihandina van nirxan roleke mihûm wergirtiye. Ev jî girîngiya çîrokên gelêrî xurtir dike.

Her ferd di nav civakekê de ji dayik dibe û ji bo ku di nav wê civakê de jiyanekê bi aram û bê alozî bidomîne, hînî çand, urf û nirxên wê civakê dibe. Bi rêya dibistanan û perwerdahiye ev nirx li wan ferdan tên dayîn. Ji bo ku ev çîrokên me jî ji hêla ragihandina nirxên civakî ve bi kêrhatiye, ev çîrok ji bo xebatên perwerdahiye mimkûn e ku bibe materyalên berdest. Helbet divê bê zanîn ku her çîrok ne tenê ji bo zarokan in, herwiha çîrokên gelêrî ji bo mezinan jî tên gotin. Lewma her çîrok dibe ku ji bo zarokan ne guncav bin. Heger bê xwestin ku ev çîrok di perwerdehiyê de bê bikaranîn, divê li ser wan çîrokan li gorî emrê zarokan hin guherîn bên kirin. Bi vî awayî dê çîrokên gelêrî bibin materyalên baş ên perwerdehiyê. Ev çîrokên herêma Nisêbînê ku me li ser wan xebat kiriye, bi hin guhertinên li gorî emrê zarokan dê bibin materyalên baş ên perwerdehiyê.

Ev nirxên ku me di çîrokên kurmancî yên li herêma Nisêbînê de tespît kirine, bi qasî ku di derbarê jîyana civakî û jîyana rojane ya herêma Nisêbînê gelek agahîyan didin me, herwiha bi tevahî di derheqê jîyana kurdan jî dibe alîkar ku em bibin xwedî agahî. Di derheqê dîn û baweriyên wan, rêz û rêçikê wan û hwd.

Piştî vê xebatê heger bi kurtî bê gotin, em dikarin bibêjin ku ev bîst çîrokên herêma Nisêbînê têra xwe nirxên civakî vehewandine. Di van çîrokan de helwest ew e ku guhdarvan ji bo hin qeîdeyên civakî û ji bo jiyanekê baştir, aramtir û bi fezîletir bên şîretkirin.

## ÇAVKANÎ

Akkaya, Nevin; “Keloğlan Masallarında Yeralan Değerlerin İncelenmesi”, *Akademik Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Sayı. 2/1,2014, 312-324.

Akkaya, Nevin; “Kıbrıs Türk Masallarında Değerler”, *Folkloredebiyat Dergisi*, Sayı 90, 2017/2.

Akıncı, Enes, *Peydabûna Nirxên Civakî û Vekolîna Wan di Hin Romanên Kurmancî yên Folklorik de*, Teza Lisansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Bîngol, 2019.

Alabay Yolcu, Tuğçe, *Hasan Lâtif Sarıyücel'in Anadolu Masallarının Eğitsel Değerler Açısından Değerlendirilmesi*, Erzincan Binali Yıldırım Üniversitesi, Erzincan, 2019, Yüksek Lisans Tezi.

Artun, Erman, *Türk Halkbilimi*, Kitabevi yayınları, İstanbul, 2010.

Altun, Rıza; “Fen Lisesi ve İmam Hatip Lisesi Öğrencilerinin Değer Yönelimleri (Samsun Örneği)”, *Gaziosmanpaşa Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, Sayı 2, 2015. s.200.

Aydın, Mustafa; “Değerler, İşlevleri ve Ahlak”, *Eğitime Bakış Dergisi*, 2013, Yıl: 7 Sayı 19.

Bazîdî, Mela Mehmûd, *Cemî'eya Rîsaleyân û Hîkayetan bi Zimanê Kurmancî*, amd. Ziya Avcı.

Bilkan, Ali Fuat, *Masal Estetiği*, Timaş Yayınları, İstanbul, 2009.

Bilge, Semih ve Küçükaycan, Durdane; “Maliye Bölümü Öğrencilerinin Yaşam Değeri Yönelimlerini Oluşturan Faktörlerin Belirlenmesi Üzerine Bir Araştırma”, *Sosyal ve Beşeri Bilimler Dergisi*, Sayı 5, 2013. s.421.

Boratav, Pertev Naili, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, Gerçek Yayınları, İstanbul, 1992.

Dundes, Dundes, “What is Folklore?”, çev. Gülay Mirzaoğlu, *Milli Folklor*, 2005, s.74.

Ergun, Fuat, *Folkloru Herêma Botan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013.

Ephrem Isa; “Di Waqâinameya Metropolît Elyasê Nisêbînî De Mîrektîya Merwanîyan”, wer. Mustafa Aslan, *The Journal of Mesopotamian Studies*, h. 4/1, 2019, r. 176.

Güleç, Hamdi, *Halk Edebiyatı*, Çizgi Kitapevi Yayınları, İstanbul, 1988.

Güngör, Erol, *Değerler Psikolojisi Üzerine Araştırmalar*, Ötüken Yayınları, İstanbul, 2000.

Ilıcak, N.Gamze, Başoğlu, Nuran; “Ahmet Ümit’in Masal Kitaplarında Yer Alan Değerlerin İncelenmesi”, *Karaelmas Journal of Educational Sciences*, Sayı 6, Zonguldak, 2018, s.88-100.

Kaya,Doğan, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2007.

Keskin, Necat, *Folklor û Edebiyata Gelêrî*, weş. Avesta, Stenbol, 2019.

Keskin, Necat, *Zêrka Zêra/Cureyên Edebiyata Gelêrî ji Derdora Mêrdînê*, weş. Avesta, Stenbol, 2019.

Kılıç, Taner; “Nusaybin’in Fiziki Coğrafya Özellikleri”, *D.Ü.Ziya Gökalp Eğitim Fakültesi Dergisi*, Sayı 10, 2008, s. 107.

Küçük, Nurettin; “Schwartz’ın Değer Yönelimleri Ölçeği ile Türkiye’deki Öğrenciler Üzerine Yapılmış Olan Bazı Araştırma Bulgularının Değerlendirilmesi”, *Akademik Bakış dergisi*, 2016, Sayı 57, s.282.

Kızılçelik, Sezgin-Yaşar, Erten, *Açıklamalı Sosyoloji Terimler Sözlüğü*, Atik Kitabevi, Ankara, 1994.

Mengüşoğlu, Takiyettin, *Felsefeye Giriş*, Remzi Kitapevi, Ankara, 1983.

Murat Turna, *Türk Romanında Değerler Çözülmesi*, İz Yayıncılık, İstanbul, 2015.

Özensel, Ertan, “Sosyolojik Bir Olgu Olarak Değer”, *Değerler Eğitimi Dergisi*, 2003.

Pertev, Ramazan, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, weş. Avesta, Stenbol, 2015.

Pertev, Ramazan, *Zarok û Çîrok*, weş. Doz, Stenbol, 2009.

Propp, Valadimir, *Masalın Biçim Bilimi*, çev. Rıfat, Mehmet-Rıfat, Sema, İşbankası Kültür Yayınları, İstanbul, 2011.

Resûl, İzedîn Mistefa, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Weşanxaneya Aras, ç.3, Hewlêr, 2010, r. 11. Jêgirtin: Hikmettin Attî, *Lêkolîneke Folklorî li Ser Destana Mem û Zînê*, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Mêrdîn, 2013, r.3.

Sakaoğlu, Saim, *Masal Araştırmaları*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2010.

Tarduş, İbrahim, “*Bikaranîna Çîrokên Kurdî di Perwerdehiya Zarokan de*”, Teza Lîsansa Bilind, Zanîgeha Mardîn Artukluyê, 2015.

Theodorson, George A. Theodorson, Achilles, *A Modern Dictionary of Sociology*, Newyork, Barnes and Noble, 1979.

Ulusoy, Kadir&Dilmaç, Bülent, *Değerler Eğitimi*, Pegem Akademi Yayınları, Ankara, 2012.

Yavuz Helimoğlu Muhsine, *Masallar ve Eğitimsel İşlevleri Mesaj-İndeks*, Kültür Bakanlığı Yayınları, 2009.

Yıldırım, Aslıxan, *Herdemciwanê*, weş. Azad, Stenbol, 2013.

Yıldırım, Kadri, Pertev, Ramazan, Aslan, Mustafa; *Ji Destpekê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul, 2013.

Yılmaz, Gülşan, *Çocukta Mekan Algısının Gelişiminde Masalın Önemi*, Yüksek Lisans Tezi, İzmir Dokuz Eylül Üniversitesi, 2010.

Yıldırımçakar, S. Çakar û Ş. Güzel; *Bibliyografyaya Têzên Master û Doktorayê yê Bêşên Ziman û Edebiyata Kurdî û Ziman û Çanda Kurdî*, *Kurdiyat*, hj. 3, 2021.

Yildiz, R. Rojdar, *Di Edebiyata Zarokan de Çîrok*, weş. Sîtav, Van, 2019.

### **Çavkaniyên Dijîtal**

8. MEB, [http://mufredat.meb.gov.tr/Dosyalar/2018130153652546-DKAB\\_\(4-8.%20S%C4%B1n%C4%B1f\)\\_DOP\\_%202018.pdf](http://mufredat.meb.gov.tr/Dosyalar/2018130153652546-DKAB_(4-8.%20S%C4%B1n%C4%B1f)_DOP_%202018.pdf)

<https://tr.wikipedia.org/wiki/Arkada%C5%9Fl%C4%B1k>

[https://en.wikipedia.org/wiki/Shalom\\_H.\\_Schwartz](https://en.wikipedia.org/wiki/Shalom_H._Schwartz)

<https://ku.wikipedia.org/wiki/Nis%C3%AAb%C3%AEn>

## **NASNAMEYA VEBÊJERÊN ÇÎROKAN**

### **1. Çîroka Gavan**

Vebêjer: Hediye MUTLU

Emr: 60

Herêm: Gundê Binerdka/Nisêbîn (Yerköy)

Pîşe: Bermalî

Perwerdahî: Nexwendî

### **2. Çîroka Hûtê Heftserî**

Vebêjer: Hediye MUTLU

Emr: 60

Herêm: Gundê Binerdka/Nisêbîn (Yerköy)

Pîşe: Bermalî

Perwerdahî: Nexwendî

### **3. Çîroka Mar û Du Bira**

Vebêjer: Vehbiye ÇETİN

Emr: 63

Herêm: Cibiltînê/Nisêbîn (Yolindi köyü)

Pîşe: Bermalî

Perwerdahî: Nexwendî

#### **4. Çîroka Mîr û Du Diza**

Vebêjer: Fasla ERDEM

Emr: 53

Herêm: Gûndê Kelehê/Nisêbîn (Kalecik Köyü)

Pîşe: Bermalî

Perwerdahî: Dibistana Serêtayî

#### **5. Çîroka Mîr û Feqîr**

Vebêjer: Fedîle DOĞAN

Emr: 63

Herêm: Gûndê Bawernê/Nisêbîn (Bahçebaşı Köyü)

Pîşe: Bermalî

Perwerdahî: Nexwendî

#### **6. Çîroka Pîrê û Rovî**

Vebêjer: Gulperi AKTAŞ

Emr: 65

Herêm: Sirînçk/Nisêbîn ( Düzce köyü )

Pîşe: Bermalî

Perwerdahî: Nexwendî

## **7. Çîroka Seyrê û Eliyê Mamed**

Vebêjer: Fasla ERDEM

Emr: 53

Herêm: Gûndê Kelehê/Nisêbîn (Kalecik Köyü)

Pîşe: Bermalî

Perwerdahî: Dibistana Serêtayî

## **8. Çîroka Stêrka Zêran**

Vebêjer: Kader BEKTAŞ

Emr: 60

Herêm: Gûndê Qesrikê/Nisêbîn (Kasrik Köyü)

Pîşe: Bermalî

Perwerdahî: Dibistana Serêtayî

## **9. Çîroka Şêr û Rovî**

Vebêjer: Tekyeddin AKTAŞ

Emr: 52

Herêm: Nisêbîn

Pîşe: Zêrînger

Perwerdahî: Lîse

## 10. Çîroka Wezîr

Vebêjer: Sebahat BATUN

Emr: 70

Herêm: Nisêbin

Pîşe: Bermalî

Perwerdahî: Nexwendî



## PÊVEK (METNÊN TAM ÊN ÇÎROKAN)

### 1. Çîroka Gavan

Hebû nebû, go li gundekî gavanê gund hebû. Ev gavanê gund ji bo go pîraka wî rehmet kiribû bi tena serê xwe di xaniyekî kerpîçî de bû. Her serê şeveqê berya malayê sibehê diçû ber dewarê gund, gûh dida dewêr û rojekê jî dereng nedima. Rojek ji rojan çaxê go li ber dewêr bû beqekî kesk dibîne, ji wa beqên go dibêjin beqê Seyîda. Axirê diraje wê beqê go bêne malê û carê ji xwe re sebra xwe pê bêne. Piştî go beq aniyê malê sê çar roja pişt re her cara go divegere malê dibîne go mala wî hatiye paqijkirin, sobeya wî hatiye dadan û xwarina wî jî hatiye çêkirin; lê ti kesî jî li mal nabîne ji xeynî wê beqê. Bi vê yekê gelekî ecêbmayî dibe, lewma diçe ji cîranê xwe dipirse ka gelo ew tîna mala wî paqij dikan an na; lê cîranê wî dibêjin go kes nayê mala te paqij nake. Ka gavan çî bike, ev yek ji gavan re dibe meraq, ji bo go her êvar wexta divegere malê dibîne go her tiştê mala wî tekuz e. Rojekê xeberê dide cîrana, bi qestî dibêje ez nexweş im û naçim ber dewêr. Wê rojê xwe di kevana nivîna de diveşêre. Beq jî dibêje qey gavan çûye ber dewêr, ew jî potikê xwe yê beqê didaxe. Gavan dibîne gu beq dibe jineke spehî, çiqas dilahî dibe jî dengê xwe dernaxê û dibêje ka gelo ew jin ê çî bike. Jin dirabe her deverî paqij dike, sobê pê dixê, diçe xwarinê jî çê dike. Gavan îda fêhm dike go kî mala wî paqij dike. Gavên di dilê xwe de dibêje go ew jin çî jineke paqij e. Piştî go ew beqa go bûye jin kar û barê xwe diqedêne careke dî potikê xwe yê beqitiye li xwe dike û dibe beq. Gavan bi va tiştê ecêbmayî dibe; lê dengê xwe dernaxê. Roja dî dîsa dikeve kevana nivîna de xwe diveşêre û li beqê dimeyzêne, ka ê çî bike çî neke. Beq qaşo piştî go gavan diçe dîsa potikê xwe dadixê û dibe jineke spehî. Kar û barê xwe diqedêne û diçe go careke dî potikê beqê li xwe bike. Hema ha di vê kêliyê de gavan bilêz ji cihê derdikeve û wê jinikê zemt dike. Pê re diştexile û dibêje ez ê te li xwe mehr bikim. Dirabe diçe dibakê malayê gund û jinikê li xwe mehr dike. Roj bi roj her du bi hev re kêf û eşq in, gavan jî hurmetê dide jina xwe. Jina gavên jî têra xwe jîr û jêhatî ye; karê mala xwe ew qas paqij dike go cîranên derdorê hemû behsa wê û paqijiya wê dikan. Rojekê xulamê axayê gund di ber mala gavên re derbas dibe. Dibîne go jina gavan çî paqijiye dike, çiqas jêhatî ye. Xulamê axê divegere qesra axê, ji axê re dibêje;

- Ne bi te ne bi jina te yî sist û tiral. Ma jineke gavên heye ji ev qas jinê gund jêhatîtir e. Ma tu jî dibêje jina min jin e, go jina gavên jina te bane ha wê çaxê axatiya te timam bû.

Piştî va gotina axa hem hêrs dibe hem jî jina gavan jî meraq dike; ka kî ye çi kesek e..Çi bi başî çi bi xerabî ew dixwaze go jina gavên ji xwe re mehr bike, ma ne axa ye , mezin e. Bi vê xwestekê difikire ka çawa gavan bixapêne.

Dotira rojê axê xulamê xwe dişyêne mala gavên û dibakê gavan go werê qesra wî. Gavan jî dikevê tirsekê de. Ji jina xwe re dibêje;

- Vî axayî bakiriye min lê ne jî xêra min re ye hermetê, bixwedê yan ê min bikuje yan ê tiştinan ji min bike, ma te ne go yê erd û zêwiyan bexşî min bike. Wey tî li mala min be..

Jina gavên piştî va gotinê gavên jê re dibêje go ka razê hata sibehî, piştire here cem axê ka dibêje çi û çi dixwazî. Gavan bi gotina jina xwe dike, roja dî bi tirs diçe ba axê. Axê di nav civata xwe de jê re dibêje go ev hemû kesên civatê şahid in go yan ez ê te bikujim û jina te li xwe mehr bikim an tê sê şertên min bi cih bêne. Ji axê wê ye go ev her sê şert ne pêkan in û ê jina gavên ji xwe re mehr bike. Bi tirs û bi mitalê gavên ji axê re dibêje ka gelo ew şertên wî çi ne. Axê dibêje;

- Şerta min a pêşî ew e go ti werşiyek tireh ( Tirî ) bêne go ev qas kesên cimaata min jê bixwin. Piştî go te ev yek pêk anî êdî ez ê şertê dî bêjim.

Gavan bi wî halê perîşan divegere malê û hal û hewadîsê ji jina xwe re dibêje. Jina wî dibêje;

- Meraqa neke, ti karê vî şertî pêk bêne. Ka vêca ez ji te re bibêjim êdî tê çi bike.

Gavan bi va gotinê jina xwe her çiqas ne bawer be jî û tirs kuştina xwe de jî be, dîsa jî li jina xwe guhdar dike. Jina wî dibê;

- Meyzêne, here wî cihê go te ez ji wir anîme û bibêje; ‘ Wa Perîxanê xweha te Perîşanê ez şiyandime, bidime werşiyek tireh.’ Piştî te ev gotin kir tê werşiyek tireh bibîne û rahijiye bibe qesra axê.

Ev gotinê jina wî her çiqasî bi serê wî nekevin jî ji neçarî dirabe diçe û gotina jina xwe dike. Dema go diçe wî cihê ku beq jê anîbû dibêje;

- Wa Perîxanê xweha te Perîşanê ez şiyandime, bide min werşiyek tireh.

Çawa go wilo dibêje berî kesekî yan kesekê bibîne werşiyek tireh tê li ber nigê wî. Ecebmayî dimêne lê dirajiyê û dikeve rêya qesra axê. Di rê de dilê wî dibijê tireh, çiqas dixwaze go nefsa xwe bigire jî hew îdare dike û dibêje jixwe ev têrî civata axê nakê, hey ê min bikuje hema ez jî bixwim. Gava go tireh dixwe çiqasî dixwe jî careke dî şîn dibe, çiqasî dixwe carek dî şîn dibe û dibîne ku ev libên tireh ji binî naqede. Bi kêfxweşî diçe qesra axê û wî werşiyê tireh dide civata wî. Birasti jî ew tireh ji binî naqede û ji civata axê hemû kes ji wî tirehê dixwin. Axê acebmayî dibe û qehrokî jî dibe. Dibêje vêca şertê dî bi cih bêne û dibêje;

- Tê here ji min re sê hêka bêne go ji her sê heka sê dehşikê kera biwelidin.

Bi vê xwestekê tirs bêhtir dikevê dilê gavan, ji bo go nizane ka çawa pêk bêne vî şertê ku axê daye ber. Bi tirs divegere malê û ji jina xwe re hal û hewadîse dibêje. Jina wî dîsa heman tiştî jê re dibêje. Ew jî dîsa ji neçarî diçe wî cihê go beq jê anî bû. Dibêje;

- Wa Perîxanê xweha te Perîşanê ez şiyandime, bide min sê hêka go dehşik jê biwelidin.

Gavan çawa go vê gotinê dibêje sê hek tên li ber nigê wî. diraje wa hêkan û diçe ber bi qesra axê. Gavan bixwe jî nizane ka gelo di va hêka de dehşik biwelidin an na; lê neçar e û bi vî halî digihije qesra axê. Dîsa tê li civata axê wa hêka pêş axê dike, axê wa hêka dişkîne û hema bi şikandina wî re sê dehşik xwe li vir û wir dixin. Çavê axê bel dibin û dîsa hêrs dibe lê ji bo go li derdora wî civata wî heye nikare tişteki jî bêje. Gavan bixwe jî hem ecêbmayî ye hem jî kêfxweş e, kêliyê berî kêliyê dixwaze herê vê xeberê ji jina xwe re bêje; lê tê bîra wî go hêj şertekî dî heye go divê pêk bêne. Dibêje axê;

- Axayê gundê min, va ye min her du şertên jî pêk anîn, vêca bêje min ka şertê te yî dawî çî ye?

Axê bawer nedikir go ne tenê gavên lê ti kes nikare va şerta pêk bêne, lewma li şertê sêya nefikirîbû. Hema ji nişke ve tê bîra wî û dibêje;

- Rast e te ev her du şert pêk anîn, lê heke ti vê şertê sêya jî pêk bêne va ye civata min şahid e go soza min soz e. Lê divê ti pêk bêne. Şertê min jî ew e go divê tu pitikekî di pêçekê de bêne go wek mezinan diştexile. Heke tî vî şertî pêk neyêne ti kuştî yî û jina te jî li min mehr e.

Ka gelo gavên çawa vî şertî pêk bêne; lê vê carê ew qasî ne bi tirs e, ew bawer e go dîsa jina wî jê re bibe alîkar. Divegere malê û ji jina xwe hal û ehwalê dibêje. Jina wî dîsa jê re dibêje here cem xweha min Perîxanê, ew ê ji te re bibe alîkar. Piştî vê gotinê gavan dirabe diçe wî cihî û dibêje;

- Wa Perîxanê xweha te Perîşanê ez şiyandime, bide min pitikekî di pêçekê de go biştexile.

Çawa go gavên vê gotinê dibêje dîsa berî go kesekî yan kesekê bibîne pitikek bi pêçek derdikevê holê. Gavên dirajiyê pitikê û diceribêne ka birastî diştexile yan na. Gavên dibêje;

- Wa pitika xweşik ka ji min re bibêje tu kur î yan keç î?

Pitik tilehka xwe ji devê xwe derdixê û wek mezinan dibêje;

- Ez kur im, kurekî xweşik im.

Piştî vê gotinê gavan hem acebmayî hem bi kêfxweşî diçe bi rêya qesra axê de. Wexta digihê qesra axê dibîne ku axê dîsa bi civata re rûniştîye û kêyfa xwe dîkin. Gavan diçe odeya wa û wî pitikî şanî axê dike. Axê jî û civata wî jî bi kelecana li hêviya gavên dimênin go ka gelo ê ev pitik biştexile yan na. Gavên dibêje;

- Ho axayê gund û cimaata wî, bi çi şiklî vî axayî ez xistim tengayiyê û hûn jî bûn şahidê vê zordariyê. Ka vêca li vî pitikî meyzênin go ew ê çawa min xilas bike. De bêje pitikê xweşik.

Piştî vê gotinê pitik wek mezinan diştexile û hemû kesê wir bi dilahî lê dimeyzênin. Axê fêhm dike go êdî nikare tiştêkî bike. Heke li derdora wî ev civata wî nebana dîsa ev gavan sax nedihîşt lê êdî şahidê wî hebûn û gavan azad kir. Gavan jî tevî wî pitikî

bi kêfxweşî diçe malê û tiştê go qewimîne ji jina xwe re dibêje. Ji bo ku ew pitik li rastê nemêne wî ji xwe re dikin kur û jê re dê û bavitiyê dikin. Jina wî jî dibêje;

- Ev qas tişt hatin serê me, lê me sebir kir. Ma ne beleseveb nabêjin xwediyê sebrê melikê Misrê.

Gavan jî bi vê yekê baş zanê. Axirê bi hev re bi kêf û eşq dibin heta hetayê. Çîroka min jî ji we re xweş ka bidin min qetîtik şebeş.

## 2. Çîroka Hûtê Heftserî

Go hebû nebû, go sê çar keçik li hev kom bûbûn û ji xwe re meharkan (Morîk) dilîstin. Piştî kêliyêkê qey yek ji wan keçika hîle kiribû. Vêca digotin hev ka kê hîle kiriye. Yekê got bi serê birayê xwe sûnd dixwim go min hîle nekiriye, keçika dî jî got bi serê birayê min, min jî hîle nekiriye û hema keçika dî jî eynî tişt got. Feqîrê keçika sonê nizanîbû go li ser çi sûnd bixwe, ji bo go nizanîbû birayên wê hene. Hema wê jî got;

- Bi serê qemçika diya min, min hîle nekiriye.

Axirê keçik diçe malê, li kêleka diya xwe dirûne û dest bi girî dike. Diya wê tê balê, destê xwe ser serê wê re dibe û bi dilahî jê dipirse;

- Ti çima digirî keçka min, ma qey çi qewimiye?

Keça wê bi zîkezîk dibêje;

- Birayê hemû hevalê min hene, ma qey birayên min nînin?

Diya wê dibêje;

- Ma çawa birayê te nînin keça min. Welleh du birayê te hene û li filan deverê ne.

Piştî go diya wê behsa birayê wê dike, keçik dixwaze go biçe cem birayê xwe. Diya wê jî cihê birayê wê jê re dibêje û diya wê dibêje go ez ê ji te re kerekî bi heriyê çêkim, bi wî kerî here bigihe birayê xwe; lê heke ti ji kerê xwe re bêje “Şoş” ê kerê te bifelişê û tê nivê rê bimêne. Keçik jî dibê tamam û dikevê rê; lê li nivê rê bi gotina diya xwe nakê û dibêje kerê xwe “Şoş”. Çawa go dibêje “Şoş” kerê wê difelişê.

Dirabe careke dî divegerê malê û dibêje diya xwe ka kerekî min dî çêke. Diya wê dibêje ma min negot nebêje “Şoş”; lê dîsa jî pê de naxiyîde, dilê keça xwe nahêle û kerekî dî jê re çê dike. Keçik dirabe diçe û hey diçe. Di dawiyê de digihe mala birayê xwe; dimeyzêne go li malê ti kes nîne, qey birayê wê çûne nêçîrê û hemû dever jî gemarî ye. Ew jî dirabe xwe diçikêne û hema dest bi paqijiyê dike, xwarina birayê xwe çê dike, sobê dadide û xwe di kuvarê de diveşêre. Piştî kêlikê birayê wê tên. Dimeyzênin go mal paqij û germ e, xwarina wa jî hazir e. Her du bira ecêbmayî dimênin; fêhm dikin go hinek hatine mala wa, dirabin li dora xwe digerin ka ew kes kî ne go hatine mala wan. Hê wilo keçik ji nişke ve ji kuvarê derdikevê û her du birayê xwe hembêz dike. Birayê wê bi hatina wê kêfxweş dibin. Bi hev re xwarinê dixwin, têra xwe diştexilin û diçin ser cihê xwe go razin. Roja dî dîsa birayê wê diçin nêçîrê, berî go herin dibêjin xwîşka xwe;

- Meyzêne xwehkam, ha ev dara hajîrê dara kitikê (Pisîk) ye, heke ti ji vê darê bixwe kitik ê bê di agirê te de bimîze û carek dî ti nikare agir peyda bike. Lewma tu ji vê darê nexwe.

Keçik jî dibêje tamam û birayê wê diçin çiyê nêçîrê. Piştî go birayê wê diçin, keçik hejîra bi darê ve meraq dike û diçe hejîra kitikê dixwê. Keçik henekê xwe bi kitikê dike û dibêje kitikê;

- Wa kitikê ma ne min hejîra te xwar.

Kitik jî dibêje;

- Erê min dît te xwar lê min jî di agirê te de mîz kir.

Piştî vê gotinê keçik diçe agirê go pê xistiye dimeyzêne, bira jî agirê wê temiriye. Keçik dike û nake agirê xwe careke dî nikare pêxe. Axirê dirabe diçe serbên, li dora xwe dimeyzêne go gelo dikare li mala cîrana tifik heye yan na. Hê wilo li dora xwe dimeyzêne dibîne go dumanêk ji deverekê tê. Hema ew jî bilêz ber bi wî alî ve diçe. Diçe û hey diçe, dawiyê de digihe malekê. Li wê malê jinekê dibîne û li ser kaboka wê jinê jî hûtekî heft serî. Jinik çawa go çav li keçikê dike, dibêje dengê xwe dernexe, heke ti dengê xwe derxê ê hût şiyar bibe û bikevê dû te û yê te bikuje. Keçikê dengê xwe dernexist lê gote jinekê ku ez hatime agir. Jinik jî dibêje;

- Heft parengê me hene; lê hût ew jimartine. Ji xwe re rahije yekî bilêz here mala xwe, berî go hût şiyar bibe.

Jinik piştî go gotina xwe bi dawî dike, kulmek derzî, kulmek şûjin û qalibek sabûnê jî dide keçikê. Dibêje keçikê dinyayê hût şiyar bibe û bide dû te, hema ti jî va tiştê bavêje nigê wî.

Keçik diraje wa tiştê û bi bayê bezê ber bi malê ve diçe. Lê hût şiyar dibe û bêhna goştê însana dike. Hût dirabe dibîne go keçikek bi bayê bezê baz dide, hema ew jî dide dû keçikê. Çawa go nêzî keçikê dibe, keçik kulmek derzî diavêje nigê wî. Heta go hût derziyê nigê xwe derdixe, cardî dide dû keçikê û nêzî wê dibe. Vê carê jî keçik kulmek şûjin diavêje. Şûjin di nigê hût re dirabin; heta go wa ji nigê xwe derdixe keçik hineke dî ji hût dût dikevê. Axirê hût careke dî nêzî keçikê dibe, dike go keçikê zefî bike; lê vê carê jî keçik lehek sabûn diavêje nigê hût. Vê carê jî hût dişemite û dikeve erdê. Heta go hût dirabe ser xwe û careke dî dide pey keçikê, keçik digihe mala xwe; lê êdî hût zehf diqehere û tê devê deriyê mala keçikê. Keçik deriyê xwe dixiliqîne; lê hût dibêje yan tê derî vekê yan jî tê tiliya xwe derxê go ez ji tiliya te xwîna te bimijim. Keçik ji neçarî tiliya xwe derdixê. Her şeveq piştî go birayê keçikê ji mal derdikevin, hût tê tiliya keçikê dimije go xwîn tê de nahêle. Roj bi roj keçik li xwe dişkêne, mehdê wê zer dibe. Birayê wê vî halê wê dibînin. Her çiqas birayê wê jê dipirsin jî keçik newêre ji birayê xwe re behsa vê hewadîse bike. Taliya talî birayn wê qirarê didin go rojekê xwe di mal de veşêrin, da go fêhm bikin ka li malê çî diqewime; çî tê serê xwaha wa. Roja dî dîsa ber bi şeveqê ve hût tê û dibêje keçikê ka tiliya xwe go ez bimijim. Ji ber go birayê keçikê xwe veşartine vê yekê dibînin, çawa go çav li hûtê heftserî dikin, her du bira dibin yek, dirajin şûrê xwe û serê hût dibirin. Şeş seriyên hût dibirin. Hût dibêje go vî seriyê dî jî bibirin, ji ber go heke ev serî jî jê bibe ê seriyê nû şîn bidin. Birayê keçikê bi vê yekê zanîbûn, lewma ew seriyê dawî jê nekirin lê hût kuştin û kirin tîrbê de.

Û axirê çîroka min çû bi avê de, dê û bavê min çûn hacê de.

### 3. Çîroka Mar û Du Bira

Go hebu nebû go du bira hebûn, go dê û bavê wa her du jî mirîbûn û ev her du bira gundekî ji wa gunda, di xaniyekî kerpîçî de bûn. Erdekî wa yî biçûk hebû û ji xwe re genim diçandin. Guh didan vî erdê xwe û ji şeveqa heta êvara tê de dişuxilîn, da go gezek nanê xwe jê derxin. Ha wilo xwe xwedî dikirin. Ji bo go dê û bavê wa nebû ev her dû bira meyla xwe dabûn hev û gelekî hij hev du dikirin. Bi feqîrî bi rezilî xwe xwedî dikirin. Rojekê ji roja birayê biçûk diçe nav erda go erdê xwe bikolê. Wexta diçe nav erd çêlikekî mara dibîne, ew jî hema dirajiyê û dibêje hema ez ê xwedî bikim. Diraje wî çêlikê mar û têne malê; lê ji birayê xwe re nabêje go çêlikê mar aniye. Heke bêje birayê xwe, zane go birayê wî destûra wî nade. Ew jî hema çêlika mar dixê qotîkekê de û wî diveşêre. Roj bi roj mar mezin dibe, birayê biçûk bi zimanê mar dielime. Her roj bi hev re diştexilin û birayê biçûk wî derdixê derve wî digêrêne û car dî wî têne malê beyî go birayê wî zanibe. Ez ji te re bêjim, hingî hevaltiye mar û wî birayê biçûk xurt dibe berî hev naçin ti devera, ew qasî hij hev du dikin. Birayê biçûk ji mar re her car dibêje;

- Tu çêlik bûyî û heta niha ti li ba min î. Ti birayê min û ez birayê te me.

Mar jî her car lê divegerand;

- Ez û ti heta hetayê destbirayê hev in.

Axirê wilo bi hev re rojê xwe derbas dikirin. Rojek ji rojan mar ji qurçika xwe derdikeve û birayê mezin wî dibîne, Wexta ku dibîne dirajê kevirekî go wî bikuje. Hê wilo birayê biçûk tê û destê wî digire. Birayê mezin dibêje ma te hişê xwe xwariye bisekine ez bikujim an na ew ê me bikuje. Birayê biçûk dibêje;

- Çêlik bû û heta niha min ew xwedî kiriye. Ew hevalê min e û weke bira ye ji min re, ez nahêlim tu wî bikuje.

Birayê wî dibêje;

- Çawa heta niha te ew xwedî kiriye û te heya min pê nexistiye, ma ev e biratiya te?

Û ji heme radije kevir û li mar dixê. Kevir li dûvê mar dikevê û dûvê wî jê dibe. Mar jî bi wê janê diçe bi birayê mezin vedide û jehriya xwe diavêje laşê wî. Birayê mezin li wir dimire. Birayê biçûk jî bi ax û ax birayê xwe binax dike. Erê birayê biçûk zehf li ber birayê xwe dikeve. Bi mehan hezna birayê xwe dikşene; lê bêriya marê xwe jî dike. Rojekê diçe ba marê xwe û jê re dibêje;

- Maro maro, me ji hev re got biraoo, tu bûyî bêdûvo ez mame bêbirao..Lê were em dîsa bibin destbirakê hev wek berê.

Mar jî lê divegerêne;

- Biraoo biraoo, me ji hev re gotibû destbirao, lê ez heta hetayê bêdûvo tu heta hetayê bêbirao..Tu ya rast bivê kengî em werin cem hev em ê birînê hev bênin bîra hev. Ji bo wilo tu li riya xwe ez li riya xwe.

Mar jî wilo got û di riya xwe de çû, careke dî hew pêjna wî hat. Û çîroka min jî kurt û kurmançî li vir xilas.

#### **4. Çîroka Mîr û Du Diz**

Hebû nebû go mîrek hebû, ma çi mîr bû; mîrekî bi deh zilamê qerese bû. Hingî ev mîr qeç, dilbirehm û destvekirî bû, çi feqîr û beleganzê bajêr hebana dihatin qesra wî xwe têr dikirin. Kî hatiba ber deriyê mîr, qewêtiya mîr bû go ti kesî destvekirî neşyênin. Lewma kêfa xelkê jî ji mir re dihat û hurmet jê re digirtin. Lê wezîrê Mîr ji vê yekê diqehêrî, dihesidî.

Her carê digote mîr bela xwe ji va parseke veke, malê xwe nexê devê wa de; lê mîr pê de dixeyîdî û digo hişê xwe ji min neyêne, ew jî însan in û em ji wa ne çêtir in. Go rojekê ji rojan du xort têne qesra Mîr. Go ev her du xort jî hingî jîr û henokoyî bûn, kêfa mîr ji wa re tê. Gelek cara tîn qesra mîr û mîr re dixwin vedixwin; henek meneka dikin û têra xwe kêfê dikin. Piştî go xwe têr dikin ji qesra Mîr derdikevin û diçin ji xwe re diziyê dikin. Lê heya mîr jê nîne go ev her du xort diz in û diziya bajêr dikin. Jixwe mîr nizanîbû go ka ev her du xort kî ne û çi kar û barî dikin jî. Ji mîr wê ye go ev xort du xortên bê kes in û feqîr in. Me go ev her du xort diz in, lê ne bi eceba go herin tiştê zêde bidizin. Carna mirişkek, carna hin genim, carna şekalek..diziya wa jî bi va tiştê bû. Rojekê ji roja dîsa ev her du xort tîn civata mîr;

dixwin, divexwin, xwe têr dikin. Civata xwe bi mîr re dikin û xwe kar dikin go rabin herin. Xatir ji mîr dixwazin û diçin. Wexta go dirabin diçin di neqaba xwe de dibêjin ka gelo wexta em ji vir derketin em herin diziya çî. Wexta go wilo dibêjin wezîrê mîr dengê wa dike; lê dengê xwe dernaxê. Wezîr dibêje naxwe ev her du xort diz in û heya mîr jê nîne. Jixwe wezîr hij va her du xorta nedikir. Lewma feêlek tê bîra wî. Wezîrê mîr mêrekî xwedî erd û xanî bû û têra xwe malê wî jî hebû, lê çî feydê qesîs û çavbirçî bû. Ev çavbirçîbûna wî yekcar wî timakar dikir. Vêca wilo wezîr dirabe diçe odeya xezîneya mîr. Berî go kes bibîne dirajê gelek zêra û ji xwe re dihilêne. Roja dî diçe ba mîr û dibêje mîr;

- Mîrê min ev çiqas e go te ne hesebê xwe kiriye û ne jî te li xezîneya xwe pirsîye. Carê tu diçû te li xezîneya xwe dimêyzan çî kê mî çî ne kê mî e.

Mîr Jî dibêje;

- Erê welle te rast go, ev çiqas e go min lê nemêyzandiye . Ka îro em herin meyzênin.

Mîr diçe go xezîneya xwe meyzêne, ma çî bibîne..dibîne go ji zêrên wî kê mî bûne. Mîr zehf diqehêrê .

Dibêje wezîrê xwe;

- Va ye li ber çava ye go ketine diziya xezîneya min, divê ti wa kesa bibîne û wa bişenihênê.

Wezîr jî dibêje mîrê xwe ser çava û diçe. Piştî kêlîkekê wezîr divegerê ba mîrê xwe û dibêje mîr;

- Mîrê min ez zanim bê kê ketiye xezîneya te.

Mîr jixwe ji wezîrê xwe bawer e, çî dibêje jê yeqîn dike. Ew jî dibêjo naxwe kerem bike.

Wezîr dibêje;

- Wê rojê min bi guhê xwe bihîst go ew her du xort diçin diziya xelkê. Min di derheqê wa çû ji millet pirsî. Heçî wa nas dikir digotin ew diz in. Ma ka mîrê min te deriyê xwe ji va xorta re vekir lê ma tu zanê ka kî ne çî kes in?

Mîr hinekî difikire û wek go heq dide wezîrê xwe. Dibêje;

- Tu rast dibêje, ez nizanim ka kî ne çî kes in. Hebê nebe ew in dizê malê. Here bake wa û bila werin vir; lê ti ti tiştî ji wa re nebêje.

Wezîr bi gotina mîr dike û diçe go wa her du xorta bêne. Wezîr diçe li wa her du xorta digêrê, dibîne û bi qepika wa digire, diêne ba mîr. Her du xort jî nizanin ka mesele çî ye. Mîr ji wa re hal û hewalê dibêje û dibêje em ê we bişenihênin. Her du xort ditirsin û bi ecêbmayî dibin. Yek ji wa xorta dibêje mîr;

- Mîrê min me digo qey tu kesekî zane yî, me tiştêkî wilo nekiriye û tu berî go baş zanibe ka mesele çî ye tu dixwaze me ciza bike.

Her du xort bi lavlavekê dixwazin bêjin mîr go wa tiştêkî wilo nekiriye. Vê carê xortê dî dibêje mîr;

- Mîrê min rast e em diziya bajêr dikin car carna, ew jî ne zêr in, hema tiştê bê qîymet in; lê kehniya go me jê vexwariye em kevirekî jî naavêjinê. Me nanê te xwariye, em ê çawa bêbextiyê li te bikin. Bê ji te re kî navê me bi diziyê daye, diz bixwe ew e.

Piştî gotina wî xortî Mîr hinekî dudilî dibe. Dibêje ma ne min ne tiştêkî dîtîye û ne jî bihîstîye, ji xeynî gotina wezîrê xwe. Belkî jî wezîrê min derewa dike û ev xort bi heq bin. Di dile xwe de dibêje go ka ez va xorta bixime zindanê, heta go tiştêkî fêhm bikim. Rojek du roj sê roj derbas dibin, zîlamê berdestên mîr hinekî li vê meseleyê dikolin, fêhm dikin go kesê diziya mîr kiriye wezîr bixwe ye. Axirê mîr dibakê wezîrê xwe û wezîr bixwe jî bêbextiya xwe qebûl dike. Mîr ji bo vê xayîntiyê, wezîrê xwe ji wezîrtiyê jî dûr dixê û wî dixê zindana xwe de jî. Her du xorta jî azad dike. Mîr fêhm dike go ev her du xort xayîntiyê nakin. Bi şertê go diziya ti kesî dî nekin wezîr wa her du xorta têne qesra xwe û karekî jî dide wa. Ha halê xayîn û timakaran ev hal e û halê dirusta jî ev hal e. Çîroka mîn çû bi avê de, dê û bavê min çûne bi hacê de.

## 5. Çîroka Mîr û Feqîr

Go hebû nebû, go feqîrek hebû. Go ev feqîr hengî feqîr bû nan nebû go bixwe. Ji ber vê feqîriya xwe şepirze û belangaz bû. Rojekê êdî hew îdare dike û qîrar dide go herê cem mîrê dewlemend. Wexta go diçe cem mîrê dewlemend mîr jê dipirse;

- Feqîr wa feqîr, ti çi dixwaze ti li çi digere?

Feqîr dibêje;

- Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.

Piştî vê gotinê feqîr tişteki dî nabêje. Dilê Mîr jî bi halê wî dişewitê û dibêje xulamê xwe ji feqîr re xwerin û avê bînin. Piştî go feqîr xwarina xwe dixwe mîr polikekî zêr jî dide wî û wî dişyêne malê. Ne rojekê ne du roja ne sê roja.. Her roj êdî feqîr diçe mala mîr û mîr jî wî têr dike û polikekî zêr dide wî. Her car jî mîr jê dipirse;

- Feqîr wa feqîr, ti çi dixwaze ti li çi digere?

Feqîrê reben her carê eynî tiştî dibêje;

- Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.

Her carê go feqîr vê gotinê dike mîr polikekî zêr jî dide feqîr. Her cara go feqîr tê û mîr wilo pê re eleqadar dibe wezîre mîr jî êdî ji feqîr diqêherê. Wezîr di dilê xwe de dibêje, ev çend sal in go li ber destê mîr im û ez ew qas tiştê jê re dikim hê rojekê polikekî zêr nedaye min. Wezîr dikeve tirsê go mîr vî feqîrî bixê dewsa wezîr de. Lewma wezîr ji vê yekê ditirse û dixwaze feêlekê li feqîr bike. Rojekê wezîr dibakê feqîr û jê re dibêje were li mala min xwarinê bixwe. Feqîrê behla ji qenciya dilê xwe û ji dilsafîtiya xwe dibêje qey wezîr zilamekî baş e û lewma diçe mala wî xwarinê. Axirê wezîr dibêje kebaniya xwe go hemû xwarina bi sîr çêke. Kebaniya wî jî xwarina go çê dike têr sîr dike. Piştî xwarinê wezîr dibêje feqîr;

- Birayê feqîr, xwarin bi sîr bû û ti zanê kesên derdorê çawa ji sîrê adiz in, lewma wexta go tu çûyî cem mîrê min şîreta min li te go ti destmalekê li ber devê xwe bipêçe, yan na mîr ê gelekî adiz bibe.

Feqîrê reben jî bi gotina wî dike û diçe cem mîr. Piştî go feqîr ji cem mîr derdikevê, wezîr diçe cem mîr û ji mîr dipirse;

- Mîrê min ma ti zanê ka çima ev feqîr devê xwe girtiye?

Ma mîr ji kû zanê. Mîr dibêje ma ez çî zanim. Wezîr dibêje;

- Mîrê min te ev qas qencî li wî feqîrî kir lê ew bi xwe piştê te re behsa te nebaşî dike. Destmal daniye ber devê xwe ji bo go digot bêhn û pûxara devê mîr neyê min. Ha ji bo wilo destmal daniye ber devê xwe.

Piştî vê gotinê mîr gelekî adiz dibe, dibêje naxwe ev feqîrê go min xwedî dikir nankor e. Li ser qaxezekê tişteki dinivîse û li hêviya wî feqîrî dimêne heta roja dî. Roja dî dîsa li ber nîvrokî feqîr tê qesra mîr. Dîsa xwarina xwe dixwe û mîr jê dipirse;

- Feqîrê belengaz li vê dinyayê çî qenc e?

Feqîr dîsa eynî tiştî dibêje;

- Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.

Mîr di dilê xwe dibêje, ev feqîrê ne weke xwe, çî ji qencyê fêhm dike go behsa qencyê dike; lê behsa tişteki dî jê re nakê. Piştî go feqîr xwarina xwe dixwe, mîr wê qaxezê mohr dike û dixwe destê wî û dibêje here cem filankeso û vê qaxezê bidiye. Feqîr jî dibêje serçavê min Mîrê min. Feqîr çawa go ji odeya mîr derdikeve wezîr dibîne go mîr tişteki bi feqîr nekiriye. Ê di ser hala de mîr mektubeke bi mohr daye feqîr. Wezîr ji feqîr dibêje ka ma mîr çî got çî negot. Feqîr jî hal û ehwalê dibêje. Wezîr dike go biteqê ji qehra. Ji wezîr wê ye go bi wê mektubê mîr ê erd û zêwiya bexşî feqîr bike. Lewma dibêje feqîr, ka wê qaxezê bide min, ez ê di bêdela te de karê mîr hal bikim. Feqîr çiqas dibêje na jî wezîr bela xwe jê navekê û kaxezê je distêne. Wezîr dirabe diçe cem wî kesê go mîr gotiye qaxezê bibe. Qaxeza mohrkirî dide wî zilamî û piştî go zilam kaxezê dixwêne ji nişke ve xençera xwe derdixe û li sûkra wezîr dixwe. Wezîr wê kêliye li wir dimire. Ji ber go di wê qaxezê de mîr emr daye go kesê vê qaxezê bêne werê kuştin. Axire wezîr bi derba xençerê dimire. Roja dî feqîr dîsa diçe mala mîr, Wexta go mîr wî dibîne ecebmayî dibe. Mîr dibêje feqîr ka ma ti neçûyî cem wî zilamê go min gotiye te here balê. Feqîr jî dibêje;

- Mîrê min ez ji vir derketim go herim emirê te pêk bînim, lê wezîrê te nehişt go herim û got emirê mîrê xwe ez ê pêk bînim. Min jî go bila be.

Mîr jî dibêje;

- Wezîrê min got xebero te gotiye ji ber bêhn û pûxara mîr ez li ber devê xwe asê dikim, lewma min jî emirê kuştina te dabû lê va ye wezîr xwe bi xwe çûye mirina xwe.

Feqîrê behla hal û ehwalê ji mîr re dibêje û dibêje;

- Mîrê min heçî qencyê dike bixwe dike, heçî xerabiyê dike dîsa bixwe dike.

Û çîroka min jî li vir xilas dibe.

## **6. Çîroka Pîrê û Rovî**

Go hebû nebû, go pîrek hebû. Go mêrê vê pîrê çûbû ber rehma Xwedê û zarokê wê jî zewicî bûn, bûbûn xwedî malê xwe. Vê pîrê jî ji xwe mastê xwe çê dikir û carna jî mastê zêde dibir û dibêdela wê de ji xwe re genim dianî. Bi vê xîretê roj bi roja xwe derbas dikir. Vêca çaxê go Pîrê mastê xwe çêdikir, dibir dixiste tenûra têhngermî, da go mastê wê bimêyê. Her carî mastê xwe dibir dixiste tenûra xwe de. Rojekê ji roja Xwedê dîsa mastê xwe xistibû tenûrê û diçe go mastê xwe ji tenûrê derxê. Çawa go çavê wê li mastê wê dikevê dibîne go mastê wê jê kêmbûye û tevdebelayî bûye. Di dilê xwe de dibêje go vêca ka ev mastê min çima wilo bûye. Axir bi wax waxê diraje mastê xwe û dikevê xanîkê xwe de. Carek du cara sê cara çar cara.. îda dibîne go gelek cara mastê wê jê hatiye xwarin. Pîrê jî her carê dibêje;

- Na gidî na ..wilo nabê; meseleyek di vê de heye..

Pîrê jî radije qurmekî dara û piştî go mastê xwe dixite tenûrê, nobetê lê digire. Piştî kêlîkekê dibîne go roviyek bi dizî tê dikeve tenûrê. Pîrê dibêje, ha haa min dizê xwe nas kir êdî. Li hêviyê dimêne go rovî ji tenûrê derkevê. Rovî çawa go ji tenûrê derdikevê, Pîrê qurmê dar li dûvê wî dixite û dibêje;

- Hey roviyê pîs î heram, qey tu fihêt nakê mastê min didize?

Rovî bê dûv dimêne û ji tirsê baz dide û diçe ba hevalê xwe. Hevalê wî çawa go çav lê dikin pê dikenin û henekê xwe pê dikin. Hemû jê re dibêjin;

- Qûto qûto rovî qûto, di bin de xwekuto..

Rovî ji bo go hevalê wî henekê xwe pê dîkin zehf diqehere lê nizane çi ji wa bike.  
Ew ji radibe diçe ba Pîrê. Dibêje Pîrê;

- Pîrê pîrê ez qurbanê ka dûvê min pê ve bike, ez diçim ba hevala heval henekê xwe bi min dîkin.

Pîrê jî jê re dibêje;

- Te ew qas mastê min berî min xwar, ma wilo hesanî ye ez dûvê te bi te ve bikim, here ji min re şîrê min bêne, ez ê jî te efû bikim û dûvê te bi te ve bikim.

Rovî ma çi bike, radibe diçe ba bizinê û dibêje bizinê;

- Bizinê bizinê ez heyranê.. ka bidime hinek şîr, ez ê bidim Pîrê, Pîrê yê dûvê min pê ve bike. Ez diçim nav hevala heval henekê xwe bi min dîkin.

Bizinê jê re dibêje;

- Roviyo roviyo, roviyê dûvquto.. here ji min re bêne çilo, ez jî bidime te şîr.

Rovî ma çi bike, dirabe diçe ba darê, dibêje darê;

- Darê darê ez qurbanê, ka bide min çilo, ez ê bidim bizinê, bizin ê bide min şîr, ez ê şîr bidim Pîrê, Pîrê yê bide min dûvê min. Ez diçim nav hevala heval henekê xwe bi min dîkin.

Darê jê re dibêje;

- Roviyo roviyo, roviyê dûvquto.. here ji min re bêne dasê, ez ê jî bidime te çilo.

Ma roviyê reben çi bike. Hema ji xwe re dibêje, ma min çi bêaqilî kiribû, ketim dizîya Pîrê. Radibê diçe ba hedat, dibêje hedat,

- Hedato ez qurbano bide min dasekê, ez ê bidim darê, dar ê bide min çilo, ez ê çilo bidim bizinê, bizin ê bide min şîr, ez ê şîr bidim Pîrê, Pîrê yê bide min dûvê min. Ez diçim nav hevala heval henekê xwe bi min dîkin.

Hedat jî dibêje;

- Roviyo roviyo, roviyê dûvquto.. here ji min re bêne avê, ez ê jî bidime te dasê.

Rovî ji xwe re dibêje hey lo hey lo bêbexto roviyo, ma min çî bêaqilî kiribû, ketim dizîya Pîrê, de vêca sebr bike heta go pîrê dûvê te pê ve bike. Radibê diçe ba enzelê, zilamek li nobeta enzelê ye. Dibêje wî zilamî;

- Birako ez qurbano bide min avê, ez ê avê bidime hedat, hedat ê bide min dasê, ez ê dasê bidim darê, dar ê bide min çilo, ez ê çilo bidim bizinê, bizin ê bide min şîr, ez ê şîr bidim Pîrê, Pîrê yê bide min dûvê min. Ez diçim nav hevala heval henekê xwe bi min dikin.

Zilam jî jê re dibêje;

- Naxwe here bêne solekê, ez ê bi wê solê pêl banê enzelê bikim da go avê bidim te.

Roviyê reben yekcar şepirze dibe û di dilê xwe dibêje, ma min çî bêaqilî kiribû, ketim dizîya Pîrê. Lê çî bike diçe ba solfiroş. Xwedêkirî solfiroş vê carê tiştêkî jê naxwaze, dilê solfiroj pê dişewite û sola dideye. Rovî radibe diçe solê dide wî zilamê li ber enzelê. Zilam avê dideye, rovî diçe avê dide hedat. Hedat dasê çê dike û didiye. Rovî radibe diçe ba darê, dasê didiye. Dar çilo dide rovî. Rovî diraje çilo, diçe dide bizinê, bizin şîr didiye. Rovî dirajê şîrê xwe û tê ba Pîrê. Axirêê.. Pîrê diraje şîrê xwe û dûvê rovî pê ve dike. Ma ne soza xwe dabû. Pîrê jî dibêje bila xêra min be û bi meherk (Morîk) û tiştik û miştika dûvê rovî dixemilêne. Rovî dûvê xwe zehf diecibêne û dirabe diçe cem hevalê xwe. Wexta tê ba hevalê xwe hevalê wî bi dûvê wî ecebmayî dibin. Yek ji wî alî dibe ka te dûvê xwe çawa çê kir, yê dî ji aliyekî ve dibêje Roviyo qurbano ka te çilo dûvê xwe çê kiribe ji me re jî çê bike. Hevalê wî hemû jê dipirsin ka çawa ev dûvê xwe yî xweşîk çê kiriye. Rovî ma ne ji hevalê xwe qeherîbû, ma hevalê hev henekê xwe bi hev dikin.. Rovî jî ji forsa dûvê xwe diçe û tê û ji bo go ji wa qeherîbû bi qestî dibêje hevalê xwe;

- Ez zanim bê ka çawa yê dûvê we xweşîk bibe. Herin bikevine wî çemê hanê û heta sibehî tê de bin. Wexta go bû şeveq dûvê we ê weke yê min xweşîk bibe.

Hevalê wî jî ji girgirê hev berî go zanibin ka rovî rast dibêje yan na, diçin dikevin çem de. Ma ne zivistan e û çem ji êvara heta sibeha qeşa digire. Wexta dibê şeveq dûvê hevalê wî hemûya qeşa digire, ji serma nikarin bimeşin heta rojekê. Û çîroka me jî li vir xilas.

## 7. Çîroka Seyrê û Eliyê Mamed

Go hebû nebû go keçeke bi navê Seyranê hebû lê li gund her kesî jê re digo Seyrê. Seyrê xwedî du biraya bû; birayekî wê yê bi navê Qo Qasim birayê wê yê heq bû û birayê wê bi navê Hiso jî birayê wê yê ne heq bû, yanî birayê wê yê jinbavê bû. Ne diya Seyrê hebû ne bavê wê, ne jinbava wê û ne jî xwehên wê hebûn. Ew û her du birayên xwe û keçikeke cariya wê hebûn. Ji ber go bavê Seyrê zilamekî dewlemend, mezin û bi nav û deng bû piştî go bavê wê miriye jî birayên wê ketine şûna bavê xwe. Lewma hê jî birayên wê û ew wek mezinên gund dihatin hesibandin. Go Seyrê keçeke hijdeh salî bû û xweşikbûna wê jî bi nav û deng bû. Li derdora gundê wa kî hatiye xwestina wê qîma xwe bi kesî neaniye. Ew û cariya xwe jî exlebe di odeya xwe de bûn û ji xwe re behsa keçikê gund û tiştê dikirin. Axirê pismamekî Seyrê hebû go Seyrê ne wî nas dikir û ne jî ew dîtibû. Ev pismamê wê yî go navê wî Eliyê Mamed bû xortekî 20 salî, xweşik, lihevhatî û camêrek ji camêran bû. Min go Seyrê ew nas nedikir, erê Seyrê ew nas nedikir û bi çavê seriya jî ew neditibû. Ji bo go wa çaxa Eliyê Mamed hê di pêçekê de bû dê û bavê wî bi êşa zirav ketibûn û rehmet kiribûn. Lewma birayê Seyrê Qo Qasim wî tene ba xwe û wî xwedî dike. Wek birayê xwe lê dimeyzênin, xweşik lê dimeyzênin lê dîsa jî kar û barê xwe pê dikan, weke go xulamêkî li ber destê wa be. Vêca ji ber go wa çaxa keçên mezinên gunda dernediketin derve, Seyrê hema di odeya xwe de bû; çî kar û barê wê hebûna jî keçika cariyê ew a li ber destê wê pêk dianî. Lewma Seyrê û pismamê xwe Eliyê Mamed qet hev nedîtibûn. Rojekê ji rojan Seyrê û keçika li ber destê wê li ber şibakê ji xwe re dirûnin û ji xwe re li hewşê dimeyzênin. Seyrê dibîne go xortek tê hewşê û kîsekî dideyne û diçe. Seyrê ji keça li ber destê xwe dipirse bê ka ew kî ye. Keçik dibêje go ew pismamê wê ye û filan bêvan. Seyrê dikevê meraqa pismamê xwe de û eqlê wê li pismamê wê dimêne. Diçe û tê hema dibêje ev çî xortê qeşeng, xweşik û

lihevhatî..heta niha çima kesî behsa wî ji min re nekir? Seyrê taliya talî xwe nagire û ji cariya xwe re dibêje;

- Te bi Xwedêkî ka bangî pismamê min bike, ez ê çend gotinan jê re bikim.

Cariya wê bi ya wê dike û diçe bangî pismamê wê dike. Pismamê wê bi fêhtokî diçe cem Seyrê. Seyrê çawa ku wî dibîne dilê wê dixûmxûmê, hema wilo kelocanek xwe lê digire. Axirê pismamê wê tê û li kêlaka wê dirûne. Hal û hewalê hev dipirsin û Seyrê hema jê re dibêje;

- Tu pismamê min î û ji her kesî çêtir î ji min re, kêliya go min tu dîtiye ve dilê min ketiya te û were min bixwaze, heke dilê te hebê tu ji min re ez ji te re.

Eliyê Mamed xortekî ji xwefedî bû, nizanîbû çî bêje; lê ji aliyekî ve jî dotmama wî xweşik û esîl bû, wek go dil jî ketiya de. Serê xwe rakir û ji dotmama xwe re got;

- Tu dotmama min î û ji min re ji her kesî çêtir î; lê ez ne xwedî tiştêkî me, tiştêkî min nîne ma ka birayê te yê çawa te bidin min. Birayê te yê li qerşî vî tiştî bin, a baş em vî tiştî ji bîr bikin.

Seyrê keça delalî bû, her tiştê wê hetabû serî, ma yê çawa ji va gotinê Eliyê Mamed qayîl bibe! Seyrê dixwaze go pismamê xwe qeneh bike û werê wê bixwaze; lê pismamê wê dibêje go heke ez behsa vî tiştî ji birayê te Qo Qasim re bikim û te nedê min, divê em hev ji bîr bikin. Piştî vê gotinê Seyrê dibêje naxwe min birevêne û em herin ji xwe re gundekî dî. Heta piştî wextekî em ê vegezin û yê birayê min me efû bike. Eliyê Mamed zanê go ev çiqas barekî giran e; lê xortekî bîst salî ye û xwîna wî germ e. Hema ew jî dibêje naxwe bila soza min be îşev xwe kar bike ez ê werim te birevênim, civanê hev ji hev re dibêjin û Elî dirabe diçe. Seyrê jî heta êvarî hedana wê nayê. Wexta go dibe şev jî beyî go cariya wê bibîne boxçika xwe hazir dike û diçe civanê xwe. Axirê çîroka min dirêj e..Seyrê û Eliyê Mamed digihin hev û ji gund derdikevin. Piştî go ji gund derdikevin Eliyê Mamed ji Seyrê dipirse, dibêje ka vêca em ê bi kû ve herin. Seyrê dibêje;

- Li Mîdyadê min navê kesekî bihîstiye, birayê min Qo Qasim jî wî nas dike, axa ye û ew va meseleyê wilo ji safî dike, xelkê li hev têne. Em herin xwe li wî bigirin, heta go hêrsa birayê me sivik bibe.

Eliyê Mamed jî ji bo ku kesî nas nake ji neçarî bi ya Seyrê dike û berê xwe didene Mîdyadê. Ta bi mala axê diçin, dibêjin axayekî bi navê Hesen e û bi nav û deng e. Diçin mala axê û hal hewalê xwe jê re dibêjin. Xwe dispêrin axê heta go birayên Seyrê wa efû bike; lê piştî go axê Seyrê dibîne dil dikevê Seyrê. Qaşo sê jinê axê hene; lê çawa go çav li Seyrê dikevê har û dîn dibe, dibêje divê Seyrê bibe jina min a çaran. Ji ber vê yekê axê ewilî wan dixapêne û xwe li ber çavê wa şêrin dike, dibêje ser sera ser çavan heta hûn bixwazin hûn mêvanê min in. Helbet Seyrê û Eliyê Mamed jî ji axê bawer dikin û li wir dimênin. Wê rojê dibe êvar Eliyê Mamed li cem axê dimêne û Seyrê jî li cem jinên axê dimêne. Axê û Eliyê Mamed dikin go limêja êvarî bikin. Li ser nimêjê axê xençera xwe derdixe û hema ji nişke va li sûkra Eliyê Mamed dixê. Dibe qêrîna wî Seyrê dengê wî dike, tê ba wî. Çawa go tê, dibîne go xençera di destê axê de bi xwîn e û pismamê wê jî dinalê. Dike hewar lê axê dixwaze go xwe bavêje ser sînga wê. Elî dibîne go nêta axê xerab e, di wî halê ber mirinê de dibêje Seyrê tu bireve here, jixwe ez ê bimirin; lê tu xwe ji destê vî xayînî xelas bike. Seyrê bi hewar û girî nizane çî bike. Dibîne go birastî jî pismamê wê li ber mirine ye, ew jî xwe ji nav destê axê xelas dike û direve diçe. Jixwe ma ne me got Eliyê Mamed, ew xortê bîst salî nestêleh piştî reva Seyrê diçe ber rehma Xwedê. De vêca werî li birîna Seyrê meyzênin..

Seyrê diçe û hey diçe, ber bi çola ve û li ser zimanê wê tenê hewara wê ye;

- Lo pismamo, lo pismamo.. kêlikê em bi hev şa nebûn pismamo..Lo qurbano lo ciwano, ev bejn û bal çawa dikevê bin erdê..

Seyrê bi vê gotinê diçe û hey diçe, bi roj û şev..Çiya û çola derbas dike. Roj bi roj cilên lê kevn dibin, çavê wê ji girî xera dibin, eyn wek pîrê heftê salî lê tê. De vêca bêjim guhdarvanino, heke ez ne şaş bim roj û meh derbas dibin û Seyrê li çiyayekî di şikeftê de xwe dihilêne. Cara go birçî jî dibe giyayê li çiyê dide hev û ji xwe re dixwe; lê ez ji te re bêjim, tu dibe qey ev keça xweşik û nazik çûye û ji bêdala wê jineke dî jihevketî hatiye, êşa wê ew qasî wê daye erdê. Axir Seyrê di vî halî de bû lê birayê wê Qo Qasim jî ne kemî wê ye. Piştî reva xweha Qo Qasim û pismamê wî Eliyê Mamed, Qo Qasim jî dikevê kerbeke kur de. Ne xwarinê dixwe ne avekê divexwe; hema diçe binya gund û çavrêya xweha xwe dike. Her û her dibêje gundiyan xwezî min zanîba ka li kû ne, welleh billeh min ew nedikuştin, min ê ew

efû kiriba, daweteke xweş ji wa re çêkiriba, çû û dihat wilo digot Qo Qasim lê çî feydê kesî pêjna wan her du xorta nedikir. Meh derbas bûn, sal derbas bûn..Seyrê hê jî li wî çiyayî di halê xwe de bû û hezna pismamê xwe dikişand. Axîna wê li wî çiyayî belav dibû. Rojekê dîsa dilorand;

- Pismamo lo pismamo, rojekê em bi hev şa nebûn pismamo, heta ez sax im te ji bîr nakim pismamo..

Seyrê digot û pê re digirî. Wê kêliya go Seyrê digot û digirî feqehêk di wê riyê re derbas dibe û dengê Seyrê dibihîze. Te dî carê feqeh hebûn, ji gundekî diçûn gundekî, ji bajarekî diçûn bajarekî, lê bi paya. Vêca bêjim, feqe pêşî fêhm nakê ka ev dengê çî ye, dengê kê ye; lê li derdora xwe dimeyzêne û dibîne go jineke bi cilê kevnok e û digirî. Dirabe diçe ba Seyrê û jê dipirse ka ev çî derdê wê heye. Seyrê çî qewimiye û çî hatiye serê wê hemû tiştî ji feqe re dibêje û jê rica dike go di dev riya xwe re herê gundê wê, hemû tiştî ji birayê wê Qo Qasim re bêje. Dilê feqe bi Seyrê dişewitê, dixwaze alîkariyê bike û dibêje bila be, heke ez nemirim ez ê ricaya te bigihênim birayê te. Derwîş dikevê rê.. Roj û meha di rê dimêne û taliya talî digihe gundê Seyrê. Ji gundiya mala Seyrê dipirse, gundî rê şanî dikin. Feqe diçe mala Seyrê û dibîne go zilamek li nav bexçe ye û li ber dara dikolê. Ev zilam birayê Seyrê yê jinbavê Hiso ye. Axir silavê dideye û jê re dibêje go ew birayê Seyrê digere. Zilam jî bi qestî nabêje go ew birayê Seyrê ye, xwe bêrî dike û weke go Seyrê nas nakê tevdigerê. Feqe dirabe derdikeve û leqayî gundiyeke dibe. Ji gundî re hal û hewalê dibêje. Gundî dibêje;

- Xwedê ji te razî be te ev xeber anî lê ew zilam Hiso birayê Seyrê yê jinbavê ye, qey dilê wî nexwestiye ji Seyrê re û derew kiriye. Tu hera ba Qo Qasim, ew birayê Seyrê yê heq e û ji çûyîna Seyrê ve hal tê de nemaye, Ka were ez te bibim ba lê, hema belkî bi vê xeberê kêfxweş be.

Piştî vê gotinê Feqe û gundî diçin binya gund ba Qo Qasim. Feqe hal û hewalê jê re dibêje. Qo Qasim ji bo go xeberek ji xweha xwe stendiye dilê wî xweş dibe; lê ji bo xebera pismamê xwe kîzînek dikevê dilê wî, kesereke kurr dikşêne. Ji bo axayê Midyadê jî go ev bînamusî kireye, qehreke zêde zêde dikeve dilê wî. Malavayiya xwe li derwîş dike go ev qenci lê kiriye û dixwaze go wî feqeyî biezimêne heta çend

roja, lê feqe dibêje mecbûr im herim. Axir feqe di riya xwe de diçe, Qo Qasim jî dirabe divegere gund. Qo Qasim mêrekî dirust bû, lewma gundiya lihev digihêne hev, da go ji wa re her tiştî bêje û dû re dibêje;

- Mesele ev e camêrno. Du ciwan xwe li axeyekî digirin go wan xilas bike, ew çi dike, dirabe xayîntiye li wa dike û di ser hala de ciwanekî qetil dike. Ka însaniyeta vî zilamî? Ez ê rabim herim xwîna pismamê xwe li erdê nehêlim. Ji nav we kesê go bixwaze bi min re werê bila werê, kesê go nexwaze jî ez ji wa bê gazin im.

Lewma ji xeynî du sê zilama hemûya xwe bi Qo Qasim re kar kir. Qo Qasim û gundî xwe bi çek kirin û dane ser riya Mîdyadê. Me go Qo Qasim zilamekî bi dilrehm bû, jî xeynî vê jî şehreza û baqil bû. Wexta go gihane Mîdyadê ji gundiya re dibêje;

- Camêrno em hatin lê heke em bi vî şiklî bakin vî axayî, ew ê fêhm bike go ji bo heyfê em hatine û ew ê jî bi çek werê. Hûn bi min re hatine lê naxwazim tiliya we hilpekê. Lewma em ê xeberê jê re bişyênin go ez hatime malavayiyê lê bikim, ji bo go namûsa me paqij kiriye. Ez yeqîn dikim go bi vê xeberê ew ê bixapê.

Qo Qasim piştî vê gotinê zilamekî dişyêne ba axê û kara xwe dikin. Zilamê go şiyandine ba axê vedigere û dibêje axê gotiye ser sera ser çava bila kerem bikin werin filan deverê. Qo Qasim û gundî radibin diçin. Dîbînin go axê jî hatiye wir. Qo Qasim pêşî di kîsikekî biçûk de xelatekê dide axê û dibêje;

- Ez vê xelatê didim te go tu qebûl bike, ev xelet ji bo malavayiya min e go te namûsa min li erdê nehişt.

Axê kêfxweş dibe û forsa wî lê zêde dibe. Hê wilo Qo Qasim bi qerpika wî digire û lê dide, wî dide erdê. Têra xwe gotinan jê re dike û xençerê nivê dilê wî dixê. Axê li wir dimire û Qo Qasim û gundiye xwe bilêz ji wir derdikevin. Piştî ku heyfa xwe hilanî, Qo Qasim êdî dibêje gundiya;

- Hûn bi min re hatin, zanim ev rêyeke nevegerê bû lê dîsa we camêriya xwe kir; lê êdî ez ê herim bi xweha xwe Seyrê ve. Hûn vegezin gund û mala we hemûçka ava.

Gundî êdî divegerin gund û Qo Qasim jî dikevê rê ber bi çiyaya ve. Ez dibêm qey roj û meh derbas dibe, ji hal diket lê dîsa jî di şûna xweha re xwe diçe. Qo Qasim tê heta cihê go feqe jê re gotibû. Li hewîrdora xwe dimeyzêne lê ne kes û ne kus heye. Dike go hineke dî bimeşê lê ji dûrayî ve dengêkî lawaz û bi nalîn dibihîze. Qo Qasim berê xwe dide wî dengî, ber bi deng ve diçe. Dibîne go jineke jihevketî, bi cilê kevnok ji xwe re dengêkî lawaz distire. Wexta go Qo Qasim hineke dî ber bi deng ve diçe, fêhm dike go ev xweha wî Seyrê ye. Hingî rûyê wê guheriye wî ew nas nekiribû. Qo Qasim dibake Seyrê. Seyrê çawa dengê wî dike dengê wî nas dike û ew jî ber bi birayê xwe ve diçe. Her du jî digirîn û hev hembêz dikin. Piştî kelikekê didin rê go vegehin gundê xwe û çiroka min li vir xilas û canê we jî sax.

## 8. Çiroka Stêrka Zêra

Go hebû nebû, keçikeke bi navê Stêrka Zêra hebû û xweha heft biraya bû. Go rojekê keçikê gûnd hemû çûne qirşika. Stêrka Zêra jî bi wa re çûye; lê ew ji hemû hevalên xwe jêhatîtir û zîrektir e. Lewma Stêrikê berya hemû hevalê xwe qirşikê xwe dane hev û çûye ber siya darekê runiştîye go bêhna xwe vedê. Çawa go diçe ber siya darê hingî betiliye vêgavkê xew ve çûye. Stêrka Zêra ji ber go ji hevalê xwe jêhatîtir û jîrtir e, hevalê wê jî jê dihesidin, lewma wexta go Stêrka Zêra xew ve diçe hevalê wê jî meherka (Morîka) xewê dixine gûhê wê go zû bi zû şiyar nebe. Hevalê wê qirşikê xwe didin hev û ber bi qedandine ve bi qestî dibakin Stêrka Zêra. Dibînin go li ti devera pêjna wê nayê. Jixwe ew jî wilo dixwestin go Stêrka Zêra dengê wa nekê. Hevalê wê jî xayîntiyê lê dikin wê li wir dihêlin û divegerin malê. Piştî go wext dibe dereng, diya Stêrikê mitala dike û diçe ji hevalê wê pirs dike. Hevalê wê jî derewa dikin, dibêjin go me bakiriye Stêrikê lê ji ber go pêjna wê nehat em vegehanê malê. Diya wê jî divegerê malê û li hêviya wê dimêne.

Stêrikê jî dema ji xew dirabe dibîne go bûye şevtarî û ti kes jî li derdorê nemaye. Hema ji tirsê dibakê diya xwe;

- Yadê, wa yedêê ez im Stêrka Zêra me, xweha heft bira me.

Hûtek jî dengê wê dike û xwe dixê şûna diya wê û dibêje;

- Ez va me kaça min, were vir.

Stêrikê wexta go vî dengî dibihîze dizane go ev ne dengê diya wê ye. Lewma lê vedigerêne;

- Dengê diya min zirav û dirêj e, ti ne diya min î.

Hût piştî go vê gotinê dibihîze ew jî dengê xwe zirav û direj dike û carek dî bi vî dengî dixwaze go Stêrikê bixapêne. Hêdî hêdî ber bi Stêrikê ve diçe û hema bi derbekê re dirajiyê û li milê xwe dike. Hût wê dibe li şikeftêkê dideyne û latekî jî dideyne ber devê şikeftê da go Stêrikê bi ti deverî de neçe. Stêrikê dike û nake xwe ji nav destê hût xilas nakê. Axirê heta çiqasî jî Stêrikê di şikeftê de girtî dimêne. Rojekê danê şeveqê dengê beranekî tê guhê Stêrikê. Deng ji ber ku nêzîk tê ew jî fêhm dike go beran nêzî şikeftê ye. Wê kêliyê tê hişê wê go gulîska xwe bixê stirehê (Qiloç) beran de. Bi vê yêkê hêvî dike go şivanê vî beranî gulîska wê nas bike û pêjna wê bike, ê ne Stêrikê jîr e. Piştî çend rojan carekê şivan gulîska di stirehê beran de dibîne, çawa ku dibîne fêhm dike go ev gulîska keçîka gûndê wa Stêrika Zêranê ye. Ji ber go dixwaze baş fêhm bike şivan diçe ber bi aliyê şikafta. Wexta nêzî şikafta dibe Stêrika Zêra jî dengê xirpişa şivên dike û dibêje;

- Ez im Stêrika Zêra me, xweha heft bira me, îsal heft sal e di girtîgeha hûta de me.

Bi vî dengî şivên baş fêhm dike go ev dengê Stêrika Zêranê ye; bilêz dixwaze alîkariya wê bike, divegere gûnd û hal hewadîse ji birayê wê re dibêje. Birayê wê hemû dibin yek û haziriya xelaskira xweha xwe dikin. Bi qasî derdora heft gûnda werîsekî peyda dikin û diçin çiyê nêzî şikafta Stêrika Zêra. Xwe li pişt lata de diveşêrin go dema hût derket pêşî wî bikujin. Nêzî berbangê hût derdikevê û birayê biçûk bi mêranî xwe diavêje nav serê wî ,kevirekî mezin li serê wî dixê û serê wî dipelixêne. Lê hût namire. Birayê dî dibînin go hût nemiriye, ew jî tên bi kevira serê wî dixin. Piştî dibînin go gûndî jî hatine alîkariya wa û gûndî jî bi kevira li hût dixin. Hût diferfite û dimire. Piştî go hût dimire, her heft bira werîsê xwe diavêjin şikafta Stêrikê; latê li ber devê şikeftê dadixin xwarê û xweha xwe ji wir xilas dikin. Her heft bira û xweha xwe bi kêfxweşî divegerin mala bavê xwe. Çîroka min li vir xilas, canê gûhdarvanan sax.

## 9. Çîroka Şêr û Rovî

Rojekê ji roja şêr ji xwe re digêrê û ji nişkê ve li roviyekî hejar, belengaz û birçî rast tê. Çawa go rovî çav li şêr dike zehf ditirse, xwe bi ser hev de diqermiçêne, dûvê xwe dixê ber xwe û serê xwe ditewêne. Şêr li halê wî dimeyzêne û jê re dibêje;

- Roviye belengaz ti li çî digere çepalê heram.

Rovî bi halekî xilmaşî dibêje;

- Ez gelekî birçî û betilî me; lê ez nizamim çî bikim?

Şêr şêr e û bi fors e; lê dîsa jî dilê wî pê dişewitê û dibêje;

- Rebeno, belengazo bi min re were ez ê ji xwe re û ji te re nêçîrê bikim, bide pey min. Çepelo!

Roviye reben ji neçarî dide pey şêr û bi rêya xwe de diçin. Di rê de li pezkoviyekî rast tên. Şêr wî pezkoviyî şanî dike û bi dengêkî nizm û xapînok dibêje;

- Rovî... Rovî... Ti dibîne ew neçîra me ye, ka bi lez û bez were çavên min bifirkêne ji bo go sor bibin.

Roviye reben bi şaş û peş dirabe her du çavê şêr difirkêne. Lê dîsa jî şêr dipirse;

- Roviye reben çavên min sor bûn?

Roviye reben ji birçîbûna hal tê de nemaye, lê ma çî bike, şêr şêr e û hurmeta şêr digire û bi dengêkî betilî dibêje;

- Hinekî sor bûn şêrê min.

Dîsa jî şêr dixwaze go hinekî din bifirkêne. Rovî lê ecebmayî dimêne lê bi ya wî dike û bi xurtir carke dî difirkêne. Dîsa şêr dubare dike xwesteka xwe û dibêje;

- Çavên min sor bûn?

Rovî êdî diqehere lê ji tirsê nîkarê dengê xwe derxê û hinekî dî sebrê dikêne;

- Erê, erê, çavê te baş sor bûn!

Birastî jî çavê şêr sor dibin. Piştî vê gotina rovî, şêr bi lepê xwe ê mezin bi hişmekê diçe li qirika pezkovî dixê. Pezkoviyê reben cihde dikevê erdê û dimire. Şêr bi coşekê, bi heybetekê dibakê rovî;

- Roviye belengaz! Were vî goştê xweş bixwe û dengê xwe jî neke.

Ma roviye birçî çî dixwaze! Xwarina wî hatiye ber lê ma hê jî çî bixwaze. Bi kêyfeke nêzî goşt dibe û bi hev du re goştê pezkoviyê dixwin. Heta ku ûrê wa digihê erdê li ser xwarinê narabin. Êdî rovî biryarê dide go bi şêr re herê neçîrê da go xwerina xwe jê derxê. Rovî penc şeş meha bi şêr re diçe neçîrê û bi qasî golikekî qelew dibe. Rojekê ji halê xwe qayil dibe û êdî dibêje bes ez bi şêr re diçim nêçîrê. Taliya talî dibêje şêr;

- Şêrê min, mîre min ez dixwazim ji te veqetim. Te qencî bi min kir lê êdî dixwazim ez bi kêrî xwe werim û bi xwe bi xwe ez nêçîra xwe bikim. Mala te ava, ez ê car cara ji xwe re bigerim.

Ma şêr bibêje çî, heke rovî bi xwe qayil be û jêhatî be bila here, zora wî naçê. Lewma şêr dibêje;

- Heke tu bêje ez ê bi kêr werim, ti karê here, ma bêjim çî.

Bi vê gotinê rovî kêfxweş dibe, êdî weke xulama bi şêr re nagerê û jixwe ji xwe jî qayil e. Ew ê bi xwe bi xwe nêçîra xwe bi dilê xwe bike. Bereketa Xwedê ye bavo..Rojekê ji roja rovî ji xwe re digere û di rê de rastî roviyekî zehf hejar û birçî tê û nişke ve bi quretî dibêje;

- Rovî, Rovî waaa roviye belengaz! Kuro bi min re were neçîrê û bibîne ka ez çawa nêçîrvan im!

Feqîrê roviye hêjar lê ecêbmayî dimêne, lê dibêje hema ez herim belkî zikê xwe tije bikim û dide dû roviye qelew go weke golikekî ye. Her du rovî dûvê xwe dihejênin û bi hev re digerin. Piştî kêlikê li rastî keriyek pez tên. Dimeyzênin go ji wî pezî du karik veqetane. Çavê roviye qelew bi coş divebe û bi quretî dibêje roviye lawaz;

- Roviye reben meyzê ew karikê ha yek jê firavîn e yek jê jî şiv e. De bilezêne were çavên min bifirkêne ji bo go çavên min sor bibin.

Roviyê lawaz ji birçîbûna hema bi gotina wî dike û diçe çavê roviyê qelew difirkêne.  
Roviyê qelew jê dipirsê;

- Çavên min sor bûn?

Roviyê dî;

- Hinekî sor bûn.

Dîsa roviyê qelew careke dî dibêje;

- Zû, baş bifirkêne ji bo go qenc sor bibin.

Roviyê reben diqeherê. Jixwe hal tê de nemaye, hema bi hêrs dibêje;

- Min qenc firkand û her du çavên te baş sor bûne, de ka tê çi bike bike.

Piştî vê gotinê roviyê qelew bi çavsorî diçe go her du karika bikuje. Çawa go nêzî karika dibe du kûçikên har go bi şivên re ber pez in bi xezep tên xwe diavêjin ser roviyê qelew û wî ji halekî dixin halekî dî. Ji lêdanê bi zorê canê xwe xilas dike. Hema bi helke helk û bi xîze xîz dûvê xwe dixê ber xwe û diçe cem roviyê lawaz. Roviyê reben ku her tişt bi çavê xwe dîtî lê divegerêne;

- Tu rovî yî û tu xwe dike şêr. Şêr şêr e û rovî rovî ye, divê yek weke xwe be, hey ehmeqê bêaqil û qurre!

## 10. Çîroka Wezîr

Hebû nebû go wezîrek hebû. Go ev wezîr têra xwe zengîn û destfîreh bû, mal û milkê wî ne xema wî bû. Û kurekî wezîr hebû; lê kurê wezîr nexweş bû. Çiqas dibirin cem doxtora jî ti çareya nexweşiya wî nebû. Hema dert û kula wezîr ew bû go kurê wî baş bibe. Her carê wezîr digot; ‘ Ya rebbî hema go kurê min rihet bibe, bila hemû mal û milkê min di ber de herê.’ Wezîr diçû û dihat hema ev tişt digot. Kurê wezîr jî ji ber go nexweş bû ji odêya xwe dernediket û hema diçû li ber şibakeya odêya xwe dirûnişt li derve dimeyzand. Xulamê wezîr jî xwarina wî dibir odeya wî û xizmeta wî dikir. Roj bi roj dimeyzandin go kurê wezîr zeîf dibe û xwarina go jê re dibin jî nexwarî nevexwarî divegerêne. Bi vî halî wezîr yekcarî mitalaya kurê xwe dike. Dibêje, xwezî canê min di ber canê kurê min de çûba, hema go kurê min rihet bûba. Diçe kû û naçê kû ti derman li nexweşiya kurê wî nayê go kurê wî baş bibe.

Çend meh wilo derbas dibin, go rojekê keçeke esmer û bêvil xizêmkirî tê ber şibakeya kurê wezîr û ji kurê wezîr re dibêje;

- Tu kurê wezîr î ez keça qereçî me, tu ji min re ez ji te re..

Kurê wezîr tişteki ji vê gotinê fêhm nakê lê ew qasî bêhal e go hema guhê xwe nadiyê. Roja dî jî dîsa ew keç tê li ber şibakeya kurê wezîr û eynî tiştî dibêje diçe. Kurê wezîr dibîne go ev keç her şeveq tê vî tiştî jê re dibêje. Rojekê ew jî pê re diştexile û hema wilo dibin heval. Her şeveq ew keç tê û bi kurê wezîr re sihetê dikin. Xulamê wezîr jî dibîne go êdî kurê nexweş xwarina xwe dixwe û roj bi roj li xwe dixwe, mehdê wî xweştir dibe; lê tişteki ferq dike, her cara go xwarina wî dideyne li ber deriyê wî dengê wî tê go bi kesekê re diştexile. Wexta ku diçe hundir jî kesî nabîne. Xulamê wezîr diçe va tišta ji wezîr re dibêje. Helbet wezîr zehf kêfxweş dibe go kurê wî êdî xwarina xwe dixwe û ber bi başbûnê ve diçe; lê jê re jî dibe meraq ka gelo kurê wî bi kê re diştexile yan hema ji xwe me re diştexile. Vêca wezîr dibakê kurê xwe ka ev çi mesele ye go fêhm bike. Kurê wî tê û bavê wî jê dipirse. Kur jî dibêje;

- Yabo êdî ez dixwazim bi wê keça go tê ber şibekaya min re bizewicim û jixwe emrê min jî hatiye.

Helbet wezîr li hêviya wê rojê bû go kurê xwe bizewicîne. Bi vê xebera kurê xwe kêfxweş dibe û jê re dibêje;

- Wey hezar carî li ser xêrê..lê ka bêja kî ye çi kes e ew a go tu dixwaze pê re bizewice?

Kurê wezîr behsa keça qereçî dike û hal û ehwalê ji bavê xwe re dibêje. Wexta go dibe behsa wê keça qereçî wezîr diqehere û dibêje kurê xwe malbata qereçiyên ne li gor malbata me ye û em wê ji te re nazwazin. Lê çiqasî wezîr dibêje jî kurê wî bi ya wî nake û her roj dibêje heke ne ev keç be ez bi kesekê dî re nazewicim. Taliya talî wezîr qaneh dibe û dixwaze go bi dilê kurê xwe bike. Axir diçin keçika qereçî ji kurê xwe re dixwazin. Tofanek fistan û kirasa jê re didûrin û têra wê jî zêra pê ve dikin. Bi ezîmeteke geş û xweş û bi xwarin daweta xwe jî dikin û keçika qereçî dikin xanima malê. Mehekê du meha bi kêf û eşq bi hev re ne û kurê wezîr jî hê baştir dibe. Piştî du meha dimêyzenin ku car caran beyî go heya kesî pê bixe bûka wezîr ji mal diçe û

dereng tê malê. Her cara go jê dipirsin ka tu diçe kû, ew bi derewa dibêje go diçime mala bavê xwe. Her çiqasî dibêjin nabe, dereng newe malê dîsa jî bûk gelek caran dereng tê malê. Heta çiqasî jî kes pê de naxiyêde û naxwazin go dilê wê bimêne; lê êdî wezîr dikevê şikê û rojekê xulamê xwe li du bûka xwe dişyêne. Xulam bi dizîka bûka wezîr dişopêne, dimeyzêne ku bûkê rahiştiye kîsekî û mal bi mal digere ji xwe re parsektiyê dike. Xulamê wezîr divegere malê û tiştê go dîtiye ji wezîr û kurê wî re dibêje. Her du jî ecebmayî dibin. Wezîr diqehere û dibêje vê bûkê em hetikandin, divê em wê berdîn û bişyênin mala bavê wê. Kurê wezîr nizane çî bike, lê ew jî dibîne go êdî nabe. Ew jî bi ya bavê xwe dike. Bavê wî jî dibêje;

- Kurê min keçika qereçî nabe xanima malê.

Û çîroka min jî li vir xilas dibe.